BI NAVÊ XUDA YÊ REHMETA WÎ ZEHF

Û BERFIREH

قال الله تعالى:

﴿إِنَّمَا يُرِيدُ اللَّهُ لِيُذْهِبَ عَنكُمُ الرِّجْسَ أَهْلَ الْبَيْتِ وَيُطَهِّرَكُمْ تَطْهِيرًا﴾

"Hema birastî Xwedê dixwazê qirêjîyê ji hewe Ehlê Beytê tenê bibê û hewe pakê pak bikê"

"Sûretê Ehzab / Ayeta 33"

Gelek hedîsên Pêxember (s) hene û ji gelek serçavkên Sunnî û Şî'an hatine gêran ku ev ayeta pîroz derheq pênc kesên "Âlê 'Eba" da ye û Ehlê Beyt ji hezretê Pêxember û 'Elî û Fatime û Hesen û Huseyn ra hatiye gotin. Ji nimûne re binêrin serçavkên jêrî:

Musneda Ehmed (h. 241) 1 / 331, 4 / 107, 6 / 292, 304. Sehîha Muslim (h. 261) 7 / 130. Sunen ya Tirmizî (h. 279) 5 / 108, 113 … Zurriyet-ut Tahire ya Dûlabî (h. 310) 108. Sunen ya Nesa'î (h. 303) 5 / 108, 113. Mustedrek ya Hekîm Nîşabûrî (h. 405) 2 / 416, 3 / 133, 146, 147. Burhan ya Zerkişî (h. 794) 197. Feth-ul Barî, şerha sehîha Buxarî Ibn-i Hecer Esqelanî (h. 852) 7 / 104. Usûla Kafî, Kuleynî (h. 328) 1 / 287. Ettebsire ya Ibn-i Babiweyh (329) 47 h 29. De'aim-ul Islam ya Mexribî (h. 363) 35, 37. Xisal ya Sedûq (h. 381) 403, 550. Emalî ya Tûsî (h. 460) h. 438 ,482, 783. Di tefsîra de binêrin: Cami'ul Beyan ya Teberî (h. 310). Ehkam-ul Qur'an ya Cessas (h. 370). Esbab-un Nuzûl ya Wahidî (468). Zad-ul Mesîr, Ibn-i Cewzî (h. 597). Cami'ul Ehkam ya Qurtubî (h. 671) Tefsîra Ibn-i Kesîr (h. 774). Tefsîra Se'alibî (825). Durr-ul Mensûr (h. 911). Feth-ul Qedîr ya Şewkanî (h. 1250). Tefsîra Eyyaşî (h. 320). Tefsîra Qummî (h. 329). Tefsîra Furatê Kûfî (h. 352). Mecme'ul Beyan ya Tebersî, tefsîra ayeta: "Ul-ul Emr" û …

Zanînên Bawerîyê

Dersên Eqîde

قالَ رَسُول الله (صلّى الله عليه وَ آله):

اِنِّي تَارِكٌ فِيكُمُ الثَّقَلَيْن: كِتَابَ اللهِ، وَ عِتْرَتِي اَهْلَ بَيْتِي، مَا اِنْ تَمَسَّكْتُمْ بِهِمَا لَنْ تَضِلُّوا اَبَدًا، و اَنَّهُمَا لَنْ يَفْتَرِقا حَتىّ يردَا عَلَيَّ الْحَوْضَ.

Resûlê Xweda Kerem Kir:

"Rastî ev e ku ez du tiştên giranbiha di nav we da dihêlim; kitêba Xwedê û binemala xwe, Ehlê Beytê, çiqa ku hûn xwe bi wan bigirin qet hûn li rê winda nabin; û bi rastî ew qet ji hev cida nabin heta ku bal hewzê li min bicivin"

Binêrin:

Ev hedîsa şerîf bi awayên zehfî û mutewatir ji Resûlê Xweda hatiye gêran, yên wek: Sehîh ya Muslim, c. 7, s. 122; Sunen ya Daremî, c. 2, s. 432; Musned ya Ahmed, c. 3, s. 14, 17, 26, 59, c. 4, s. 466, 471, c. 5, s. 182; Mustedrek ya Hekîm, c. 4, s. 109, 148, 533 hwd ...)

ZANÎNÊN BAWERÎYÊ

Ustad Muhemmed Teqî Misbahê YEZDÎ

WERGÊR:

Seyyid Seccadê Huseynî yê CÛDÎ

Komgeha Cihanîya Ehlê Beytê (e.s)

نام کتاب: آموزش عقائد
نویسنده: محمد تقی مصباح یزدی
مترجم: سید سجاد حسینی جودی
زبان ترجمه: کردی (کرمانجی)

Navê Orjînalê Kitêbê:
Amûzişê Eqayid
Nivîser: Ustad Muhemmed Teqî Misbahê Yezdî
Wergêr: Seyyid Seccadê Huseynî yê Cûdî
Serastker û Edîtor: Seyda Seyyid Elî yê Huseynî yê Bohtî
Amadekar: Idare ya Tercume ya Komgeha Cihanî ya Ehlê Beyt
Belavker: Komgeha Cihanî ya Ehlê Beyt (s.e)
Tîraj: 3000 lib
Çapxane: Leyla
Sal: Sala 2008. Çapa Ewil.
ISBN: 978-964-529-432-6
www.ahl-ul-bayt.org
Info@ahl-ul-bayt.org
Hemî mafên kitêbê parastî ne.

NAVEROK

PEYVA KOMGEHÊ -- 15
PÊŞGOTINA NIVÎSER -- 17

PIŞKA YÊKÊ

DERSA 1

Mefhûmê dîn -- 21
Esl û Çiqên dîn -- 22
Cihanbînî ya ilahî û maddî -- 23
Dînên 'esmanî û usûlên wan -- 23

DERSA 2

LÊKOLÎNA DÎNÎ / 27
Hilêxistin ji lêkolîn û vejenînê ra -- 27
Muhimî ya tehqîqa derheq dîn da -- 30
Rakirina şubheyekî -- 31

DERSA 3

ŞERTÊ JIYANA INSANKÎ / 33
Pêşekî -- 33
Mirov li pey kemalê ye -- 34
Kemala mirov di peyrewî ya 'eql da ye -- 34
Hukmên 'emelî yên 'eql, muhtacê binyata ne -- 35
Desthat û netîce -- 36

DERSA 4

RÊKA ÇARESERKIRINA MESELÊN BINYATÎ / 39
Pêşekî -- 39
Qismên nasînê -- 39
Qismên cihanbînîyê -- 40
Lêkolîn û vejenîn -- 41
Desthat û netîce -- 43

DERSA 5

NAS KIRINA XUDÊ / 45
Pêşekî -- 45
Nasîna huzûrî û husûlî -- 46
Nasîna fitrî -- 46

DERSA 6
RÊKA RIHET Û SADE YA XUDA NASÎYÊ / 49
Rêkên nas kirina Xuda -- 49
Taybetmendîyên rêka sade û hêsan -- 50
Nîşanên nas -- 51
DERSA 7
ISBAT KIRINA WACIB-UL WUCÛB / 55
Pêşekî -- 55
Delîl (burhan) -- 55
Imkan û wucûb -- 56
'Illet û me'lûl -- 57
Mehal bûna teselsula 'illetan -- 59
Dubare kirina burhan û delîlê -- 59
DERSA 8
SIFETÊN XUDÊ / 61
Pêşekî -- 61
Ezelî û ebedî bûna Xudê -- 62
Sifetên selbîyye -- 62
'Illetê jînder -- 64
Taybetîyên 'illeta jînder -- 65
DERSA 9
SIFETÊN ZATIYYE / 67
Pêşekî -- 67
Sifetên zatî û fi'lî -- 68
Isbata sifetên zatî -- 69
Ronahî kirinek zehftir derheq va sifeta da -- 69
DERSA 10
SIFETÊN FI'LÎ / 73
Pêşekî -- 73
Xaliqiyyet (sifetê xuliqandin û çêkirinê) -- 75
Rubûbiyyet -- 76
Ulûhiyyet -- 77
DERSA 11
SIFETÊN DÎ YÊN FI'LÎ / 79
Pêşekî -- 79
Irade -- 80
Hikmet -- 81
Kelamê Xudê -- 82
Sidq – rastî -- 83
DERSA 12
VEJENÎNA SEBEBÊN XWEHRÎYÊ / 85
Pêşekî -- 85
Sebebên xwehrî û rêşaşîyê -- 86
Berberekaniya gel sebebên nedurustîyê -- 89
DERSA 13
CEWABA ÇEND ŞUBHAN / 91
Baweriya bi mewcûdê nemehsûs -- 91
Tirs û nezanîn û baweriya bi Xudê -- 92
Gelo eslê «'Illiyyet»ê eslek gişti û kullî ye? -- 93
Desthatên 'ilmên tecrubî -- 94

DERSA 14
CIHANBÎNÎ YA MADDÎ Û VEJENÎNA WÊ / 97
Eslên cihanbînî ya maddî -- 97
Vejenîna eslê ewil -- 98
Vejenîna eslê duwê -- 99
Vejenîna eslê sisê -- 100
Vejenîna eslê çarê -- 100
DERSA 15
MATIRIYALÎSMA DIYALIKTÎK Û VEJENÎNA WÊ / 103
Matiriyalîsma mîkanîkî û diyalîktîkî -- 103
Eslê dijatîyê -- 104
Eslê guhaztinê -- 106
Eslê nefya nefy -- 107
DERSA 16
YÊK BÛNA XUDA / 109
Pêşekî -- 109
Delîlek li ser yêk bûna Xudê -- 111
DERSA 17
ME'NA YÊN TEWHÎDÊ / 115
Pêşekî -- 115
Avêtina çend xudatîyê (nefya te'edûdê) -- 115
Nefya terkîbê -- 116
Nefya sifetên zêdeyê ji zat -- 116
Tewhîda ef'alî (kiryarî) -- 117
Eser danîna serbixwe -- 117
Du desthatên muhim -- 118
Dûr kirina şubheyekî -- 119
DERSA 18
CEBR Û IXTIYAR / 121
Pêşgotin -- 121
Ixtiyar -- 123
Dûr kirin û def'a şubhên cebrê -- 125
DERSA 19
QEZA Û QEDER / 127
Mefhûmê qeza û qederê -- 127
Qeza û qedera ‘ilmî û 'eynî -- 128
Peywenda qeza û qederê digel ixtiyara mirov -- 129
Eqsamên eser danîna 'illetên zehfî -- 130
Rakirina şubhê -- 131
Eserên baweriya bi qeza û qederê -- 132
DERSA 20
'EDALETA XUDA / 135
Pêşekî -- 135
Mefhûmê «'edl»ê -- 137
Delîla 'edaleta Xudê -- 139
Cewaba çend şubhan -- 141

PIŞKA DUWÊ

DERSA 21
DERHEQ MESELA PÊXEMBERÎYÊ DA / 147
Pêşekî -- 147
Hedefa ji behsên vî qismî -- 148
Awayê lêkolînê di 'ilmê kelam da -- 149
DERSA 22
NIYAZA BI «WEHY» Û «PÊXEMBERÎYÊ» / 151
Lazimî ya hatina pêxemberan -- 151
Kafî nebûna zanîna beşer -- 153
Feydên hinartina pêxemberan -- 154
DERSA 23
CEWABA ÇEND ŞUBHAN / 157
Jinav birina çend şubhan -- 157
DERSA 24
PARASTÎ BÛNA ('ISMET) PÊXEMBERAN / 165
Lazimî ya parastî mayîna wehyê -- 165
Parastinên dî -- 167
'Ismet û parastî bûna pêxemberan -- 169
DERSA 25
DELÎLÊN PARASTÎ BÛNA PÊXEMBERAN / 173
Pêşekî -- 173
Delîlên 'eqlî yên parastî bûna pêxemberan -- 174
Delîlên neqlî li ser me'sûmiyeta pêxemberan -- 175
Remz û raza pakî ya pêxemberan -- 176
DERSA 26
JINAV BIRINA ÇEND ŞUBHAN / 179
Jinav birina çend şubhan -- 179
DERSA 27
MU'CIZE / 189
Rêkên sabit kirina pêxemberîyê -- 189
Mu'cize çi ye? -- 191
Kar û tiştên xariqul 'ade -- 191
Xariqul 'adeyên xudayî -- 192
Taybetî yên mu'cizên pêxemberan -- 193
DERSA 28
JINAV BIRINA ÇEND ŞUBHAN / 195
DERSA 29
TAYBETÎ YÊN PÊXEMBERAN / 201
Gelekî ya pêxemberan -- 201
Êjmara pêxemberan -- 204
Nubuwwet û risalet -- 204
Pêxemberên ulul 'ezm -- 205
Çend nukte -- 206
DERSA 30
MIROV Û PÊXEMBER / 209
Pêşekî -- 209
Me'emileta xelkê digel pêxemberan -- 210

Sebebên muxalefeta digel pêxemberan -- 210
Awayên rûbirû bûna digel pêxemberan -- 211
Hinek ji sunnetên ilahî di rêxistina komela da -- 213
DERSA 31
PÊXEMBERÊ ISLAMÊ / 215
Pêşgotin -- 215
Isbata risaleta Pêxemberê Islamê (s) -- 218
DERSA 32
MU'CIZE BÛNA QUR'ANÊ / 221
Mu'cize bûna Qur'ana pîroz -- 221
Cihet û doralî yên mu'cize bûna Qur'ana pîroz -- 223
A- fesahet û belaxeta Qur'ana pîroz -- 223
B- nexwendî bûna înerê -- 225
C- hemahengî û nebûna ixtilafê -- 227
DERSA 33
PARASTÎ BÛNA QUR'ANA PÎROZ JI TEHRÎF Û GUHERÎNÊ / 229
Pêşekî -- 229
Lê zêde nebûna tiştekî di Qur'anê da -- 230
Jê kêm nebûna tiştek ji Qur'ana pîroz -- 231
DERSA 34
CIHANÎ BÛN Û DAIMÎ BÛNA ISLAMÊ / 235
Pêşekî -- 235
Cihanî bûna Islamê -- 236
Delîlên Qur'anê li ser cihanî bûna Islamê -- 237
Daimî bûna Islamê -- 238
Rakirina çend şubhan -- 239
DERSA 35
XATEMIYYET / 241
Pêşekî -- 241
Delîla Qur'anê li ser xatemiyetê -- 241
Delîlên riwayetî yên xatemiyetê -- 242
Sirra xetma pêxemberîyê -- 243
Cewaba şubheyekî -- 244
DERSA 36
IMAMET / 247
Pêşekî -- 247
Mefhûmê imametê -- 250
DERSA 37
NIYAZ Û IHTIYACA BI HEBÛNA IMAM / 253
Pêşekî -- 253
Lazimiya hebûna imam -- 254
DERSA 38
DANÎNA IMAM / 259
DERSA 39
'ISMET Û 'ILMÊ IMAM / 265
Pêşekî -- 265
'Ismeta imam -- 265
'Ilmê imam -- 267

DERSA 40
HEZRETÊ MEHDÎ / 273
Pêşekî -- 273
Hukmeta ilahî ya cihanî -- 274
We'da Xudê -- 275
Nimûneyek ji riwayetan -- 276
Hinek riwayetên Ehlê Sunnet vê derheqê de -- 276
Veşartin û sirra wê -- 277

PIŞKA SISÊ

DERSA 41
MUHIMMÎ YA XILASEK NASÎYÊ / 283
Pêşekî -- 283
Muhimmî ya baweriya bi qiyametê -- 284
Muhimmî ya qiyametê di Qur'ana pîroz de -- 286
Netîce ya gotarê -- 287
DERSA 42
BIHEVE GIRÊDAYÎ BÛNA QIYAMETÊ Û MESELA RÛH / 289
Milaka wehdetê di mewcûdê xwey jiyan da -- 289
Cî yê rûh di wucûda insan da -- 292
DERSA 43
TECERRUDA RÛH / 295
Pêşekî -- 295
Delîlên 'eqlî yên tecerruda rûh -- 295
Şahidên Qur'anî -- 298
DERSA 44
SABIT KIRINA ME'ADÊ / 301
Pêşekî -- 301
Delîl û burhana hikmetê -- 302
Delîla 'edaletê -- 304
DERSA 45
RABÛNA QIYAMETÊ GOREKÎ QUR'ANÊ / 307
Pêşekî -- 307
Inkara me'adê bêdelîl e -- 308
Qewimînên wek me'adê -- 309
DERSA 46
CEWABA QUR'ANÊ BO ŞUBHÊN INKARKERAN / 313
DERSA 47
WE'DA XUDÊ DERHEQ QIYAMETÊ DA / 317
Pêşekî -- 317
We'da muheqeq ya Xuda -- 317
Işare bo delîlên 'eqlî -- 318
DERSA 48
TAYBETÎ YÊN 'ALEMA AXIRETÊ / 323
Pêşekî -- 323
Taybetî yên 'alema axiretê di nêrîna 'eqil da -- 325

DERSA 49
JI MIRINÊ HETA QIYAMETÊ / 329
Pêşekî -- 329
Her mirovek wê bimirê -- 330
Cangîr -- 330
Rihet û zehmet girtina rûhan -- 331
Qebûl nebûna îman û tewbê li demê mirinê -- 331
Xweziya zivirîna li dinyayê -- 332
'Alema berzexê -- 333
DERSA 50
ŞIKLÊ QIYAMETÊ DI QUR'ANÊ DA / 335
Pêşekî -- 335
Halê 'erd û behr û çiyan -- 336
Halê 'esman û stêran -- 336
Sûra mirinê -- 336
Sûra saxîyê û destpê bûna qiyametê -- 337
Eşkere bûna hukûmeta ilahî û birîna sebeb û neseban -- 337
Mehkema 'edla ilahî -- 338
Bi alîyê sekingeha ebedî ve -- 339
Bihişt -- 340
Cehnem -- 341
DERSA 51
MUQAYESE YA DINYA Û AXIRETÊ / 345
Pêşgotin -- 345
Cuda bûna xweşîyê ji 'ezab di axiretê da -- 346
Eslî bûna axiretê -- 347
Netîce ya bijartina jiyana dinyayê -- 347
DERSA 52
PEYWENDA DINYA Û AXIRETÊ / 349
Pêşgotin -- 349
Dinya zevî ya axiretê ye -- 349
Xweşîyên dinyayê ne sebebê bexteweriya axiretê ne -- 351
Xweşîyên dinyayî ne sebebê bextreşî ya axiretê ne -- 352
Netîce û desthat -- 353
DERSA 53
ŞIKLÊ PEYWENDA NAVBEYNA DINYA Û AXIRETÊ / 355
Pêşekî -- 355
Peywenda heqîqî an danerî -- 356
Şahidên Qur'anî -- 357
DERSA 54
ESERA ÎMAN Û KUFRÊ DI SE'ADET Û ŞEQAWETA EBEDÎ DA / 359
Pêşekî -- 359
Heqîqeta îman û kufrê -- 360
Nisaba îman û kufrê -- 361
Esera îman û kufrê di bextewerî û bextreşî ya her û her da -- 362
Şahidê Qur'anî -- 363
DERSA 55
GIRÊDANA DUBEREKIYA ÎMAN Û 'EMEL / 365
Pêşekî -- 365
Peywend û girêdana îmanê digel 'emel û kiryarê -- 365

Peywenda 'emel digel îmanê -- 366
Netîce û desthat -- 367
DERSA 56
ÇEND NUKTÊN GIRÎNG Û MUHIM / 369
Pêşekî -- 369
Kemala heqîqî ya mirov -- 370
Tebyîna 'eqlî -- 371
Esera hedef û niyetê -- 372
DERSA 57
HEBT Û TEKFÎR / 375
Pêşekî -- 375
Peywenda îman û kufrê -- 376
Peywenda karê qenc û xirab -- 377
DERSA 58
SERATÎ YÊN BAWERDARAN / 379
Pêşekî -- 379
Zêde bûna xêrê -- 380
Bexşîn û 'efû kirina gunehên biçok -- 381
Istifade kirina ji karê yên dî -- 381
DERSA 59
ŞEFA'ET / 383
Pêşekî -- 383
Mefhûmê şefa'etê -- 384
Çarçova şefa'etê -- 386
DERSA 60
RAKIRINA ÇEND ŞUBHAN / 391

PEYHAT
PÊRISTA AYETAN -- 399
PIRSYARÊN KITÊBÊ -- 423

PEYVA KOMGEHÊ

Mîrasa giranbiha ya ku Ehlê Beytê (s) paş xwe ve hiştî û peyrewên wê, ew ji xetera jinavçûnê parastîn nimûneyek kamil e ji mektebekî berfireh ku çiq û bergên muxtelifên me'rifet û zanînên Islamî li ber xwe girtine; evê mîrasê, kariye gelek ji kesên xwey qabiliyet û şîyan ji bona têr vexwarina ji vê serkanî ya tejî, perwerde bikê û ewa zanayan berpêşê ummeta Islamî bikê ku li pey dewsa binemala Pêxemberê Xwedê (s) li beraberê ewan şubheyan da ku ji navda û ji derveyê komela Islamî tên meydanê baştirîn û binecîtirîn cewab û rêkên çareser kirinê bidin û bêjin.

Komgeha cihanî ya Ehlê Beytê (s) li ser esasê mesûliyeta xwe, ji herîmê risalet û bawerî yên wê yên heq berevanî kiriye û her û her di vê rêka muqeddes da xwe ji şagirdên durust yên mekteba Ehlê Beytê hesab kiriye. Her wiha ev komgeh xebitiye ku lêkolîn û nivîsînên bi feyde yên şexsiyet û kesayetî yên borîyî û derbaz bûyî çap û belav bikê, da ku li têhnîyên heqîqetê bigivirê û di çaxa tekamula leza 'eqlan û pêwenda bênimûne ya canan da guhê canê xwe vekin li ber wa heqîqetên ku Ehlê Beyta risaletê (s) ji hemî cihanîyan ra kirîn xelat û hediye kirîn.

Hêvî ew e ku xwendayên giranqedr, komgeha cihanî ya Ehlê Beytê ji bîr û hizr û pêşniyarên bi biha û rexneyê xwe yên durustker bêbehr nekin û her wiha em ji bingeh û zana û wergêran daxwaz dikîn ku ji bona belav kirina Islama xalisa Muhemmedî (s) arîkariya me bikin.

Em ji Xweda yê Mute'al daxwaz dikîn ku evê xizmetê ji me qebûl bikê û li bin sîbera xelîfe yê xwe, Hezretê Mehdî (s) da tewfîqa zêde bûna va xizmeta bidê me. Niha jî gelek bi cî ye ku em qedrzanîyê bikîn ji nivîser û wergêr û hemî wa 'ezîzên ku arîkarî kirîn heta ev eser gehayî fêkî danê, nexasma biraderên hêjayî li idare ya tercumê da.

Komgeha Cihanî ya Ehlê Beyt (s)
Arîkarê Ferhengî
5-ê Şe'ban / 1427

PÊŞGOTINA NIVÎSER

BI NAVÊ XUDA YÊ PIR BIREHMÊ DILOVAN

Hemd ji Xuda re, xweykerê cihaniyan, û selat û selam li ser başt irîn mexlûqê Wî Muhemmed (s.e) û alê wî yê pak û paqij, nexasma «Beqiyetullah/Imam Mehdî» ku Xwedê berfirehiya wî nêzîk bikê û me bikê ji arîkar û yarîderên wî.

'Eqîde û bawerîyên binyatî, esas û xîmê her teşkîlat û îdeolojîyekî ye ku te'sîrê datînê ser rabûn rûniştinên xelkê. Ji ber vê yêkê ji bona qewî bûna hevgirtina Islamî lazim e binyatên bawerîyê ku reh û rîşe yên evê dara pir xêr û bereketê di dilan da cî bigirê; da ku her û her fêkîyê xwe yê xweş û şîrîn bidê û bexteweriya du cihana dest mirov bêxê.

Ji ber vê yêkê zana û 'alimên Islamê di ewilîn sedên destpêka Islamê da bi awayên muxtelif dest avêtine ronahî kirina bawerîyên Islamî, û di nav wan da zanayên «'ilmê kelam» jî ji hemî renga û ji bona her komekî gora fêhma wan kitêb nivîsîne. Di vî wextê me da jî ku şubhe û gotinên nû hatine meydanê, wê gorekê kitêb hatine nivîsîn. Lêbelê tişta heyî ev e ku vê derheqê da an ji 'umûmê xelkê ra bi zimanekî hatine nivîsîn ku hemî fêhm bikin, an jî bi zimanek taybet û xas hatine nivîsîn û kelîmên 'ilmî û giran têda hene ku komek tenê fêhm dikin. Û di vê navbeynê da cihê wa kitêbên ku ji ders dana heddê navincî ra bi kêr bê vale maye. Eve çend sal e ku medreseyên dînî, xwe muhtac zanin ji kitêbên wiha ra.

Ji ber vê çendê li ser daxaza kombesta ragehandina Islamî û bi arîkariya birek ji zanayên «bingeha rêka heq» me dest avêt hazir kirina vê kitêbê ku taybetîyên jêrî hene:

1- Em xebitîne ku bi awayek durust mesela li cihê wan da û bi tertîbek durust ronahî bikîn û zanîna wê nehêlîn hêviya gotinên hêj bên ve.

2- Em xebitîne ku ji fêhm kirina gotinê ra kelîmên sivik bînîn û xwe vedîn ji bikar anîna kelîmên istilahî û bi zehmet.

3- Em xebitîne ku pê delîlên qahîm û ronahî gotinê bidîn ber çavan û xwe ji anîna delîlên sist vedîn û delîlan ser hev da nekurisênîn.

4- Em xebitîne ku hay ji kurt kirinê hebîn û xwendayan pê gotinên zêde newestînîn.

5- Çiko ev kitêb ji heddê navincî ra hatiye nivîsîn, me xwe vedaye ji anîna delîlên kûr û li hev pêçayî ku dikê lazimê xwe mirov nas bê digel felsefe û tefsîr û fiqh û hedîsê; di cihên lazim da me bi kurtî vebiriye û berê xwendaya daye xwendina kitêbên dî, da ku di xwendevana da şewqa xwendin û peyketinê çêbê.

6- Kitêb bi awayê ders û ders hatiye veqetandin, û gotinên têra her dersekî di qismek yê kitêbê da hatiye.

7- Nukte û gotinên muhim û lazim yên dersa pêşda li dersa pêretir da hatine gotin da ku li mejîyê xwendevanan da cî bigirê.

8- Di axirîka her dersekî da hinek pirsyar ji wê dersê hatine, da ku bibin arîkarê 'elimîn û hîn bûna baştir ya wê dersê.

9- Şik tune ku ev kitêb ne vale ye ji kêmasîyê, hêvî ew e seydayên giranqedr fikr û xwestên xwe ji me ra bêjin da ku di çapên pêretir da istifade ji gotina wan bê kirin.

Hêvî ew e, ev xizmet ji me bê qebûl kirin û me karîbê em hinekî ji deynê xwe yê medresên dînî û şehîdan li stûwê me da heyî eda bikîn.

Qum – Muhemmed Teqî Misbahê Yezdî

1365 – Hicrî Şemsî

PIŞKA YÊKÊ

XUDA NASÎ

DERSA 1

DÎN ÇI YE?

Dagirê:

Mefhûmê Dîn

Esas û Çiqên Dîn

Cihanbînî û Îdeolojî

Cihanbînî ya Ilahî û Maddî

Dînên Esmanî û Binyatên Wan

Mefhûmê dîn

Hedefa vê kitêbê ronahî kirina bawerîyên dînî ye ku di istilahê da jêra tê gotin «biniyatên dîn». Ji ber vê yêkê lazim e pêşiya her tiştî da em piçekî behsa kelîma «dîn» û biwêjên (kelîmên) ji wê pêkê bikîn. Çimko wek çewa di mentiqê da hatî «mebadî yên tesewwurî – te'rîfat» pêşiya gotinên dî da ye.

Dîn, wêjekî 'Erebî ye ku di luxet da bi me'na guhdan û kirh û ceza û ... hatiye, û di istilahê da bi me'na baweriya bi hebûna xaliqekî ye ji cihan û insan ra û baweriya bi wê çendê ku ewî xaliqî hinek destûrên rêkketî digel wê bawerîyê hene. Vê gorekê kesên ku qet bawerî neyîn bi xaliqekî û çêbûna eva tiştên di cihanê da heyî tesadufî (ji ber qewimînekî neme'lûm) an ji desthata pêşhatên maddî û tebî'et bizanin ji wan ra tê gotin «bê dîn». Lêbelê kesên ku bawer dikin cihanê xaliq û çêkerek heye, lê bawerî û kiryarên wan yên dînî tevlî xwehrî û nedurustîya bê

«xwey dîn» hesab dibin. Û li ser vê binyatê ye ku ji bo dînên di nav mirova da heyîn ra tê gotin heq an batil; û dînê heq ew e ku bawerîyên di wê da heyîn durust û gorekî heqîyê bin û ewa kar û kiryaran bidê ber peyrewên xwe ku ji durustî û kêrhatina wan ra mirov piştrast bê.

Esl û Çiqên dîn

Pê gotina ku derheq mefhûmê istilahî yê dîn da hat gotin, ronahî bû ku her dînek kêmê kêm ji du behra pêk tê: 1- bawerî an bawerîyên ku xîm û esas û reh û rîşe jêra hene 2- destûrên 'emelî û kiryarî ku li ser esasê wê ava bûye û ji wê peyda bûye û derketiye meydanê.

Nixwe di cî da ye ku qismê baweriya di her dînekî da jê ra bê gotin «esl û esas» û ji qismê hukmên kiryarîyê wê ra jî «çiq û fer'» bê gotin. Çewa ku zanayên dînî ev her du nav ji bawerî û ehkamên Islamê ra bikar birine.

Cihanbînî û îdeolojî

Ev her du kelîme di me'nayên nêzîkê hev da bikar hatine, yêk ji me'nayên cihanbînîyê ev e ku: ew zincîre bawerîyên biheve girêdayî ne, derheq cihan û insan da. Û yêk ji me'nayên îdeolojîyê jî ev e ku: ew zincîre bîr û hizrên hevgirtî ne, derheq rabûn rûniştinên mirova da.

Gorekî van du me'na em dikarîn ji şiklê 'eqîde û bawerê û eslên her dînekî ra bêjîn «cihanbînî» ya wî dînî û hukmên gir û necuz'î yên kiryarî jî ji wî dînî ra «îdeolojî» bênîn hesabê, yanî em dikarin ewa herduka bidîn ber usûl û furû'ên dînekî. Lêbelê lazim e bê zanîn ku îdeolojî hukmên cuz'î li ber xwe nagirê wek çewa cihanbînî şamilê bawerîyên cuz'î û hûrik nabê.

Tiştek dî jî heye ku: carna kelîma «îdeolojî» bi me'nayek 'umûmî jî bikar tê birin ku cihanbînî yê jî li ber xwe digirê.

Cihanbînî ya ilahî û maddî

Di nav mirova da gelek şiklên cihanbînîyê hene, lêbelê çêdibê ku li ser esasê qebûl kirina «mawerayê tebî'et» û qebûl nekirina wê li ser du qismên cihanbînî ya ilahî û cihanbînî ya maddî bên pişk kirin.

Di zemanê kevn da ji xweyê cihanbînî ya maddî ra dihat gotin: «tebî'î» û «dehrî» û carna jî digotan wan: «zindîq» û «mulhid» û di zemanê me da ji wan ra tê gotin: «maddî» û «matiriyalîst».

Evê fikra maddî komên muxtelif hene ku meşhûrtirînê wan di zemanê me da «matiriyalîsma diyalîktîk» e ku qismê felsefî ya marksîsmê pêk aniye.

Gorekî qasê me behsê kirî ev jî ronahî bû ku daira kelîma «cihanbînî» firehtir e ji bawerîyên dînî; çimko ji bawerîyên ilhadî û maddî ra jî tê gotin, wek çewa wêje ya «îdeolojî» jî ne mexsûsê hukmên dînî ye.

Dînên 'esmanî û usûlên wan

Derheq çewaniya peyda bûna dîna da di navbeyna zanayên tarîxa dîna û komelnasî û mirov nasîyan da hinek ixtilaf hene. Lêbelê li ser esasê wê ya ji delîlên Islamî destve tê, em dikarîn bêjîn: tarîxa peyda bûna dîn ji hingê ve ye ku mirov çêbû, û ewilîn mirov (hezretê Âdem (s) pêxemberê Xudê û gazîkerê bi alîyê tewhîd û Xudê perêsîyê ve bûye. Û ew dînên ku şirk têda heyîn hemî ji ber xwehrî ya ku hineka pê meyla xwe xistî têda peyda bûne. [1]

[1]- Yêk ji xwehrî yên ku êxistîn di dîn da ji bona razî kirina zalimên zorgo, ev e ku: daire ya dîn biçok kirin di peywenda mirov û Xuda da, û hukmên dînî ji merasimên dînî tenê ra hêlane û siyaset û teybîrdana kar û barê komelê ji daire ya dîn deranîne. Halhale Pêxember (s) ji alîyê Xudê ve hemî hukmên lazim ji xelkê ra di jiyanê da ji

Dînên tewhîdî hema dînên heqîqî û 'esmanî ne ku sê eslên muşterek hene: baweriya bi Xuda yê tek û tenê; baweriya bi jiyana ebedî di 'alema axiretê da ji bona tektekê mirovan ra, ku hingê wê herkes ceza û xêra kiryarên di vê dinyayê da kirîn bibînê; û ya sisê jî baweriya bi vê çendê ku Xudê pêxemberan rêdikê ji bona rêrast kirina beşer bi alîyê kemalê ve û ji bextewer kirina wî di dinya û axiretê da.

Ev sê esl, di heqîqet da cewab in ji bona pirsyarên binyatî ku ji hemî mirovên hişyar ra tên pêş: destpêka hebûnê çi ye? Û dûmahîk û axirîka wê çi ye? Û bi çi rêkê ve mirov dikarê rêk û awayê baştir ya jiyanê nas bikê? Ew rêk û awayê ku piştrastiya ji wî bi wehyê tê zanîn, îdeolojî ya dînî ye ku ji cihanbînî ya ilahî hatiye girtin.

Bawerîyên eslî hinek dûvik û lazimî û tişt û mişt digel hene, ku hemî pêkve dibin bawerîyên dînî û ixtilafa di van baweriyan da dibê sebebê çêbûna dîn û kom û birên mezhebî yên ji hev cida. Çewa ku ixtilafa derheq pêxemberî ya hinek ji pêxemberan û kifş kirina kitêba 'esmanî, bûye sebebê hinek ixtilafên dî di bawerî û kiryaran da, ku carna êdî digel bawerîyên eslî jî rêk nakevin, wek bawerîya sêyîtîyê (teslîs) di Filetîyê da ku digel tewhîdê rêk nakevê, herçend ku Fileh ewê te'wîl û me'ne dikin. Wek çewa ku çewaniya kifş kirina cîgirê Pêxember (s) kanê gelo gereke ji alîyê Xudê ve bê an ji alîyê xelkê ve, bûyî sebebê binyatîyê ixtilafa navbeyna Şî'e û Sunnîya da di daira Islamê da.

Welhasil: tewhîd û pêxemberî û qîyamet (me'ad) binyatîtirîn û esasîtirîn bawerî û 'eqîde ne di hemî dîna da, lêbelê mirov dikarê hinek bawerîyên dî jî bi awayekî ji bawerîyên eslî hesab

---

wan ra aniye û qismek mezin ji zanînên dînê Islamê girêdayî ye bi mesele yên komelayetî û iqtisadî û siyasî ve.

bikê, vêca çi em bêjin ew ji wa sê eslan hatine dest û çi jî bê gotin ku di netîca vejenîna wan da ew hene. Mesela mirov dikarê baweriya bi Xudê bikê esl û binyatek, û baweriya bi tek bûn û yêkîniya Wî bikê esl û binyata duwê . Wek çewa hinek ji zanayên Şî'a «'edalet» ku yêk ji çiqên baweriya bi Xudê ye kirine eslek ser bixwe, û «imamet» ku meseleyeke li pey eslê pêxemberîyê ra tê eslek cida hesab kirine.

Vê gorekê du me'nên 'umûmî û xusûsî ji biwêja «usûlên dîn» ra hene, bi awayê 'umûmî ku hemî bawerîyên binyatî li ber xwe digirê li beraberê «furû'ên dîn» û hukmên şer'î da bikar tê, û bi awayê xusûsî jî ji esasîtirîn bawerîya ra bikar bê birin ku sê eslên «tewhîd û nubuwwet û qîyamet» bi awayek gişti usûlên dîn ên 'esmanî ne û çend eslek dî eger lê zêde bibin dibê eslên dînê mexsûs û taybet, û pê zêde kirina yêk an çend bawerîyên dî ku kom û birek xas xweyê wa baweriya ne, ew jî dibê «usûlê dîn û mezheb» an «bawerîyên binyatên yêk mezhebê».

PIRSYARÊN DERSA 1

Dîn, di luxet û istilahê da yanî çi?

Cihanbînî û îdeolojî bi çi me'nayê ne, û çi ferq navbeyna wan da heye?

Du awayên gişti yên cihanbînîyê beyan bikin.

Du istilahên 'umûmî û xusûsîyên usûlê dîn, beyan bikin.

Esl û binyatên ku di hemî dînên 'esmanî da heyîn çi ne?

DERSA 2
LÊKOLÎNA DÎNÎ

Dagirê:

Sebeb û hilêxistên lêkolînî (tehqîqî)

Muhimîya pey ketina dîn

Rakirina şubheyekî

Hilêxistin ji lêkolîn û vejenînê ra

Yêk ji taybetmendîyên rûh û rewanê insan, ew e ku bi awayek fitrî û xerîzî meyl û viyanek heye û dixazê heqîqetan nas bikê û tiştan bizanê, ev meyla he ji zarokatî ve di mirov da xuya dikê û heta xilaseka 'emrê mirov her berdewam e. Hema ev fitreta peyketina heqîqetan ku carna jêra tê gotin «ihsasa lêkolînê» dikarê mirov hay bidê da ku derheq hinek meselan da ku dîn jê daxivê fikr bikê û ewa mesela vejenê û bikevê pey nas kirina dînê heq. Meselên wek:

Gelo tiştên ne maddî (xeyb) û veşartî û xef ji pêhesanê heye? Eger heye, gelo girêdan û peywendek di navbeyna cihana xeybê û cihana maddî û hissê da heye? Eger girêdan hebê di navbeyna wan da, gelo nemehsûsek an veşartiyek heye ku ev cihana maddî çêkir bê?

Gelo hebûna mirov hema tenê bi vê beden û kelaşê wî yê maddî ye, û jiyana wî hema ew e ku li vê dinyayê da dijî, an jiyanek dî jî

jêra heye? Eger jiyanek dî jî heye, gelo girêdan û peywendek di navbeyna jiyana dinyayê û jiyana dî da (jiyana axiretê) heye? Û eger girêdan di navbeyna wan da heye çi tiştên dinyayî di kar û barê axiretê da eser hene? Û çi çare heye ji bona nas kirin û zanîna rêka durust ya jiyanê; rêka ku mirov piştrast bikê û bexteweriya du cihana jê ra çêkê? Welhasil axirîka wê rêkê çi ye û çewan e?

Nixwe xerîza peyketina heqîqetan sebebeke ku mirova pal didê ji vejenîn û tehqîqa tişta û meselan ra, ku meselên dînî jî di nav wan da ne, û hema ew mirova hay didê ku pey naskirina dînê heq bikevê.

Sebebek dî ku şewqa nas kirina heqîqeta di mirov da çêdikê ev e ku: xêncî ji meyla fitrî ya nas kirina heqîqetan hinek meylên fitrî yên dî jî ji insan ra hene[1] ku xwest û viyanên mirova bi wa ve jî girêdayî ne, û gehiştina ewa xwest û viyana girêdayî ye bi hinek nasîn û zanîna ve, çewa ku behremend bûna ji hinek xweşîyên maddî û dinyayî di girûa xebatên ‘ilmî da ye, û pêşketina zanînên tecrubî dibê arîkar ku mirov bigehê xwest û viyanên xwe; vêca eger dîn jî bikarê bibê arîkar ji mirovan ra ku xwe bigehênê xwest û feyda baş û pêşiya xeter û zerer û ziyana bigirê wê keyfa wî jê ra were û ji wî ra xweş bê, û hingê wê «xerîza feydexazî û revîna ji zererê» bibê sebebek dî ji bona tehqîqa derheq dîn da.

Lêbelê çimko dîmen û daire ya zanînê gelek fireh e û şert û merc ji zanîna hemî heqîqetan ra nehazir in, çêdibê ku mirov ew meseleyên ku rihettir û desthata wan xweştir û hêsantir in ji vejenîn û tehqîq kirinê ra bibijêrê, û we heye ji ber ku guman dikê meselên dînî zehmet in an desthatek ‘ilmî ya berketî têda nîne xwe ji tehqîqa wê paşda bidê. Ji ber vê yêkê gereke ji xelkê

[1]- Hissa qencîyê, hissa rindî û sipehîtîyê.

ra bê ronahî kirin ku meselên dînî gelek muhim û berketî ne û tehqîq û lêkolîna derheq wan da tiştekî gelek hêjayî ye û belkî tiştek di muhimmî û hêjana wê da nebê.

Em vê jî bêjîn ku hinek rewan-nas û rewan-kol[1] li ser wê bawerîyê ne ku Xudaperêsî xwestek fitrî ya serbixwe ye, û ji serkaniya wê ra dibêjin: «hissa dînî» û ewê di kêleka «hissa pey ketin» û «hissa qencî» û «hissa rindî»yê da datînin û hissa çarê ya rûhê insan hesab dikin.

Ew ji hinek şahidên tarîxî behrê digirin û dibêjin: her û her bi awayekî Xudêperêsî di nav mirovan da hebûye, û ev hemiyanî û her û herî, nîşan e ku ew fitrî ye.

Eva ku dibêjin nîşana fitrî bûnê ew di hemîyan da û di her zemanî da hebê, ne bi wê me'nê ye ku illeh di tektekê mirovan da hebê bi awayek wereng ku bi agahî ewî bêxê pey xwesta wî, belkî çêdibê ku ji ber sebebên dorûberê wî û terbiyeta nedurust ew bê temirandin û bê tesîr bibê û an ji rêka xwe ya durust derkevê, wek çewa evahe di xerîzên dî da jî tê dîtin.

Gorekî vê bîr û hizrê tehqîqa di dîn da sebebê fitrî yê serbixwe heye û niyaz tune ku ew bi rêka delîlê ve isbat bibê.

Çêdibê ku mirov ji vê gotinê ra şahida ji ayet û riwayetan bênê, lêbelê çimko tesîra evê meyla fitrî ne agahane ye, çêdibê kesek bikevê delîl anînê ku ev tişta he di min da nîne. Ji ber vê çendê emê vê derheqê da bi vê çendê bes bikîn, û emê dewamê bidîn vê yêkê ku bi rêka delîla 'eqlî ve muhimîya tehqîq û lêkolîna dîn sabit bikîn.

[1]- Binêrin kitêbên: "Hiss" - "Insan, mewcûdê naşinaxte" - "Dîn we rewan"

Muhimî ya tehqîqa derheq dîn da

Ronahî bû ku meyla fitrî ji nasîna heqîqeta ra ji aliyekî ve û destve anîna feyde û başî û êmnahiya ji zerer û xeterê ji alîyê dî ve dibê sebebek muhim û berketî ji wê çendê ra ku mirov bikevê pey destve anîna zanînan.

Vê gorekê dema kesek pê biheshê ku di dirêjiya tarîxê da hinek mirovên hêjayî gotine: em ji alîyê çêkerê cihanê ve ji bona rêrast kirina beşer bo bexteweriya her du cihana hatine rêkirin, û di vê rêkê da çi ya ji destê wan hatî kirine û gelek ketine zehmetê di vê rêkê da û heta bi rûh û canê xwe jî di vê rêkê da feda kirine û ji dest dane; mirov ji ber vî sebebî wê rabê û derheq dîn da tehqîq û lêkolînê bikê da ku bibînê gelo ev de'wa pêxemberan durust e û delîlên ber 'eql jê ra hene an ne? Nexasma dema pê bihesê ku gazî ya wan mizgînî ya xweşîyên ebedî û tirsandina ji bextreşî ya her û her li ber xwe girtiye. Yanî qebûl kirina gazî ya wan dibê sebeb ji destve hatina feydên ihtimalî yên bê xilasek ra û qebûl nekirina gazî û de'wa wan jî we heye zererek bê binî pêve bê. Vêca hingê ewî mirovî ji bê xeber kirin û guh nedana wê ra wê çi 'uzr hebê û çewa wê derheq tehqîq û lêkolîna dîn da bê xem bê?

Belê, çêdibê ku hinek ji ber sistî û tembelîyê xwe neyêxin bin barê zehmetê tehqîq û vejenînê da û an ji ber ku dîn hinek bergirîyan ji wan ra çêdikê û dibê sebeb ku ewa paşda bidê ji gehana hinek xwest û vîyanên wan yên nefsanî, vêca ji ber wê êdî tehqîqa dînî nekin û xwe jê paşda bidin. [1]

Lêbelê ew gereke paşî ra netîca evê tembelî û rihetî xwazîyê li ser xwe qebûl bikin û teslîmê 'ezabê ebedî û bextreşî ya her û her bibin.

---

[1]- بَلْ يُرِيدُ الْإِنسَانُ لِيَفْجُرَ أَمَامَهُ - Qiyamet / 5.

Halê va kesan gelek xirabtir e ji halê ewî zarokê nexweş ku ji tirsa xarina dermanên tehl, hazir e bimirê, lêbelê neçê doktor, çimko ewî zarokî 'eqlê durust ji têgehiştina sûd û zererê ra nîne û zerera qebûl nekirina gotinên doktor jî ne zêdetir e ji wê çendê ku ji behremend bûna çend rojên jiyana dinyayê mehrûm bibê. Lêbelê mirovê gehiştî û agah dikarê zerer û sûd û xweşîyên zû derbaz dibin û 'ezab û nexweşiya her û her li ber hev bigirê û ya durust pêk bênê.

Hema ji ber vê yêkê ye ku Qur'ana pîroz, eva mirovên bê xeber ji dewar û heywanan jî pitir li rê wunda hesab dikê û derheq wan da dibêjê:

«أُوْلَئِكَ كَالأَنْعَامِ بَلْ هُمْ أَضَلُّ أُوْلَئِكَ هُمُ الْغَافِلُونَ»

«Ew wek dewara ne, belkî ji wan jî li rê wundatir in; hema ew in yên bê xeber». E'raf / 179

Û li cihek dî da dibêjê:

«إِنَّ شَرَّ الدَّوَابَّ عِندَ اللّهِ الصُّمُّ الْبُكْمُ الَّذِينَ لاَ يَعْقِلُونَ»

«Birastî pîstirîn xwey rûh li bal Xudê ew ker û lal in; ewên tişta nadin 'eqlê xwe». Enfal / 22.

Rakirina şubheyekî

Çêdibê hinek evê yêkê ji xwe re bikin hêcet ku: xebat û fikr kirina ji rakirina şubheyekî ra hingê durust e ku mirov ji çareser kirina wê ra hêvî hebê, lê em ji gehana desthat û netîceyekî derheq meselên dînî de bêhêvî ne. Û ji ber vê yêkê em baştir zanîn ku wextê xwe ji tişek dî ra ku em pitir berhêvîyê desthatê ne biborênîn.

Di cewaba van kesan de gereke bê gotin:

Yêk: hêvîdariya ji çareser kirina meselên dînî qet ne kêmtir e ji meselên dî yên zanistê û em dizanîn ku peyda kirina cewaba

gelek ji mesele yên ‘ilmî û zanistê pê xebatek dirêj û berfireh ya dehan sale ya zana û ehlê fikrê hatiye dest.

Du: qîmetê ihtimalê, ne pê 'amilekî tenê ye (= miqdara ihtimalê) belkî gerek miqdara muhtemel jî berçav bê girtin. Mesela eger ihtimala feyde ya karek iqtisadî 5% bê û derheq karek dî da 10% bê lê qasê feyda muhtemel di karê ewil de hezar û di yê duwê de sed Lîr bê karê ewil pênc caran ser karê duwê ra tê girtin; halhale miqdara ihtimala wê (5%) nîvê miqdara ihtimala karê duwê (10%) ye.

Û çimko menfi'eta ihtimalî ya peyketin û lêkolîna derheq dîn da bê nihayet û xilasek e herçend gehana desthata qet'î derheq wê da kêm bê jî dîsa xebata wê derheqê da hêjayîtir e ji xebata di rêka ya mehdûdtir da. Û tenê hingê gorekî 'eql tehqîq nekirin û terka lêkolîna derheq dîn da durust tê dîtin ku mirov qet' û yeqîn bi nedurustîya dîn hebê an bi temamî bê hêvî bê ji gehana desthat û netîca wê derheqê da. Lê vêca ev qet' û bawerî ji kî ve dikarê hebê?!

PIRSYARÊN DERSA 2

Hedefa mirov ji naskirina heqîqetan çi ye?

Çima mirov derheq hemî tiştî da lêkolîn û vejenînê nakin?

Mexsed ji hissa dînî çi ye? Û ji hebûna wê ra çi delîl anîne?

Lazimiya tehqîqa derheq binyatên dînî da bêjin.

Gelo mirov dikarê bêhêvî bûna ji çareser kirina meselên dînî bikê hêcet ji terka lêkolînê ra? Çima?

DERSA 3

ŞERTÊ JIYANA INSANKÎ

Dagirê:

Pêşekî

Mirov li pey kemalê ye

Kemala mirov di girewa peyketina 'eql da ye

Hukmên 'emelî yên 'eql muhtacê binyatên hizrî ne

Desthat û netîce

Pêşekî

Di dersa borî de me lazimiya tehqîq û xebatê ji nas kirina dînê heq ra bi gotinek sade sabit kir. Xîmê delîlê jî ev bû ku peyketina menfi'etê û revîna ji zererê di fitret û sirûşta mirov da heye. Û herkes di navdeyê xwe de bi evê yêkê dihesê û ‘ilmê huzûrî bi wê heye ku xeletî têda çênabê.

Di vê dersê da me divê em ewê gotinê bi beyanek dî sabit bikîn ku li ser çend pêşekî yên deqîqtir ava bûye. Û desthata wê ev e ku eger kesek derheq dîn da fikr nekê û nebê xweyê cihanbînî û îdeolojîyek durust nikarê bigehê kemala insanî, belkî ji xwe mirov nekarê jê re bêjê insanê heqîqî. Û bi gotinek dî: şertê jiyana insankî hebûna cihanbînî û îdeolojî ya durust e.

Ev delîl ser sê pêşekîyan ava bûye:

1- Mirov li pey kemalê ye.

2- Kemala mirov pê kiryarên ixtiyarî yên rêkketî digel 'eql destve tê.

3- Ehkamên 'emelî yên 'eql pê nasînên melhezeyî yên taybet şikl digirin ku muhimtirînê wan sê eslên cihanbînîyê ne, yanî: nasîna destpêka hebûnê (tewhîd); xilaseka jiyanê (me'ad) û rêka cihê bawerîyê ji destve anîna bernama bextewerî û se'adetê ra (pêxemberî). An bi kurtî: heyîn-nasî; mirov-nasî û rêk-nasî.

Li vêderê emê hinekî ji ronahî kirina van sê eslan baxivîn:

Mirov li pey kemalê ye

Kesê di hedefên xwe yên navdeyî de û meylên xwe yên rewanî de bifikirê û hûr bibê wê pê bihesê ku koka gelek ji wan, gehana kemalê ye. Û di eslê xwe da kes hez nakê kêmasiyek di wî da hebê û herkesek dixebtê çiqas jê bê, 'eyb û kêmî û kêmasiyan ji xwe bibê, da bigehê wê kemala xwe ya dixazê û pêşiya rakirina kêmasî yên xwe ewan eyban ji xelkê vedişêrê.

Ev meyla he eger di rêka xwe ya fitrî û sirûştî da biherikê dibê sebebê hemî awayên kemala maddî û me'newî, lê eger ji rêka xwe derkevin, dibin sebebê peyda bûna sifetên wek xwe mezin kirin û riyakarî û hej pesnê xwe kirinê û ... .

Kemala mirov di peyrewî ya 'eql da ye

Tekamula şînkatiyan pê berhev bûna esbab û şerayita ye; bi awayek cebrî û mecbûrî. Qet çi dar bi ixtiyar û bijartina xwe mezin nabê û fêkî nadê; çimko şu'ûr/fêhm û irade ya wê tune.

Di heywanata de cihek ji irade û bijartinê ra tê dîtin, lê iradeyek ku serçavka wê ji xerîzên heywanî ye û gelek mehdûd û sînor kirî ye.

Lê vêca insan xêncî ji xasiyetên şînkatî û heywanî xweyê du zêdahî yên rûhî ye: ji aliyekî ve xwestên wî di daire ya niyazên wî yên tebî'î de nayên sînor kirin û ji alîyê dî ve jî xweyê 'eql e ku bi

rêka wê ve dikarê zanînên xwe heta bê nihayetê berfireh bikê. Û gorekî van taybetî û seratiyan irade ya wî ji hedd û sînorên tebî'î derdikevê û meyla bê nihayetê dikê.

Çewa ku kemala nebatî (giya û şînkatî) bi rêka hêza nebatiya taybet ve tê dest û kemalatên heywanî bi rêka irade ya ji xerîzê serkanî girtî û idrakatên hissî çêdibin, kemalatên taybetê mirov jî ku hema halatên wî yên rûhî ne bi rêka irade ya agahane û rênimûnî ya 'eql tê dest; ew 'eqlê ku di cihên muxtelif da ya baş nas dikê û di demê tezahumê da jî ya baştir digirê.

Nixwe mi'emileta insanî bi vê ye ku bi irade ya ji meylên taybetê insanî û li ber ronahî ya 'eqlî pêk bê. Û mi'emilet û kiryarek ku pê hedefek heywanî bi cî bê kiryara heywanî ye û hereketek ku tenê bi rêka hêza mîkanîkî di bedena mirov de çêdibê hereketek fîzîkî ye.

Hukmên 'emelî yên 'eql, muhtacê binyata ne

Mi'emilet û kiryarên ixtiyarî wesîleyeke ji gehana desthata baş re, biha û qîmetê wê jî tabi'ê dereca başî ya wê hedefê ye ku melheze kirî û her wiha ew esera ku di tekamula rûh de heyî, wek çewa ku eger kiryar bibê sebebê ji dest dana kemalek rûhî hingê esera menfî / nebaş heye.

Nixwe hingê 'eql dikarê derheq kiryarên ixtiyarî de hukm bikê û bihayê wê nîşan bidê ku ji kemalatên insanî û derece yên wê agah bê û bizanê ku ew tiştek çewan e û meydana jiyana wî çiqas fireh e û dikarê bigehê çi kemalatan. Û bi gotinek dî: ewî bi hemî aliya ve nas bikê û bizanê hedef ji çêkirina wî çi ye.

Vê gorekê, peyda kirina îdeolojî ya durust [-yanî ew bihadarên biryarder derheq kiryarên ixtiyarî da-] di girewa hebûna cihanbîniyek durust û çareser kirina meselên wî ye. Û heta eva mesela çareser nekê nikarê biryarek temam derheq biha û qîmetê kiryaran da bidê, çewa ku eger hedef û amanc ne kifş bê me'lûm

kirina rêka ku bigehê hedefê mumkin nabê. Nixwe ev nasînên nezerî/teorîk ku meselên binyatî yên cihanbînîyê ne di heqîqet da xîm û binyata ehkamên 'emelî yên 'eql tên hesab kirin.

Desthat û netîce

Vêca pişti va gotin û pêşekiyan em dikarin lazimiya tehqîqa dîn û xebatê bo destve anîna îdeolojî û cihanbînî ya durust bi vî awayî sabit bikîn ku:

Insan bi fitreta xwe li pey kemala xwe ya insanî ye, û dixazê pê kirina hinek karan bigehê kemala xwe ya heqîqî. Lêbelê ji vê çendê ra ku bizanê çi karek ewî nêzîkê hedef û armanca wî dikê lazim e ewil kemala xwe ya nihayî nas bikê û nas kirina wê di girewa xeberdar bûna ji heqîqeta wî û destpêk û axirîka wî da ye, piştî hingê gereke bi girêdan û peywenda baş û nebaşa di navbeyna kiryarên muxtelif û derecên kemala xwe da heyî bizanê heta ku bikarê rêka durust ji bona kemala xwe ya insanî peyda bikê. Û heta eva nasînên nezerî (usûlên cihanbînîyê) bi dest ve neyinê nikarê sîstimek durust ya kiryarî (îdeolojî) ji xwe ra bigirê.

Nixwe vêca xebat ji bona nas kirina dînê heq ku ji cihanbînî û îdeolojîyê pêk hatiye tiştek lazim e û bêy wê gehana kemala insanî çênabê; çewa ku ew kiryarên ji van bîr û hizran nehatibin girtin, ew ne kiryarên insanî ne. Û ew kesên ku nekevin pê nas kirina dînê heq, an piştî nas kirinê ji ber rik û kîna xwe ewê inkar dikin û tenê berê wan li xwestê wa yên heywanî ye û li pey lezzetên zû derbaz dibin e, di heqîqet da hema ew ji dewaran pêve ne tiştek dî ne, wek çewa Qur'an kerem dikê: «Ew li pey xweşiya ne û dixwin wek çewa ku dewar dixwin».[1]

[1] - Muhemmed/ 12

Û çimko ewa qabiliyet û kêrhatinên xwe yên insanî pûç dikin û jinav dibin ji wan ra 'ezabek dijwar heye: **«Bihêle bila ew bixwin û ji xweşiyan behremend bibin û bila hêvî ewa bi xwe ve mijûl bikê, vêca paşê wê pê bihesin».** [1]

[1] - ذَرْهُمْ يَأْكُلُوا وَيَتَمَتَّعُوا وَيُلْهِهِمُ الأَمَلُ فَسَوْفَ يَعْلَمُونَ/ Hicr / 3.

PIRSYARÊN DERSA 3

Delîla duwê ya lazimî ya tehqîqa derheq dîn da ji çi pêşekiyan pêk hatiye?

Evê ristê hinekî ronahî bikin: «mirov li pey kemalê ye».

Taybetmendî yên insan, beyan bikin.

Çi girêdan di navbeyna taybetmendîyên mirov û kemala heqîqî ya insan da heye?

Çewa îdeolojî li ser binyatên cihanbînîyê tê ava kirin?

Delîla duwê ku lazimî ya tehqîqa derheq dîn da nîşan didê çewan e?

DERSA 4

RÊKA ÇARESERKIRINA MESELÊN BINYATÎ

Pêşekî
Qismên nasînê
Qismên cihanbînîyê
Lêkolîn û vejenîn
Desthat û netîca gotinê

Pêşekî

Dema mirov dixazê meselên binyatî yên cihanbînî çareser bikê û binyatên dînê heq nas bikê, di gava ewil da ev pirsyar jêra tê pêş ku: evan meselan bi çi rêkî ve mirov dikarê hell û çareser bikê? Û çewa mirov dikarê zanîn û nasînên binyatî yên durust destve bênê, û çi rêk ji nasînê ra hene? Û kîjanê gereke mirov bibijêrê ji bona dest ve anîna evan nasîna?

Vejenîna berfireh û ʻilmî ya vê meselê bi hêvî ya qismê «nasîn nasî ya felsefî - ipîsotomolojî»yê ve ye, ku qismên nasîna insan davêjê ber lêkolîn û vejenînê. Û axiftina ji wan me ji hedefa me di vê kitêbê da dûr dikê. Ji ber vê yêkê li vêderê emê tenê hinek gotinên lazim bênîn û ji bona vejenîna zehftir em berê xwendaya didîn cihê wê .[1]

Qismên nasînê

[1] - Binêrin: “Amûzişê felsefe” û dersa 15 - 16 ji “Îdeolojî yê Tetbîqî”.

Bi awayekî nasînên insan li ser çar qisma teqsîm dibin:

1- Nasîna tecrubî û ‘ilmî. Ev awayê nasînê bi arîkariya endam û qetên hissî dest ve tê, herçend ku 'eql jî bi awayekî têda dexîl û têkel e.

Nasînên tecrubî di ‘ilmên tecrubî da wek: fîzîk û şîmî û jîn nasîyê da behre jê tê girtin.

2- Nasîna 'eqlî. Ev awayê nasînê pê mefahîmên intiza'î (me'qûlatê ŝanîye) çêdibê, û karê eslî ji bo dest ve anîna wê bi hêviya 'eql ve ye, herçend ku çêdibê carna ji «muqeddematên qiyasê» behre bê girtin, meydana eva nasîna mentiq û ‘ilmên felsefî û hesab e.

3- Nasîna te'ebbudî. Ev awayê nasînê li ser binyata nasîna pêşda heyî tê ava kirin, yanî ji wê ra serkaniyek heye ku cihê xwe pê girtinê ye, û bi rêka gotina bêjerê rastgo ve çêdibê. Gotinên ku peyrewên edyana ji ber xeberdana rêberên xwe yên dînî bawerîyê pê tînin [- û carna bawerî ya bi wan qahîmtir e ji wê bawerî ya pê hiss û tecrubê çêdibê-] ji vê pêkê ne.

4- Nasîna şuhûdî. Ev awayê nasînê bervajîyê sê qismên borî bêy hebûna navbirekî, sûretê mefhûmê zêhnî xwe bi wê tişta 'eynî [û berçav] ya heyî ve digirê, û qet ne cihê xeletî û nedurustîyê ye, lêbelê wek çewa di cîyê wê da behs bûye, me'mûlen ewa bi navê «nasîna şuhûdî û 'irfanî» jê tê xeberdan, di heqîqet da tefsîrek zêhnî ye ji meşhûdatan û çêdibê ku xeletî û nedurustî jêra hebê. (Binêrin: “Amûzişê felsefe” dersa 13).

Qismên cihanbînîyê

Gorekî wê teqsîmata ji nasînê ra hatî kirin çêdibê ku teqsîmek bi vî awayî ji cihanbînîyê ra jî hebê:

1- Cihanbînî ya ‘ilmî, yanî mirov li ser esasê dest ve hatên ‘ilmên

tecrubî, derheq hebûnê da bibê xweyê bîr û hizrekî.

2- Cihanbînî ya felsefî, ku bi rêka delîl anîn û xebata 'eqlî ve, tê dest û çêdibê.

3- Cihanbînî ya dînî, ku bi rêka îmana bi rêberên dînî û qebûl kirina gotina wan ve çêdibê.

4- Cihanbînî ya 'irfanî, ku bi rêka keşf û şuhûd û «işraq»ê çêdibê. Niha gereke em binêrin gelo meselên binyatî yên cihanbînîyê hema bi rastî bi rêka va çar rêka ve tên hel û çareser kirin an ne? Heta vêca dor bigehê vê pirsyarê ku kîjan başţir û seratir e!

Lêkolîn û vejenîn

Çiko daire ya nasîna hissî û tecrubî teng e û hema tenê dagirê tişţên maddî û tebî'î ye, ronahî dibê ku mirov nikarê tenê pê desthatên ‘ilmên tecrubî binyat û eslên cihanbînîyê nas bikê û meselên bi wê ve girêdayî serast bike; çimko ev meselên he, ne di meydana ‘ilmên tecrubî da ne, û qet çi ‘ilmek tecrubî axiftin derheq hebûn an nebûna wan da nîne. Meselen çênabê ku mirov hebûna Xudê pê vejenînên tecrubî sabit bikê, an haşa nefy bikê, çimko destê tecrube ya hissî gelek kurttir e ji wê çendê ku bigehê «mawera-ut tebî'et»ê an tişţekî ku ne di daire ya tişţên maddî da ye, isbat an nefy bikê.

Nixwe cihanbînî ya ‘ilmî û tecrubî ji serab û leylanekî pêve ne tişţek dî ye û di heqîqet da mirov nikarê bi me'na durusta kelîmê jêra bêjê cihanbînî, bi zorî mirov dikarê navê «nasîna cihana maddî» jêra bikar bibê, û nasîna bi vî awayî nikarê cewaba meselên binyatî yên cihanbînîyê bidê.

Û emma nasînên ku bi awayê te'ebbudî dest ve tên, wek çewa jê hatî xeberdan ew jî girêdayî ne bi tişţek dî ve; gereke pêşda serçavkên wê sabit bûbin. Yanî lazim e ewil pêxemberî ya kesekî

sabit bûbê heta peyamên wî bibê cihê bawerî û pişt rastîyê, û pêşiya wê da jî vêca gereke hebûna xweyê peyamê, yanî Xuda yê Te'ala sabit bûbê. Û ronahî ye ku hebûna «xweyê peyamê» û her wiha pêxemberî ya «peyam îner» pê delîla «peyamê» nayê sabit kirin. Mesela, mirov nikarê bêjê: çimko Qur'an dibêjê: «Xuda heye», nixwe heye. Elbet piştî sabit kirina hebûna Xudê û nas kirina pêxemberê Islamê û heqqaniyeta Qur'ana pîroz mirov dikarê pê gotina «bêjerê rastgo» û «serkaniya cihê bawerîyê» 'eqîde û bawerîyên dî û her wiha destûrên kiryarî û 'emelî qebûl bikê. Lêbelê gereke meselên eslî û binyatî pêşda pê rêkên dî çareser bibin û bên hel kirin.

Nixwe awayê te'ebbudî jî bikêr çareser kirina meselên binyatî yên cihanbînîyê nayê. Lêbelê, awayê 'irfanî û işraqî gelek xeberdan li ser heye:

Yêk- Cihanbînî nasîbûneke ku ji mefahîmên zêhnî çêdibê, lêbelê di metnê şuhûdê da cihek ji mefahîmên zêhnî ra nîne. Nixwe nisbet dana mefhûmên bi vî awayî bal şuhûdê ve tiştekî seresere ye.

Du- Tefsîra şuhûdan û gotina wan di qalibê kelîme û mefhûman da niyaz heye bi awayekî ya zêhnî ya xas û taybet ku bêy boriyek dirêj û xebatek 'eqlî û vejenînek felsefî çênabê, û kesên ew hêjan û jêhatin tunehin kelîme û mefhûmên wereng bikar dibin ku dibê sebebê ji rêderî û xwehriyek mezin.

Sê- Gelek caran ew tişta rastî ketî ber şuhûdê pê wan şiklên xeyalî yên wê û ewê me'na ku zêhn didîyê, mesele li ber şuhûdker bi xwe jî tevhev dibê.

Çar- Destve anîna hinek heqîqetan ku me'ne kirina zêhnî ya wan bi «cihanbînî»yê tên nav kirin di girewa salên dirêj ya seyr û sulûka 'irfanî da ye, û qebûl kirina seyr û sulûkê ku ji qismê nasîbûnên 'emelî û kiryarî ye, ihtiyac heye bi mebanîyên nezerî

û meselên binyatî yên cihanbînîyê; nixwe pêş destpê kirina seyr û sulûkê gereke ev mesele çareser bibin, halhale nasîna şuhûdî di axirîka wê da çêdibê, û hema ev jî heye ku 'irfana heqîqî ji kesekî ra çêdibê ku di rêka 'evdîtî ya Xuda da xalisane bixebitê, û xebata bi vî awayî girêdayî ye bi nasîbûna pêşda ku ji Xuda heye û girêdayî ye bi nasyarî ya digel rêka bendetî û guhdana Wî.

Desthat û netîce

Desthata vê lêkolîn û vejenînê bû ev ku: ji bona çareser kirina meselên binyatî yên cihanbînîyê, ew tek rêka ku li ber xelkê vekirî ye, hema rêka 'eql û awayê te'eqqulê ye, nixwe vê gorekê gereke em cihanbînî ya felsefî, cihanbînî ya heqîqî hesab bikîn.

Elbet evahe ku hat gotin rêka çareserî ya evan mesela hema tenê pê 'eql e, û cihanbînî hema cihanbînî ya felsefî ye, me'na wê ne ev e ku ji bona dest ve anîna cihanbînî ya durust gereke hemî meselên felsefî bên hel û çareser kirin, belkî serast kirina çend meselên felsefî yên rihet û nêzîkê bedîhî [eşkere] bûnê ji bona sabit kirina hebûna Xudê ku esasîtirîn mesela cihanbînîyê ye bes e. Herçend meharet û feraseta di va mesela da û qudreta zêdetir ji cewaba her işkal û şubheyekî ra niyaz heye bi vejenînên zehftir. Û evahe ku hel kirin û çareserî ya meselan bi hêviya nasîbûnên 'eqlî tenê ve ma; me'na wê ne ev e ku ji çareser kirina meselan ra ji zanînên dî behre neyê girtin, belkî di gelek ji istidlal û delîl anîna 'eqlî da mirov dikarê ji wan muqeddemata istifade bikê ku bi rêka ‘ilmê huzûrî an ji rêka hiss û tecrubê ve tê dest, çewa ku mirov dikarê ji nasîna meselên desta duwê û bawerî yên fer'î ra ji nasînên te'ebbudî behrê wergirê û ewa pê Qur’an û sunnetê (serkanî yên dîn) sabit bikê. Û paşî ra mirov dikarê pê bi dest ve anîna cihanbînî û îdeolojî ya durust bi mertebe û derece yên seyr û sulûkê ve biçê û bigehê mukaşifat û

muşahidatan, û bêy wasita mefahîmên zêhnî, bigehê gelek ji wan tiştên pê delîla 'eqlî sabit bûyîn.

PIRSYARÊN DERSA 4

Qismên nasînên insanî û berfirehî ya her yêk ji wan beyan bikin.

Çend awayên cihanbînîyê tesewwur dibin?

Meselên binyatî yên cihanbînîyê bi çi rêkê ve tên sabit kirin?

Cihanbinî ya ʻilmî vejenin.

Mirov çewa dikarê ji nasînên tecrubî behrê bigirê ji bona ronahî kirina meselên cihanbînîyê?

Ji isbata meselên 'eqîdê ra çewa û li kîjan cihan mirov dikarê ji nasînên te'ebbudî istifade bikê?

Cihanbînî ya 'irfanî çi ye? Gelo mirov dikarê meselên binyatî yên cihanbînîyê pê şuhûda 'irfanî serast bikê? Çima?

DERSA 5

NAS KIRINA XUDÊ

Dagirê:

Pêşekî

Nasîna huzûrî û husûlî

Nasîna fitrî

Pêşekî

Pêşîyê da me zanî ku baweriya bi Xuda yê xaliqê cihanê esl û esasê dîn e, û ferqa binyatî ya cihanbînî ya ilahî û cihanbînî ya maddî hema di hebûn û nebûna vê bawerîyê ve girêdayî ye.

Nixwe ewilîn mesela ku ji mirovê heqîqet xwaz re tê pêş û gereke ji her tiştî pitir cewaba wê ya durust dest xwe ve bênê ev e ku: gelo Xudê heye an ne? Û ji dest ve anîna cewaba durust ya vê pirsyarê ra [wek çewa li dersa borî da hat gotin] lazim e 'eqlê xwe bidê şuxul û bixebitênê heta bigehê desthat û netîceyek vebirî û yeqînî, vêca çi cewab erêtî bê û çi nerêtî.

Eger di netîcê da cewaba qebûlê hat dayîn, hingê dor digehê vejenîna meselên hûrtir (yêk bûna Xudê û 'edalet û sifetên Xudê yên dî) û eger cewab menfî bû, hingê cihanbînî ya maddî cî digirê û êdî ihtiyac nîne bi vejenîn û lêkolîna meselên dî yên dînî.

Nasîna huzûrî û husûlî

Derheq Xwedê Te'ala da du awayên nasînê tên fikr kirin: yêk nasîna huzûrî û ya dî nasîna husûlî.

Mexsed ji nasîna huzûrî ew e ku mirov bêy navcîtî ya mefhûmên zêhnî bi awayek ya şuhûda dilî û navdeyî digel Xudê nas bibê.

Kifş e ku eger kesekî şuhûda agahane derheq Xwedê Te'ala da hebê [wek çewa 'arifên bilind mertebe dibêjin] êdî ewî ihtiyac bi delîl anîn û burhana 'eqlî nîne. Lêbelê wek çewa pêşda jî hat gotin ev ‘ilmê huzûrî û şuhûdî ji mirovên me'mûlî ra pişti derbaz kirina mertebên seyr û sulûka 'irfanî wê dest ve bê. Û merteba ze'êf ya wî herçend di mirovên me'mûlî da bê dîtin jî çimko ne digel agahîyê ye ji bona dest ve anîna cihanbînî ya agahane bes nîne.

Û mexsed ji nasîna husûlî jî ew e ku: mirov bi rêka hinek mefhûmên kelamî ve wek: «xaliqê bê ihtiyac, zanayê kara û qadir û ... » nasînek zêhnî derheq Xuda yê Te'ala peyda bikê û bawer bikê ku yêkî wereng heye, ew kesê cihan çêkirî û ... vêca di pey ra hinek zanînên husûlî yên dî jî lê zêde bikê heta şiklê sîstimek ya bawerîyê (cihanbînî) bi xwe bigirê.

Ewa ku rasterast ji vejenînên 'eqlî û delîlên felsefî tê dest hema ev nasîna husûlî ye, û dema ev nasîna husûlî peyda bû mirov dikarê xwe bi alîyê nasîna huzûrî ve rakêşê.

Nasîna fitrî

Di gelek gotinên rêberên dînî û 'arif û hekîman da mirov evê gotinê dibînê ku: «Xudanasî fitrî ye» an: «bi-l fitre insan Xuda nas e». Ji bona ku em me'na vê gotinê baş bizanin lazim e hinekî derheq kelîma «fitret»ê da bê axiftin:

Fitret, kelîmeyek 'Erebî ye bi me'na «xuliqandin» e, û ew tişt fitrî hesab dibin (= nisbeta wa tê dayîn bal fitretê ve) ku

xuliqandina tiştekî ew di xwe da girtibin. Vê gorekê mirov dikarê sê taybetmendiyan ji wan ra bêjê:

1- Fitrî yên her tiştekî di hemî ferdên wî qismî da tên dîtin, herçend ku çewanî ya wa ji alîyê ze'êfî û qahîmî ve ferq bikin.

2- Tiştên fitrî illeh di dirêjî ya tarîxê da sabit in, wereng nîne ku fitreta mewcûdekî di zemanekî da bi awayekî bê û di zemanek dî da bi awayek dî. Rûm / 30

« فَأَقِمْ وَجْهَكَ لِلدِّينِ حَنِيفًا فِطْرَةَ اللَّهِ الَّتِي فَطَرَ النَّاسَ عَلَيْهَا لَا تَبْدِيلَ لِخَلْقِ اللَّهِ ذَلِكَ الدِّينُ الْقَيِّمُ وَلَكِنَّ أَكْثَرَ النَّاسِ لَا يَعْلَمُونَ»

3- Karên fitrî ji nezer ku fitrî ye û di mewcûdekî da heye, êdî ne muhtacê hîn kirin û hîn bûnê ne, herçend ku qahîm kirin an ber zivirandina wan muhtacê hîn kirinê ne.

Fitriyatên mirov ser du qisman tên teqsîm kirin:

A- Nasînên fitrî ku her mirovek bêy wê çendê ku muhtacê 'elimînê bê di wan da heye.

B- Meylên fitrî ku di xuliqandina her kesî da heye.

Vê gorekê eger awayek yê nasîna Xudê ji herkesî ra hebê bêy wê yêkê ku muhtacê 'elimandin û hîn bûnê bê, mirov dikarê navê wê bikê «Xuda nasî ya fitrî». Û eger awayek yê meyla bal Xudê û perêstina Wî ve di her kesî da hebê mirov dikarê jêra bêjê: «Xudê perêsî ya fitrî».

Di dersa duwê da me got ku gelek ji xwey fikran meyla bi dîn û Xudê ji taybetmendî yên rûhî yê insan zanîne û bi navê «hissa dînî» an «'atife ya dînî» jê xeber dane. Niha em ser ve zêde bikîn ku: nasîna Xudê jî ji pêkhatî yên fitreta mirovan hatiye zanîn. Emma wek çewa fitreta Xudê perêsîyê ne agahane ye, fitreta Xudê nasîyê jî nasîbûnek agahane nîne bi awayekî ku xelkê bê ihtiyac bikê ji xebata 'eqlanî ji bona naskirina Xuda yê Te'ala.

Di cî da ye ku eva he jî bê gotin ku: çimko kêmê kêm dereceyek ze'êf ji nasîna huzûrî ya fitrî di her kesî da heye, ew dikarê pê piçekî fikr kirin û delîlê, hebûna Xudê qebûl bikê û kêm kêm nasîna şuhûdî ya ne agahane qahîm bikê û bigehênê derecên seratir yên agahîyê.

Welhasil: fitrî bûna nasîna Xudê bi vê me'nayê ye ku: dilê mirov nas e digel Xudê û di kûratî ya rûhê wî da maya naskirina agahane ya Xudê heye ku qabil e ji pêşketin û pişkivînê ra. Lêbelê ev maya fitrî di xelkên me'mûlî da ne bi awayekî ye ku ewa ji fikr û delîlên 'eqlê bê ihtiyac û bê niyaz bikê.

PIRSYARÊN DERSA 5

Esasîtirîn mesela cihanbînîyê çi ye? Û çima esasîtirîn e?

Nasîna huzûrî û husûlî ya derheq Xudê Te'ala, şîrove bikin.

Gelo nasîna huzûrî bi rêka delîlên 'eqlî ve çêdibê? Çima?

Nasîna husûlî ji nasîna huzûrî ra dikarê çi bikê?

Me'na fitretê çi ye?

Taybetmendî (xusûsiyet) yên tiştên fitrî beyan bikin.

Qismên umûrên fitrî beyan bikin.

Çi emrê fitrî bi Xuda yê Te'ala ve peywend heye?

Nasîna fitrî ya Xudê şîrove bikin.

Gelo fitreta Xuda nasîyê, xelkên me'mûlî bê niyaz dikê ku delîla 'eqlî neyinin? Çima?

DERSA 6

RÊKA RIHET Û SADE YA XUDA NASÎYÊ

Dagirê:

Rêkên nas kirina Xudê

Taybetmendî yên rêka sade

Nîşanên nas

Rêkên nas kirina Xuda

Ji nas kirina Xudê Te'ala ra rêkên zehfî û rengareng hene ku di kitêbên felsefî û kelamî û gotinên rêberên dînî û di kitêbên 'esmanî da behs jê hatiye kirin. Ev rêk û delîlên he ji hinek aliyan ve digel hev ferq in. Mesela: di hinek ji wan delîla da ji muqeddematên hissî û tecrubî behre hatiye girtin, halhale hinek dî ji muqeddematên 'eqlê xwehrî pêk hatine; hinek rasterast li pey sabit kirina Xuda yê Hekîm in, û hinek dî hema tenê hebûnekî sabit dikin ku heyîna wî girêdayî nîne bi heyînên dî ve (wacib-ul wucûd) û ji nas kirina sifetên Wî ra gereke hinek delîlên dî hebin.

Ji aliyekî ve mirov dikarê bêjê delîlên nas kirina Xudê ew rêkên derbaz bûna li ser çem û rûbara ye: hinek ji wan wek pirên ji darê ne ku li ser çeman hatine deynan û mirovên sivik bi rihetî

dikarin ser ra derbaz bibin û lez û bez bigehên mexsedê, hinek wek wa pirên ji keviran çêbûyî ne ku qahîm û qewîtir in lêbelê rêkê dirêjtir dikin û hinek jî wek wa rêkên xwey pêç û tûnel in ku ji bona derbaz bûna tren û qetarên teqil û giran çêbûne.

Mirovê ku zêhn û bîr û hizrek sivik bar hebê dikarê pê rêkên gelek hêsan û sade Xuda yê xwe nas bikê û dest bavêjîyê jê ra 'evdîtîyê bikê, lê ew kesê barê giranê şubhan dayî pişta xwe gereke ji pira kevirî derbaz bibê û her wiha ewê têr û cewalên tejî şik û şubhe hilgirtîn gereke bi rêkekî ve biçê ku esas û binyata wê pir qahîm hatibê çêkirin; herçend ku evraz û nişûvî û pêçên zehfî têda hebin.

Li vêderê emê ewil işare bikin bal rêka sade û hêsan ya nas kirina Xudê û pêre emê ji rêkek navincî baxivîn, û emma rêka dirêj û pir pêç ku li ser çareser kirina gelek meselên esasî û felsefî ava bûye gereke ew kes pêve biçin ewên mejîyê wan tejî şik û şubhe, an ewên ji bona jinav birina şubhan û durustkirina rê xeletan xebatê dikin.

Taybetmendîyên rêka sade û hêsan

Rêka rihet û sade ya Xuda nasîyê hinek nîşan û seratî jê ra hene ku muhimtirînê wan ev in:

1- Ev rêk ne muhtacê muqeddemat û pêşekî yên pir pêçên fennî ye, gotina wê pir rihet û hêsan û sade ye, ji ber vê yêkê herkes dikarê fêhm bikê û têbigehê.

2- Ev rêk hema rasterast berê mirov didê ew «Xuda yê Xaliq û Zana û Kara» bervajîyê gelek ji delîlên kelamî û felsefî ku ewil hebûnekî binavê «wacib-ul wucûd» sabit dikin û ‘ilm û qudret û hikmet û xaliqiyet û rubûbiyet û sifetên Wî yên dî pê anîna hinek delîlên dî sabit dikin.

3- Ev rêk lê digerê ku fitretê hişyar bikê û agahîyê bidê nasîna

fitrî, û pê fikrîna di wê da haletek 'irfanî ji mirov ra peyda dibê û heçweku çêkirin û teybîr dana Xudê di vê cihanê da dibînê ewa ku fitreta wî digel wê nas.

Ji ber taybetmendîyên vê rêkê ye ku rêberên dînî ev rêk ji xelkê ra bijartine û gazî hemiya kirine ku bi wê rêkê ve biçin, û awa û delîlên dî an ji mirovên taybet û xas ra gotine û an jî li beraberê zanayên bê dîn û feylesûfên maddî da bikar birine.

Nîşanên nas

Rêka hêsan û sade ya Xuda nasîyê fikr kirina li ser nîşanên Xuda ne di cihanê da; û bi gotina Qur'ana pîroz «fikir kirina di ayetên ilahî da».

Tu dibêjî qey her yêk ji tiştên cihanê di 'erd û 'esmana û di wucûda mirov da nîşanek ya Wî li sere û berê dil didê Wî ku li her cihî hazir e.

Hema ev kitêba di destê we da heyî nîşaneke ji Wî, ma qey pê xwendina wê mirov nas dibê digel nivîserekî agah û xwey hedef? Ma gelo qet dikevê fikra hewe ku ev kitêb ji ber hinek qewimîn û pêşhatên maddî û ji xwe da çêbûbê û nivîserek hedefdar û xwey amanc jê ra nebê? Gelo ne bê 'eqlî ye ku kesek guman bikê ku kitêbek mezin ya çend sed cildî pê peqhanekî di nav serçavkek ya hêsina da çêbûbê; bi vî awayî ku: piçên wan hêsina pê wê peqhanê li hewa ra bûbin herf û bêy tedbîrdanekî li qetên kaxeza ketibin û şiklê nivîsandinê bi xwe girtibin û di pey ra vêca dîsa bêy teybîr ew kaxez ketibin berhev û bûbin kitêbek dirûtî û qapkirî?!

Vêca qebûl kirina çêbûna bê tedbîr (tesaduf) ji bona çêbûna evê cihan û 'alema mezin digel va hemî sirr û hikmetên xef û eşkere yên di wê da heyî hezaran hezar caran ehmeqanetir e ji wê gumanê.

Belê, her tertîb û hevgirtinek xwey hedef nîşaneke ji tertîbder û li hevderekî xudan hedef ra, û ev nezm û tertîb di seraserê cihanê da tê dîtin û hemî pêkve sîstimek pêk aniye ku xaliqek şehreza ew çêkiriye û berdewam e li ser idare kirina wê .

Tu dibînî binkek ya gulê di baxçeyekî da ji nav ax û rîxê derketiye, xweşreng û xweş bêhn; darek ya sêvê ji libek biçok çêbûye û her sal miqdarek zehfî sêvên xweşreng û xweş bêhn û xweş tam didê û ...

Her wiha bulbulek li ser çiqek ya gulê dixûnê û cûcikek ku ji hêkê derketiye niklê xwe li 'erdê didê û gûlkek ku taze ji zikê çêlê derketiye guhanê dayika xwe dimijê, û ew şîrê hatî guhanê dayika wê ji mêhtina wê ra hazir bûye û ... hemî pêkve nîşanên Wî ne.

Rastî çiqas 'ecêb e çêbûna şîr di çiçkê dayikan da ku di wî wextê zarok tê dinyayê ew şîr heye.

Ew masî yên her sal ji hêkrêjîyê ra ji cara ewil ra dehan kîlometra paş xwe ve dihêlin. Û mêşên hingivî ku her sibeh ji kewar û kendûyan derdikevin û ji behremend bûna ji gulên bêhn xweş ra bi rêkên dirêj ve diçin û êvaran li cihê xwe dizivirin û ... hemî nîşanên Wî ne.

Ya 'ecêbtir ew e ku mêşên hingivî û dewar û pezê şîrde jî çend beraber zêdetirê ji niyaz û ihtiyaca xwe şîr û hingvî didin da ku mirov, ev mewcûdê bijartî ji wan behremend bibê. Lêbelê ev mirovê nankor heçweku xweyê qencîyê ewê nas, nas nakê û derheq Wî da dikevê rikeberanî û cidalê.

Hema di vê bedena mirov da 'ecêbtirîn eserên teybîra hekîmane tên dîtin: beden pêk hatiye ji dezgahên rêkketî digel hev; terkîba her dezgahekî ji qetên munasibê hev; çêbûna her qet û endamekî ji hezaran hucrên (silûl) sax, halhale hemî ji yêk

hucre ya mak (kok) çêbûne; û terkîba her hucreyekî ji wa tiştên jê ra lazim; û cî girtina her qetekî di munasibtirîn cihê bedenê da; û hereket û bizavên xwe hedefên endam û dezgahan, wek: dakirina oksîjenê bi rêka pişê ve û guhaztina wê pê gulbûlên sor yên xûnê; çêkirina şekir qasê jê ra lazim pê kezebê; û bi heve danîna ewa cihên zerer dîtî pê çêbûna hucrên nû; û şer û berberekanî ya digel mîkrob û dijminên hêrişber pê gulbûlên sipî û ... eva di rêkxistina tiştên lazim ji jiyandinê ra karek muhim li xwe girtiye û ... ev hemî nîşanên Wî ne. [1]

Ev sîstima 'ecêb ku bi hezaran zanaya di dirêjî ya sede û qernan da hêca nekarîne hûr hûr bizanin, kî ew rêk xistiye?

Her hucreyek (silûl) sîstimek biçok ya hedefmend e, û birek ji hucran endamekî pêk tînin ku sîstimek mezintir ya xwey hedef e, û birek ji van sîstima ku vêca sîstima hedefdara bedenê pêk tînin. Vêca pê vê jî mesele bi dûmahî nayê, belkî gelek sîstim ji mewcûdên candar û bêcan sîstimek gelek mezin pêk tînin bi navê «cihanê tebî'et» ku li bin teybîra hekîmane ya yêkî tek û tenê da bi awayê rêk û pêk û minsecim û hevgirtî idare dibê.

«إِنَّ اللّهَ فَالِقُ الْحَبِّ وَ النَّوَي يُخْرِجُ الْحَيَّ مِنَ الْمَيِّتِ وَ مُخْرِجُ الْمَيِّتِ مِنَ الْحَيِّ ذَلِكُمُ اللّهُ فَأَنَّى تُؤْفَكُون»

«... Eha evêhe ye Xuda yê hewe, vêca hûn bi kû ve tên birin». En'am / 95.

Kifş e ku çiqa zanîna beşer pêş bikevê û qanûn û peywendên tişta pitir eşkere bibin wê sirr û hikmetên 'alema hebûnê ronahîtir bibin. Lêbelê fikr kirina di van tiştên heyîn da ku nîşanên ronahî ne ji bona dilên pak û paqij û nelewitî bes e.

[1] - Ji zanîna pitir ra binêrin: "Razê aferînişê insan" - "Isbatê wucûdê Xuda" - "Nişanehayî ez Û"

PIRSYARÊN DERSA 6

Rêkên Xuda nasîyê û taybetmendî yên wê beyan bikin.

Rêka sade ya Xuda nasîyê çi ye? Û çi taybetmendî jêra hene?

Nîşanên hedefdarî ya tiştan şîrove bikin.

Şiklê mentiqî yê delîla nezmê beyan bikin.

DERSA 7

ISBAT KIRINA WACIB-UL WUCÛB

Dagirê:

Pêşekî

Metnê delîlê

Imkan û wucûb

'illet û me'lûl

Mehal bûna teselsula 'illetan

Eslê delîlê

Pêşekî

Di dersa pêşîyê da me got ku feylesof û zanayên ‘ilmê kelam gelek delîl ji sabit kirina hebûna Xudê ra anîne ku di kitêbên berfirehên felsefe û kelam da nivîsîn. Me ji nav hemiyan burhanek (delîl) tenê bijart ku muhtacê pêşekî yên kêmtir e û qahîm e û zûka jî mirov dikarê fêhm bikê. Lêbelê gereke bê zanîn ku ev delîl hema tenê Xudê bi awayê «wacib-ul wucûd» yanî ew mewcûdê hebûna wî lazim û niyaz bi çêkerekî neyî, sabit dikê; û sabit kirina sifetên Wî wek: zanîn û karînê û cism nebûna Wî û tunebûna cî û zeman ji Wî ra bi hêviya delîlên dî ve ne.

Delîl (burhan)

Mewcûd (tişta heyî, gorekî hesaba 'eql) an «wacib-ul wucûd» e an «mumkin-ul wucûd»; gorekî 'eql çi tiştên heyîn ji van du şiqa neder e, û mirov nikarê hemî yên heyîn «mumkin-ul wucûd»

hesab bikê, çimko mumkin-ul wucûd muhtacê «'illet»ê ye, û eger 'illet hemî mumkin-ul wucûd bin û muhtacê 'illetek dî bin, hingê qet çi tişt çênabê û nayê wucûdê, bi gotinek dî: teselsula 'illetan mehal e û çênabê, nixwe bivê nevê silsile û zincîre ya 'illetan li mewcûdekî disekinê û li bal wê xilas dibê, ewê ku ew bi xwe ne m'elûlê mewcûdek dî ye û ev jêra tê gotin «wacib-ul wucûd».

Ev delîla he sadetirîn û rihettirîn delîla felsefî ye ji isbata hebûna Xudê ra, ku ji çend pêşekî yên hissî û tecrubî nîne. Lê çimko di vê burhanê da ji mefhûm û istilahên felsefî behre hatiye girtin gereke derheq va istlah û pêşekiyan da ku delîl ji wa pêk hatiye şîroveyek bê kirin.

Imkan û wucûb

Her «qeziyeyek» her çiqa sade bê jî kêmê kêm ji du mefhûmên esasî (mewzû' û mehmûl) pêk hatiye. Mesela, di vê qeziyeyê da: «roj ronahî ye» ku delalet dikê li ser hebûna ronahîyê ji rojê ra «roj» mewzû'a qeziyeyê ye û «ronahî» mehmûlê wê ye.

Sabit bûna mehmûl ji mewzû'ê ra, ji sê haleta neder e: an mehal e, wek wê yêkê ku bê gotin «jimara sê ji jimara çar mezintir e», an zerûrî ye, wek vê qeziyeyê ku «jimara dû nîvê jimara çar e», an ne mehal e û ne lazim û zerûrî; wek vê ku bê gotin «roj li raserê me ye».

Gorekî istilaha mentiqî, di şiklê yêkê da, nisbeta qeziyeyê xweyê wesfê «imtina'» û di şiklê duwê da, xweyê wesfê «zerûret» an «wucûb» û di şiklê sisê da xweyê wesfê «imkan»ê ye (bi me'na xas).

Lê çimko di felsefê da derheq «mewcûd - ewa heyî» tê axiftin û tişta ku mumteni' û mehal bê qet mewcûd bûn jêra nîne, ji ber vê yêkê feylesofan «mewcûd» gorekî hesaba 'eql teqsîm kirine li ser «wacib-ul wucûd» û »mumkin-ul wucûd». Wacib-ul wucûd

ew e ku bi xwe bi xwe hebê û ne muhtacê hebûna tiştek dî ye ku sebeb an şertê çêbûna wê ye, û pê nebûna wê ew jî dibê «tune». Û mumkin-ul wucûd ew mewcûd e ku bi xwe bi xwe tune, û hebûna wê bi hebûna tiştek dî ve girêdayî ye.

Ev teqsîm ku li ser esasê hesaba 'eql çêbûye, bê hire wêre dibêjê ku hebûna «mumteni-ul wucûd»ê çênabê, lêbelê delalet nakê li ser vê yêkê kanê gelo ew tiştên heyîn ji kîjan qismê ne (wacib-ul wucûd an mumkin-ul wucûd). Bi gotinek dî: durustî ya vê qeziyeyê bi sê awayan tê fikr kirin: yêk ev ku her tişta heyî wacib-ul wucûd bê, ya duwê ev ku her tişta heyî mumkin-ul wucûd bê, ya sisê ev ku hinek yên heyîn wacib-ul wucûd û hinek dî mumkin-ul wucûd bin. Gorekî ferz û awayê ewil û sisê hebûna wacib-ul wucûd sabit e, nixwe gereke ev ferza he bikevê ber vejenînê ku: gelo çêdibê hemî tiştên heyîn mumkin-ul wucûd bin an ne? Û pê jinav birina vê ferziyeyê ku hebûna wacib-ul wucûd bi awayek qet'î û yeqînî biryar li ser tê dayîn û sabit dibê herçend yêk bûn û sifetên wî yên dî gereke pê delîlên dî sabit bibin.

Vê gorekê lazim e ji betal kirina ferza duwê ra pêşekiyek dî li burhanê (delîl) zêde bibê, ew jî ev e ku: mumkin-ul wucûd bûna hemî tiştî mehal e û nabê. Lêbelê ji ber ku ev pêşekî ne bedîhî ye, xebat hatiye kirin ku ewê ronahî û sabit bikin, bi vî awayî ku: mumkin-ul wucûd muhtacê 'illetê ye û teselsula di 'illeta da mehal e. Nixwe gereke zincîra 'illeta li tiştekî bisekinê ku mumkin-ul wucûd nebê û ne muhtacê 'illetê bê, yanî wacib-ul wucûd bê. Û li vêderê ye ku sertilî yên hinek mefhûmên dî yên felsefî xuya dikin û lazim e derheq wan da hinekî bê xeber dan.

'Illet û me'lûl

Eger tiştek muhtacê tiştek dî bê û hebûna wê bi awayekî li ser ya dî rawesta bê û bi wê ve girêdayî bê gorekî istilaha felsefî ji wê ya muhtac ra dibêjin «me'lûl» û ji ya dî ra dibêjin «'illet».

Lêbelê çêdibê ku «'illet» ji hemiyan ve ne bê ihtiyac bê, belkî ew bi xwe jî muhtac û «me'lûlê» tiştek dî bê. Lêbelê eger «'illet» ji çi aliyan ve ne muhtac bê û qet «me'lûliyet» jê ra tunebê, hingê ew «'illet» û «nemuhtacê» hemî alî ye.

Heta bi vêderê em nas bûn digel istilahên felsefî û 'illet û me'lûl, vê gavê gereke em ji vê pêşekîyê baxivîn ku: «her mumkin-ul wucûd muhtac û niyazmendê 'illetê ye».

Ji ber ku mumkin-ul wucûd bi xwe bi xwe tune, bê hire wêre hebûna wî girêdayî ye bi hebûna tiştekî an hinek tiştên dî ve, çimko ev «qeziye» bedîhî ye ku her «mehmûlek» ku ji qeziyekî ra hebê an bi xwe bi xwe «bizzat» sabit e an jî ji ber tiştek dî (bi-l xeyr) sabit dibê, mesela, her tiştek an bi xwe bi xwe ronahî ye an pê tiştek dî (nûr) ronahî dibê; û her cismek an bi xwe bi xwe dohnî ye û an pê tiştek dî (rûn) dohnî dibê, û mehal e ku tiştek ne bi xwe bi xwe ronahî û dohnî bê û ne jî pê tiştek dî ronahî û dohnî bûbê û di wî halî da jî ronahî an dohnî bê!

Nixwe sabit bûna hebûnê ji tiştekî ra (ji mewzu'ekî ra) an bizzat e û an bi-l xeyr e, û eger bizzat nebê neçar e ku bi-l xeyr bê. Vê gorekê nixwe her mumkin-ul wucûdek ku bi xwe bi xwe sifetê hebûnê (wucûdê) jê ra çênabê bi rêka tiştek dî ve çêdibê (wucûdê peyda dikê) û me'lûlê wê ye. Û ev hema ew eslê 'eqlî ye ku dibêjê: her mumkin-ul wucûdek muhtac û niyazmendê 'illetê ye.

Lêbelê hineka guman kirine ku desthata eslê 'illiyetê ev e ku: «her tiştek heyî ihtiyac bi 'illetê heye» û li ser vê binyatê işkal girtine ku: nixwe gereke ji Xudê ra jî 'illetek hebê! Lê bê xeber in ji vê yêkê ku mewzû'ê eslê 'illiyetê «mewcûd - hemî tiştên heyîn» bi awayê mutleq û hemî alî nîne, belkî cihê jê axiftina wê «mumkin-ul wucûd» û «me'lûl» e, û bi gotinek dî: her tişta hebûna wê bi tiştek dî ve girêdayî bê niyazmend û muhtacê 'illetê ye, ne her tişta heyî.

Mehal bûna teselsula 'illetan

Axirîn pêşekî ya ku ji vê burhanê ra (delîl) bikar hatî ev e ku: zincîra 'illeta gereke bigehê wê tiştê ya ku ew bi xwe ne me'lûl bê, çimko wek çewa hatî gotin: teselsula 'illeta heta bê nihayetê mehal e. Yanî ji ber ku hebûna me'lûl muhtacê 'illetê ye û bi hebûna wê ve girêdayî ye eger em we hesab bikîn ku ev me'lûliyet û girêdayî bûn 'umûmî bê qet çi wexta tiştek jî çênabê, çimko ne ber 'eql e birek ji tiştan ku hebûna wan bi tiştek dî ve girêdayî ye hebin û ewa ku sebebê hebûna wa ye tunebê.

Wiha bêjin ku: birek mirov ji jêbirkanê ra li ber xeta bezê sekinîne, lêbelê her yêkî biryar daye heta yê dî nebezê ew dest bezînê nekê, eger ev biryar 'umûmî bê û hema birastî hemî li ser wê biryarê bin, qet çi yêk ji wan qet tu cara dest bezê nakê! Bi vî awayî ye eger hebûna tiştekî bi tişta dî ve girêdayî bê qet çi caran tiştek çênabê. Vêca evahe ku em dibînin tişt û mişt hene, nîşan didê ku tiştek û mewcûdek bê niyaz û nemuhtac û hebûna wî bi tiştekî ve negirêdayî heye.

Dubare kirina burhan û delîlê

Vê gavê piştî wa pêşekî yên hatîn gotin carek dî delîlê bînin:

Her tişta ku mirov bikarê ewê «heyî» hesab bikê, ji du hala neder e:

An hebûn ji wê ra lazim e û ew bi xwe bi xwe heye û «wacib-ul wucûd» e, û an hebûna wê ne pêdivê ye, û girêdayî ye bi hebûna tiştek dî ve ku di istilahê da jêra tê gotin «mumkin-ul wucûd». Û gelek ronahî ye ku eger çêbûna tiştekî mehal bê qet çi cara çênabê û qet mirov nikarê ewê heyî hesab bikê. Nixwe her tişta heyî an «wacib-ul wucûd» e an «mumkin-ul wucûd».

Pê fikrîna li mefhûmê «mumkin-ul wucûd» da ronahî dibê ku heçî bi vê pêkê bê ew me'lûl û muhtac e, çimko eger tiştek bi

xwe bi xwe tunebê neçar e ku bi rêka tiştek dî ve çêbûbê, her wek wî wesfê ku hebûna wê ne bizzat bê, bi-l xeyr e. Û desthata qanûna 'illiyetê jî ev e ku her tişta hebûna wê bi tiştek dî ve girêdayî û mumkin-ul wucûd bê muhtacê 'illetê ye, an bê gotin ku: baweriya bi Xudê pê 'illet, şikandina qanûna 'illetê ye!

Ji alîyê dî ve vêca eger her tişta heyî mumkin-ul wucûd û muhtac û niyazmendê bi 'illetê bê, hingê qet çi cara tiştek jî çênabê, û evahe dibê wek wê çendê ku her yêk ji mirovên kom û birekî kiryara xwe bi kirina yê dî ve girêbidê, bi vê me'nayê ku heta ew destpê nekê ev jî dest kar nekê, bi vî awayî qet çi kar çênabin. Nixwe evahe ku tişt hene delîla wê ye ku wacib-ul wucûd heye.

PIRSYARÊN DERSA 7

Istilaha mentiqî û felsefî ya «imkan û wucûb»ê beyan bikin.

Bêjin kanê «wacib-ul wucûd» û «mumkin-ul wucûd» çi ne?

Durustî ya teqsîma 'eqlî ya «mewcûd» bi «wacib-ul wucûd» û «mumkin-ul wucûd» bi çend sûretan ferz dibê?

«'Illet û me'lûl»ê te'rîf bikin.

Desthata eslê «'illiyet»ê çi ye?

Gelo desthata eslê 'illiyetê ew e ku ji Xudê ra jî 'illet hebê? Çima?

Çima hemî mumkin-ul wucûd muhtacê 'illetê ne?

Gelo baweriya bi Xuda yê nehatî çêkirin, eslê 'illiyetê dişikênê?

Mehal bûna teselsula di 'illeta da beyan bikin.

Evê delîlê binivîsin û bêjin kanê çi tiştî sabit dikê?

DERSA 8

SIFETÊN XUDÊ

Dagirê: Ezelî û ebedî bûna Xudê
Sifatê selbiyye
'illetê jînder
Taybetî yên 'illeta jînder

Pêşekî

Di dersa borî da hat gotin ku desthata gelek ji delîlên felsefî sabit bûna mewcûdekî ye bi navê «wacib-ul wucûd» ku pê hinek delîlên dî vêca sifetên Wî yên "selbî" û "subûtî" sabit dibin û pê wa delîla hemiya li ser hev, hebûna Xuda yê Te'ala bi wan sifetên Xwe ve sabit dibê ku ji mexlûqan ferq e. Eger ne hema sabit bûna «wacib-ul wucûd» ji naskirina Wî ra ne sebeb e, çimko we heye ku kesek guman bikê, mesela: madde an enerjî jî dikarê wacib-ul wucûd bê. Ji ber vê yêkê lazim e ji alîyekî ve sifetên selbiyye (sifetên ku Xudê ji wan berî û munezzeh e) yên Xudê sabit bibin da kifş bibê ku wacib-ul wucûd ji sifetên mexlûqan munezzeh e û navê wacib-ul wucûd nekevê ser yêk ji mexlûqan, û ji alîyê dî ve jî gereke sifetên subûtî (sifetên ku di Xudê da hene) yên ilahî sabit bibin da hem layiq bûna Wî ji 'ibadet ra xuya bibê û hem rêk vebê ji bona sabit kirina hinek bawerî yên dî wek pêxemberî û qiyametê ku çiqên wê bawerîyê hesab dibin.

Ji burhana (delîla) borî evahe hat dest ku wacib-ul wucûd ne muhtacê çi sebeba ('illet) ye û ew (sebeb û) 'illetê hemî

mumkina ye. Û bi gotinek dî: du sifet ji wacib-ul wucûd ra sabit bûn: yêk bê ihtiyacî ya Wî ji hemî tiştên heyîn, çimko eger kêmtirîn niyaz û ihtiyac bi tiştekî hebê wê ew tişt bibê «'illet» ji wî ra, û me zanî ku me'na 'illetê di istilaha felsefê da ev e ku mewcûdek dî muhtacê wî bê. Û ya dî ku sabit bû ev e ku mewcûdên mumkin-ul wucûd me'lûl û muhtacê wî ne, û ew ewilîn 'illet e ji peyda bûn û çêbûna wan ra.

Vêca pê behre girtina ji va du desthata emê ji pêve girêdayî yên wan baxivin û sifetên selbiye û subûtiye yên wacib-ul wucûd sabit bikîn. Elbet ji sabit kirina wan ra gelek delîl di kitêbên felsefî û kelamî da hatiye, lêbelê ji bona rihet fêhm kirinê û hevgirtina gotinê, emê wa delîlan bibijêrîn ku digel delîla derbaz bûyî rêk bikevin.

Ezelî û ebedî bûna Xudê

Eger mewcûdek me'lûl û muhtacê mewcûdek dî bê, hebûna wê girêdayî ye bi wê ve, û eger 'illeta wê tunebê ew jî çênabê. Bi awayek dî em bêjin: nebûna mewcûdekî di zemanekî da nîşanê mumkin-ul wucûd bûna wê ye, û çimko wacib-ul wucûd xwe bi xwe heye û ne muhtacê tiştek dî ye; nixwe wê her hebê.

Vê gorekê du sifetên dî ji wacib-ul wucûd ra isbat dibin: yêk ezelî bûn, yanî di zemanê borî da tunebûn jê ra tune bûye, û ya duwê, ebedî bûn, yanî di zemanê hêjbê (pêşerojê) da jî tunebûn jê ra çênabê. Carna pê navê «sermedî» ji van her du sifetan daxivin.

Nixwe her tişta ku zemanekî nebûbê an jinavçûn jê ra hebê ew ne wacib-ul wucûd e, û bi vî awayî pûçî ya ferzîya wacib-ul wucûdî ya her tiştekî maddî ronahî dibê.

Sifetên selbîyye

Yêk dî ku lazimê wacib-ul wucûd e û jê venabê, ev e ku ew ne murekkeb e û ji piç û ecza pêk nehatiye, çimko her murekkebek

muhtacê piç û qetên xwe ye, û wacib-ul wucûd ji hemî awayên ihtiyacîyê dûr û munezzeh e.

Eger bê gotin ku ecza û qetên wacib-ul wucûd ne bi-l fi'l in, belkî wek du qetên yêk xetkê ne, evahe jî dîsa gotinek pûç e, çimko ew tişta ku ji hev vebûna piç û ecza yên wê mumkin bê herçend li ber çavan ji hev venebûbin jî, lê gorekî 'eql ji hev vebûna wan mumkin e, û me'na imkana ji hev vebûnê, imkana ji nav çûna hemîyê ye, wek çewa mirov xetekî yêk metrî bikê du xetên nîv metrî, hingê êdî xeta yêk metrî tune û jinav çûye. Û me pêşda zanî bû ku imkana zewal û jinav çûnê ji bona wacib-ul wucûd nîne.

Û çimko terkîb û çêbûna ji piç û eczayên «bi-l fi'l» û «bi-l quwwe» ji xasiyetên cisma ye, sabit dibê ku çi tiştên cismanî nabin wacib-ul wucûd; bi gotinek dî: tecerrud û cism nebûna Xuda yê Te'ala sabit dibê; û her wiha sabit dibê ku çav nikarin Xudê Te'ala bibînin û çi hiss nikarin pê bihesin, çimko mehsûs bûn ji xasiyetên cism û cismaniyetê ye.

Ji alîyek dî ve vêca pê nefy kirina cismaniyetê xasiyetên cisma jî wek: hebûna cî û mekan, û heyîna zeman û wext jî ji wacib-ul wucûd ra namînin, çimko cî û mekan ji wan tişta ra ye ku berfirehî û dirêjiyek jêra hebê. Û her wiha her tişta zeman û wextek jêra hebê ew jî bi awayekî çêdibê ji hev biqethê û evahe jî awayek yê dirêjî û terkîba bi-l quwwe ye, nixwe mirov nikarê ji Xuda yê Te'ala ra cî û wextekî hesab bikê, û qet çi tiştên cî û wextek ji wan ra heyî nikarin wacib-ul wucûd bin.

Û di pey ra pê nefy kirina wext û zeman ji wacib-ul wucûd, hereket û bizav û guherîn û kamil bûn jî ji wî tên dûr kirin, çimko çi bizav û guherîn bêy wext û zeman imkan jêra tune û çênabin.

Vê gorekê ew kesên ji Xuda ra cihek wek «'erş» hesab kirîn; an hereket û bizavek wek hatina ji 'esmana nisbet dayîn balê ve; an

guman kirîn ku Xudê pê çava bê dîtin; an guherîn û berew kemal çûn jêra zanîn, ewa bi durustî Xudê nas nekiriye. [1]

Bi awayek gişti heçî tişta bi awayekî kêmasî, an sînor kirin an ihtiyac û niyaz têda hebê ji Xuda yê Te'ala di Xudê da nîne û ji Wî tê dûr kirin û ev e me'na sifetên selbî yên Xudê.

'Illetê jînder

Desthata duwê ku ji delîla derbaz bûyî dest ve hat ev bû ku wacib-ul wucûd 'illet e ji peyda bûna mumkinata ra. Hema li vêderê emê ji desthata wê baxivîn, ewil emê bi kurtî behsa qismên 'illeta bikîn û piştî wê emê taybetî yên 'illiyeta ilahî şîrove bikîn.

Bi gişti 'illet ji wî mewcûdî ra tê gotin ku dagirê şurût û mu'iddata bê û hebûna mewcûdek dî bi wê çêbûbê. Evahe ku dibêjin: ji Xudê Te'ala re 'illet tune, bi vê me'nê ye yanî Xudê bi çi tiştek dî ve girêdayî nîne û ji Wî ra qet şert û mu'id jî nînin.

Lê evahe ku Xudê Te'ala 'illet e ji hemî mexlûqata ra, yanî jînder e ku qismek taybet e ji 'illiyeta fa'ilî. Ji ronahî kirina vê gotinê ra tenê çare ya me ew e ku em piçekî derheq qismên 'illetê baxivîn û ji zanîna berfireh re berê hewe bidîn kitêbên felsefî.

Em zanîn ku ji şîn bûna giya re, tovê munasib û av û hewa û ... lazim e, û her wiha gereke sebebek tebî'î an mirovek ewî tovê li axê bireşênê û avê bigehênîyê. Evênhe hemî gorekî te'rîfa ji 'illetê ra hatî gotin ji 'illetên şîn bûna giya tên hesab kirin.

Mirov dikarê evan 'illetan bi awayên muxtelif teqsîm bikê li ser çend qisman, mesela: ew desta ji 'illetan ku daima ji hebûna

[1] - Hebûna cî û daketina ji ser 'erş û dîtina bi çavan hatiye nisbet dan bal hinek ji birên musilmana ve. Û berew kemal çûna Xudê jî ji komek feylesofên rojavayî hatiye gêran, wek, Hegel, Birigson, Wîliyam Cîmz û Waynhid.

me'lûl ra lazim û pêdvê ne «'illetên heqîqî» û deste ya dî ku mayîna wan ji bona mayîna me'lûl nelazim e [wek cotyar ji giya re] «'illetên i'dadî» an «mu'iddat» tên nav kirin. Û her wiha ji 'illetên cîgirê tov ra «'illetên cîgir» û ji 'illetên dî ra «'illetên inhisarî» dibêjin.

Lê vêca qismek dî yê 'illet heye ku ferq dikê digel wê ya derheq şîn bûna giya da hatî gotin, û nimûnên wê mirov dikarê di nefsê û karên nefsanî da bibînê: dema mirov şiklekî zêhnî di mejîyê xwe da çêkê an ji kirina karekî ra biryarê bidê, tiştek nefsanî û rewanî bi navê sûretê zêhnî û bi navê «irade / vîyan / xwest» çêdibê ku hebûna wê girêdayî ye bi hebûna nefsê ve û ji ber wê yêkê me'lûlê wê hesab dibê. Lêbelê ev qismê me'lûl bi awayek wereng e ku qet ji 'illeta xwe ne cuda ye û nikarê serbixwe û cidayê ji 'illetê hebê. Di wî halî da jî fa'iliyeta nefsê nisbet bi sûretê zêhnî an iradê bi wa şertan ve girêdayî ye ku ji kêmasî û sînordarî û mumkin-ul wucûdî ya wê serkanî girtiye. Vê gorekê fa'iliyeta wacib-ul wucûd ji cihanê ra ji fa'iliyeta nefsê nisbet bi wa tiştên rewanî jî bilindtir û kamiltir e û di nav fa'ila da hemberek nîne, çimko ew bêy çi ihtiyacekî me'lûlê xwe çêdikê û tênê wucûdê, ew me'lulê ku hemî pêkve bi wî ve girêdayî ye.

Taybetîyên 'illeta jînder

Ji wê ya hatî gotin mirov dikarê çend taybetî yên muhim ji 'illeta jînder ra bêjê:

1- 'Illeta jînder gereke bi awayek kamiltir kemalatên hemî me'lûlan di wî da hebin, da bikarê gorekî her tiştekî lê zêde bikê û danê digel bikê, bervajîyê 'illetên mu'id û maddî ku hema tenê rêka guherîn û tehewwulê vedikin û nelazim e ku ew kemalên wan di wa da hebê, mesela: nelazim e ku kemalatên giya di axê da hebin, an dayik û bab xweyê kemalatên zarokên xwe bin. Lê Xuda yê jînder gereke digel wî qasî ku ecza jêra nebin kemalatên her tiştî di Wî da hebin.

2- 'Illetê jînder me'lûlê xwe ji tunehîyê tênê heyînê, û di yêk kelîmê da «ewê çêdikê», û pê xuliqandina wê tiştek ji wî kêm nabê, bervajîyê fa'ilên tebî'î ku karê wan hema guherîna me'lûlê ku heyî ye, û mesref kirina hêz û enerjîyê ye. Û evahe ku were gotin tiştek ji zatê wacib-ul wucûd cida bibê û jê vebê, ev yanî ji hev cida bûn û guherîna li zatê Barî Te'ala da, pûçî û nedurustî ya vê gotinê pêşîyê da eşkere bû.

3- 'Illeta jînder, 'illeta heqîqî ye, û ji ber vê yêkê hebûna wî ji mayîna me'lûl ra lazim û pêdivê ye. Bervajîyê 'illeta i'dadî ku mayîna me'lûl ihtiyac bi wê nîne.

Nixwe ev gotina he ku ji zimanê hinek ji mutekellimîn Sunnî hatiye gêran: "'alem di mayîna xwe da ihtiyac bi Xudê nîne", an gotina hinek ji feylesofên rojavayê ku gotine: cihana tebî'et wek se'etekî ye ku ji her û her ra hatiye bar kirin û êdî ji kar kirinê ra ne muhtacê Xudê ye, ji heqîqet û rastîyê dûr e. Belkî heqîqet ev e ku cihan her û her muhtacê Xuda yê Te'ala ye û eger bêhnekî desta ji xwey kirina wê bikêşê qet tiştek namînê.

PIRSYARÊN DERSA 8

Çi lazimî heye ku sifetên Xudê bên nas kirin?
Çi netîce ji delîla hatî gotin dest ve hatin?
Sermedî bûna Xudê sabit bikin.
Mirov çewa dikarê isbat bikê ku Xudê ne murekkeb e, û ecza yê bi-l quwwe û bi-l fi'lî jêra nînin?
Delîla cism nebûna Xudê çi ye?
Çima Xudê nayê dîtin?
Bi çi delîlê cî û wext ji Xudê ra nînin?
Gelo mirov dikarê nisbeta hereket û sukûnê bidê bal Xudê ve? Çima?
Qismên 'illetê beyan bikin.
Taybetîyên 'illeta jînder şîrove bikin.

DERSA 9

SIFETÊN ZATIYYE

Dagirê:
Pêşekî
Sifetên zatî û fi'lî
Isbata sifetên zatî
Jîn (heyat)
Zanîn (ʻilm)
Karîn (qudret)

Pêşekî

Me zanî Xudê Te'ala ku 'illetê jînderê cihanê ye xweyê hemî kemalatên heyînê ye û her kemalek ku di tiştekî da hebê ji Wî ye bê wî qasî ku pê dayîn û bexşîna ji wê kemalê tiştek ji kemalên Wî kêm bibê. Û ji ber ku başitir bê fêhm kirin mirov dikarê ji vê misalê behrê bigirê ku: seyda ji zanîna xwe didê feqî bêy wî qasî ku ji zanîna wî kêm bibê. Elbet dana wucûd û kemalan ji alîyê Xudê Te'ala ve gelek ji vê misala me anî bilindtir e, û belkî başitirîn gotin vê derheqê da ew bê ku em bêjin: cihana heyînê tîrojeke ji ronahî ya zatê eqdesê Allah, çewa ku ji vê ayetê tê istifade kirin: «Xudê ronahî ya 'esmana û 'erdê ye». [1]

Ji ber kemalên xeyrê mutenahî yên ilahî, heçî tişta kemalek têda

[1]- اللَّهُ نُورُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ مَثَلُ نُورِهِ كَمِشْكَاةٍ فِيهَا مِصْبَاحٌ الْمِصْبَاحُ فِي زُجَاجَةٍ الزُّجَاجَةُ كَأَنَّهَا كَوْكَبٌ دُرِّيٌ يُوقَدُ مِن شَجَرَةٍ مُّبَارَكَةٍ زَيْتُونِةٍ لَّا شَرْقِيَّةٍ وَلَا غَرْبِيَّةٍ يَكَادُ زَيْتُهَا يُضِيءُ وَلَوْ لَمْ تَمْسَسْهُ نَارٌ نُّورٌ عَلَى نُورٍ يَهْدِي اللَّهُ لِنُورِهِ مَن يَشَاء وَيَضْرِبُ اللَّهُ الْأَمْثَالَ لِلنَّاسِ وَاللَّهُ بِكُلِّ شَيْءٍ عَلِيمٌ .Nûr/ 35

hebê û bêkêmasî û bêsînor bê ji Xuda yê Te'ala ra bikar tê birin, çewa ku ayetên pir bihayên Qur'ana pîroz û hedîsên şerîf û du'ayên pakan ji Ehlê Beytê (s) kelîmên wek: nûr û kemal û cemal û mehebbet û behcet û ... nisbet dane bal Xudê ve. Lê ewa ku di kitêbên felsefe û kelamê Islamî da bi navê sifetên Xudê jê hatî xeber dan çend sifetek in ku bi du desta (sifetên zatiyye û sifetên fi'liyye) teqsîm dibin. Ji ber vê yêkê ewil emê hinekî ji vê teqsîmê baxivin û paşê emê behsa muhimtirînê wan bikin.

Sifetên zatî û fi'lî

Ew sifetên ku bal Xudê ve bên nisbet dan, an ew in ku awayek yê kemalê ne ji zatê Xuda re, wek: jîn û zanîn û karînê, an jî ew mefhûm in ku bi awayekî peywend hene digel Xudê û mexlûqên Wî; wek: xuliqandin û rizq danê. Desta ewil bi «sifetên zatî» û desta duwê bi «sifetên fi'lî» hatine nav kirin.

Ferqa esasî di navbeyna van her du deste yên sifeta da ew e ku: desta yêkê rasterast derheq Xudê da ne, lê desta duwê girêdan hene di navbeyna Xudê û mexlûqên Wî da, yanî li alîyekî da Xudê heye û li alîyê dî jî mexlûq û aferîde yê Xudê Te'ala, wek sifetê çêkirin û xuliqandinê ku nîşan didê hebûna wan girêdayî ye bi zatê ilahî ve, ku hingê Xudê xaliq e û sifetê xaliqiyetê jêra bikar tê birin ku mexlûqan çêkir bê, elbet Xuda yê Mute'al di zatê Xwe da karîn heye ku bixuliqênê û çêkê, lêbelê «karîn» ji sifetên zat e û «xuliqandin» mefhûmek izafî ye ku meqamê «fi'lê - kirinê» derdikevê. Vê gorekê «xaliq bûn» ji sifetên fi'lî ye, illa ku bi me'na «karayê li ser xuliqandinê» bê hingê dizivirê bal sifetê «karîn - qudret»ê ve, ku ji sifetên zatî ye.

Muhimtirîn sifetên zatî yên ilahî: jîn û zanîn û karîn e. Û emma «semî' - bihîser» û «besîr - bîner» eger me'na wê ew bê ku: zana ye bi wa tiştên tên bihîstin û dîtin, an ev bê ku: karîn heye ji bihîstinê û dîtinê ra, hingê ev her du li sifetên «zanîn û karîn»ê dizivirin. Û

eger mexsed bihîstin û dîtina bi-l fi'l bê ku ji hebûna girêdana di navbeyna bihîser û bîner ji wa tiştên tên bihîstin û dîtin derdikevê, gereke ji sifetên fi'lî bên hesab kirin. Çewa ku carna «'ilm» bi vê me'nayê bikar hatiye û bi navê «'ilmê fi'lî» jê tê xeberdan.

Hinek ji zanayên 'ilmê kelam «kelam - xeber dan» û «irade» jî û sifetên zatî hesab kirine ku emê paşê derheq wan da wê baxivîn.

Isbata sifetên zatî

Sadetirîn rêka isbata jiyan û zanîn û karînê (heyat, 'ilm û qudret) ji Xuda ra evahe ye ku ev mefhûmên he dema ji mexlûqa ra bikar bê birin nîşana kemala wa ye, nixwe gereke kamiltirînê wan di 'illeta jînder da hebê. Çimko çi kemala di mexlûqekî da peyda bibê ew ji Xudê ye û ewê ewan didê gereke ew hebê heta bidê, û çênabê ku ewê ku jînê didê ew bi xwe ne xweyê jiyanê bê; an ewê ku zanîn û karînê didê aferîde û mexlûqê xwe, zanîn û karîn di wî bi xwe da tunebê û nezan û nekar bê. Vê gorekê hebûna evan sifetên kemalê di hinek mexlûqa da nîşan e ji bona hebûna wan di Xaliqê Mute'al da; bêy wê çendê ku kêmasî û sînorek têda hebê. Bi gotinek dî: Xuda yê Te'ala xweyê jiyan û zanîn û karîna bênihayet û bêdawî ye.

Ronahî kirinek zehftir derheq va sifeta da

Jîn - heyat

Mefhûmê «heyat - saxî»ê derheq du birên mexlûqa da bikar tê: *yêk*- giya ku zêdahî û li xwe zêde kirin ji wan ra heye, û ya dî heywan û mirov ku xweyê irade û viyan e. Me'na ewil, sebebê kêmasî û ihtiyacî ye, çimko li xwe zêde kirin ew e ku ya li xwe zêde dikê di ewil da kemalek jê ra nebê û ji ber kartêkerên ji derveyî guherîn bikeftê û kêm kêm kemalek nû jêra peyda bibê, û çênabê ev tişt bên nisbet dan bal Xudê ve, çewa ku di behsa "sifetên selbiyye" da derbaz bû.

Lê me'na duwê ya «heyat - saxî»ê mefhûmek kemalî ye, û her çend misdaqên [û nimûne yên] wê yên imkanî têkel in digel hinek kêmasî û sînoran; lêbelê çêdibê ku ji wê ra mertebeyek bênihayet û bêdawî hebê ku bêkêmasî û bêsînor û bê ihtiyac bê, çewa ku mefhûmê «wucûd - hebûn» û «kemal»ê jî wereng in.

Ji xwe «heyat - saxî» bi vê me'nayê ku hevrê ye digel ‘ilm û karê iradî / vîyanî ji tişta nemaddî venabê, çimko herçend «heyat - saxî» tê nisbet dan bal rûh li ber yên maddî ve, lê belê di heqîqet da ew sifetê rûhê wa ye, û bedena wan ji ber ku bi rûh ve girêdayî ye jêra tê gotin: "sax". Û bi gotinek dî: wek çewa kurtî û dirêjî (qas - imtdad) ji lazimî yên tiştên cismanî ye, heyat (saxî) jî ji lazimî yên tiştên mucerred e (yanî tiştên ku ne cism in). Pê hûr bûna di vê gotinê da delîlek dî li ser heyat û saxî ya ilahî dest ve tê, ew jî ev e ku: zatê muqeddesê Xudê cismanî nîne wek çewa di dersa borî da hatî gotin, û her mewcûdek mucerred xwey heyat û saxî ye di zatê xwe da. Nixwe Xudê Te'ala di zatê Xwe da xwey heyat û saxî ye.

Zanîn

Mefhûmê ‘ilm û zanînê ji eşkeretirîn mefhûma ye, lêbelê dema mirov berê xwe didê ew ‘ilmê ku di nav mexlûqan da heyî mirov dibînê ‘ilm û zanînek kêm û sînordar e; û pê va taybetiyan mirov nikarê bêjê ‘ilm û zanîna Xudê jî hema ew e. Lêbelê çewa hat gotin anagora 'eql ew dikarê xweyê merteba kemalê bê ku qet kêmasî û hudûd kirin jêra tunebê û hema 'alim û zana bi xwe bê, û hema ew e zanîna zatî ya Xuda yê Te'ala.

Zanîn û ‘ilmê Xudê bi gelek rêka ve sabit dibê: yêk ji wan hema ew rêk e ku hemî sifetên zatî pê wê sabit dibin; ew rêka me jê xeber dayî ku: çimko ‘ilm û zanîn di nav mexlûqa da heye lazim e kamiltirînê wê di çêkerê wan da hebê.

Rêyek dî behre girtina ji delîla nezm û rêk û pêkîyê ye, bi vê

gotinê ku: çiqa ku di tiştekî da rêk û pêkî û qahimiyek baştir hebê ewqas pitir nîşanê ‘ilm û zanîna çêkerê wê ye, çewa ku kitêbek ‘ilmî an şi'r û helbestek xweş an eserek hunerî nîşan e ji xweş fikrî û hostahî ya nivîserê wê ra, û qet çi mirovê 'aqil û zana wereng fikr nakê ku kesek bêsewad û cahil û nezan bikarê kitêbek ‘ilmî û felsefî binivîsê, vêca nixwe çewa wê ihtimal bê dayîn ku ev cihan û 'alema hevgirtî ya mezin û xweyê van hemî 'ecêb veşartiyan mewcûdekî bê ‘ilm û zanîn ew çêkir bê?!

Welhasil, rêka sisê ew e ku pê muqeddemat û pêşekî yên felsefe ya nezerî (nebedîhî) tê dest, wek vê gotinê ku: «her mewcûdê mucerredê serbixwe ‘ilm û zanîn heye» wek çewa di kitêbên vê derheqê da isbat bûye. Evahe ku mirov hûr bibê di ‘ilm û zanîna Xudê da ji bona durust bûna mirov gelek baş e, û ji ber vê yêkê ye ku di pey hev ra Qur’ana pîroz jê xeber daye, û di ciyekî da hatiye ku:

«Xudê nêrînên bi dizî yê çavan û ewa di dilan da xef bûyî dizanê». [1]

Karîn

Derheq wî kirinkerî de ku karê xwe bi vîyan û ixtiyar dikê, tê gotin: karîn heye li ser karê xwe. Nixwe karîn (qudret) destpê kirina kirinkerê muxtar e ji karekî ra ku çêdibê bikê. Û çiqas ku kirinker ji alîyê merteba wucûdî ve kamiltir bê ewî karînek pirtir heye, nixwe ew mewcûdê ku xweyê kemala bênihayet bê ji qudret û karîna wî ra xilasek û temamî nîne:

« إِنَّ اللَّه عَلَى كُلِّ شَيْءٍ قَدِيرٌ » [2]

Li vêderê emê çend gotineka bêxin bîr:

1- Karê bi karînê ve girêdayî gereke imkana çêbûnê jêre hebê,

[1]- Mu’min / 19 يَعْلَمُ خَائِنَةَ الْأَعْيُنِ وَمَا تُخْفِي الصُّدُورُ

[2]- Beqere / 20 û ... = Hema birastî Xudê kara ye ji kirina her karekî ra.

nixwe ewa ku mehal e an ew tişta ku bibê sebebê mehalê, nakevê ber karînê. Nixwe hebûna qudret û karîna Xudê Te'ala ne bi vê me'nê ye ku mesela bikarê xudayek dî çêkê (çiko Xudê çêkirin nîne) an êjmara «2»ê digel wî qasî ku zarokê kesekî ye pêşiya bab da bixuliqênê.

2- Lazimî ya hebûna karînê li ser her tiştî ne ew e ku hemiyan çêkê û bikê; belkî tişta ku dixazê, bikê; û Xuda yê hekîm û şehreza xêncî ji karê hekîmane û cîgirtî naxazê û nakê; herçend karîn heye ji kirina karê kirêt û nebaş ra jî. Derheq hikmeta ilahî da emê di dersên hêj bên da baxivîn.

3- Karîn û qudret bi wê me'na hatî gotin ixtiyar û bijartin jî têda heye, û çewa ku Xuda yê Te'ala xweyê bilindtirîn karîna, kamiltirîn mertebên ixtiyar û bijartinê jî ji Wî ra heye, û qet çi tişt nikarê Ewî mecbûr bikê ji kirina karekî ra, an ixtiyar û heqê bijartinê jê bigirê, çimko heyîn û karîna her tiştî ji Wî ye, û qet ew hêz û quweta Wî daye yên dî Ewî bin naêxin.

PIRSYARÊN DERSA 9

Derheq Xudê da mirov dikarê çi mefhûman bikar bibê?
Sifetên zatî û fi'lî beyan bikin û ferqa navbeyna wan da bêjin.
Rêka gişt î ya sabit kirina sifetên zatî çi ye?
Heyat (saxî) bi çend me'na ye? Û kîjan ji Xuda re bikar tê birin?
Delîla xas û taybet ji saxî ya Xudê ra bêjin.
'Ilm û zanîna Xudê bi sê rêka ve sabit bikin.
Mefhûmê karînê (qudretê) beyan bikin û karîna bêbinî ya Xudê sabit bikin.
Çi tişt nakevin ber karînê da?
Çima Xudê karên kirêt û nebaş nakê?
Evahe ku «Xudê xwey ixtiyar e» û muxtar e şîrove bikin.

DERSA 10

SIFETÊN FI'LÎ

Dagirê:

Pêşekî

Xaliqiyet (çêkirin)

Rubûbiyet (xwey kirin - gehandin)

Ulûhiyet (me'bûd - 'ibadet kirin ji Wî ra)

Pêşekî

Wek çewa di dersa borîyê da hatî gotin: sifetên fi'lî ew mefhûm in ku pê di nezer da girtina zatê ilahî digel mexlûqên Wî û ew girêdana ku di navbeyna wan da heyî û ewê dana Xudê ji wan ra tê dest; wek mefhûmê «xuliqandin û çêkirin» ku pê melheza girêdana hebûna mexlûqan bi Xudê Te'ala ve tê dest, û eger ev girêdan û peywend neyê melheze kirin ev mefhûm (çêkirin - xuliqandin) peyda nabê.

Girêdan û peywendî yên ku navbeyna Xudê û mexlûq da melheze dibin bêhed û bêsînor in, lêbelê bi awayekî li ser du qisman teqsîm dibin: qismek ew e ku rasterast di navbeyna Xudê û mexlûqê Wî da mulaheze dibin wek: çêkirin û xuliqandinê û ji nû ve çêkirinê û ... û qismek jî ew in ku pişti hingê tên mulaheze kirin, wek rizq danê, çimko gereke ewil

çêbûna wa yên rizq ji wan ra lazim e bê mulaheze kirin heta mefhûmê rizq «Raziq û Rezzaq»ê bê dest. Û carna heye ku ev biheve girêdan û peywend bi çend tiştên pêşiya xwe ve girêdayî bin, wek 'efû kirin û lêborîna Xudê derheq 'evdan da, ku ewil girêdayî ye bi rubûbiyeta teşrî'î ya ilahî ve, ku cara yêkê hukm û wezîfe ji alîyê Xudê ve kifş bibê û di pey ra 'evd muxalefet û neguhdarîyê bikê û piştî hingê sifetê lêborînê ji wî ra dibê.

Welhasil: ji bona destve anîna sifetên fi'lî gereke pîvanek çêbê di navbeyna Xudê Te'ala û mexlûqê Wî da û awayek yê girêdanê di navbeyna xaliq û mexlûq da bê mulaheze kirin heta ku ev mefhûmê «mutezayef» dest ve bê. Ji ber vê yêkê zatê muqeddesê Ilahî, bêy mulaheza wan girêdan û peywendan nabê xweyê van sifetên fi'lî. Û hema ev e ferqa binyatî di navbeyna sifetên zatî û fi'lî de.

Elbet wek çewa hatî gotin, carna çêdibê ku sifetên fi'lî bi mulaheza mebadî û pêşekî yên wê di nezer de bên girtin û hingê zivirîngeha wan sifetên zatî ye, çewa ku eger «xaliq» an «xellaq» bi me'na wê bê ku «dikarê çêkê û bixuliqênê» hingê dizivirê ser sifetê «qedîr - kara» yê ve; an sifetê «semî' – bihîser» an «besîr - bîner» bi vê me'na ku bi tiştên tên seh kirin û tên dîtin zana ye, hingê dizivirê bal sifetê «'elîm – zana» ve.

Ji alîyê dî ve vêca hinek ji mefhûmên ku ji sifetên zatî hesab dibin bi me'na fi'lî mulaheze dibin, hingê ew ji sifetên fi'lî ne, wek çewa mefhûmê «'ilm – zanîn» di gelek cî yên Qur'anê da bi me'na sifetê fi'lî bikar hatiye. [1]

Gotinek muhim ku gereke li vêderê bê gotin ev e ku: dema girêdanek navbeyna Xuda yê Te'ala û mexlûqê Wî da mulaheze

[1] - Binêrin: Beqere / 187 û 235. Enfal / 66. Feth / 18 û 27. Alê 'Imran / 140 û 142. Maide / 94. Tewbe / 16. Muhemmed / 31 û ...

bibê, vêca li ser wê esasê sifetên fi'lî ji Xuda ra berçav tên girtin, ew sifet bi mulaheza wê yêkê ku ji alîyekî ve girêdayî ne bi wa tiştên maddî ve hingê qeyd û bendên zeman û mekan jêra hene, lêbelê bi mulaheza girêdana wê bi Xudê ve qet hedd û bend jêra nînin û munezzeh e ji qeyd û bendên zemanî û mekanî.

Mesela, rizq dana rizq xwerekî di wextek taybet û mexsûs di zeman û mekanekî da pêk tê, lêbelê ev qeyd û bendên he di heqîqet da ji wî ra ye ewê rizqê wî tê dayîn ne ji wî ra ye ewê rizq didê, û zatê eqdesê Ilah berî û dûr e ji hemî nisbetên zeman û mekanan.

Ev gotina he cihê lê hûr bûn û diqqetê ye, û kilîda jinav birina gelek meşakila ye di meydana nas kirina sifet û kiryarên ilahî da ku ixtilafek dijwar li ser hatiye kirin di navbeyna ehlê fikr û vejenînê da.

Xaliqiyyet (sifetê xuliqandin û çêkirinê)

Piştî sabit bûna «wacib-ul wucûd» ku yêkemîn 'illet e ji peyda bûna mewcûdên «mumkin-ul wucûd» ra, û ev yêkê ku ew hemî di hebûna xwe da muhtacê Wî ne sifetê xaliqiyetê ji wacib-ul wucûd ra û sifetê «mexlûq bûnê» ji mumkin-ul wucûda ra derdikevê meydanê. Mefhûmê «xaliq» ku li ser esasê evê hebûnê tê dest, beraber e digel «'illetê jînder» û «çêker» û hemî mewcûdên mumkin û muhtac jî dikevin bin sifetê «mexlûq» ve.

Lêbelê carna kelîma «xelq - xuliqandin» bi me'nayekî sînor kirî da bikar tê û tenê ji wa tişta ra tên gotin ku ji madde ya pêşîyê hatîn çêkirin, û di muqabilê wê da mefhûmê «ibda'» ji wa tişta ra bikar tê ku ji maddeyek ya ji pêşda heyî çênebûbin (wek: tiştên mucerred û madda ewilî), û bi vî awayî çêkirin teqsîm dibê ser du qismên «xelq û ibda'ê».

Di her hal û karî da, çêkirina Xudê wek kar û çêkirinên mirovan

nîne; ku muhtacê hereket û bizav û istifade kirina ji qet û endamên bedenê bê, û hereket bibê «fi'l û kiryar» û desthata ji wê bibê «netîca fi'l û kiryarê»; û ne wereng e ku «xuliqandin» tiştek bê û «xulq bûyî» tiştek dî bê, çimko zêdeyê ji wê ku Xuda munezzeh e ji hereket û taybetî yên cisman, eger xuliqandina Xudê tiştek bûya ji zatê xulqîner cida, ew wê bibûya mewcûdek mumkin-ul wucûd, wê bibûya mexlûqek ji mexlûqên Xudê, wê gotin derheq çêkirina Wî da dubare bibûya. Belkî çewa ku di behsa sifetên fi'lî da hat gotin, ev sifetên he hinek mefhûm in ku ji sifet û nisbetên di navbeyna Xudê û mexlûqa da tên girtin û xwe girtina evê girêdan û nisbetê bi mulaheza 'eqlî çêdibê.

Rubûbiyyet

Ji wa tiştên ku ji girêdana di navbeyna Xudê û mexlûqan melheze dibê ev e ku mexlûq ne hema di çêbûna xwe da muhtacê Xudê ne belkî di hemî tiştên xwe da muhtacê Xudê ne û qet çi serxwebûnek ji wan ra nîne û Ew çewa bixazê ji wan istifade dikê û bikar dibê, û teybîra kar û rêve birina wan didê.

Teybîr dana kar û baran, ku dagirên tiştên jêrî ne: parastina wan û xwey kirina wan û dana saxî û jiyanê û mirandin û rizqdan û pêşda birin û gehandina kemalê û rênimûn kirin û emr û nehy kirin û ... mefhûmê rubûbiyetê ye.

Dagirên rubûbiyetê bi du bira tên teqsîm kirin: rubûbiyeta tekwînî; ku idare kirina hemî tiştî û rakirina ihtiyacî yên wa û di yêk kelîmê da «rêve birina 'alemê» digirê ber xwe. Û rubûbiyeta teşrî'î; ku mexsûsê mexlûqên xudan 'eql û xwey ixtiyar e, û meselên wek: rêkirina pêxemberan û şandina kitêbên 'esmanî û kifş kirina wezîfe û berpirsyarî û hukmdanê, digirê ber xwe.

Welhasil: rubûbiyeta Xudê bi vê me'nê ye ku: mexlûq bi hemî alî yên xwe ve bi Xudê ve girêdayî ne û ew girêdanên wan jî biheve dîsa li Xudê dizivirin û hema ew Xuda ye ku hinek ji

mexlûqên Xwe pê hineka idare û serast dikê û pê rizqê Xwe rizqxwaran xwey dikê û mexlûqên xwey 'eql bi rêka wesîle yên navdeyî (wek 'eql û ...) û pê wesîle yên eşkere (wek pêxember û kitêbên 'esmanî) rêrast dikê û ji wa yên mukellef û berpirsyar ra hukm û qanûnan datînê û wezîfe û erka wan kifş dikê.

Rubûbiyet jî wek xaliqiyetê mefhûmeke biheve girêdayî, pê vê ferqê ku di cî yên muxtelif da hinek girêdan û peywendên taybet di navbeyna mexlûqan bi xwe da jî melheze bûye, wek çewa me behsa «raziqiyetê» da gotî.

Pê hûr bûn û diqqeta di mefhûmê xaliqiyet û rubûbiyetê da tê kirin, evahe derdikevê meydanê ku: ew her du digel hev in û jêk venabin, û çênabê ku Rebbê 'alemê xêncî ji xaliqê wê bê, belkî hema ewê mexlûq bi taybetmendî yên wan ve çêkirî hema mefhûmê rubûbiyetê û teybîra rêve birinê ji çewaniya xuliqandina mexlûqan tê dest.

Ulûhiyyet

Derheq mefhûmê «ilah» û «ulûhiyetê» de xwey fikran gelek xeberdan û gotin gotine ku di kitêbên tefsîrê da hatîne nivîsîn. Me'na ku gorekî me ji me'na yên dî baştir e ev e ku: «ilah» bi me'na «ewê tê perêstin» an «ewê layiqê guhdan û 'ibadet» e, wek «kitab» bi me'na «ya nivîsînê û ewa bikêr nivîsandinê tê».

Anagora vê me'nayê, ulûhiyet sifeteke ku gereke girêdana wê bi 'ibadet û guhdana 'evdan ve jî bê melheze kirin. Û her çend jirêder û rêşaşan ji bona xwe hinek me'bûdên nedurust bijartine, lêbelê hema kesê layiqê 'ibadet û guhdanê ew e yê xaliq û rebbê wan e. Û gereke her kesî ev qas bawerî bi Xuda yê Te'ala hebê; yanî zêdetirê ji wî qasî ku Xudê wacib-ul wucûd û xaliq û xweyê cihanê zanê, gereke Ewî layiqê 'ibadet û guhdanê jî bizanê, û ji ber vê yêkê ye ku ev mefhûm di nîşana Islamê da hatiye danîn: «La îlahe illellah».

PIRSYARÊN DERSA 10

Girêdana sifetên zatî û fi'lî biheve beyan bikin û bêjin kanê çewa me'na wan li hevdu dizivirê.

Çi melhezê qeyd û bendên zemanî û mekanî ji sifetên fi'lî ra çêdibin?

Mefhûmê xaliqiyetê şîrove bikin û ferqa wê digel çêkirin û «ibda'ê» bêjin.

Çima mirov nikarê bêjê: "«xuliqandin» tiştek û mexlûqat bi xwe tiştek xêncî ji wê ye".

Mefhûmê rubûbiyetê beyan bikin.

Qismên rubûbiyetê şîrove bikin.

Çewa û bi çi şiklî xaliqiyet û rubûbiyet ji hev naqetin?

Mefhûmê ulûhiyetê beyan bikin, û bêjin kanê çewa ji xaliqiyet û rubûbiyetê cida nabê?

DERSA 11

SIFETÊN DÎ YÊN FI'LÎ

Dagirê:

Pêşekî

Irade

Hikmet

Kelam

Sidq (rastî)

Pêşekî

Yêk ji meselên 'ilmê kelam ku gelek cirekêş û qerqeşe li ser heyî, mesela irade ya Xudê ye, û ji çend milan ve got û bêj li ser heye, wek:

Gelo irade ji sifetên zatî ye an sifetên fi'lî?

Gelo qedîm e an hadis e?

Gelo irade hema yêk e an gelek in? û ...

Û evahe hemî xêncî ji wan behsên felsefî ne ku derheq iradê û nexasma irade ya Xudê da hatî kirin.

Behs û axiftina berfireh vê derheqê da nemunasibê vê kitêbê ye. Ji ber vê yêkê emê kêmekî behsa iradê bikîn û di pey ra jî bi kurtî ji irade ya ilahî baxivîn.

Irade

Kelîme ya «irade» di got û bêjê da kêmê kêm bi du me'na bikar hatiye: *yêk*- hez kirin, vîyan û xwestin. *Ya dî*: biryar dana ji kirina karekî ra.

Me'na ewil, berfirehtir e û dagirê hez kirina ji tişta[1] û karên xwe û karên xelkê ye. Bervajîyê me'na duwê ku hema tenê derheq karê mirov bi xwe da bikar tê.

Irade bi me'na ewil (mehebbet - vîyan) herçend di mirovan da wan haleta ye ku ji nefsê ra çêdibê û di nefsê da peyda dibê, lêbelê 'eql dikarê pê vale kirina wê ji alîyên neqs û kêmasîyê mefhûmek 'umûmî (giştî) bi dest ve bênê ku ji mewcûdên cewherî û heta ji Xudê ra jî bikar bê, çewa ku derheq «'ilm - zanîn»ê da jî wî karî dikê, û vê gorekê «hubb - vîyan» ku mehebbeta ilahî nisbet bi zatê Xwe li ber xwe digirê, çêdibê ku yêk ji sifetên zatî bê hesab kirin. Vêca eger mexsed ji irade ya Xudê, hez kirina kemalê bê ku di dereca ewil da bi kemala bê nihayeta ilahî ve digirhê û di mertebên pêretir da bi kemalên mewcûdên dî ve digirhê ji ber ku eserên kemala Wî ne, çêdibê ku ji sifetên zatî û qedîm û tek û zatê muqeddesê ilahî bi xwe bê.

Lêbelê irade bi me'na biryar danê ji kirina karekî ra, bê şik ji sifetên fi'lî ye ku bi melheza pêve girhana bi karê hadis û nûve qeyda zeman jê ra çêdibê, çewa ku di kar birina Qur'ana pîroz da jî hatiye, wek:

«إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ»

«Dema hebûna tiştekî bixazê, hema tenê evê dibêjitê ku: «çêbe», vêca di gavê da çêdibê» . Yasîn / 82

[1] - Wek: Enfal / 87- تريدون عرض الدنيا و الله يريد آلآخرة - Hewe heyiya dinyayê divê (hûn ji wê hez dikin) û Xudê axiretê dixazê.

Lêbelê gereke mirov hay ji vê yêkê hebê ku zanîna sifetên fi'lî ji Xuda ra ne bi wî me'nê ye ku guherînek di zatê Xudê da çêbê, an tiştek têda peyda bibê, belkî bi vê me'nê ye ku nisbetek di nav Xudê û mexlûqên Wî da bi awayek xas û taybet û di şert û mercên kifş da tê melheze kirin û mefhûmek taybet ku yêk ji sifetên fi'lî ye derdikevê meydanê.

Derheq iradê da ev girêdan tê melheze kirin ku her mexlûqek ji ber ku xêr û kemal û meslehetek têda hebûye hatiye çêkirin, nixwe hebûna wê di zeman û mekanek taybet û an çewaniyek mexsûs da bi zanîn û hez kirina Xudê ve girêdayîye û bi vîyana Xwe, ew çêkiriye û xuliqandiye, ne ku kesekî ew mecbûr kiriye. Melheza evê peywendê dibê sebeb ku mefhûmek bi navê «irade» derkevê, ku ji alîyê peywend û pêve girêdana bi tiştek sînordar û muqeyyed ve hatiye qeyd û bend kirin, û hema ev mefhûm e ku wesfê «hudûs - nû» û «kesret - zehfî» jêra çêdibê, çimko «izafe» pêve girêdayê du alîya ye, û «hudûs û kesret»a yêk ji du alîya bes e ji wê çendê ra ku ev wesf di «izafe» yê da çêbin.

Hikmet

Ji wê gotina derheq irade ya Xuda da hatî gotin, hat zanîn ku ev irade bê hesab û kitab bi tiştekî ve nagirhê, belkî pêve girhana irade ya Xudê bi tişta ve ji alîyê kemal û başî ya wan ve ye. Çimko tezahuma (li ber hev rawestan û berberekanî ya) maddiyata dibê sebebê neqs û ziyanê ku hinek ji hinekan ra tînin pêş, desthata mehebbeta ilahî ji kemalê ra ew e ku çêbûna ewan pêkve bi awayekî bê ku başî û kemalek pitir ji wan ra hebê, û pê li ber hev girtina ewan peywend û girêdanan mefhûmê «meslehet»ê destve tê; eger ne, meslehet tiştekî cidayê ji hebûna mexlûqan nîne ku tesîrek hebê li ser çêkirina wan, vêca çi bigehê wê ku di irade ya ilahî da eser hebê.

Welhasil: çimko serkanî ya karên Xudê ji sifetên Wî yên zatî wek: zanîn û karîn û mehebbeta ji kemal û başîyê ne, her û her bi awayekî pêk tên ku meslehet têda hebê, yanî gelektirîn kemal û başî têda hebê, û iradeyek bi vî awayî jêra tê gotin «irade ya hekîmane» û ji vêderê sifetek dî di meqamê fi'l û karê da ji Xuda ra derdikevê bi navê «hekîm/şehreza» ku wek sifetên dî yên fi'lî li sifetên zatî tên zivirandin.

Elbet gereke bê zanîn ku kirina kar ji ber meslehetê ne bi vê me'nayê ye ku meslehet sebeb û 'illetê xayî (nihayî) ye ji Xuda yê Te'ala re, belkî awayekî yê hedef û amanca çiqî û tebe'î ye, û 'illetê xayî yê eslî ji kirina kara re hema ew mehebbete ku ji kemala bê nihayet ya zatî ra heye û di pey ra ji eserên wê ra, yanî kemala mewcûda ra jî çêdibê, û hema ji ber vê ye ku tê gotin: 'illeta xayî ji karên xudayî ra hema 'illeta fa'ilî ye û Xuda hedef û tiştek zêdetirê ji zat nîne. Û evê gotinê dijatî tune digel vê çendê ku kemal û başî û mesleheta mewcûdatan çiqî û tebe'î bê hesab kirin. Û hema bi vê me'nayê ye evahe ku di Qur'ana pîroz da karên Xudê bi wa tişta ve hatine girêdan ku zivirîngeha hemiyan kemal û başî ya mexlûqa ye, çewa ku imtihan kirin, û bijartina baştirîn kara, û 'evdîtî ya Xudê û gehana rehmeta taybet û her heyî ya Xuda[1] ji bona hedefên xuliqandina insan hatine gotin ku bi tertîb, her yêkî ji va çara pêşekî ye ji ya dî ra.

Kelamê Xudê

Yêk ji mefhûmên nisbeta wê tê dayîn bal Xudê ve mefhûmê «tekellum» û xeberdanê ye. Ji kevin da zanayên 'ilmê kelam derheq kelamê Xudê da xeber dane û hatiye gotin sebebê nav lê kirina «'ilmê kelam» bi vî navî hema ev e ku zanayan li ser

[1] - Binêrin: Hûd / 7; Mulk / 2; Kehf / 7; Zariyat / 56; Hûd / 108 û 109; Casiye / 23; Alê 'Imran / 15; Tewbe / 72.

kelamê Xudê xeber dane. Eş'eriyan ew ji sifetên zatî hesab kirine û Mu'teziliyan ji sifetên fi'lî zanîne. Û yêk ji meselên ku ixtilafek dijwar di nav zanayên kelamî da li ser hatî kirin hema ev bûye, gelo Qur'an ku kelamê Xudê ye mexlûq e an ne mexlûq? Û heta çêbûye ku cara ji ber vê meselê hevdu kafir bikin!

Piştî wê gotina derheq sifetên zatiye û fi'liye da hatî gotin mirov rihet fêhm bikê ku xeberdan (tekellum) ji sifetên fi'lî ye ku gereke ji derketina wê ra muxatebek [= ew kesê berê xeberdanê lê] hebê da ku pê guhlê bûna deng, an dîtina nivîsokê, an mefhûmekî di zêhnê xwe da û an bi awayek dî mexseda wî yê xeber didê bizanê û pê bihesê. Û di heqîqet da ev mefhûm ji peywend û girêdana navbeyna Xudê [ku dixazê tiştekî bidê zanîn] digel muxatebê ku dixazê ewê fêhm bikê derdikevê meydanê. Illa ku ji «xeberdan - tekellum»ê ra me'nayek dî berçav bê girtin, mesela, bê gotin ku: mexsed ji «xeberdan»ê ev e ku: dikarê xeber bidê, an ev e ku: zanê xeberdan çi ye û çewa tê xeberdan; eger ev bê, hingê li sifetên zatî dizivirê; wek çewa pêşda derheq hinek dî ji sifetên fi'lî hat axiftin.

Û Qur'an jî, bi me'na nivîsîn û kelîme û mefhûmên di zêhnê mirov da heyî, an heqîqeta nûranî û mucerreda wê, ji mexlûqa ye, lêbelê eger kesek heqîqeta Qur'anê 'ilmê zatî yê Xudê hesab bikê hingê dizivirê bal sifetê zatî yê «'ilm - zanîn»ê ve. Lê ev tewîlat derheq kelamê Xudê û Qur'ana pîroz da û ... ji 'urfa gotûbêjê der e û gereke mirov jê dûr bikevê.

Sidq - rastî

Xeberdana Xudê eger bi şiklê emr û nehy û inşa bê, ji xwe wezîfa kiryarî ya 'evdan nîşan didê û ne cihê sidq û kizbê ye. Lê eger bi şiklê xeberdana ji rastî û heqîqetên heyî an qewimînên borî û hêj nehatî bê hingê sifetê «sidq - rastî - durustî» jêra tê –

çewa ku Qur'ana pîroz dibêjê:

« وَمَنْ أَصْدَقُ مِنَ اللّهِ حَدِيثًا »

"Ma kî ji Xudê rastgotir e". Nisa / 87.

Ev sifet (sidq) dergehê awayek dî yê delîl anînê (istidlala neqlî û te'ebbudî) ji me re vedikê ku pê wê gelek meselên çiqî yên cihanbînîyê û gelek ji meselên îdeolojîyê isbat dibin.

Yêk ji delîlên 'eqlî ku çêdibê ji sabit kirina vî sifetî ra bê anîn ev e ku: xeber dana Xudê ji karên xudayî ye ji bona teybîr dana kar û barê cihan û mirovan, û li ser esasê zanîn û şehrezayîyê û ji bona hidayet û rêrast kirina mexlûqan û nasînên durust e, û eger rêk neketina wê digel durustîyê çêbê û imkan jêra hebê hingê mirov jê piştrast nabê û hingê dibê «neqza xerezê / jinav birina hedef û amancê» û ew xilafê hikmeta ilahî ye.

PIRSYARÊN DERSA 11

Irade ya Xudê bi kîjan me'nayê ji sifetên zatî ye û bi çi me'nayê ji sifetên fi'lî tê hesab kirin?

Bi me'na sifetê fi'lî, ji deranîna mefhûmê iradê ra çi girêdanek di navbeyna Xudê û mexlûqan da berçav tê girtin?

Irade ya ilahî çewa bi «hudûs» û «kesret»ê tê wesf kirin.

Hikmeta ilahî beyan bikin.

Mefhûmê «meslehet»ê çewa tê dest?

Bi çi me'nayê mirov dikarê meslehet û xeyr û kemalê hedefa xilqetê bizanê?

Kelamê ilahî şîrove bikin.

Delîla 'eqlî li ser «sadiq - rastbêjî» ya Xudê beyan bikin.

DERSA 12

VEJENÎNA SEBEBÊN XWEHRÎYÊ

Dagirê:

Pêşekî

Sebebên xwehrî û rêşaşîyê

Sebebên rûhî û rewanî

Sebebên komelayetî (ictma'î)

Sebebên fikrî

Şerê digel sebebên xwehrîyê

Pêşekî

Di dersa yêkê da hat gotin ku bi şiklekî giştî mirov dikarê cihanbînîyê li ser du qisman teqsîm bikê (cihanbînî ya ilahî û ya maddî) û muhimtirîn ixtilafa ku di navbeyna wan da heyî mesele ya hebûna xaliqek zana û kara ye, ku cihanbînî ya ilahî, ewê eslê esasî û binyatî qebûl dikê û cihanbînî ya maddî ewê inkar dikê.

Di dersên derbaz bûyî da qasê ku li heddê vê kitêbê da bû me derheq hebûna Xudê û muhimtirîn sifetên selbî û subûtî û zatî û fi'lî yên ilahî xeber da, û niha jî ji bona qahîm kirina baweriya bi vî eslê binyatî emê bi kurtî cihanbînî ya maddî vejenîn da pê

cîgirî û qahîmî ya cihanbînî ya ilahî, sistî û bê xîmî ya cihanbînî ya maddî bixweyhê.

Ji bona vê yêkê ewil emê behsa sebeb û 'illetên xwehrî û ladana ji bîr û hizra ilahî û meyl kirina bal ilhadê ve bikîn û di pey ra emê ji muhimtirîn nuqtên ze'êf bûna cihanbînî ya maddî baxivîn.

Sebebên xwehrî û rêşaşîyê

Ilhad û maddîtîyê borîyek dirêj di tarîxa beşer da heye, û digel wê çendê ku di nav komelên beşerî de [gorekî nîşan dan û şahidên tarîxî] bawerîya bi Xudê her hebûye, ji kevin da mirov û komên ku inkara Xudê jî bikin (mulhid - ehlê ilhadê) hebûne. Lêbelê rewac û belav bûna bêdînîyê ji sedî hejdê mîladî da ji Ewrûpayê destpê kir û kêm kêm li 'alemê belav bû.

Ev tişt herçend bi şiklê dijatîya digel dezgahê kilîsayê û li dijê Filetîyê da destpê bû; lêbelê pêlên wê dîn û mezhebên dî jî li ber xwe girtin û meyla bêdînîyê hevrê digel sen'et û huner û teknolojî ya rojavayê ser 'erd û welatên dî da girt û di vî sedê paşîn da tevlî bîr û hizrên komelayetî û iqtisadî yên marksîzmê di gelek welata da belav bû û mezintirîn afet ji mirovanîyê ra anî pêş. Sebeb û egerên zêde kirin û berfirehîya evê fikra xwehr û xelet pir in, û vejenîna hemiyan muhtacê nivîsîna kitêbek cida û serbixwe ye[1] lêbelê mirov dikarê ji sê birên sebeba baxivê:

1- Sebebên rûhî û rewanî: yanî ew sebeb û palderên di mirov da heyîn û bêy wî qasî ku agahî ji tesîra wê hebê, ewî pal bidê ji bêdînî û ilhadê ra, û muhimtirînê wan pey ketina rihetîyê û meyla bê qeyd û bendîyê û bê mesûliyetî û bê berpirsyarî ye.

[1]- Ustadê şehîd Murteza Mutehherî hinek ji van sebeban axiftiye di kitêba «'Ilelê girayiş bi maddîgerî» da.

Yanî ji alîyekî da naçê bin barê tehqîq û lêkolînê da [nexasma derheq wa kara de ku lezzeta maddî û berçav têda neyî] û evahe pêşîyê li mirovê tembel û rihetîxaz û sisthimmet digirê û nahêlê tehqîq û vejenînê bikin, ji alîyê dî ve jî meyla bi azadî ya heywanî û bê qeydî û bê mesûliyetî ewa ji pêve girhana cihanbînî ya ilahî paşve didê. Çimko qebûl kirina bîr û hizra ilahî û bawerîya bi xaliqê şehreza û Xuda yê hekîm reh û rîşe ye ji bona zincîre bawerî yên dî ku desthata wê mesûl û berpirsyar bûna insan e di hemî kar û barên ixtiyarî da, û ev berpirsyarî dikê lazimê xwe ku ew di gelek cihan da çavê xwe li xwest û vîyanan bigirê û hinek qeyd û sînoran qebûl bikê û qebûl kirina eva hudûda digel meyla beredayî bûn û bê qeyd û bendîyê rêk nakevê. Ji ber vê yêkê ev meyla heywanî herçend agahî jê nebê, dibê sebeb ku ew reh û rîşa va mesûliyet û berpirsyariya hilkê û ji binî ve hebûna Xuda yê Te'ala inkar bikê.

Hinek sebebên rûhî û rewanî yên dî jî li bêdînîyê da esera xwe hene ku di pey sebebên dî ra derdikevin.

2- Sebebên komelî: yanî rewş û halê civakî yên ne durust ku di nav hinek kom û ictima'an da peyda dibin, ku bi awayekî tesîra pêşkarên dînî ji peyda bûn an zêde kirin û berfireh kirina wan ra heye. Di van şert û mercan da gelek ji xelkê ji nezer fikr kirina 'eqlanî ve ze'êf û lawaz in û nikarin meselan bi durustî ji hev biqetînin û vejînin û sebebên durust yên eva qewimîna bizanin û pê bihesin; û ji ber ku dîndaran têkelî û dexalet hebûye di pêş hatina wa nexweşî û nerihetiyan da, ewa têxin ser hesaba dîn û wereng guman dikin ku bawerîyên dînî bûne sebeb heta ev rewş û halê nexweş çêbê û vêca ji ber wê yêkê ji dîn û mezheb direvin û xwe jê didin paş.

Nimûne yên eşkere ji van sebeban mirov dikarê di wez' û halê komelayetîyê Ewrûpa da di zemanê «Ronesans»ê da bibînê, ku

me'emilet û reftara ne durusta ehlê dêr/kilîsayê derheq meselên dînî û huqûqî û siyasî da bû sebebek muhim û gir ji wê çendê ra ku xelk ji Filetîyê û bi awayek giştî ji dîn birevin û jê dûr bikevin.

Ew kesên ku kar û barê dînî dest wan da ye, lazim e gelek hay ji vê zincîre ya sebeba hebin û bi muhimmî ya birpirsyarî ya xwe bihesin û bizanin ku şimitînên wan dikarê bibê sebebê ji rêderî û bextreş kirina xelk û komelê.

3- Sebebên fikrî: yanî wehm û şubhe yên ku ji mirov ra çêdibin an ji hinek dî guhlê dibin û ji ber ze'êfî û lawazî ya hêza fikr kirin û delîl anînê nikarin cewabekî durust ji wan ra peyda bikin û dikevin bin tesîra wê da, û kêmtirîn tişta ku hingê diqewimê ew e ku mejîyê wî dikevê qeleq û şaşîyê û nikarê bigehê bawerî û dilrihetî û yeqînê.

Ev deste ya ji sebeba jî vêca bi çend awaya ne, wek şubhe yên ji palgeha hissê çêdibin û şik û şubhe yên ji bawerî yên xurafî û ne durust derdikevin meydanê û şubhe yên ku ji ber şîrove kirinên ne durust û delîlên ze'êf peyda dibin û şubhe yên ku ji ber qewimînên nexweş ku guman tê birin xilafa hikmet û 'edaleta Xudayî ye peyda dibin û şubhe yên ku ji ber ferziyeyên ‘ilmî yên ku li dijê bawerî yên dînî çêdibin û her wiha ew şubhe yên ku derheq hinek ji hukmên dînî da çêdibin nexasma di meselên huqûqî û siyasî da.

Carna jî du an çend sebeb digel hev dibin sebebê şik û dudilîyê an inkar û ilhadê, her wiha carna rêk û pêk nebûnên rûhî û rewanî rê ji şubhe û ewhama ra vedikin û nexweşiya rûhî «weswasa fikrî» çêdikin û netîce dibê ev ku ewê nexweş pê çi delîl û burhanekî razî nabê û qebûl nakê, wek çewa weswasîyê di karan da bawer nakê û piştrast nabê ji durust pêk anîna karê ku kiriye; meselen, deh - bîst caran destê xwe dişo, lê dîsa ji pakî ya wê piştrast nabê, halhale we heye ji ewil da pak bê û niyaz û ihtiyac bi pak kirinê tunebê!

Berberekaniya gel sebebên nedurustîyê

Çewa ku sebebên xwehrî û nedurustîyê zehf in, wereng berberekaniya digel wan jî ne yêk e û her yêkî awayê xwe yê taybet heye û gorekî şert û mercan ferq dikê. Meselen 'illet û sebebên rûhî û exlaqî gereke pê perwerde kirina durust were derman kirin, çewa ku di dersa 2 û 3 da lazimî ya tehqîqa derheq dîn da û zererên ku ji ber terka wê ser mirov da tên hat xeberdan.

Derheq sebebên komelayetî da [xêncî ji pêşî girtina wan] gereke ferqa di navbeyna nedurustî ya dîn û ya nedurustî ya kar û me'emileta dîndaran ji hev were qetandin û ronahî bibê. Û ji pêşî girtina sebebên fikrî ra gereke awayên durust bikar bên ku yêk ji wan ev e: bawerî yên xurafî û bê binyat ji bawerî yên durust bên veqetandin û yêk dî ev e ku mirov xwe biparêzê ji delîl anîna ze'êf û ne mentiqî ji bona sabit kirina bawerî yên dînî û gereke bê ronahî kirin ku ze'êf û lawaz bûna delîlê ne nîşana nedurustî ya ewê bîr û hizrê ye û ...

Lêkolîn û vejenîna hemî sebebên inhiraf û xwehrîyê û beyana hemî awayên berberekanî ya digel wan li vêderê çênabê. Emê li dersa hêj bê da behsa hinek ji wan bikîn û cewaba şubhan bidîn.

PIRSYARÊN DERSA 12

Çi feyde di vejenîna cihanbînî ya maddî da heye?

Meyla bêdînî (ilhadî) yê di sedên paşî da çewa berfireh bû?

Sebebên rûhî yên xwehr bûna ji dîn şîrove bikin.

Sebebên fikrî û çiqên wê beyan bikin.

Weswasa fikrî çewa çêdibê?

Rêka berberekanî ya digel sebebên inhiraf û xwehrîyê çi ye?

DERSA 13

CEWABA ÇEND ŞUBHAN

Dagirê:

Bawerîya bi mewcûdê nemehsûs

Tirs û nezanîn, û bawerîya bi Xudê

Gelo eslê 'illiyetê eslek kullî ye?

Desthatên ‘ilmên komelayetî

Baweriya bi mewcûdê nemehsûs

Yêk ji şubhên sade derheq Xudê nasîyê de ev e ku çewa mirov dikarê hebûna tiştekî bawer bikê halhale pê hissê nayê idrak kirin?

Ev şubhe di zêhnê mirovên sade da heye, lêbelê hinek xwey fikr jî peyda bûne ku binyata fikrî ya xwe li ser esasê «isaleta hissê» ava kirine û mewcûdê nemehsûs inkar kirine an dibêjin derheq wa da mirov nikarê bigehê yeqînê.

Cewab ev e ku idrakên hissî pê peywend û rabite ya qetên bedenê digel cisman û tiştên cismanî çêdibin û her yêk ji hissên me hinek ji tiştên maddî yên munasibê xwe di hinek şert û mercên taybet û xas da idrak dikê û çewa ku mirov, ne berhêvî

ye ku çav denga guhlê bibin û guh renga bibînin; her wereng gereke mirov ne berhêvî bê ku hissên me pêkve hemî tiştên heyîn idrak bikin û pê bihesin.

Çiko di nav tiştên maddî da jî hinek tişt hene ku hissên me nikarin pê bihesin, çewa ku hissên me nikarên nûrên "mawerayê binefş" û "madûnê sor" û pêlên elektironîkî û ... idrak bikin.

Xêncî ji wê jî gelek ji heqîqetan hene ku em ne bi rêka hewasên xwe ve pê dihesin û idrak dikin, û em baweriyek yeqînî bi wan peyda dikin herçed hiss nikarê ewa idrak bikê. Mesela, em xeberdar în ji haletê tirs û mehebbet û xwest û biryarên xwe û me baweriyek yeqînî bi hebûna wa haletan heye; halhale ev haletên rûhî wek rûhê bi xwe pê hissan idrak nabin û hema «idrak – pêhesan» bi xwe jî ji tiştên ne maddî û ne mehsûs e.

Nixwe evahe ku mirov pê qet û endamên hissî tiştekî idrak nekê û pê nehesê, ne hema nabê delîl ji nebûna wê tiştê ra belkî ne cihê 'ecêbîyê ye jî û gereke mirov hebûna wê dûr jî nezanibê.

Tirs û nezanîn û baweriya bi Xudê

Şubheyek dî ku ji alîyê komelnasan ve hatiye gotin evahe ye ku: baweriya bi hebûna Xudê ji ber tirsa ji xeteran, nexasma xeterên ji ber zelzele û sa'iqe û ... çêbûye. Û (haşa) beşer ji rihetiya xwe ya rûh û rewan ra tiştek xeyalî bi navê Xudê çêkiriye û 'ibadetê wî dikê. Û ji ber vê yêkê çiqas sebebên tebî'î yên tişta û rêka xwe xilas kirina ji xeteran zehftir bên nas kirin, baweriya bi Xudê ze'êftir dibê.

Marksîst evê şubhe yê berfireh û germ û nerm bi navê desthatek ya «'ilmê komelnasî»yê di kitêbên xwe da dinivîsin û ewê dikin wesîleyek ji xapandina mirovên ne agah ra.

Di cewabê da lazim e bê gotin ku:

Yêk- binyata vê şubhê hizrek ya hinek ji komelnasa ye ku avêtine meydanê û çi delîlên ‘ilmî li ser durustî ya wê tunehin.

Du- hema di vî zemanî da gelek ji xwey fikrên mezin ku ji yên dî pitir agah in ji sebebê tiştên heyîn û ewa baweriyek qet'î û yeqînî heye bi hebûna Xuda yê Hekîm.[1] Nixwe ne we ye ku bawerî ya bi Xudê ji ber tirs û nezanînê bê.

Sê- eger tirsa ji hinek qewimînan an nenasî ya digel 'illetên tebî'î yê hinek tişta bibê sebeb ku berê mirov bikevê Xudê, ev wê me'nê nadê ku Xudê ji tirs û nezanî ya mirov peyda bûye, çewa ku gelek ji balgehên rûhî wek xweşxazî û pey ketina meşhûr bûnê û ... bûne sebebê xebatên ‘ilmî û fennî û felsefî, lêbelê çi zerer li i'tibara wan nedane.

Çar- eger hineka Xuda pê navê çêkerê tiştên ku 'illetê çêbûna wan ne kifş e nas kiribin û heta eger pê kifş bûna 'illetên tebî'î yên wan ji îmana wan kêm bûbê, gereke ew nîşan bê ji ze'êfî ya îmana wan ra; ne ku delîl bê ji bê i'tbarî ya bawerî ya bi Xudê, çimko heqîqet ev e ku 'illiyeta Xuda ji tişta ra ne bi pêka 'illetên tebî'î ye û ne tiştek wek wa ye, belkî 'illiyeteke berfirehtir û di dirêjîya hemî 'illetên maddî û xeyrê maddî da ye ne di kêleka wa da.[2] Û nas kirin û nas nekirina 'illetên tebî'î tesîrek di isbat an nefy kirina wê da nîne.

Gelo eslê «'Illiyyet»ê eslek giştî û kullî ye?

Şubheyek dî ku hinek ji zanayên rojavayê avêtine meydanê ev e ku: eger eslê 'illiyetê kulliyet jêra hebê gereke ji Xudê ra jî 'illiyet û sebebek berçav bê girtin, halhale ferz ew e ku ew 'illeta

[1]- Wek: Enîşteyn û Kirsî Murîs û Elksîs Karl û giregirên zanayan ji xêncî wan ku gotinên wan derheq hebûna Xudê da hene û hinek ji wan gotinan di kitêba «Isbatê wucûdê Xuda» da hatine berhev kirin.

[2] - Di dersên hêj bên da emê vê derheqê da pitir baxivîn.

yêkemîn e û Ewî bi xwe çi 'illet nînin. Nixwe qebûl kirina Xuda yê bê 'illet şikandina qanûna 'illiyetê ye û delîl e li ser kullî nebûna wê , û eger em kulliyeta wê qebûl nekîn ji xwe hingê em nikarîn ji sabit kirina «wacib-ul wucûd» ra ji vî eslî istifade bikîn. Çimko hingê çêdibê ku kesek bêjê eslê madde an enerjî bi xwe bi xwe û bê 'illet û sebeb çêbûye û guherîna di wê da bûye sebebê peyda bûn û çêbûna tiştên dî.

Ev şubhe [çewa ku di dersa heftê da hat gotin] ji ber şîrove kirina ne durusta eslê 'illiyetê çêbûye. Yanî wiha guman kirine ku me'na wê ev e ku: «her tişt muhtacê 'illetê ye» halhale gotina durust ev e ku: «her mumkin-ul wucûd» an: heçî tişta muhtac û niyaz heyî muhtacê 'illetê ye, û evahe qanûnek kullî (giştî) û lazim e û qet çi tişt ji ber dernakevê (istisna jêra tune).

Emma ev gotin ku eslê madde an enerjî bêy 'illet çêbûye û guherînên wê bûye sebebê peyda bûna tiştên dî yên cihanê, evahe gelek xeletî tên ser ku di dersên hêj bên da emê jê baxivîn.

Desthatên ‘ilmên tecrubî

Şubheyek dî ev e ku bawerî ya bi xaliqê cihan û insan, digel hinek ji desthatên ‘ilmên cedîd rêk nakevê.

Mesela, di ‘ilmê kîmiya da sabit bûye ku qasê maddê û enerjî yê her û her sabite û gorekî vê qet tiştek jî ji tunebûnê çênabê û çi tişta heyî jî bi temamî ji nav naçê, halhale Xudêperês ser wê bawerîyê ne ku Xudê mexlûq ji tunebûnê çêkirine û hebûn daye wan.

Her wiha di jîn nasîyê da sabit bûye ku tiştên sax ji tiştên bê can çêbûne û kêm kêm guherîn ketiye wan û kamil bûne heta ku bûye insan, halhale bawerî ya Xudê perêsan ew e ku Xudê ew cuda cuda çêkirine.

Cewab ev e:

Yêk- qanûna mayîna (beqa ya) madde û enerjîyê ku qanûnek ‘ilmî û tecrubî ye, tenê derheq wa tişta da bikêr tê ku tên tecziye kirin . Û mirov nikarê evê mesela felsefî cewab bidê ku gelo: madde û enerjî ezelî û ebedî ye an ne?

Du- her hebûn û sabit bûna miqdarê madde û enerjîyê, ne bi vê me'nê ye ku ew ne muhtacê xaliq û çêkerekî ye, belkî çiqas 'emrê cihanê dirêjtir bê niyazek pitir heye ji xaliq ra, çimko milak û pîveka niyaza me'lûl bi 'illetê imkan û pêve girêdana zatî ya wê ye ne hudûs (çêbûn) û mehdûdî ya zemanî ya wê .

Bi gotinek dî: madde û enerjî 'illeta maddî ya cihanê pêk tînin ne 'illeta wê ya fa'ilî (û çêkirinê) û ew bi xwe jî muhtacê 'illeta fa'ilî ne.

Sê- sabit mayîna miqdara madde û enerjîyê peyda bûna tiştên nû û çêbûna kêm û zêdahîyê di wan da nefy nakê û tiştên wek rûh û saxî û fêhm û irade û ... ne ji qismê madde û enerjîyê ne da kêm û zêdahiya di wan da dijatî hebê digel qanûna mayîna madde û enerjîyê.

Çar- ferziya tekamulê [xêncî ji wî qasî ku piştrastiyek ‘ilmî ya kafî jêre nîne û gelek ji giregirên zanaya ew durust nezanîne] dijatî digel baweriya bi Xudê nîne, û zêdetirîn karê dikê ew e ku 'illiyetek ya hazir kirinê (i'dadî) di navbeyna mewcûdên sax da isbat dikê ne ku girêdana wan bi Xuda yê jînder ve nefy dikê. Û şahidê vê gotinê jî ew e ku gelek ji qebûlkerê evê ferziye û hizrê, bawerî hebûne bi Xuda yê xaliqê cihan û insan.

PIRSYARÊN DERSA 13

Fikra hissî û inkara tiştên ne mehsûs çi xeletî tên ser?

Ewên guman kirîn serkanî ya bawerî ya bi hebûna Xudê tirs û nezanî ya beşer e, çi nedurustî di gotina wan da heye?

Gelo bawerî ya bi hebûna Xudê digel kullî bûna eslê 'illiyetê munafat heye û hev nagirin? Çima?

Qanûna beqa û mayîna madde û enerjîyê munafat heye gel bawerî ya bi xaliqê cihan? Çima?

Ferziya tekamulê bawerî ya bi hebûna Xudê betal kiriye û ji kar êxstiye? Çima?

DERSA 14

CIHANBÎNÎ YA MADDÎ Û VEJENÎNA WÊ

Dagirê:

Eslên cihanbînî ya maddî

Vejenîna eslê ewil

Vejenîna eslê duwê

Vejenîna eslê sisê

Vejenîna eslê çarê

Eslên cihanbînî ya maddî

Mirov dikarê ji cihanbînî ya maddî ra eslên jêrî berçav bigirê:

Yêk- evahe ku hebûn beraber e digel madde [1] û maddiyata û mirov ji wê tiştê ra dikarê bêjê heye ku an madde bê û xasiyetên maddê (dirêjî û pehnî û stûrî) têda hebin û an taybetî yên maddê têda hebin û ew jî wek maddê çewanî jêra hebê û bê teqsîm kirin li ser piçan. Li ser esasê vê eslê hebûna Xudê ji ber ku ne heyîyek maddî ye û ser tebî'et ra ye tê inkar kirin.

---

[1]- Derheq te'rîfa maddê da binêrin «Pasdarî ez sengerhayê îdeolojîk» cihanbînî ya maddî, rûperê 297 - 292. Û «Amûzişê felsefe» c. 2, dersa 41.

Du- evahe ku madde ezelî û ebedî ye û nehatiye çêkirin û ihtiyac bi hebûna çi 'illetan nîne; û gorekî istilaha felsefî: «wacib-ul wucûd» e.

Sê- ji cihanê ra hedef û 'illetek nihayî (xayî) nîne, çimko çêkerê bi fikr û irade jêra tune ku mirov bikarê jêra hedefekî hesab bikê.

Çar- evahe ku tiştên di cihanê de (ne eslê maddê) ji ber cî guhaztina piç û zerre yên maddê û esera wan li ser hevdu çêdibin û peyda dibin, û ji ber vê yêkê mirov dikarê ewa tiştên pêş da heyîn bi awayekî şert û 'illetê hazirker (i'dadî) ji yên paşê çêdibin ra hesab bikê, û pirtirîn tişta ku mirov qebûl bikê ev e ku di navbeyna maddîyata da awayek yê fa'iliyeta tebî'î heye, mesela ku dar, fa'ilek tebî'î bê ji fêkî ra an tiştên fîzîkî û kîmiyayî werin nisbet dan bal karkerên wa ve, lê qet tiştek jî ne muhtacê fa'ilê ilahî û jînder e.

Eslek yê pêncê jî mirov dikarê li eslên jorî zêde bikê ku girêdayî ye bi behsa «nasîn nasîyê» ve û ji nezerekî ve pêşiya eslên dî da ye, ew jî ev e ku: tenê ew nasîn cihê piştrastîyê ye ku ji tecruba hissî bi dest ve hatibê, û çimko tecrube yên hissî, tenê hebûna madde û maddiyata sabit dikê, hebûna tiştek dî qet nayê qebûl kirin.

Lêbelê ne durustî ya vî eslî di dersa derbaz bûyî da [1] eşkere bû û niyaz nîne carek dî bê vejenîn, lewmanê emê hema eslên dî bêxîn ber vejenînê:

Vejenîna eslê ewil

Ev esl ku binyatîtirîn eslê cihanbînî ya maddî ye, ji gotinek xurtî û bê delîl pêve ne tiştek dî ye, û qet çi delîl û burhan ji bona nefya

[1] - Binêrin: «Îdeolojî yê tetbîqî» dersa 8-16. û «Amûzişê felsefe», dersa 13- 18.

mawerayê tebî'et nikarin hebin: nexasma li ser binyata «me'rîfet nasî» ya matiryalîstî ku li ser isaleta hiss û tecrubê ava bûye. Çimko gelek ronahî ye ku qet çi tecrube yên hissî nikarin ji heddê xwe zêdetir ku madde û maddiyat in, zêdetir biçin û nikarin xwe têkel tiştek dî bikin û ewê sabit an nefy bikin. Pirtirîn tişta ku mirov dikarê li ser esasê mentiq û gotina hissî bêjê ev e ku: gorekî wê mirov nikarê tiştekî ser tebî'et ra sabit bikê, nixwe kêmê kêm gereke ihtimal bidin ku ew heye.

Û pêş da me got gelek tiştên ne maddî ku taybetî yên maddê di wan da nîne, wek rûh hene ku mirov dikarê pê 'ilmê huzûrî ewa idrak bikê û pê bihesê, û her wiha delîlên zehfî yên 'eqlî hene li ser hebûna tiştên mucerred ku di kitêbên felsefê da hatine nivîsîn. [1]

Û ji baştirîn şahid û delîlên li ser hebûna rûhê mucerred, xewnên rast û gelek ji karên "murtazan" û her wiha mu'cize û keramatên pêxemberan û welîyên Xuda ne (selamên Xuda li ser wan bin). [2] Di her halî da, ew delîlên ji hebûn Xudê û cism nebûna Wî ra heyîn [3] ji pûç kirina vî eslî ra bes in.

Vejenîna eslê duwê

Di vî eslî da xwe şidandine li ser vê yêkê ku madde her hebûye û wê her hebê (ezelî û ebedî ye) û nehatiye çêkirin. Vê derheqê da gereke bê gotin:

Yêk- ezelî û ebedî bûna maddê pê çi delîlên 'ilmî û tecrubî sabit nabê, çimko sînorê tecrubê hudûd kiriye û çi tecrube nikarin bê nihayetî ya cihanê ji alîyê cî û wext ve (zeman û mekan) sabit bikin.

---

[1] - Binêrin: «Îdeolojî yê teblîqî» dersa 8-16. û «Amûzişê felsefe», dersa 13-18.
[2] - Binêrin kitêba «Neqdî fişurde ber usûlê Marksîsm» dersa 2.
[3] - Binêrin: dersa 7 û 8 ji vê kitêbê. û «Amûzişê felsefe»; dersa 62 û 63.

Du- ferza ezelî bûna maddê, ewê ji hebûna xaliq bê niyaz nakê, wek çewa ku hereketa mîkanîkî ya ezelê dikê lazimê xwe ku hêz û quweta ezelî ku ewê rê bêxê hebê; ne ku bê ihtiyac bê ji hêza ku ewê rê bêxê.

Xêncî ji vê jî evahe ku bê gotin madde nehatiye çêkirin bi wê me'nê ye ku ew «wacib-ul wucûd» e û me di dersa heştê da sabit kir ku çênabê madde wacib-ul wucûd bê.

Vejenîna eslê sisê

Eslê sisê inkara xwey hedef bûna cihanê ye ku desthata tebî'î ya wê, inkara xaliq e. Û pê sabit bûna hebûna Xuda yê hekîm û şehreza hema ji binî ve ev esl pûç dibê.

Xêncî ji vê jî cihê evê pirsyarê heye ku: çewa mirovê 'aqil pê dîtina evê cihana hevgirtî û 'ecêb û rêk ketina heyî yên wê digel hev û ... bi hedefdarî ya cihanê nahesê?!

Vejenîna eslê çarê

Eslê çarê ev e ku dibêjê: 'illiyet hema ew e di peywenda maddî ya tişta da heyî û ne zêdetir. Işkal û xeletî yên zehfî tên ser vî eslî ku emê ji muhimtirînê wan baxivîn:

Gorekî vî eslî gereke qet tiştek nû di cihanê da çênebê, halhale her û her em dibînin ku tiştên nû çêdibin nexasma di nav heywan û insana da, ku muhimtirînê wan: jiyan û fikr û ihsas û fikra nû çêkirinê û irade ye.

Matiryalîst dibêjin: ev tiştên he jî, ne zêdetirê ji taybetî yên maddê ne! Di cewabê da tê gotin:

Yêk- xasiyet û taybetî ya ku ji madde û maddiyata venabê hema imtidad (hebûna dirêjî û pehnî û stûrîyê) û teqsîm bûna li ser piça ye, û ev taybetî di tiştên hatî gotin da nîne.

Du- eva tişta ku hûn navê «xasiyetên maddê» datînin ser bê şik

di maddeya bê rûh û bê can da tunebûye. Û bi gotinek dî: wextekî ev tişt di maddê da tunebûye û paşê jêra çêbûye, nixwe çêbûna eva tiştên ku tên nav kirin bi «xewasên maddê» muhtacê çêker û xaliqekî ye ku ewa bêxê nav maddê da, û ev hema 'illetê çêker û jînder e.

Işkal û xeletiyek dî ku tê ser vî eslî ew e ku lazim e hemî tiştên cihanê xurtî û cebrî bin; çimko di eser danîn û eser lê bûna maddê da cihek ji ixtiyar û bijartinê ra nîne; û inkara ixtiyar û heqê bijartinê zêdeyê ji wê yêkê ku xilaf û dijê bedahet û vî halê heyî ye, inkara berpirsyarî û hemî meselên exlaqî û me'newî ye jî, û kifş e ku inkara berpirsyarî û tiştên bi qîmet wê çi bênê serê jiyana beşer.

Welhasil çimko madde nikarê wacib-ul wucûd bê [çewa ku pêşda sabit bû] nixwe gereke ji çêbûna wê ra 'illet û sebebek hebê, û ew 'illet nikarê ji qismê 'illetên tebî'î û hazirker (i'dadî) bê, çimko ev awayê girêdan û peywendê tenê di nav maddiyata da çêdibê, lê kullê maddê nikarê ev girêdan digel 'illeta xwe hebê. Nixwe ew 'illeta ku madde xuliqandî (çêkirî) 'illetek îcadî ya ser maddê ra ye.

PIRSYARÊN DERSA 14

Eslên cihanbînî ya maddî beyan bikin.

Madde û maddîyê te'rîf bikin.

Xeletên eslê ewil şîrove bikin.

Xeletî yên eslê duwê bêjin.

Eslê sisê vejenin.

Işkalên eslê çarê şîrove bikin.

DERSA 15

MATIRIYALÎSMA DIYALIKTÎK Û VEJENÎNA WÊ

Matiriyalîsma mîkanîkî û diyalîktîkî
Eslê «dijatî» û vejenîna wê
Eslê «guhaztin» û vejenîna wê
Eslê «nefya nefy»ê û vejenîna wê

Matiriyalîsma mîkanîkî û diyalîktîkî

Matiriyalîsmê çiqên muxtelif hene ku ji peyda bûna cihnê û tiştên wê ra her yêkî ji xwe ra gotinek heye. Di destpêka sedê cedîd da matiriyalîstan pê behre girtina ji mefhûmên fîzîka nîyotonî li ser esasê hereketa mîkanîkî ji peyda bûyî yên cihanê daxiftan û her hereketek me'lûlê hêzek taybet ya muherrikekî zaniyan ku ji derve ve dikevê di cismê muteherrikê da, bi gotinek dî: cihan wek makîneyek mezin hesab dikiran ku quwet û hêza muherrik ji qetekî diçê qeta dî da û di netîcê da ev makîna mezin pêkve rê dikevê û hereket dikê. Ev ferziye ku bi navê «matiriyalîsma mîkanîkî» hat nav kirin hinek alîyên ze'êf û lawaz hebûn ku ket ber vejenîna muxalifan.

Yêk ji wan ev e ku: eger her bizav û hereketek me'lûlê hêzek ya ji derveyî bê, gereke ji hereket dana madda ewwelî ya cihanê ra jî hêz û quwetek hebê ku ji derve ve ketibê têda, û lazimê vê gotinê ew e ku hebûna tiştekî ser maddê ra bê qebûl kirin ku kêmê kêm bûbê despêka ewwilîn hereket û bizavê di 'alema maddê da.

Ya dî ev ku: pê hêz û quweta mîkanîkî hema tenê mirov dikarê hereket û bizavên wez'î û intiqalî xeber bidê; halhale mirov nikarê hemî tiştên cihanê wereng hesab bikê ku pê guherînên mekanî ne, vêca çare nîne xêncî ji vê ku hebûna 'illet û 'amilek dî ji peyda bûna tiştên dî ra bê qebûl kirin.

Ji ber ku matiriyalîsma mîkanîkî nekarî cewaba eva işkala bidê, matiriyalîstan xwe lê qewimandin ku 'amil û sebebek dî ji guherînên cihanê ra bibînin û kêmê kêm hinek ji hereket û bizavan bi awayek dînamîkî şîrove bikin û bi awayekî hereket û bizavek bi xwe bi xwe ji maddê ra nîşan bidin. Ji karên ku danerên mekteba matiriyalîsma diyalîktîk (Marks û Engils) kirîn ev bû ku pê behre girtina ji mefhûmên felsefî ya «Hegel» 'amilê hereket û bizavê dijatiya navdeyî ya tiştên maddî nîşan didin û xêncî ji qebûl kirina eslên: her û herî; û ne mexlûq bûna maddê; û bizava pêkveyî; û eser danîna tişta li ser hevdu, sê eslên dî ji ronahî kirina gotina xwe ra çêkirin:

1- eslê dijatiya navdeyî.
2- eslê bizavî, an ketina guherînên kemmî di şûna guherînên keyfî da.
3- eslê nefya nefy, an qanûna xelqa tebî'et.
Li vêderê emê bi kurtî ji va sê eslan baxivîn û paşê emê wa vejenîn.

Eslê dijatîyê

Matiriyalîsma diyalîktîk dibêjê ku: her tiştek pêk hatiye ji du dijatiya «tez û antî tez» û dijatî ya wan dibê sebebê bizav û hereket û guherîna wê tiştê, heta ku «antî tez» serdikevê û tiştek nû ku «sentez»a wa ye derdikevê meydanê. Mesela, hêk nutfeyek têda heye ku kêm kêm li xwe zêde dikê û maddên xarinê li xwe da digivirênê û di pey ra cûcik ku sentza wa ye çêdibê.

Eliktirîsîte ya erêtî (musbet) û nerêtî (menfî) nimûneyeke ji dijatîyê di tiştên fîzîkî da, çewa ku cem' û tefrîq, dijatiya di

hesaba seretayî û muşteq û entigral dijatiya di hesaba pêşketî da tên hesab kirin.

Ev herikîna he di meselên komelayetî û tarîxî da jî hene, mesela, di komela sermayedarî da, tebeqa karkera ku antî teza tebeqa sermayedar e pêş dikevê û li xwe zêde dikê heta ser dikevê û senteza wa ku komela sosyalîstî û komonîstî ye peyda dibê û tê meydanê.

Vejenîn

Ewwil gereke bê gotin: evahe ku du tiştên maddî bikevin di kêleka hevde bi awayekî ku yêk ji wan ya dî ze'êf û lawaz bikê û heta bibê sebebê jinav birina wê, kes evê tiştê inkar nakê, çewa ku di av û agir da tê dîtin. Lêbelê:

Yêk- kulliyet ji vê meselê ra nîne û bi navê qanûnek cihan şumûl ku her tiştî li ber xwe bigirê nayê qebûl kirin, çimko bi sedan û bi hezaran meselên bervajî û muxalifê wê mirov dikarê bibînê.

Du- hebûna evê dijatîyê di nav hinek tiştên maddî da, çi girêdan û peywend nînin digel dijatî û hevşikandina (tezad û tenaquz) di mentiqa kilasîk û felsefa metafîzîk da hatî û gotîn ew mehal e û çênabê; çimko ew tişta ku mehal hatî zanîn kom bûna du dij û du hevşikêna ye di yêk meselê da (ictma'a ziddeyn û neqîza di mewzu'ê wahid da) û di misalên hatîn gotin da «yêk mesele - mewzû'ek wahid û tenê» nîne. Xêncî ji wan jî cihê pêkenîyê ye ew misalên marksîsta ji kom bûna du dija re (ictima'a ziddeyn), anîn, wek kom bûna «cem'» û «tefrîq»ê an «muşteq» û «entigiral»ê û ... an ew pêşgotinên nedurustên derheq çêbûna hukûmeta karkeran di welatên sermayedarî da gotîn.

Sê- eger her tiştek ji du dijan pêk hatibê gereke ji tez û antî tezê ra jî pêk hatinek bi wî awayî hebê; çimko her yêk ji wan jî bi xwe tiştek in û gorekî vî eslê gereke ew jî ji du dija (ziddeyn) pêk hatibin û hingê desthat û netîce dibê ev ku: her tiştek mehdûd û sînor kirî ji dijatîyên bê nihayet pêk hatibê! Û ew dijatiya navdeyî ku gotine sebeb û ‘amilê hereket û bizavê ye, û bi vê rêkê ve xwestine nuqta ze'êf û lawaza di matiriyalîsma mîkanîkî da heyî ji halê rakin, kêmtirîn işkal û xeletiya tê ser, ev e ku: qet çi delîlên ‘ilmî jêra tunehin. Xêncî ji wê, vêca hebûna hereket û bizava mîkanîkî ku ji ber hêz û quwetek ji derveyî çêdibê qet nayê inkar kirin, illa ku hereketa topa fûtbolê jî ji ber dijatiya di nav topê bi xwe da heyî hesab bikin, ne ji ber wî qasî ku pîyê fûtbolîst lê ketiye!

Eslê guhaztinê

Çiko hemî guherînên cihanê ne bi yêk awayê ne û gelek caran tiştek nû peyda dibê ku ne wek ya pêşda ye û mirov nikarê ewê dewama hereket û guherîna pêşda hesab bikê, marksîsta xwe eslek dî girtine bi navê «guhaztin» an «derbaz bûna ji guherînên kemmî bo guherînên keyfî» û wereng nîşan dane ku guherînên «kemmî» dema geha cihek kifş û taybet, dibê sebebê peyda bûna guherîna «keyfî - çewanî»; wek çewa ku dema derece ya germî ya avê bigehê derek kifş û me'lûm av tê guherîn û dibê hêlm û buxar. Û her qismek yê hêsin dereceyek kifş ji helîyana wê ra heye û dema germî ya wê bigehê wê derecê dihelê. Û di nav komelê da jî dema ixtilaf û dijatî dijwar bibê û bigehê dereceyek kifş û me'lûm inqilab û guherîn çêdibê.

Vejenîn

Yêk- qet di çi ciyekî da «kemmiyet / çiqasî / qas» nayê guherîn bi «keyfiyet / çewanî»yê, ji vê zêdetir nayê gotin ku: peyda bûna tiştekî taybet û xas girêdayî ye bi hebûna «kemmiyet û qasek»

kifş ve. Mesela, derece ya germî ya avê nabê hêlm û buxar, belkî evahe ku av bibê buxar, meşrût e û girêdayî ye bi hebûna dereceyek xas ya germayê ve.

Du- ne lazim e ku ev «kemmiyeta lazim» pê zêde kirina kêm kêma «kemmiyetên» pêş da peyda bibê, belkî çêdibê ku ji ber kêm kirina «kemmiyeta» pêşda çêbê, wek wê ku buxar bibê av, ku girêdayî ye bi wê çendê ve germî ya wê li kêmê bidê.

Sê- evahe ku çewanî (keyfiyet) tê guherandin, her û her ne bi wî awayî ye ku di carekî da çêbê, belkî gelek caran ew guherîn kêm kêm û tedrîcî çêdibê, wek helîyana mûmê (findê) û şûşê.

Vê gorekê qasê tê qebûl kirin ev e ku: ji peyda bûna hinek tiştên tebî'î ra «kemmiyetek» xas lazim e, ne ku «kemmiyet» bi «keyfiyetê» tê guherandin; û ne ku lazim e kemmiyet kêm kêm zêde bikê; û ne ku ev şertek kullî bê ji hemî guherînên keyfî û new'î ra.

Eslê nefya nefy

Mexsed ji eslê nefya nefyê ku carna bi navê «qanûna tekamula du dija - ziddeyn» jê tê xeberdan ev e ku: di nav guherînên berfirehên diyalîktîkî da her û her «tez» pê «antî tez»ê nefy dibê û tê dûr kirin, û «antî tez» jî vêca pê «sentez»ê bi awayekî nefy dibê. Çewa ku giya libê (tov - dinidik) nefy dikê û ew bi xwe jî vêca pê libên nû tê nefy kirin; û nutfe, hêkê nefy dikê û ew bi xwe jî pê cûcikê nefy dibê. Lêbelê heçî ya nûtir ew ji ya kevin kamiltir e. Bi gotinek dî: seyr û gera diyalîktîkî her û her jêlil diçê û berew tekamul e, û muhimmî ya vî eslî hema ev e ku gera guherîna nîşan didê û li ser vê meselê dişidênê ku ev guherînên he ber jor û berew kamil bûn in.

Vejenîn

Şik nîne ku di hemî guherîna da wez' û halê pêşîyê namînê û wez' û halek nû peyda dibê. Û eger em eslê nefya nefy hema bi

vê me'nayê bizanin, ev ne tiştek zêdetir e ji lazimî ya guherînan. Lêbelê ew şîrove kirina di eslê da hatî kirin ku gotine hereket berew tekamul û pêşketin e, vê derheqê da gereke bê gotin ku:

Tekamulî bûn û berew pêşve bûna hemî bizav û guherînên cihanê bi vê me'nê ku: her tiştek nû û cedîd muheqeq kamiltir e ji ya pêşîyê da, evahe nayê qebûl kirin.

Gelo ûranîyom ku ji ber hinek kara dibê «surb/risas» kamiltir e?

Gelo giya û dara ku hişk dibê û qet çi lib û fêkiyek ji wê namînê kamiltir dibê?

Nixwe qasê tê qebûl kirin ev tenê ye ku: hinek ji tiştên tebî'î pê guherîn û bizavê kamiltir dibin. Vê gorekê tekamul jî bi navê qanûnek giştî ji hemî tiştên cihanê ra nayê qebûl kirin.

Di dûmahîkê da em vê jî bêjîn ku: ferzen eger ev eslên he bi awayek kullî û cihan şumûlî sabit bibûyan jî, hingê wek qanûnên sabit bûyî di 'ilmê tebî'et da tenê dikariya çewaniya peyda bûna tişta beyan bikê. Lêbelê hebûna qanûnên sabit û kullî di cihanê da borîn me gotî: çiko madde û maddiyat mumkin-ul wucûd in; nixwe bê hire wêre muhtacê «wacib-ul wucûd» in.

PIRSYARÊN DERSA 15

Ferqa matiriyalîsma mîkanîkî û diyalîktîkî bêjin.
Eslê dijatîyê şîrove bikin û xeletî yên wê bêjin.
Eslê «guhaztinê» û işkalên wê şîrove bikin.
Eslê nefya nefyê beyan bikin û ewê vejenin.
Gelo eger ev usul durust bin û kulliyet ji wan ra hebê, bê niyazî ya cihanê ji xaliq, sabit dibê? Çima?

DERSA 16

YÊK BÛNA XUDA

Dagirê:

Pêşekî

Delîlek li ser yêkatî ya Xudê

Pêşekî

Di dersên borî da lazimiya Xuda yê xaliqê cihanê sabit bû; Xuda yê zana û kara yê ku xaliq û xweyker û teybîrderê cihanê ye. Û di dersên pey wan ra jî me derheq cihanbînî ya maddî da xeber da û işkal û xeletî yên wê gotin û ronahî bû ku gotina cihana bêy Xudê gotinek ne ber 'eql e û ne meqbûl.

Niha dor gehaye vê yêkê ku em ji mesela yêkîtî ya Xudê (tewhîd) baxivîn û nedurustî ya fikra muşrikan (ew kesên şirîkan ji Xudê ra çêdikin) eşkere bikîn.

Vê derheqê da ku fikra şirkê çewa di nav mirovan da peyda bûye û belav bûye, bîr û hizrên muxtelif di nav komelnasan da hene, lêbelê qet çi yêk ji wan jî delîlek ronahî û cihê piştrastîyê tunehin.

Belkî mirov bikarê bêjê ku: yêkemîn sebebê meyla bi şirk û çend xudayîyê ew bê ku dîtina gelek tiştên 'erdî û 'esmanî ev hizr ji xelkê ra çêkirbê ku teybîr dan û xwey kirina her qismek ji wan bi hêviya xudayek taybet û mexsûs ve ye, wek çewa hineka guman

kirî ku qencî ji Xuda yê xêrî û xirabî ji Xuda yê xirabîyê ne, û bi vî awayî we fikr kirine ku ji cihanê ra du destpêk û serkanî hene.

Ji alîyê dî ve vêca pê dîtina esera ronahî ya roj û heyv û stêran li ser tiştên di 'erdê da heyîn, ev guman çêbû ku ew in yên bi awayekî eva tiştên 'erdî xwey dikin û ew rebb in.

Û ji alîyek dî ve, meyla ji hebûna me'bûd û ilahek mehsûs û melmûs, bû sebeb ku ji bona wan xudayan ku di mejîyê xwe da girtîn mucesseme û nîşanan çêkin û ji wan ra 'ibadet bikin. Û kêm kêm ewan put û seneman di nav xelkê kêm fikr û kêm 'eql da cihê xwe vekirin û ketin şûna esl da, û her milletî û belkî her qebîleyekî li ser esasê xeyalatên xwe şiklek ji çewaniya ‘ibadetê wan ra danîn, da ku ji alîyekî ve ewê meyla fitrî ya Xudê perêsîyê bi awayek bedelî razî û têr bikin û ji alîyê dî ve rengê qidaset û pakîyê bi meylên xwe yên heywanî û bi xwestên xwe ra bidin û ewa birêjin di qalibê merasimên dînî da, û vê gavê jî di nav put perêsan da cejnên tevlî reqs û xwe hilavêtin, 'ereq vexwarin û berdayî kirina şehwetê bi navê merasimên dînî hene.

Xêncî ji van hemiya jî vêca zalim û zorbêjan ji bona xwe xazî û xwe mezin kirinê ji fikr û bawerî yên sade yên xelkê behrek ne durust werdigirtan, ji ber wê yêkê bona fireh kirina qudret û desthelatiya xwe ra fikrên tevlî şirkê di nav xelkê da belav dikiran û ji xwe ra jî awayek yê xudatîyê hesab dikiran û ‘ibadetê taxût û zorgoyan jî hinek ji merasimên dînî dihesibandin.

Mirov dikarê nimûne yên eşkere ji vê yêkê di nav padişahên Çîn û Hind û Îran û Misr û ... da bibînê.

Di her hal û karî da dînên tevlî şirkê dibûn esera ‘amil û sebebên muxtelif heta di nav mirovan da cî girt û belav bû û bû asteng û pêşîgir li pêş ketina insanan da ku dikariya li bin sîbera dînê ilahî û tewhîdî da li xwe zêde bikin û bigehên kemalê, û ji ber vê yêkê qismek berketî û mezin yê xebata pêxemberên Xuda

berberekaniya digel şirk û muşrikan bû. Çewa ku hikayet û qisetên wan di Qur'anê da hatîn.

Vê gorekê, binyata baweriya tevlî şirkê baweriya bi xudantî (rubûbiyet) ya tiştekî xêncî ji Xuda ye ji hinek mexlûqên cihanê ra, eger ne, gelek ji muşrikan heta bawerî hebûne bi yêk bûna xaliqê cihanê, û di heqîqet da tewhîda di xaliqiyetê da qebûl kiribûn, lêbelê di derece yên binretir da bawerî bi hebûna hinek xuda yên binretir hebûn ku bi gumana wan idare û teybîra cihanê hêviya wan ve bû, û ji Xuda yê xaliq ra digotan: Xuda yê xudayan û «rebb-ul erbab».

Ev xuda yên rêveberên kar û bara, di gumana hineka da melaîket bûne ku 'Erebên muşrik guman dikiran ew keçên Xudê ne, û di gumana hineka da jî ew cin û perî bûne, û hineka jî guman dikiran ku ew xuda yên teybîrderên cihanê rûhê stêran bûne an rûhê hinek ji mirovên pêş da an birek taybet ji wa tiştan ku nayên dîtin.

Di dersa dehê da me got ku xaliqiyet û rubûbiyeta heqîqî, qet ji hev cida nabin û pêkve ne, û baweriya bi xaliq bûna Xudê digel baweriya bi reb bûn û xwey kirina yêk dî çênabê, û kesên ev baweriya hevşikên (mutenaqiz) heyîn pê nehesane ku her du alîyên wê dijê hev in û ji pûç kirina baweriyan ra ev bes e ku mirov ewa bi vê hevşikênîyê bihesênê.

Ji sabit kirina yêk bûn û tewhîda Xuda yê Te'ala ra gelek burhan (delîl) di kitêbên kelamî û felsefî da hatine, lêbelê emê li vêderê delîlekî bênîn ku rasterast yêkaniya di rubûbiyetê da nîşan didê û bawerîyên muşrikan red dikê.

Delîlek li ser yêk bûna Xudê

Ev mesele ku ji cihanê ra du an çend Xuda hebin, ji çend halan ne der e: an her tiştek ku di cihanê da heyî, mexlûq û me'lûlê

wan hemiya ye; û yan her birek ji wan mexlûq û çêkirîyê her yêkî ji wan xudaya hesab dibê û an hemî pêkve mexlûq û çêkirîyê yêk Xuda yê bi tenê ne û xudayên dî teybîrder û rêveberên kar û barê cihanê ne.

Ev ferza he ku her tiştekî çend xaliq hebin mehal e û çênabê, çimko me'na vê ku: du an çend xaliq (='illetê jînder) tiştekî bixuliqînin, ev e ku her yêk ji wan hebûnekî bidin, û desthat dibê ev ku çend hebûn çêbin, halhale her tiştekî tenê yêk hebûn heye, eger ne nabê yêk tişt.

Lê ev ferza he ku her yêk ji wan çêker û xaliqê yêkî an birrek ji mexlûqa bê, evahe dikê lazimê xwe ku her mexlûqek xwe bi xaliqê xwe ragirê û ihtiyac bi tiştek dî tunebê, xêncî wê ihtiyaca ku paşî ra dîsa li xaliqê wî bi xwe dizivirê û ev ihtiyac û niyaz jî hema ew niyaz e ku ji çêkerê wî çêkerî ra heyî.

Bi gotinek dî: lazimiya ferza çend xudatîyê ji cihanê ra; hebûna çend sîstimên ji hev cida ye, halhale yêk sîstim tenê ji cihanê ra heye; û hem tiştên di yêk zemanê da heyîn girêdan biheve hene û eserê datînin serhev û muhtacê hev in; û hem girêdan û peywend heye di nav tiştên derbaz bûyî da û hem tiştên heyîn û tiştên hêjbên da; û her tişta pêşda heyî meydanê hazir dikê ji çêbûna ya paşretir ra. Nixwe ev cihana ku piç û qetên wê biheve girêdayî ne û sîstimek bi tenê hukmê li ser dikê nikarê me'lûlê çend 'illetên jînder bê.

Û eger bê ferz kirin ku xaliq û çêkerê hemî mexlûqan yêk e, û ewên dî idare kirin û teybîrdan û rêve birina cihanê li xwe girtine, ev ferza he jî nikarê durust bê, çimko her me'lûlek bi hemî tiştê xwe ve, xwe bi 'illeta xwe ya jînder radigirê û bi wê dimînê, û qet çi tiştek serbixwe ku heye nikarê têkel wê bibê xêncî ji eserdanîn û eser girtinên ku di navbeyna me'lûlên yêk 'illtê da çêdibin û hemî pêkve li bin qudreta fa'ilê jînder da ne û

bi izn û icaza wî ya tekwînî pêk tê. Bi vî şiklî qet çi yêk ji wan di heqîqet da ne xweyker û rebb e; çimko me'na durust ya «rebb - xweyker» ev e ku serbixwe kar û barê wa yên li bin destê xwe da rêve bibê, û ferza me ev e ku ev têkel bûna karan û eser danîn ne serbixwe ne, belkî hemî pêkve di bin tîrojên xwey kirin û rubûbiyeta xaliq û çêker bi xwe da û pê hêz û quweta ku ew didê pêk tê û çêdibê. Ferza hebûna eva xweyker û rêveberên kar û baran bi vî awayê ne serbixwe (ne musteqil) dijatiyek digel tewhîd û yêkatiya di xwey kirinê da (rubûbiyet) nîne, çewa ku afrînderî (xaliqiyet) ku bi izna Xuda bê. ewê jî dijatî û munafat digel tewhîda xaliqiyetê nîne. Û di Qur'ana pîroz û hedîsên şerîf da ev awayê ne serbixwe yê xuliqandin (çêkirin) û teybîr danê ji hinek bende û 'evdên Xuda ra sabit e, çewa ku derheq hezretê 'Îsa da (s) dibêjê: [1]

«و َإِذْ تَخْلُقُ مِنَ الطِّينِ كَهَيْئَةِ الطَّيْرِ بِإِذْنِي فَتَنفُخُ فِيهَا فَتَكُونُ طَيْرًا بِإِذْنِي...»

“Û hingê ku te bi izna Min wek teyrika ji herîyê dixuliqanda, vêca te pif dikirayê di pey ra ew bi izna Min dibûya teyr û firinde».

Û her wiha kerem dikê: “فَالْمُدَبِّرَاتِ أَمْرًا” Nazi'at / 5

Welhasil: xeyal û tewehhuma çend xudatîyê ji 'alemê ra, ji qiyas kirina Xuda digel 'illetên maddî derketiye meydanê, ku çêdibê ji yêk me'lûlê ra çendek ji wan 'illetan hebin. Halhale 'illetê jînder (Xudê) digel van 'illetan nayê teşbîh kirin, û ji çi me'lûlekî ra çend 'illetên jînder an çend xweyker û teybîrderên musteqil û serbixwe çênabin.

---

[1] تەمامێ نایەتێ: إِذْ قَالَ اللّهُ يَا عِيسى ابْنَ مَرْيَمَ اذْكُرْ نِعْمَتِي عَلَيْكَ وَعَلى وَالِدَتِكَ إِذْ أَيَّدتُّكَ بِرُوحِ الْقُدُسِ تُكَلِّمُ النَّاسَ فِي الْمَهْدِ وَكَهْلاً وَإِذْ عَلَّمْتُكَ الْكِتَابَ وَالْحِكْمَةَ وَالتَّوْرَاةَ وَالإِنجِيلَ وَإِذْ تَخْلُقُ مِنَ الطِّينِ كَهَيْئَةِ الطَّيْرِ بِإِذْنِي فَتَنفُخُ فِيهَا فَتَكُونُ طَيْرًا بِإِذْنِي وَتُبْرِئُ الأَكْمَهَ وَالأَبْرَصَ بِإِذْنِي وَإِذْ تُخْرِجُ الْمَوتَى بِإِذْنِي وَإِذْ كَفَفْتُ بَنِي إِسْرَائِيلَ عَنكَ إِذْ جِئْتَهُمْ بِالْبَيِّنَاتِ فَقَالَ الَّذِينَ كَفَرُواْ مِنْهُمْ إِنْ هَذَا إِلاَّ سِحْرٌ مُّبِينٌ.

Nixwe ji avêtina vê xeyalê ra gerek ji aliyekî ve di me'na 'illeta jînder û taybetî yên vî awayê 'illiyetê da fikr bê kirin ku kifş bibê mehal e çend 'illetên wiha ji yêk me'lûlê ra hebin, û ji alîyê dî ve jî lazim e di hevgirtina cihanê da fikr bê kirin; da ronahî bibê ku sîstimek wiha hevgirtî çênabê ku çend xudayan ew çêkirbê û an li bin teybîra çend xweykerên (rebb) musteqil û serbixwe da bê.

Evahe jî ronahî bû ku qebûl kirina welayet û xweyîtî ya tekwînî ji hinek 'evdên layiq yên Xuda ra eger ne bi me'na xaliqiyet û rubûbiyeta istiqlalî û serbixwe bê munafat û dijatî digel «tewhîd»ê nîne, çewa ku welayeta teşrî'î ya Resûlê Ekrem (s) û imamên pak jî (s) munafat û dijatî digel rubûbiyeta teşrî'î ya ilahî nîne, çimko ew ji alîyê Xudê ve ye û bi izna Wî ye.

PIRSYARÊN DERSA 16

Sebebên bawerî yên tevlî şirkê şîrove bikin.

Binyata bawerî yên têkel şirkê çi ye?

Pêkve bûna xaliqiyet û rubûbiyetê û ji hev cida nebûna wan beyan bikin.

Çima nayê gotin ku çêdibê ji her tiştekî ra çend xaliq hebin?

Çima çênabê her birrek ji mexlûqan çêkirîyê xaliqên ji hev cida bin?

Û wê çi bibê eger yêk Xuda yê tenê 'alem xuliqandibê û di wî halî da jî teybîrder û xweykerên zehfî ji cihanê ra hebin?

Gumana imkana çend xudatîyê ji çi çêbûye û çewa nedurustî ya wê sabit dibê?

Çima baweriya bi welayeta tekwînî ji welî yên Xudê ra dijatî gel tewhîd û yêk bûna Xuda di xuliqandin û teybîrdanê da nîne?

DERSA 17

ME'NA YÊN TEWHÎDÊ

Dagirê:

Pêşekî

Nefy kirina te'eddudê (çend xudatîyê)

Nefya terkîbê

Nefya sifetên zêdeyê ji zat

Tewhîda ef'alî (kiriyarî)

Serbixwe bûna (istiqlal) di eser danînê da

Du desthatên girîng

Dûr kirina şubheyekî

Pêşekî

Kelîma «tewhîd» di luxet da bi me'na «yêk zanîn û yêkane» ye. Û di zimanê felsefî û kelamî û exlaqî û 'irfanî da di me'ne yên muxtelif da bikar hatiye, lê di hemiyan da yêk û tek zanîna Xudê ji cihetekî ve hatiye melheze kirin. Carna navê «qismên tewhîdê» an «mertebên tewhîdê» jê hatiye xeberdan. Û lêkolîna van hemiyan ne munasib e ji kitêbekî ra bi vî awayî. Ji ber wê yêkê li vêderê emê ji meşhûrtirîn û munasibtirînê wan tenê baxivîn:

Avêtina çend xudatîyê (nefya te'edûdê)

Ewilîn istilaha «tewhîd»ê ya meşhûr, hema ev bawerî ye ku: Xudê yêk e û bêşirîk û bêheval e; Xudê hema yêk bi tenê ye, û

baweriya bi şirîk çêkirina ji Xudê ra; du xudatî û çend xudatî tiştek avêtî û menfî ye.

Nefya terkîbê

Istilaha duwê ji me'na tewhîdê ra ew e ku: Xudê di zatê xwe da jî tek e û ji piç û qet û endaman pêk nehatiye (besît e û ne murekkeb e ji eczayên bi-l quwwe û bi-l fi'l).

Evê me'nayê zehftir bi awayê sifetê selbî (nefya terkîbê) jê daxivin [çewa ku di dersa dehê da borî] çimko mirov digel mefhûmê «terkîb»ê û di pey ra «nefy kirina wê» nastir e û kêmtir nasî bûn digel mefhûmê «besatet»ê heye.

Nefya sifetên zêdeyê ji zat

Istilaha sisê ya tewhîdê bi me'na baweriya bi yêk bûna sifetên zatî ye digel zatê Xudê Te'ala û nefya sifetên zêdeyê ji zat e, ku bi navê «tewhîda sifetî» tê nav kirin, û di zimanê riwayeta da bi navê «tewhîd - yêkatiya sifetan» jê hatiye xeberdan, ev di beraberê wa kesa da ye ku sifetên Xudê zêdeyê ji zat zanîne û gotine: heşt sifet qedîm in / daimî ne (wek Eşa'ire).

Delîla li ser tewhîda sifetî ev e ku: eger her yêk ji sifetên Xudê misdaqek cida hebê ji çend halan ne der e: an misdaqên wan di navdeyê zatê Xuda da ne; evahe dikê lazimê xwe ku zatê ilahî murekkeb bê ji piç û qetan, û pêşda me sabit kir ku ev mehal e. Û an misdaqên wan ji derveyê zatê Xudê da ne; û an mumkin-ul wucûd û mexlûqê Xuda ne. Hindîke ev ferz e ku ew sifet jî wacib-ul wucûd bin, evahe şirîk çêkirina rasterast e û çi musilman ewê qebûl nakin, û ferza mumkin-ul wucûd bûna ewa sifetan, me'na wê dibê ev ku: Xudê ku ew sifet têda nebûn, ewa çêdikê û di piş ra dibê xweyê wan sifetan, mesela: digel wê yêkê ku «saxî» jêra nebê, tiştekî bi navê «saxî» çêkê û pê wê bibê xweyê saxîyê, her wiha derheq zanîn û karîn û ... da. Halhale

mehal e ku 'illeta jînder di zatê xwe da ne xweyê kemalên mexlûqê xwe bê, û ji wê jî xirabtir vêca ew e ku pê mexlûqê xwe bibê xweyê saxî û zanîn û karîn û sifetên dî yên kemalî!

Pê betal bûna eva ferzan ronahî dibê ku sifetên ilahî ne tiştekî cidayê ji hevdu û cidayê ji zatê Xuda ne, belkî ew hemî pêkve hinek mefhûm in ku 'eql ewa hemiyan yêk tişt zanê ku zatê ilahî ye.

Tewhîda ef'alî (kiryarî)

Istilaha çarê ya «tewhîd»ê di zimanê ehlê felsefe û ehlê kelamê da bi navê «tewhîda ef'alî» jê tê xeberdan, ew jî ev e ku: Xuda yê Te'ala di karên Xwe da ihtiyac û niyaz bi kesî û bi çi tiştî nîne, û qet çi heyîyek nikarê çi arîkarîyê jêra bikê.

Ev gotin pê sifetê 'illetê jînderîyê ku xweyîtî û ragirtina me'lûlê xwe ye, sabit dibê; çimko me'lûlê 'illetek wiha xwe bi 'illeta xwe ve girtiye û bi istilaha felsefî hema «rebt û te'elluq» bi wî ye, û qet çi serbixweyî ji xwe nîne.

Bi gotinek dî: herkesê çi heyî hemî di bin qudret û karîn û hukmet û milkiyeta heqîqî ya tekwînî ya wî da ye û karîn û milkiyeta yên dî di dirêjiya karîna Xudê da ye û ji çiqên wê ye, ne ku li beraberê wê da bê. Wek çewa milkiyeta i'tbarî ya «benî» derheq wî malî da ku bi destve tênê di dirêjiya milkiyeta i'tbarî ya xweyê xwe da ye. Nixwe çewa çêdibê ku Xuda yê Te'ala muhtacê arîkariya wa kesa bê ku hemî tiştên wa û hemî heyî ya wan bi Wî ve girêdayî ye?!

Eser danîna serbixwe

Istilaha pêncê ya «tewhîd»ê serbixwe bûna di eser kirinê da ye, yanî mexlûqên Xudê di karên xwe bi xwe da jî bê niyaz nînin ji Xuda yê Te'ala, û eser kirinên wan li ser hev bi izna Xuda ye û pê wê hêz û quwetê ye ku Xuda yê Te'ala daye û didê wan. Û di heqîqet da hema tenê ewê serbixwe û bêy ihtiyac ku hergav û

herdem, li her cihî eserê li her tiştî dikê hema zatê eqdesê Allah e. Û fa'iliyet û kartêkerîya yên dî di dirêjiya fa'iliyet û eserdanîna Wî da ye.

Ji ber vê ye ku Qur'ana pîroz eserên karker (fa'il) yên tebî'î û xeyrê tebî'î (wek melek û cin û insan) nisbeta wan didê bal Xudê ve, ji nimûne ra: barîna baranê û şîn bûna giya û fêkî dana daran, nisbeta wan didê bal Xudê ve, û lê dişidênê ku xelk evê istinada bal Xudê ve ku di dirêjiya istinada bal karkerên nêzîk da ye fêhm bikin û qebûl bikin û her û her hay jê hebin.

Ji têgehana başţir ra emê misalekî i'tbarî bênîn: eger berpirsyarê idareyekî destûrê bidê karkerek yê idarê ku filan karî bikê û vêca ew wî karî pêk bênê, di wî halî da ku kar bi destê karker hatiye kirin, lêbelê di wî halî da jî di mertebeyek bilindtir da ew kar tê nisbet dan bal reîs û berpirsyar ve, û heta 'eqilmend istinada wî karî bal reîs ve gelektir û qewîtir dibînin.

Fa'iliyeta tekwînî jî silsile û meratib jêra hene û çimko hebûna her fa'il û karkerekî bi irada Xudê ve girêdayî ye û ji aliyekî ve wek wa sûretên zêhnî ye ku bi tesewwurkerê wan ve girêdayî ye: «و لله المثل الأعلى» ji ber vê yêkê heçî tişta ji kesekî û ji kartêkerekî çêbê di merteba bilindtir da girêdayî ye bi izn û irada tekwînî ya Xuda ve û nisbeta wê bal Xuda ve tê dayîn:

و لا حول و لا قوة إلا بالله العلى العظيم

Du desthatên muhim

Netîce ya tewhîda ef'alî ev e ku qe tiştek û kesek xêncî ji Xudê Te'ala layiqê 'ibadet û perêstinê neyê dîtin, wek çewa me pêşîyê da jî gotî: xêncî ji xaliq û xweykerê 'evd kes dî ne layiqê 'ibadet e. Û bi gotinek dî: ulûhiyet lazimeya xaliqiyet û rubûbiyetê ye.

Ji alîyê dî ve: desthat û netîca tewhîdê bi vê me'na paşî ev e ku insan pişta xwe bi Xudê girê bidê û di hemî kara da Ewî bikê

palgeh û tenê arîkarîyê ji Wî bixwazê û tirs û hêvî ji wî pêve tunebê, û heta eger dema wesîle û esbabên me'mûlî ji pêk hatina xwest û viyanên wî ra ne berdest bin jî dîsa bê hêvî nebê; çimko Xudê dikarê xwest û niyazên wî bi rêkên ne'edetî ve bi cî bênê.

Mirovê wiha dikevê bin çavdêrî û welayeta mexsûsa Xuda da û dikevê nav rihetî û xweşiya rûhî da: «Heyhê, birastî welî yên Xudê, tirs ji wan ra nîne û xemgîr jî nabin». [1]

Ev du desthat û netîce di vê ayeta berketî da hatine ku her musilman her roj çend caran ewê dixûnê:

« إِيَّاكَ نَعْبُدُ وإِيَّاكَ نَسْتَعِينُ »

«Ey Xuda! Em tenê ji Te ra 'ibadet dikîn û ji arîkarîyê ra gazî Te tenê dikîn». Sûretê Fatihe / ayeta 4.

Dûr kirina şubheyekî

Li vêderê çêdibê şubheyek bê pêş bi vê me'nayî ku: eger tewhîda kemal û temam ew e ku mirov ji Xudê pêve arîkarîyê ji kesî nexazê, nixwe «tewessul - mehderxazî» ji welî yên Xudê jî nedurust e.

Cewab ev e ku: tewessul û mehderxazî ya ji welî yên Xudê eger bi vê me'nayê bê ku ew musteqil û serbixwe û bêy izna Xudê karekî ji mehderxaz ra (ewê mutewessil dibê) dikin, evahe digel tewhîdê rêk nakevê û çênabê. Lêbelê eger bi vê me'nê bê ku: Xudê ew kirine wesîleyek ji dana rehmeta Xwe ra û destûr jî dabê xelkê ku ewa ji xwe ra bikin mehderkar û tewessulê bi wan bikin, ne hema munafat û dijatî digel tewhîdê (yêkatî ya Xudê) tunehin belkê ji tewhîda di 'ibadet û guhdanê hesab dibê, çimko bi emr û destûra Wî pêk tê.

[1] - Yûnus / 62. أَلا إِنَّ أَوْلِيَاء اللّهِ لاَ خَوْفٌ عَلَيْهِمْ وَلاَ هُمْ يَحْزَنُونَ

Lê vêca vê derheqê da ku çima Xudê ev wesîle û esbab danîne? Û çima destûr daye ku xelk xwe bi wan bigirin û ewa ji xwe ra bikin mehderkar?

Cewab ev e ku: evê destûra ilahî hikmet jêra hene û hinek ji wan hikmetan ev in: nasandina meqam û merteba bilinda welî yên Xudê; û teşwîqa xelkê ji wî 'ibadetî û ji wê guhdanê ra ku mirov ji wê digehê derece û merteba bilinda wan; û pêşî girtina li vê yêkê ku hinek bi 'ibadetê xwe bixirin û ser xwe biçin û guman bikin gehane bilindtirîn mertebe û derece û kemalatên insanî, çewa ku ji hinek ji wa yên bê behr bûyîn ji tewessula welî yên Xudê ra hatiye pêş.

PIRSYARÊN DERSA 17

Me'na luxetî û istilahî ya tewhîdê bêjin.
Tewhîda sifetî çi delîl heye?
Tewhîda ef'alî çewa sabit dibê?
Tewhîda bi me'na yêk bûna di eser danînê da şîrove bikin.
Desthatên ji du qismên paşî yên tewhîdê destve tên çi ne?
Gelo tewessula bi welî yên Xudê digel tewhîdê munafat heye? Çima?
Destûr dana Xudê ji mehderxazîyê ra (tewessul) çi hikmet jêra heye?

DERSA 18

CEBR Û IXTIYAR

Dagirê: Pêşekî

Ronahî kirina ixtiyarê

Dûr kirina şubhên cebriyan

Pêşgotin

Çewa ku di dersa pêşda hat gotin, tewhîda istiqlala di eserdanînê da ji zanînên pir berketî ye ku eserek zehfî di durust kirina insan da heye û ji ber wê yêkê Qur'ana pîroz ew tişt gelek muhim zaniye û pê beyan û ronahî kirinên muxtelif meydan hatiye fireh kirin ji fêhm û têgehana durusta wê ra, û yêk ji wan ev e ku hemî tişt bi izn û meşiyet û irade û qeza û qedera ilahî ve girê daye.

Lêbelê fêhm kirina durust ya vê meselê ji aliyekî ve muhtacê pêşketina fikr û 'eql e û ji alîyê dî ve jî niyaz heye ku bi durustî beyan bibê û bê gotin. Û kesên ku xweyê fikr û 'eqlek pêşketî nebûne û an ji zanînên pêşkarên pak û tefsîrkerên heqîqî yên Qur'anê bêbehr mane, ketine xeletîyê û şimitîne û guman kirine ew bi vê me'nê ye ku: hemî awayên tesîr danînê û 'illiyetê mexsûsê Xuda ne û bervajîyê deqê gelek ji ayetên muhkemên Qur'anê, hemî awa yên eser lê kirina 'illiyetê ji esbab û wesîlan nefy kirine, û wereng nîşan dane ku 'edeta Xudê bi vê gorekî pêk hatiye ku dema agir hebê germayê çêkê û dema xwarin were xwarin û av were vexwarin têrîyê û têravîyê çêkê, eger ne, agir û xwarin û avê eserek nînin di germa û têrî û têravîyê da.

Eserên nedurusta evê xwehrî ya fikrî hingê eşkere dibin ku desthatên wê, derheq kiryarên ixtiyarî yên mirov û mesûliyeta wî bê tehqîq kirin. Yanî desthat û netîca evê fikrê ev e ku kiryarên insan jî rasterast nisbet bên dayîn bal Xuda ve û fa'iliyeta insan nisbet bi wan bi temamî ji nav biçê, û di vî halî da kes li beraberê karê xwe da mesûl nîne.

Bi gotinek dî: netîceyek ya vê xwehr fikrîyê hizra cebrî ye û jêbirina mesûliyetê ye ji mirov ku nefya muhimtirîn sifetê insan e, û ew yanî bêhûdetiya hemî sîstimên terbiyetî, exlaqî û huqûqî. Çimko eger mirov li beraberê karên xwe da ixtiyar û heqê bijartinê tunebê, hingê cihek ji berpirsyarî û teklîf û emr û nehy û kirh û ceza danê ra namînê. Belkî dikê lazimê xwe ku sîstima tekwînê bêhûde û bêhedef bê; çimko wek çewa ji ayetên kerîme[1] û hedîsên şerîf û delîlên 'eqlî dest ve tê, hedef û amanca afirandina cihanê ew e ku rê ji xuliqandina insan ra vekê da ku pê karên xwe yên ixtiyarî û 'ibadet û guhdana Xuda yê Te'ala bigehê bilindtirîn kemalên mumkin û merteba qurba ilahî bi dest xwe ve bênê û bibê layiqê rehmeta mexsûsa Xudê Te'ala, û eger mirov ixtiyar û mesûliyetek tunebê nikarê bibê layiqê girtina kirh û ni'metên her û her û razî bûna Xuda wê hedefa xuliqandinê pûç bibê û wê cihan wek meydana berfireha leystokê bibê ku insan wek boklûkên wê, bê ixtiyar wê hinek hereket û bizav jê çêbin û paşê jî hinek wê bikevin ber lomê û bên ceza dan, û hinek jî wê qedrê wan bê girtin û kirh û xêrê bidin wan!

Muhimtirîn sebebê ku ev fikra bi xeter berfireh kir, xwesta siyasiya hukumetên zalima bûn ku dikariyan bi vê rêkê ve û pê fikrên wiha kiryarên xwe yên ne layiq û ne durust bidin cî kirin û xelkê ne agah pitir bindest bikin û pêşiya bizav û hereket û hilperîna wan bigirin.

[1] - Binêrin: Hûd / 7, Mulk / 2, Kehf / 7, Zariyat / 56, Tewbe / 72

Ji alîyê dî ve vêca hinek bi nuqtên ze'êf û lawazê vê fikrê hesiya bûn, lêbelê ne ewa bixwe dikariya di navbeyna tewhîda kamil û nefya cebrê da kom bûnekî çêkin û ji zanînên Ehlê Beyta pak jî behre negirtin, vêca baweriya «tefwîzê» peyda kirin û fi'l û kiryarên ixtiyarî yên insan ji daira fa'iliyeta ilahî deranîn û ketin nav awayek dî yê fikra xelet ra û ji zanînên bilindên Islamî û desthatên wê yên pir biha bê behr man.

Lêbelê ew kesên hem karîna têgehiştinê hebûn û hem mu'ellim û mufessirên heqîqî yên Qur'anê nas kiribûn neketin nav va xeletiyan ra, û ji aliyekî ve fa'iliyeta xwe ya ixtiyarî ku Xuda yê Te'ala dayî wan û mesûliyeta girêdayî bi wê ixtiyarê ve qebûl kirin û ji alîyê dî ve jî esera bilind û serbixwe ya ilahî di merteba bilindtir da fêhm kirin û gehan evê zanîna pir biha.

Di riwayetên Ehlê Beyta Pêxember da (s) gotinên ronahî vê derheqê da gehane destê me, û di kitêbên hedîsî da li bin navê «istita'et û nefya cebr û tefwîz»ê û di beşên: «izn û meşiyet û irade û qeza û qedera ilahî» da hatine nivîsîn. Û her wiha hinek riwayet hene ku nehya mirovên nekar kirine ku xwe di kûratiya va mesela da bernedin da nekevin şimitîn û xwehrîyê.

Mesela cebr û ixtiyarê alîyên zehfî hene ku vejenîna hemiyan ne munasibê vê kitêbê ye, lêbelê çimko behs muhimm e emê ronahî bûnekî bêxin hinek ji alîyên wî ku ihtiyac pê heye, û em ji wa yên ku li pey tehqîq û lêkolîna pitir in dixazîn ku ji hîn kirina binyatên 'eqlî û felsefî yên meselê ra sebrdar bin.

Ixtiyar

Qudreta biryar dan û ixtiyarê, yêk ji yeqînîtirîn mesela ye ku mirov dikarê pê bihesê, çimko herkes di navdeyê dilê xwe da pê 'ilmê huzûrî yê bê xeletî pê dihesê, çewa ku pê evê zanînê bi haletên xwe yên rûhî dihesê, û heta ku dema derheq tiştekî da dikevê şikê, hebûna «şikê» bi xwe jî hema pê vî 'ilmî ye ku pê

dihesê heye, û nikarê derheq hebûna şikê da bikevê şikê. Her wiha herkes piçekî bifikirê pê dihesê ku dikarê gotinekî bêjê an nebêjê, an destê xwe bihejênê an nehejênê; xwarinekî bixwê an nexwê û ... .

Biriyardan ji kirina karekî ra an ji ber têr kirina meyl û xerîzeyek heywanî ye, wek ewê birçî ku dixazê xwarinê bixwê an ewê têhn ku biryarê didê avê vexwê; û carna jî ji razî kirina xwestên 'eqlanî û gehana hedefên bilindên insanî ye, wek wê ku: nexweş ji gehana selametîyê ra dermanê tehl dixwê, û xwe ji xwarina xwarinek xweş didê paş; an mirovek ehlê tehqîqê û vejenînê ku di rêka ʻilm û zanînê da çavê xwe ji lezzetên maddî digirê û gelek xwe têxê zehmetê, an leşkerek fedakar ku heta bi canê xwe jî di rêka hedefa xwe da didê.

Di heqîqet da bihayê insan hingê dixweyhê ku xwest û viyanên muxtelif bikevin li beraberê hev da û gehana hemîya pêkve çênebê û vêca mirov ji bona gehana exlaqên berketî û kemalatên rûhî û qurba razî bûna ilahî, ji xwest û viyanên kêm yên heywanî dest bikêşê. Û her karê ku bi ixtiyarek pitir û bijartinek agahanetir û çêtir pêk bê eserek pitir di tekamul û nizim kirina rûhî û me'newî da heye û pitir mirov pê wê dibê musteheqqê xêrdan û cezadanê. Elbet karîn û li ber xwe dan di beraberê xwestên nefsanî da, di her kesî da û li beraberê her tiştekî da wek yêk nînin, lêbelê irade ya azad; ev hediye û xelata ilahî kêm an zehf di her kesî da heye, çiqas zêdetir ewê bikar bênê û perwerde bikê ewqas dikarê ewê qewîtir bikê û bihêz bêxê. Vê gorekê qet çi cih ji şik û dudilîyê ra derheq hebûna irade û ixtiyarê da nîne û gereke şubhe derheq vê mesela wijdanî û bedîhî da mejîyê mirov tevhev nekin. Û çewa me gotî hebûna ixtiyarê bi navê eslek eşkere di hemî sîstimên terbiyetî û exlaqî û dîn û şerî'etên 'esmanî da hatiye qebûl kirin; û bêy wê me'ne ji berpirsyarî û lome kirin û pesn dan û ceza û xêrdanê ra namînê.

Tişta ku bûyî sebebê xwehr bûna ji vê heqîqeta eşkere û meyl peyda kirina ji cebrê ra, hinek şubhe ne ku gereke cewaba wan bê dayîn heta ku cihek ji weswese û dudilîyê ra nemînê. Û li vêderê emê ji dûr kirina muhimtirînê wan baxivîn.

Dûr kirin û def'a şubhên cebrê

Muhimtirîn şubhên cebriyan bi vê qirarê ne:

1- irada insan ji ber meylên navdeyî yên mirov şikl digirê, û ne hebûna eva meyla di ixtiyara mirov da ye û ne jî çêbûna wan bi rêka sebebên ji derveyî ve. Nixwe cihek ji ixtiyar û bijartinê ra namînê.

Cewab ev e ku çêbûna meylan, meydanê ji irade û biryardanê ra hazir dikê, ne ku biryar dana kirina karekî netîca cebrî bê ji çêbûna meylê ra ku vêca qudreta berberekanî û nekirinê ji mirov selb bikê û ji nav bibê. Û şahidê wê jî ev e ku gelek caran haletê şik û dudilîyê ji mirov ra çêdibê û biryar dan muhtacê fikr kirinek zêdetir dibê heta ku sûd û zerera wê were pîvandin û li ber hev bê girtin û carna jî gelek bi zehmet dikevê.

2- gorekî sabit kirina ‘ilm, gelek tiştên wek: irsê û tereşşuha xuddeyan (ku ji ber hinek xwarinan û mesref kirina dermanan çêdibê) û sebebên muhît û komelê di çêbûna irada mirov da eser hene û ne wek yêk bûna mi’emileta mirovan ji ber ixtilafa di van sebeba da ye. Çewa ku di serçavkên dînî da jî ev gotin cihê qebûlê ye. Nixwe mirov nikarê kiryarên mirova ji irada wa ya azad hesab bikê.

Cewab ev e ku qebûl kirina ixtiyar û irada azad, bi me'na nefy û avêtina evan sebeban nîne, belkî bi vê me’nê ye ku: digel hebûna van ‘amil û sebeban jî, mirov dikarê li ber xwe danê bikê û dema sebebên muxtelif ketin ber hev û hev negirtin mirov yêkî bibijêrê.

Elbet quwet û bi hêz bûna hinek ji van sebeban, carna li ber xwe dan û bijartina karekî ku bervajîyê wa ye bi zehmet têxê, lêbelê ji

ber ve evê li ber xwe dan û bijartinê eserek pitir di kemalê da heye û ser musteheq bûna xêrê ve zêde dikê, çewa ku heyecanên zehfî û şert û mercên dijwar, dibê sebebê kêm bûna ceza û sivik bûna sûc.

3- şubheyek dî ya cebriyan ev e ku Xwedê Te'ala bi hemî tiştî heta bi kiryarên insan jî pêşiya qewimîna wan da agah e û xeletî di zanîna Xwedê da çênabê. Nixwe her tişt gorekî zanîna ezelî ya Xwedê pêk tê. Vê gorekê cî ji ixtiyar û bijartina mirov ra namînê.

Cewab ev e ku: her tiştek kanê wê çewa çêbê û biqewmê di zanîna Xudê da heye. Û kiryarên ixtiyarî yên mirov pê sifetê «ixtiyarê» ji Xudê ra kifş e, nixwe eger pê sifetên «cebrî» bûnê çêbê xilafê 'ilmê Xuda ye. Mesela: Xuda yê Mute'al zanê ku filankes di filan şert û merca da wê biryarê li ser kirina karekî bidê û ewî karî bikê, ne ku tenê kirina wî karî bêy girêdana wê bi irade û ixtiyara karker ve di zanîna Xudê da hebê. Nixwe 'ilm û zanîna ezelî ya ilahî munafat û dijatî tune digel ixtiyar û irada azad ya mirov. Şubheyek dî ya cebriyan derheq mesela «qeza û qederê» da ye, ku bi gumana wan digel ixtiyara insan rêk nakevê. Di dersa hêjbê da emê vê derheqê da baxivîn.

PIRSYARÊN DERSA 18

Sebebên peyketina cebrê û berfireh bûna wê şîrove bikin.

Hebûna ixtiyar û irade ya azad ya insan ronahî bikin.

Gelo meylên di navdeyê mirov da heyîn û sebebên mirov ji kirina karekî ra radikin, gel ixtiyara insan munafat heye? Çima?

Ewên dikevin bin heyecan û şert û mercên dijwar da, çi ferq hene gel yên dî?

Gelo eser danîna tiştên irsî û sebebên dûr û berê mirov û komelayetî dibin sebebê cebrê? Çima?

Gelo 'ilmê ezelî yê Xudê ixtiyarê ji mirov dibê? Çima?

DERSA 19

QEZA Û QEDER

Dagirê:

Mefhûmê qeza û qederê

Qeza û qedera ʻilmî û 'eynî

Peywenda qeza û qederê gel ixtiyara mirov

Eşkalên eser danîna 'illetan

Eserên baweriya bi qeza û qederê

Mefhûmê qeza û qederê

Kelîma «qeder» bi me'na qas, qeyde û endaze ye û «teqdîr» bi me'na qeyde û endaze girtina tiştekî ye. Kelîma «qeza» bi me'na pêk anîn û hukm danê bikar tê birin. Carna jî ev herdu di yêk me'nayê da ji «sernivîsê» ra istifade dibê.

Mexsed ji teqdîra ilahî ev e ku Xudê ji her tiştekî ra qeyde û hedd û sînorên zemanî û mekanî û çewanî û çiqasî daniye ku li bin eserên ʻamilên tedrîcî da pêk tên. Û mexsed ji qeza ya ilahî jî ev e ku piştî pêk hatina şert û merc û pêşekî û esbabên tiştekî, ewê dighênê mehela çêbûna paşîn.

Gorekî vê me'nê, merhela teqdîrê pêşiya merhela qezayê ye û merteba tedrîcî jêre heye ku dagirê pêşekî yên dûr û navincî û nêzîk e û pê guherîna hinek ji esbab û şertan guherîn dikeftê. Mesela, seyra tedrîcî ya zaroka di zikê dayika xwe da ji nutfe û 'eleqe û muzxê destpê dikê û pêşve diçê heta dibê «cenîn»,

merhelên muxtelifên teqdîrê ew e ku wext û mekan jî ber xwe digirê, û ketina wê di merheleyekî da guherînek di teqdîra wê da hesab dibê. Lêbelê merteba qezayê yêkcarkî ye û girêdayî ye bi pêk hatina esbab û şerayitan ve û her wiha hetmî ye û guherîn jêra nîne: «dema hebûna tiştekî bixazê hema tenê dibêjitê hebe, vêca di gavê da heye».[1]

Lê çewa ku hat gotin carna «qeza û qeder» di yêk me'nê da bikar tên birin, vêca ji ber vê yêkê teqsîm dibin bi «hetmî» û «xeyrê hetmî»; û bi vê melhezê ye ku di hedîs û du'a da, ji guherîna qezayê hatiye xeberdan û qenciya digel dê û baban û pêk anîna heqê mirovatîyê (sileya rehmê) û du'a ji sebebên guherîna qezayê hatine nasandin.

Qeza û qedera ‘ilmî û 'eynî

Carna teqdîr û qeza ya ilahî, bi vê me'nayê bikar tê birin ku: Xudê Te'ala zanîn heye bi pêk hatina esbab û şertên çêbûna tiştan û her wiha ‘ilm û zanîn heye bi wa yên ku muheqeq çêbin û biqewimin, navê vê ya he «qeza û qedera ‘ilmî» ye, carna jî bi vê me'nayê ye ku: çêbûna her tiştekî ku tedrîcî çêdibê û tê wucûdê û peyda bûna hemî tiştî bi Xudê ye, ji vê ra jî tê gotin: «qeza û qedera 'eynî».

Gorekî ji ayet û riwayeta istifade dibê ‘ilm û zanîna Xuda yê Te'ala bi her tiştekî bi awayê ku 'eynen di xaric da pêk tê, di tiştekî giranqedr bi navê «lewh-ul mehfûz» da hatiye nivîsîn, û heçî kesê bi izna Xudê xwe bigehênê wê , wê ji tiştên borîn û hêj bên agah bibê; û her wiha «elwah»ên binretir jî hene ku qewimîn bi awayê netemam û meşrût têda hatine û kesên ji wê

[1]- Temamê ayetê: Alê ‘Imran / 47 û binêrin: Beqere / 117, Meryem / 35, Mu’min / 68
قَالَتْ رَبِّ أَنَّى يَكُونُ لِي وَلَدٌ وَلَمْ يَمْسَسْنِي بَشَرٌ قَالَ كَذَلِكِ اللهُ يَخْلُقُ مَا يَشَاء إِذَا قَضَى أَمْرًا فَإِنَّمَا يَقُولُ لَهُ كُن فَيَكُونُ

agehîyê peyda bikin wê zanînên sînor kirî dest ve bînin ku meşrût û qabilê guherînê ne, û belkê ev ayeta giranqedr ji van du ser nivîsan xeber didê:

«يَمْحُو اللّهُ مَا يَشَاء وَيُثْبِتُ وَ عِندَهُ أُمُّ الْكِتَابِ»

«Ya Xudê bixazê jinav dibê û sabit dikê û li bal Wî ye maka kitêbê». Re'd / 39

Û guherîna teqdîrên meşrût û nehetmî di zimanê riwayetan da jêra hatiye gotin: «**beda'**».

Di her hal û karî da baweriya bi qeza û qedera 'ilmî muşkilekî zêdetirê ji wê ya derheq 'ilmê ezelî yê Xudê da hatî gotin nayinê pêş û di dersa borî da şubha cebriyan derheq 'ilmê ilahî da hat gotin û sistî ya wê ronahî bû.

Lêbelê baweriya bi qeza û qedera 'eynî nexasma baweriya bi sernivîsa hetmî işkalek bi zehmettir heye ku gereke cewaba wê bê dayîn, herçend cewaba giştî ya wê di behsa «tewhîd bi me'na eser têkerê serbixwe» da hat.

Peywenda qeza û qederê digel ixtiyara mirov

Me zanî ku me'na baweriya bi qeza û qedera 'eynî ya ilahî ev e ku: hebûna her tiştekî ji zemanê çêbûnê ve heta bi axirîkê li bin teybîra hekîmane ya ilahî da bê zanîn û pêk hatina şertên çêbûnê û gehana merhele û merteba nihayî were nisbet dan bal irade ya Xuda ve. [1]

Bi gotinek dî: çewa ku hebûna her tiştekî girêdayî ye bi izn û meşiyeta tekwînî ya Xuda ve û qet çi tişt bêy izna Wî çênabê û navê hebûnê nakevê ser; her wiha her tişt bi qeza û teqdîra ilahî

[1] - Hevrêkî ya irade û qeza ya ilahî digel hev (gorekî vê behsê) ji tetbîqa ayeta 47 ya sûretê Alê 'Imran li ser ayeta 82 ji sûretê Yasîn ronahî dibê. bi tertîb:
إذا قَضَى أَمْرًا فَإِنَّمَا يَقُولُ لَهُ كُن فَيَكُونُ - إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ .

ve girêdayî ye û bêy wê çi mewcûdek şikl û şemalekî bi xwe nagirê û nagehê cihekî. Û beyana evê intisab û istinadê di heqîqet da hema te'lîma tedrîcî ya tewhîdê ye bi me'na istiqlala di tesîrê da ku bilindtirîn derecên tewhîdê ye û çewa me pêşda gotî eserek mezin jêra heye di durustkirina insan da.

Lê istinada tiştan bi izna Xudê û meşiyeta Wî baştir tê fêhmê ji istinada merhela nihayî û kifş bûna qet'î ya wan bi qeza ya ilahî, ku ji ber zehmet bûna fêhm kirina wê gelektir xeberdan li ser hatiye kirin. Çimko kom kirina di navbeyna vê bawerîyê digel qebûl kirina ixtiyara insan di sernivîsa wî da gelek zehmet e, û ji ber vê yêkê komek ji mutekelliman (Eşa'ire) ku şamil bûna qezaya ilahî nisbet bi kiryarên mirovan qebûl kirine meyla bi cebrê peyda kirin û komek dî (Mu'tezile) ku nikariya cebr û peyhatên wê yên nexweş qebûl bikin, şumûl û dagirî ya qeza ya ilahî nisbet bi ef'al û kiryarên insan inkar kirin. Û her yêk ji van biran ketin tewîl kirina wan ayet û riwyetan ku muxalifê fikra wan bûn, çewa ku di kitêbên berfirehên kelamî û nivîsokên taybet derheq cebr û ixtiyarê da hatine.

Nuqta eslî ya işkalê ev e ku eger karê insan hema birastî ixtiyarî û mustened bê bi irada wî ve, çewa mirov dikarê ewê bi irade û qeziya ilahî ve girê bidê? Û eger mustened bê bi qezaya ilahî ve çewa mirov dikarê bêjê ew pê bijartin û ixtiyara insan e?

Nixwe ji rakirina işkalê ra û ji kom kirina di navbeyna istinada kar bi irade û ixtiyara insan û istinada wê bi irade û qezaya ilahî, gereke ronahî kirinek çêbê derheq eşkalên istinada me'lûlê wahid bi çend 'illeta ve, heta ku awayê istinada karê ixtiyarî bi insan û Xuda yê Te'ala ve eşkere bibê.

Eqsamên eser danîna 'illetên zehfî

Eser danîna çend 'illetan di peyda bûna tiştekî da, bi çend awaya ye:

1- çend 'illet digel hev û di kêleka hevda eserê deynin, wek vê yêkê ku li hev kom bûna tov û av û germa û ... bibê sebebê pişkivîna tov û şîn bûna giya.

2- her yêk ji wan di dora xwe da eserê deynin, ku li pey hev, ne digel hev eser ji wan ra heye, wek: teyyarê çend motor hebin û pê bûna her yêkî di dora xwe da bibê sebebê rêketina teyyarê.

3- esera wan bi hevdu ve girêdayî bê; wek çewa li hev ketina çend topan û an di tesadufatên zincîreyî da tê dîtin.

Û nimûneyek dî ya wê esera irade ya insan e di çûnê da, û esera dest ji bizava qelemê ra, û esera qelemê di çêbûna nivîsînê da. Bi awayek wereng ku dirêjiya 'emrê ewê tiştê tê teqsîm kirin li ser êjmara wan û her qismek ji wê, me'lûlê ‘amilekî bê.

4- eser danîna çend ‘amilan di dirêjiya hev da, bi awayekî ku hebûna her yêkî girêdayî bê bi hebûna ya dî ve, bervajîyê gotina pêş da ku hebûna qelemê ne girêdayî bû bi hebûna dest ve, û hebûna dest jî ne girêdayî bû bi hebûna irade ya mirov ve.

Di va şiklan hemiyan da kom bûna çend 'illetan ji peyda bûna me'lûlek wahid û tenê ra mumkin û belkî lazim in, û esera irade ya ilahî û irade ya insan di karê ixtiyarî da ji vî qismê paşî ye, çimko hebûna insan û irade ya wî girêdayî ne bi hebûna irade ya ilahî ve.

Lê ew şiklê ku kom bûna du 'illetan ji me'lûlê wahid ra nabê, ew hebûna du 'illetên jînderin an du 'illetin ku nikarin li hev kom bibin û ber hev ra an yêk piştî yêkî eserê datînin. Wek vê yêkê ku irada wahid ji dû karkerên iradeker çêbê.

Rakirina şubhê

Pê wê gotina hatî gotin ronahî bû ku nisbet dana hebûna karên ixtiyarî yên insan ji Xudê ra munafat tune ji nisbet danê ji wî

bixwe ra, çimko ev nisbet dan di dirêjiya hev da ne û nakevin di beraberê hev da.

Bi gotinek dî: istinada kar ji karkerê insanî ra di dereceyekî da ye, û istinada wê ji Xuda yê Te'ala ra di dereceyek bilindtir da ye, ku di wê derecê da wucûda insan bi xwe û wucûda ewê tişta karê xwe li ser dikê û wucûda aletên ku pê wa karê xwe dikê hemî pêk ve nisbeta wan bal wî ve ye.

Nixwe esera irade ya insan bi awayê «cuz'ê paşî ji 'illeta tamme» di karê wî da munafat tune digel nisbet dana hemî cuz'ên 'illeta tamme ji Xuda ra. Û ew Xuda yê Te'ala ye ku her û her cihan û insan û hemî tiştên wî di destê quderta Xuda da ye û Ew e yê hebûnê û wucûdê didê wan û bi dewam hebûnê didê wan û çi tişt di çi hal û çi zemana da ji Wî bê ihtiyac û bê niyaz nîne û ji Wî venabin.

Nixwe karên ixtiyarî yên mirov jî ji Xudê bê niyaz nîne û ne der e ji meydana irade ya Wî, û hemî sifet û taybetî û hedd û hudûdên wan bi teqdîr û qezaya ilahî ve girêdayî ye, û ne wereng e ku bê gotin: an gereke nisbeta wê bê dayîn bal irade ya insan ve û an irade ya Xuda ve. Çimko ev du irade, ne di kêleka hev da ne û ne we ye ku li hev kom nebin, û esera wan di kara da ne di şûna hev da ne, belkî irade ya insan wek ewî bixwe bi irade ya Xudê ve girêdayî ye û ji pêk hatina wê ra irade ya Xuda lazim e:

«وَ مَا تَشَاؤُونَ إِلَّا أَن يَشَاءَ اللَّهُ رَبُّ الْعَالَمِينَ»

«irade û viyan ji hewe ra nîne illa ku xweykerê 'aleman irade bikê û bixazê». Tekwîr/29

Eserên baweriya bi qeza û qederê

Baweriya bi qeza û qederê xêncî ji wî qasî ku mertebeyek giranbiha ye ji nasîna Xudê û sebebê kamil bûna insan e di alîyê 'eqlî da, eserên zehfî yên dî jî jê ra hene ku li vêderê emê ji

hinekan baxivîn:

Kesê ku qewimînan bi irade ya hekîmane ya Xuda yê Te'ala ve girêdayî bizanê û nisbeta wê bal qeza û qedera ilahî ve hesab bikê ji pêşhatên nexweş nabizdê û li beraberê wan da xwe wunda nakê û bêtabî jê çênabê, belkî pê vê fikrê ku ev qewimîn qetek yê sîstima hekîmane ya cihanîyê ne û li ser esasê meslehet û hikmetan qewimiye û diqewimin, ewa hembêz dikê û dibê xweyê melekatên pir biha wek: sebr û tewekkul û razî bûn û teslîm bûna ji Xuda ra.

Her wiha pê xweşî û şahî yên jiyanê nayê xapandin û ser xwe naçê û ni'met û qencî yên Xudê nakê wesîla xwe mezin kirin û fexrê û xwe mezin kirina li ser xelkê.

Ev eserên hêjayî hema ew in ku di ayetên 22 û 23 ji sûretê Hedîd da hatîn:

«مَا أَصَابَ مِن مُّصِيبَةٍ فِي الْأَرْضِ وَلَا فِي أَنفُسِكُمْ إِلَّا فِي كِتَابٍ مِّن قَبْلِ أَن نَّبْرَأَهَا»

“Çi musîbeta di 'erdê da û di nefsa hewe da hemî di kitêbê da hebûne pêşiya em wa çêkîn, evahe ji Xudê ra rihet e”.

«لِكَيْلَا تَأْسَوْا عَلَى مَا فَاتَكُمْ وَلَا تَفْرَحُوا بِمَا آتَاكُمْ وَاللَّهُ لَا يُحِبُّ كُلَّ مُخْتَالٍ فَخُورٍ»

“Evahe ji ber wê ye da hûn ji ber wê ya ji dest hewe derketî xema nekin û bi wê ya ketî destê hewe şahî nebin. Û Xudê hej xwe mezinkerên ehlê fexrê nakê”.

Lê di wî halî da gereke em hay jê hebin ku fêhma ne durust ji mesela qeza û qederê û tewhîda di esera istiqlalê da nebê sebebê sistî û tembelî û zelîlî û bindestî ya zulmê û revîna ji mesûliyetê; û gereke bê zanîn ku bextewerî û bextreşî ya her û her bi kiryarên ixtiyarî yên me bi xwe ve girêdayî ye:

لاَ يُكَلِّفُ اللّهُ نَفْسًا إِلاَّ وُسْعَهَا لَهَا مَا كَسَبَتْ وَعَلَيْهَا مَا اكْتَسَبَتْ

“Xudê bar li kesî nakê illa gorekî karîna wî, [qencî] ya bi dest ve anî ji wî ra ye û [nebaşî] ya bi dest ve anî li dijê wî da ye ...”[1]

وَ أَن لَّيْسَ لِلْإِنسَانِ إِلَّا مَا سَعَى [2]

PIRSYARÊN DERSA 19

Mefhûmê luxetî yê qeza û qederê çi ye?

Mexsed ji qeza û qedera Xudê çi ye?

Bi çi melhezê qeza û qeder bi hetmî û nehetmî teqsîm dibin?

Beda’ çi ye?

Ji qeza û qedera «‘ilmî» û «'eynî» baxivin.

Lewha mehfûz û ya «mehw û isbatê, û girêdana wan digel sernivîsa hetmî û nehetmî şîrove bikin.

Qeza û qeder çewa kom dibin digel ixtiyara insan? Xeberdana mutekellimîna beyan bikin.

Eqsamên esera 'illetên zehfî û me'lûlê wahid da beyan bikin û bêjin ku kîjan qismî ictima'a çend 'illetan ji me'lûlê wahid ra mehal e?

Cewaba şubha cebrê di mesela qeza û qederê da bidin.

Eserên baweriya bi qeza û qedera ilahî şîrove bikin.

[1] - Beqere / 286.
[2] - Necm / 39.

DERSA 20

'EDALETA XUDA

Dagirê:

Pêşekî

Mefhûmê «'edl»ê

Delîla 'edla ilahî

Cewaba çend şubhan

Pêşekî

Di dersên borî da em bi çend ixtilafên di navbeyna du birên kelamî «Eş'erî û Mu'tezile» hesiyan, ji wî cumleyî: kelam û irade ya ilahî û tewhîda sifetî û cebr û ixtiyar û qeza û qeder, ku bîr û hizra her du aliyan zehftir di du alîyên ifrat û tefrîtê da bû.

Ixtilafek binyatî ya dî ku nav van du bira da heyî mesela «'edaleta ilahî ye ku di vê meselê da fikra Şî'an gorekî fikra Mu'tezliyan hatiye hesab kirin û her du pêkve di beraberê Eş'eriyan da hatine nav kirin bi «'Edliye». Û ji ber ku ev mesele di «ʻilmê kelam» da gelek muhim hatiye zanîn û ji meselên binyatî ye ji eslên bawerîyê û veqetênê mezhebê kelamî yê Şî'e û Mu'tezliyan hesab bûye.

Gereke bê zanîn ku Eş'erî jî 'edaleta Xudê nefy nakin û ne we ye ku haşa Xudê zalim bizanin, ev di halekî da ye ku ayetên Qur'ana pîroz deqedeq û bê çep û çûr 'edaleta Xudê sabit dikin û zulmê jê nefy dikin. Nixwe behs û gotin li ser vê yêkê ye ku gelo

'eqlê mirov - bêy wê çendê ku li beyanên şer'î (kitab û sunnet) bê nêrîn - dikarê qeyide û qiraran ji kiryaran ra nexasma ji karên ilahî ra deynê û bi wê gorekê bêjê: filan kar lazim e bê kirin û filan kar neyê kirin. Û mesela, bêjê: «Xuda yê Te'ala lazim e ehlê îmanê bibê bihiştê û kafiran bavêjê cehnemê da», an ev hukmên he li ser esasê wehyê tên dayîn û bêy wê 'eql nikarê hukm û biryarek hebê?

Nixwe nuqta eslî û destpêka ixtilafî ew e ku bi navê mesela «husn û qubha 'eqlî» hatiye nav kirin. Û Eş'eriyan ew inkar kirine û gotine ku (di tiştên tekwînî da) heçî ya Xudê bikê qenc û sipehî ye û (di karên teşrî'î da) heçî ya Xudê destûrê pê bidê baş e, ne ku çimko karek qenc û baş e vêca Xudê ewê dikê an ji kirina wê ra destûrê didê.

Lê "'Edliye" li ser vê bawerîyê ne ku «kiriyar/ef'al» bêy nêrîna li wî qasî ku tekwîn û teşrî'a wan tê nisbet dan bal Xudê Te'ala ve, sifetê «husn û qubh / başî û nebaşî» ji wan ra heye û 'eqlê mirov jî heta bi heddekî dikarê başî û nebaşî (husn û qubh) ya wan fêhm bikê û pê bihesê û Xudê ji kirina karê qebîh pak bizanê û berî bikê, elbet ne bi wê me'nê ku haşa destûrê bidê Xudê û emr û nehy bikê, belkê bi vê me'nê ku pê wan (başî û nebaşiyan) munasib bûn an nebûnê kifş dikê û çêbûna karê nebaş (qebîh) ji Xudê Te'ala ra mehal zanê.

Kifş e ku vejenîna berfireh ya vê meselê û cewaba şubhên ku bûyîn sebeb heta husn û qubha 'eqlî ji alîyê Eş'eriyan ve bê inkar kirin û bikevin di beraberê «'Edliye»yan da, ne di heddê vê kitêbê da ye. Her wiha çêdibê ku gotina Mu'tezileyan jî nuqtên ze'êf hebin ku gereke li cihê wê da lêkolîn li ser bê kirin. Lê tişta heyî ev e ku eslê baweriya bi husn û qubha 'eqlî li bal Şî'an hatiye qebûl kirin û delîla durustî ya wê di Qur'an û sunnet û gotinên imamên pak da heye.

Nixwe li vêderê ewil hinekî emê derheq mefhûmê «'edl»ê da baxivîn û paşê emê işare bikin bal delîla 'eqlî ya vî sifetî ve ku ji sifetên fi'lî yê Xuda ye; di axirîkê da jî emê cewaba muhimtirîn şubhên vê derheqê da heyîn bidîn.

Mefhûmê «'edl»ê

Me'na luxetî ya "'edl"ê beraberî û beraber kirin e. Û di nav xelkê da bi me'na hay jê mana heqê xelkê di beraberê zulmê da bikar hatiye; û ji ber vê yêkê «'edl» bi vî away te'rîf kirine: "'edalet ew e ku mirov heqê her heqdarekî bidîyê - إعطاء كل ذى حق حقه ». Û vê gorekê gereke ewil mirov tiştekî di nezer da bigirê ku heqek hebê da ku bi cî anîna wê jêra bê gotin «'edl» û hay jê neman û zêdegaviya di wê da bi «zulm»ê bê nav kirin.

Lêbelê carna mefhûmê «'edl»ê berfireh dibê û bi me'na «danîna her tiştekî di cîyê wê da, an kirina her karekî bi awayek baş û layiqê wê» bikar tê, û bi vî awayî tê te'rîf kirin:

«وضع كل شىء في موضعه»

û gorekî vê te'rîfê «'edl» beraberê «hikmet»ê, û karê 'adilane beraberê karê hekîmane ye.

Lê vêca derheq vê çendê da ku çewa «heqê xudan heq» û «cihê layiqê her tişekî» kifş û me'lûm dibê, ev tişteke ku gelek xeberdan li ser heye û qismek berketî ji felsefe ya exlaq û felsefe ya huqûq, vê derheqê da ye û kifş e ku li vêderê ew mecal nîne ku jê bê xeberdan.

Tişta ku lazim e li vêderê bê gotin ev e ku: her 'aqlek fêhm dikê ku eger kesek bêy sebeb pariyek nan ji devê zarokek yetîm û sêwî derênê an xûna mirovek bê guneh û bêsûç birêjê zulm kiriye û karek qebîh û pîs jê çêbûye, vêca bervajîyê wê, eger parîyê nanê hatî girtin ji wî yê girtî bigirê û li wî zarokê yetîm û sêwî bizivirînê û qatilê canî bigehênê cezayê wî, karek 'adilane û layiq û bi cî pêk aniye. Û ev hukm û biryar ne girêdayî ye bi emr

û nehya ilahî ve, û heta eger kesekî bawerî bi Xudê jî tunebê dê vî hukmî û vê biryarê bidê.

Lê evahe ku raz û remza vê biryarê çi ye û çi hêz û quwwe ye ku evê husn û qubhê fêhm dikê û pê dihesê û ... evênhe ew mesele ne ku gereke di çiqên muxtelifên felsefê da lêkolîn li ser bê kirin.

Welhasil: ji 'edlê ra mirov dikarê du mefhûmên xas û 'umûmî di nezer da bigirê: yêk- hay jê mana huqûqê xelkê; û ya dî kirina karê hekîmane ku hay jê mana huqûqê (mafê) yên dî jî piçek e ji wê. Nixwe lazimeya 'edlê, beraber kirina her kesî û her tiştî digel hev nîne, meselen mu'ellimê 'adil ne ew e ku hemî qutabiyan çi xebatker û çi tembel û sist hemiyan wek hev teşwîq an tenbîh bikê, belkî mu'ellimê ʻadil ew e ku her yêkî anagora heq û liyaqeta wî pesnê wî bidê û an loman lê bikê. Û qazî yê ʻadil ew e ku malê ku şer li ser heyî, bidê xweyê wî malî.

Her wiha lazimiya hikmet û 'edla ilahî ne ew e ku mexlûqan hemiyan wek hev çêkê û mesela şax û sim û per û çenga û ... bidê mirova jî. Belkê ewa hikmeta Xuda dikê lazimê xwe ev e ku cihanê bi awayek welê çêkê ku pirtirîn xêr û başî kemal jêra hebê û mewcûdên muxtelif ku piç û qetên wê ne wereng bixuliqênê ku munasibê hedefa nihayî bin. Her wiha hikmet û 'edaleta Xudê dikê lazimê xwe ku gorekî karîna her insanekî barê teklîfê lê bikê[1] û di pey ra qas karîn û xebata wî ya ixtiyarî derheq wî da biryarê bidê[2] û paşî ra jî gorekî karên wî kirh û cezayê bidîyê. [3]

---

[1] - Beqere / 286: Ji karîna kesekî der, Xudê barê teklîfê li kesî nakê.
لاَ يُكَلِّفُ اللّهُ نَفْسًا إِلاَّ وُسْعَهَا

[2] - Yûnus / 54: Û bi 'edalet derheq wan da biriyar tê dan û zulm li wan nabê.
... وَقُضِيَ بَيْنَهُم بِالْقِسْطِ وَهُمْ لاَ يُظْلَمُونَ

[3] - Yasîn / 54: Vêca îro qet çi zulm li kesî nayê kirin, û xêncî ji wê ya hewe kirî ji hewe ra nayê dayîn.

Delîla 'edaleta Xudê

Çewa ku hat gotin 'edaleta Xudê gorekî gotinekî hinek ji hikmeta ilahî ye û bi gotinek dî hema ew bi xwe ye, nixwe delîla sabit kirina wê hema ew e ku hikmeta Xudê pê sabit bûyî. Di dersa yazdê da işare pê hat kirin û li vêderê emê hinekî zehftir jê baxivîn.

Me zanî ku Xudê Te'ala xweyê bilindtirîn merteba qudret û ixtiyarê ye, û dikarê her karê mumkin-ul wucûd bikê an nekê û çi qudret û hêz nikarin eserê lê bikin û ewî mecbûr bikin ji kirina karekî ra. Lêbelê heçî ya dikarê nakê belkî heçî ya irade bikê û bixazê dikê.

Û her wiha me zanî ku irade ya Wî ne bê hesab û kitab e, belkî ewa ku sifetên Wî yên kemalê dikin lazimê xwe qet ewê nakê. Û çimko Xuda yê Mute'al hema kemal bi xwe ye; irade ya Wî jî bi alîyê kemal û xêra mexlûqata da ye, û eger lazimiya hebûna mexlûqekî çêbûna xirabî û kêmasî ya di cihanê da bê, alîyê xirabî ya wê mexseda «bi-t tebe'» e, yanî çimko lazima ji hev venebûnê xêra pitir e, xêra xalib dikevê ber irade ya ilahî.

Nixwe sifetên kemalî yên ilahî dikê lazimê xwe ku cihanê bi awayek wisa çêkê ku li ser hev gelektirîn başî û kemal jêra hebê, û ji vêderê sifetê hikmetê ji Xuda yê Te'ala ra sabit dibê.

Li ser vê binyatê, çêkirina insan di wa şerta da ku imkan ji hebûna wî ra hebê û hebûna wî serkaniya pirtirîn başiya bê ketiye ber irade ya ilahî, û yêk ji zêdahî yên binyatî yên insan ixtiyar û irade ya wî ya azad e, û şik tune ku hêza ixtiyar û bijartinê yêk ji kemalatan tê hesabê û ew tişta ew têda hebê kamiltir e ji wê ya ew têda neyî.

Lêbelê lazimî ya muxtar bûna insan ev e ku hem bikarê karên baş û berketî bikê û bi alîyê kemala bê nihayet ve biçê û hem bikarê pîs û nebaş bikê û bikevê nav ziyan û bextreşî ya her û

her da. Elbet ew tişta eslî ya irade ya Xudê li ser hema kamil bûna wî ye, lêbelê çimko lazimî ya kamil bûna ixtiyarî ya insan imkana nizim bûn û ketinê ye jî ku ji ber hewayên nefsanî û hedefên şeytanî çêdibin, ev suqût û ketina ixtiyarî jî «bi-t tebe'» ketiye ber irade ya Xudê.

Û çimko bijartina agahane muhtacê nasîna durusta rêkên başî û xirabîyê ye, Xudê Te'ala emrê insan kiriye bi wê ya di xêr û mesleheta wî da û nehya wî kiriye ji wê ya xirab û nebaş da ku bibê wesîla çêbûna hereketa wî ya tekamulî. Û çimko teklîfên ilahî ji wê çendê ra hatine danîn ku mirov bigehê desthata ku ji kirina wan destve tê û çi menfe'et ji Xudê ra têda tunehin, ji ber wê hikmeta ilahî dikê lazimê xwe ku ev teklîf munasibê karîna mukellefa bê, çimko ew teklîfên imkana guhdan û kirinê tunebin bêhûde ne.

Vê gorekê ewilîn merhela «'edl»ê (bi me'na xas) yanî 'edalet di meqamê teklîfê da bi vê delîlê sabit dibê ku eger Xudê Te'ala teklîfekî zêdetirê ji guhdana 'evdan kifş bikê û deynê, ew nikarê pê 'emel bikê û dibê karek bêhûde û pûç.

Lê vêca 'edaleta di meqamê biryar dana di nav bendeyan de, bi vê yêkê sabit dibê ku: ev kar ji ber wê ye ku mirov bibê musteheq ji kirh û cezayê ra, û eger ne bi 'edalet pêk bê hingê dibê neqza xerezê (hedefa wê jinav diçê).

Û 'edaleta di meqamê dana xêr û cezayê da jî pê hedefa nihayî ya hebûnê sabit dibê, çimko ewê insan çêkirî da bigehê desthata karên xwe yên baş û xirab, eger bervajîyê desthata wan xêrê an ceza bidê wan nagehê hedefa xwe.

Nixwe delîla 'edaleta Xudê bi me'na durust ev e ku: sifetên Wî yên zatî sebebê mi'emileta hekîmane û 'adilane ye, û çi sifetên ku zulm an bêhûdeyî an pûçî pêve bên di Wî da tunehin.

Cewaba çend şubhan

1- ixtilaf û ne wek yêk bûna di xuliqandina mexlûqan nexasma di mirov da heyî çewa digel ‘edalet û hikmeta Xudê rêk dikevê? Û çima Xuda yê Hekîm û ‘Adil mexlûq hemî wek hev çênekirine?

Cewab ev e ku ixtilafa di behre girtina di hebûnê da ji mexlûqan ra heyî lazimeya sîstima hebûnê û tabi'ê qanûnên 'llî û me'lûlî ye ku di wan da heye. Û ferza yêk cûrî ya hemî mexlûqan ferzek ne pijhayî ye, û pê fikrek kêm jî dixweyhê ew guman beraber e digel terka çêkirin û afirandinê, çimko mesela, eger mirov hemî jinan mêr bûna zarok û zuriyet çênedibûn û wê nesl û nifşa insan binbir bibûya; û eger mexlûq hemî mirov bûna, êdî wê çi bixwaran û ihtiyacî yên xwe çewa rakiran? Û eger heywanat û giya û ... hemî yêk tişt û yêk reng bûna ev hemî feydên zehfî û sipehîtahî wê tunebûyan. Û çêbûna vî qismî û wî qismî yên tişta bi vî şiklî an wî şiklî jî girêdayî ye bi esbab û şerayitan ve ku di herkîn û guherînên maddê da tên pêş. Û pêşiya afirandinê da kes çi heq li ser Xudê nînin ku ew bi vî awayî an wî awayî çêkê an li vêderê an li wê derê û an li filan zemanî da bixuliqênê heta vêca ji 'edl û zulmê ra cihek hebê.

2- eger hikmeta ilahî li ser vê sekiniye ku ev cihan cihê jiyana insan bê, çima ewî dimirênê û xilasekê didê saxî û jiyana wî?

Cewab ev e ku: ***yêk-*** mirin û saxiya tişta di vê cihanê da pê qanûnên tekwînî û girêdana 'illî û me'lûlî, û lazimeya sîstima xilqetê ye. ***Du-*** eger mexlûqên sax nemirbûyan meydan ji peyda bûna yên pêretir ra çênedibûya û wê ew ji jiyan û saxîyê bêbehr mabûna. ***Sê-*** eger em we hesab bikîn ku hemî mirov sax bimînin, di zemanek ne gelek dirêj da wê 'erd ji wa re teng bibê û wê ji ber tengavî û birsîtîyê daxaza mirinê bikin. ***Çar-*** hedefa eslî ya xilqeta insan ew e ku bigehê bexteweriya ebedî, û heta ku insan pê mirinê ji vê dinyayê neyê guhaztin nagehê wê hedefa nihayî.

3- ev derd û nexweşî û bela yên tebî'î (wek lêmişt û zelzelê) û gîrûgiriftên komelayetî (wek: şer û zulm û sitem) ku hene çewa digel 'edla Xudê rêk dikevin?

Cewab ev e ku:

Yêk- qewimînên tebî'î tişteke ku ji ber fi'l û infi'alatên maddî çêdibin û çimko başî yên bi wa ve tên pitir in ji xirabî yên wan, nixwe ne muxalifê hikmetê ne, û her wiha peyda bûnên fesad û xirabî yên komelayetî lazimeya muxtar bûna insan e, û di wê halî da jî meslehetên jiyana komelayetî zêdetir in ji xirabî yên wê û eger mefasid zêdetir bûna, qet kes li ser 'erdê nedima.

Du- hebûna eva derd û bela û musîbetan ji aliyekî ve dibin sebeb ku insan xebatê bikê ji deranîna esrarên tebî'et ra û her wiha dibê sebeb ku ‘ilm û sen'et peyda bibin. Û ji alîyê dî ve jî rûbirû bûna digel zehmetiyan sebebek girîng e ji pêşketin û bişkiftina isti'dad û karînên veşartî û tekamula insan ra. Welhasil, ragirtina derd û zehmetiyan di vê dinyayê da eger bi awayek durust bê dibê sebebê xêrek gelek hêjayî di wê dinyayê da, û bi awayek baş wê cihê wê bê dagirtin.

4- 'ezabê ebedî di beraberê gunehên sînor kirî û mehdûdên vê dinyayê da, çewa digel 'edaleta Xudê rêk dikevê?

Cewab ev e ku di navbeyna karên qenc û xirab û xêr û cezayê axiretê da bi awayekî girêdana 'illî û sebebî heye, ku bi rêka wehyê ve kifş bûye û ji xelkê ra hatiye gotin. Û çewa ku di vê dinyayê da hinek cinayet eserên xirab yên dirêj pêve tên, mesela, kor kirina çavê xwe an yê xelkê di bêhnek kurt da pêk tê, netîce û desthata wê heta axirê 'emr dewam dikê û dirêjî jêra heye, her wiha gunehên mezin jî eserên axiretî yên daimî jêra hene, û eger kesek wesîle yên cubrana wê (wek tewbê) di vê dinyayê da dest ve neyinê, heta ebedê wê esera wê ya xirab gel wî bimînê. Û çewa ku kor mayîna mirov heta axirîka 'emrê wî ji

ber cinayeta ku di bêhnek kurt da kirî dijatî û munafat digel 'edaleta Xudê tunehin, serda hatina 'ezabê ebedî jî ji ber gunehên mezin, munafat digel 'edla Xudê nîne, çimko desthat û netîca karekî ye ku mirovê gunehkar bi zanîn û agahane ew kar kiriye.

PIRSYARÊN DERSA 20

Reh û rîşa ixtilafê di mesela 'edla ilahî da çi ye?

Mefhûmê «'edl»ê ronahî bikin.

Gelo lazimeya ‘edaletê beraberiya hemî tiştî ye digel hev? Çima?

Lazimî yên hikmet û 'edaleta Xudê çi ne?

Delîla 'edaleta Xudê çi ye?

Hedef ji çêkirina insan çi ye?

Ixtilafa tekwînî ya mexlûqata çewa digel 'edaleta Xudê rêk dikevê?

Xuda yê Hekîm çima mexlûqê Xwe dimirênê?

Hebûna belayên tebî'î û musîbetên komelayetî çewa rêk dikevin digel hikmet û 'edaleta Xuda?

Çima gunehên mehdûd dibin sebebê 'ezabê nemehdûd?

PIŞKA DUWÊ

RÊBER NASÎ

DERSA 21

DERHEQ MESELA PÊXEMBERÎYÊ DA

Dagirê: Pêşekî

Hedef ji behsên vê pişkê

Şiklê lêkolîna ‘ilmê kelam

Pêşekî

Me zanî ku esasîtirîn û binyatîtirîn meselên ku gereke her şexsê ‘aqil bizanê da ku jiyanek ‘aqilane hebê ev in:

1- Hebûna cihan û insan ji kî ye? Teybîr û irade ya wan bi destê kî ye?
2-Axirîka jiyanê û mexseda nihayî ya insan kûderê ye?
3-Insan ku ji bextewerî ya xwe ya heqîqî û gehana kemalê ra ihtiyac û niyaz heye ji rêk û bernameyek durust ra, çi wesîleyek heye ku mirov piştrast bikê ji nasîna durust ya vê rêkê û ew di ixtiyara kî da ye?

Cewaba durust ya van pirsyaran hema sê eslên «tewhîd û me'ad û nubuwwet» in ku eslîtirîn bawerî yên hemî dînên asmanî ne.

Di qismê ewilê kitêbê da me meselên «Xudanasî»yê vejenandin û em gehan vê desthatê ku hemî tiştî, hebûna xwe ji Xuda yê Wahid û Tenê girtine û hemî pêkve li bin teybîra Wî ya hekîmane da ne û qet çi yêk ji wan di çi halan da û di çi karan da û di çi wext û dem û ciyan da ne bê niyaz e ji Wî.

Me ev gotin pê delîlên 'eqlî sabit kirin û me ronahî kir ku ev mesele yên he hema tenê bi rêka 'eql ve tên sabit kirin, çimko

delîl anîna «te'ebbudî» û istinada bi kelamê Xudê hingê durust e û çêdibê ku hebûna Xudê û gotina Wî û durustî ya xwe pê girtina bi wê gotinê, pê delîla 'eqlî sabit bûbê, çewa ku xwe girtina bi gotina pêxember û imam jî li ser wê sekiniye ku pêxemberî û imamet û delîl bûna gotina wan sabit bûbê. Nixwe eslê nubuwwetê jî gereke bi rêka wehyê sabit bibê, herçend eslê «me'ad/qiyamet» hem pê delîla 'eqlî û hem neqlî qabilê isbat e.

Vê gorekê ji ronahî kirina behsên van du qisma ra (pêxemberî û qiyamet) ewil mirov dikarê «eslê qiyamet» û «eslê pêxemberî»yê pê delîlên 'eqlî sabit bikê û dema pêxemberî ya pêxemberê Islamê û heqaniyeta Qur'ana pîroz sabit bû hingê mirov dikarê meselên dî yên van du qisman li ber tîroja kitêb û sunnetê ronahî bikê. Lê çimko di 'elimandinê da ji hev qetandin û cida kirina meselan xweştir û şîrîntir e, ji ber vê yêkê wek çewa 'aliman ji pêşda jî we kirîn, ewil emê ji behsa pêxemberîyê baxivîn û di pey da jî ji «me'ad - qiyamet»ê.

Hedefa ji behsên vî qismî

Yêkemîn hedef ji behsên vê pişkê, sabit kirina gotinê ye ku ji nas kirina heqîqetên cihanê û rêka durust ya jiyanê ra tiştek dî ji xêncî «hiss» û «'eql»ê heye ku bêy xeletî û nedurustî ye. Û ew hema «wehy» e ku hînkirineke ji alîyê Xudê ve û mexsûsê hinek ji 'evdên Xudê ye û gişti ya xelkê ji heqîqeta wê bê xeber in; çimko nimûna wê di xwe da nabînin, lêbelê dikarin bi rêka eser û nîşanên wê ve pê bihesin û de'wa ya pêxemberan (selam û selatên Xwedê li ser wan bin) ku dibêjin wehy ji me ra tê, qebûl bikin. Û tebî'î ye eger hatina wehyê ji kesekî ra sabit bû û peyama wê geha xelkê, ew berpirs in ji wê çendê ku ewê qebûl bikin, illa ku peyam taybetê kes an kesên mexsûs bê û an bi zeman û wextek kifş bûyî ve girêdayî bê.

Nixwe meselên binyatî yên vî qismê ev in: lazim bûna hatina

pêxemberan, lazimî ya parastina wehyê ji têkeliya bi qestî an ji xeletî ve, heta ku peyama wê bigehê xelkê. Û bi gotinek dî: lazimî ya parastî bûna pêxemberan di girtina wehyê da û di ragehandina peyama ilahî da, her wiha lazimî ya hebûna rêkekî ji xelkê ra da ku pê wê bikarin pêxemberî ya pêxemberan sabit bikin.

Vêca pişti ronahî bûna mesele yên «wehy» û «pêxemberî»yê pê delîla 'eqlî, dor dgehê meselên dî yên wek: hebûna pêxemberên zehfî û çend kitêbên 'esmanî, kifş kirina pêxember û kitêba dûmahîkê û kifş kirina cîgirên wan. Lê vêca sabit kirina va meselan hemiyan pê delîla 'eqlî çênabê û di gelek ciyan da ji delîla «neqlî» istifade tê kirin.

Awayê lêkolînê di 'ilmê kelam da

Pê qasê hatî gotin ferqa binyatî navbeyna felsefe û 'ilmê kelam da ronahî bû, çimko felsefe, hema tenê ew mesele ne ku pê delîla 'eqlî sabit dibê, lêbelê 'ilmê kelam dagirê hinek ji mesela ye ku xêncî pê delîla neqlî û «te'ebbudî» isbat nabê.

Bi gotinek dî: nisbeta ku di navbeyna meselên felsefî û meselên 'ilmê kelam da heyîn «nisbeta 'umûm û xusûsa min wech» e, di wî halî da ku mesele yên muşterek ku bi rêka 'eql ve sabit dibin di felsefe û kelam da hene, her yêk ji wan mesele yên xassê bi xwe ve jî hene, ku mesele yên xassê felsefî bi awayê 'eqlî beyan dibin û meselên xassên kelamî jî bi awayê neqlî sabit dibin. Bi gotinek dî: metoda vejenînê di 'ilmê kelam da «telfîqî – duserekî» ye yanî hem awayê te'eqqulî û hem te'ebbudî her du têda hene. Hasilê gotinê ev e ku di navbeyna felsefe û kelam da du ferqên binyatî hene:

Yêk- xêncî ji meselên muşterek (wek Xudê nasîyê) her yêk ji wan meselên taybetê bi xwe ve hene ku di ya dî da behs jê nayê kirin.

Du- metod û şiklê vejenîn û tehqîqê di hemî meselên felsefî da bi awayê 'eqlî ye, bervajîyê ‘ilmê kelam ku di hinek mesela da (wek meselên muşterekê felsefe û kelam) ji metoda 'eqlî behre tê girtin û di hinek mesela da (wek mesela imametê) ji uslûba neqlî istifade dibê, û di hinek meselên dî da (wek mesela qiyametê) ji her du awaya behrê digirê û istifade dikê.

Cihê wê ye bê gotin ku: meselên mexsûsên ‘ilmê kelam ku bi rêka neqlî û «te’ebbudî» ve sabit dibin hemî ne di mertebe û dereceyekî da ne, belkî birek ji wan yên wek «huccîyet û delîl bûna sunneta Pêxemberê Ekrem (s)» rasterast û musteqîm bi rêka ayetên Qur’ana pîroz ve sabit dibin (pişti ku heqaniyeta Qur’anê pê delîla 'eqlî sabit bû) û di pey ra jî meselên dî wek kifş kirina cîgirê wî hezretî û delîl bûna gotinên imamên pak (selamên Xudê li ser wan bin) ronahî dibin. Kifş e ku desthata delîlên neqlî hingê yeqînî ye ku seneda wan qet'î û delaleta wan deq û ronahî bû.

PIRSYARÊN DERSA 21

Çima meselên girêdayî bi Xuda nasîyê ve hema tenê bi rêka 'eqlî ve hatin beyan kirin?

Meselên binyatî yên pêxemberîyê çi ne?

Gelo mirov dikarê meselên binyatî yên pêxemberî û qiyametê pê delîlên neqlî sabit bikê? Û gelo di navbeyna van du deste yên mesela da ferqek heye?

Kîj meselên ‘ilmê kelam mirov dikarê pê delîlên neqlî sabit bikê?

Çima behsa pêxemberîyê pêşiya behsa qiyametê da hat? Gelo tertîbek dî ya mentiqî ji meselên va du qisma ra heye?

Di navbeyna felsefe û kelam da çi ferq hene?

Meselên ‘ilmê kelam ji nezer «isbat» ve li ser çend desta teqsîm dibin? Tertîba wan beyan bikin.

DERSA 22

NIYAZA BI «WEHY» Û «PÊXEMBERÎ»YÊ

Dagirê:

Lazimî ya hatina pêxemberan

Têra nekirina zanînên beşer

Feydên hinartina pêxemberan

Lazimî ya hatina pêxemberan

Ev mesele ku ji binyatîtirîn meselên pişka pêxemberîyê ye bi delîlekî sabit dibê ku pêk hatiye ji sê pêşgotinan:

1- hedef ji afirandina insan ew e ku pê kiryarên xwe yên ixtiyarî di rêka tekamula xwe da bi alîyê kemala xwe ya nihayî ve biçê, ew kemala ku xêncî pê ixtiyarê dest ve nayê. Bi gotinek dî: mirov ji vî qasî ra çêbûye ku pê 'ibadet û guhdana Xudê Te'ala, bibê layiqê dest ve anîna ewan rehmetan ku taybet û mexsûsê insanê kamil e. Û irade ya hekîmane ya Xudê di eslê xwe da ew e ku mirov bigehê kemal û bextewerîyê, lê çiko ev kemal û bextewerî ya bilind ji rêka kirina karên ixtiyarî pêve nayê dest, beşer di jiyana xwe da ketiye ser durêkîyê da ku meydana bijartin û intixabê jêra hebê, ku bêşik yêk ji wan du rêkan bi alîyê bextreşî û 'ezab ve ye ku «bi-t tebe' û ne bi-l isale» irade ya ilahî bi wê ve jî girhaye.

Ev pêşekî ya he dema me ji hikmet û 'edaleta Xudê axiftî ronahî bû. Binêrin dersa 11 û dersa 20.

2- ixtiyar û bijartina agahane û bi zanîn, xêncî ji wê ku lazim e karîn hebê ji kirina kar ra û meyla navdeyî hebê ku ewî bi alîyê kar û meydanên 'emel ve bikişênê, ev jî lazim e ku karên baş û xirab û rêkên layiq û nelayiq bi durustî nas bikê, û hingê mirov dikarê rêka kemala xwe azadane û agahane bibijêrê ku hem hedefê û hem rêka gehana wê nas bikê û ji nişûv û evraz û asteng û şimitîngehên wê agah bê. Nıxwe naverûka hikmeta ilahî ew e ku wesîle yên lazim ji dest ve anîna van nas kirina ra bidê beşer. Eger ne, wê bibê wek gazî kirina hineka ji ziyafetekî ra ku cihê ziyafetê nîşanê wan nekê! Û kifş e ku ev kar bervajîyê hikmetê ye û dibê «neqza xerezê». Ev pêşekî jî ronahî ye û ne muhtacê xeberdan û ronahî kirinek zêdetir e.

3- nasîn û zanînên me'mûlî û mute'arefên mirovan ku pê arîkarî ya hiss û 'eqlê dest ve tên, her çend ji bona rakirina ihtiyacên jiyanê gelek muhim û hêjayî ne; lêbelê têra nas kirina hemî alîyên rêka kemal û bextewerî ya heqîqî nakê û pê wê tenê hemî alîyên kemal û se'adeta ferdî û komelî û maddî û me'newî û dinyayî û uxrewî nayên nas kirin, û eger rêkek dî ji rakirina kêmasiyan ra tunebê hedefa Xudê ji çêkirina insan nayê cî.

Dema em evan sê pêşekiyan berçav bigirin, em digehin evê desthat û netîceyê ku hikmeta xudayî dikê lazimê xwe ku rêkek dî ser rêka hiss û 'eql ra ji bona nas kirina rêka kemala hemî alî ji beşer ra deynê û bidê ber wî, da ku mirov bikarin rasterast an bi rêka hinek dî ve ji wê istifade bikin. Û ew hema rêka «wehy»ê ye ku daye pêxemberan (selamên Xudê li ser wan bin), û ew rasterast û yên dî bi rêka wan ve ji wê istifade dikin û ewa ku ji gehana se'adet û kemala nihayî ra lazim e, dest xwe ve tînin. Di nav evan sê pêşekiyan da çêdibê ku pêşekiya paşî bikevê ber şikê, ji ber vê yêkê emê derheq wê da pitir baxivîn da ku ronahî bibê zanînên beşer têra nas kirina rêka kemala hemî alî ya insan nakê û ew muhtacê rêka wehyê ye.

Kafî nebûna zanîna beşer

Ji vê yêkê ra ku rêka durusta jiyanê bi hemî alîyên wê ve bê nas kirin, lazim e mirov bi awayek hemî alî ji ewil heta axir bê nas kirin; peywendên wî digel tiştan û mirovan û mexlûqên dî; eserên peywendên cûrbicûr ku digel bextewerî û bextreşî ya wî heyî û ... hemî gereke kifş bibin û bên zanîn û her wiha durustî û xirabî bên nas kirin, da berpirsyarî ya mirov ku bi milyaran li ser 'erdê hene û di şert û mercên ne wek hev yên tebî'î û komelayetî da dijîn û ji nezer bedenî û rewanî û rûhî ve ferq in, kifş bibê.

Lêbelê ev zanîn ne hema ji kes û kesan ra çênabê, belkî bi hezara kom û birên xwey zanîn di çiqên muxtelifên ‘ilmên insanî da nikarin û ji wan nayê ku eva mesela hemiya ji hev cida bikin û bi şiklê qanûnê binivîsin, bi awayek wereng ku mesalihên ferdî û komî û maddî û me'newî û dinyayî û uxrewî yên hemî mirovan li ber xwe bigirê û dema ew meslehet bikevin li beraberê hev da ya muhimtir pêş bêxin.

Awayê ku di dirêjiya tarîxê da derheq guherînên huqûqî û qanûnî da tê dîtin nîşan didê ku digel va hemî zanaya û tehqîq û vejenînên wan, eve hezaran sal e hêca sîstimek durust ya huqûqî û kamil çênebûye, û berdewam komên huqûqî bi kêmasiya qanûnên ku çêkirîn dihesin û pê rakirina madde yên qanûna xwe an lê zêde kirina bendekî lê digerin ewê durust û temam bikin.

Lazim e ev jî bê zanîn ku ji nivîsîna va qanûnan bi xwe ra jî ji sîstima huqûqî ya ilahî û şerî'etên asmanî gelek behre birine û istifade kirine. Ev jî gereke bê zanîn ku hemî xebat û hemm û xema huqûqzan û qanûndaneran ew e ku meslehetên dinyayî û komelayetî dest ve bênin û qet xemê ji dest ve anîna mesalihên uxrewî û kêm û zêdehî ya wa ku bi mesalihên maddî û me'newî ve girêdan hene naxwin û ji wan ra ne xem e. Û eger eva he jî

berçav bigirtan ji xwe qet nedigehan çi meselên qet'î, çimko pê heshana mesalihên maddî û dinyayî heta bi heddekî pê tecruba ‘ilmî çêdibê, lêbelê mirov pê hissê nikarê bi meslehetên me'newî û uxrewî bihesê û mirov nikarê başê baş ewan hilsengênê û dema bikevin li beraberê meslehetên maddî û dinyayî da nikarê mîzana muhimmî ya her yêkî nas bikê.

Pê nêrîna li wez' û halê îro yê qanûnên beşerî, mirov pê dihesê ku bi awayek qet'î ku beşerê di destpêkê da ji nas kirina rêka durusta jiyanê ra ji beşerê îro nekartir bûye, vêca ferzen bê qebûl kirin ku beşerê îro karîbê pê tecrube ya hezaran sale ya mirovên pêşda sîstimek ya huqûqî ya durust û kamil anîbin; û ferzen ku bextewerî ya ebedî û uxrewî jî li xwe girtibê, cihê vê pirsyarê her heye ku: beredayî hiştina bi mîlyara mirovan di dirêjiya tarîxê da di nav nezanîna wan ra, çewa digel hikmeta ilahî û hedefa afirandina wan rêk dikevê?

Welhasil: hingê hedefa ji çêkirina mirov ji ewil heta axir pêk tê û cî digirê ku rêkek ser hiss û 'eql ra ji bona nas kirina heqîqetên jiyanê û berpirsyarî yên ferdî û komî hebê, û ew jî ji rêka wehyê pêve ne tiştek dî ye.

Ji vê delîlê ev jî derdikevê ku gereke ewwilîn insan pêxemberê Xudê bê da ku ew bi rêka wehyê ve rêka durusta jiyanê nas bikê û hedefa afirandinê derheq wî bi xwe da pêk bê û di pey ra mirovên dî bi rêka wî ve bikevin ser rêka durust.

Feydên hinartina pêxemberan

Pêxemberên Xuda zêdetirê ji wî qasî ku rêka durust ji kamil bûna heqîqî ya mirovan ra nîşan dane û her wiha wehy ji wan ra hatiye û ewa ragehandiye, eserên muhim yên dî jî di kamil bûna insan da hebûne ku girîngtirînê wan bi vê qirarê ne:

1- gelek tişt hene ku mirov dikarê pê 'eql fêhm bikê, lêbelê niyaz

bi derbaz bûna zeman û tecrubeyek zehfî heye, an jî ji ber hîn kirinên xelet û piropagenda nebaş li ber xelkê xef û veşartî dimînin. Ev tiştên he bi rêka pêxemberan ve tên ronahî kirin û pê bîr anîn û jê xeberdana mukerrer pêşiya wê yêkê tê girtin ku bi temamî bên ji bîr kirin û pê hîn kirina durust û mentiqî, pêşiya aloz kirin û 'elimandinên xelet tên girtin.

Û ji vêderê nav kirina pêxemberan bi «muzekkir – bîrîner» û «nezîr - tirsîner» û nav kirina Qur'ana pîroz bi «zikr - bîrhatin» û «tezkire - bîranîn» ronahî dibê.

Mîrê bawerdaran Elî (s) derheq hikmetên hatina pêxemberan da di gotinek ya xwe da dibêjê: *«Xuda yê Te'ala pêxemberên xwe li pey hev şandin û rêkirin, da ku wefadarî ya bi soza fitretê ji xelkê bixazin, û niʼmetên hatîn ji bîr kirin bênin bîra wan, û pê teblîx û ragehandinê delîl û huccetê li ser wan temam bikin».*[1]

2- yêk ji tiştên girîng û muhim di terbiyet û gehan û ruşda insan da hebûna nimûneyê ye di kiryar û 'emelan da, û muhimmî ya wê di behsên rûhnasîyê da sabit bûye. Pêxemberên Xuda ku insanên kamil û terbiyet bûyî yên ilahî bûne bi başî berpirsyarî ya xwe di vê derheqê da pêk anîne, ku xêncî ji hîn kirin û 'elimandina xelkê, ew temîz kirine ji nebaşiyan û berpirsyarî ya «tezkiye» kirinê hebûne. Em zanin ku di Qur'ana pîroz da «te'lîm û tezkiye» digel hev hatine û heta di hinek cihan da «tezkiye» pêşiya «te'lîmê» da hatiye gotin.

3- bereketek dî ya hebûna pêxemberan (s) di nav xelkê da ew bûye ku dema şert û merc bihatan cî, ewa rêberiya komelayetî û siyasî û hukm dana di nav wan da li xwe digirtan. Û ronahî ye

[1]- Nehc-ul Belaxe / x. 1
وَوَاتَرَ إِلَيْهِمْ أَنْبِيَاءَهُ، لِيَسْتَأْدُوهُمْ مِيثَاقَ فِطْرَتِهِ ، وَيُذَكِّرُوهُمْ مَنْسِيَّ نِعْمَتِهِ ، وَيَحْتَجُّوا عَلَيْهِمْ بِالتَّبْلِيغِ

ku rêberê pak û hatî parastin ji nebaşiyan ji mezintirîn ni'metên Xuda ye ji komelê ra, û bi rêka wî ve pêşî li gelek ji xirabîyên komelê tê girtin û ew ji ixtilaf û inhrafê xilas dibin û rêrast dibin bo alîyê kemala xwe ve.

PIRSYARÊN DERSA 22

Hedef û amanc ji xuliqandina insan çi ye?

Gelo wek çewa irade ya hekîmane ya Xudê bûyî, ew ku mirov bigehê bextewerîyê û rehmet lê bê kirin, hema irade kirina bextreşî û 'ezabê insan jî wereng e an di navbera wan da ferqek heye?

Çi tişt ji bikar anîna ixtiyar û bijartina agahane ya insan ra lazim in?

Çima 'eqlê beşerî têra dest ve hatina nasînên ku ji insan ra lazim in, nakê?

Delîla lazimî ya hatina pêxemberan binivîsin.

Eger mirov bikariya pê tecrubê rêka bextewerî ya dinyayî û komelayetî ya xwe nas bikê, gelo hingê ihtiyac bi wehyê tunebû? Çima?

Gelo mirov dikarê delîlek 'eqlî bênê ku ewilîn mirov pêxember bûye? Çewan?

Pêxemberan çi feyde yên dî hebûne?

DERSA 23

CEWABA ÇEND ŞUBHAN

Dagirê:

Çima gelek ji xelkê bê behr mane ji hidayeta pêxemberan?

Çima Xudê pêşî li ixtilaf û inhirafê negirtiye?

Çima pêxemberan seratî yên sen'etî û iqtisadî tunebûne?

Jinav birina çend şubhan

Derheq delîla lazimî ya hatin û hinartina pêxemberan da (selamên Xudê ser wa bin) hinek pirsyar û şubhe hene ku emê li vêderê jê xeber bidin:

1- eger hikmeta Xuda li ser wê sekiniye ku rêkirina pêxemberan ji hidayet û rêrast kirina hemî mirovan ra bê, nixwe çima ew hemî ji mentiqeyekî taybet (rojhelata navîn) rabûne û 'erdên dî ji vê ni'metê bê behr û bê pişk mane? Nexasma ku di zemanên berê da peywend û xebergehan gelek mehdûd û sînorkirî bûye û gehana xeberekî ji cihekî bo cihek dî gelek zeman jêra lazim bûye û bi zehmet bûye, belkî gelek millet û gel hebûne ku qet bi hebûna pêxemberan nehesane û jê bê xeber bûne.

Cewab ev e ku: hatina pêxemberan (selamên Xuda li wa bin) ne di menteqe û herêmek xas û taybet de bûye, çewa ku Qur'ana pîroz dibêjê her ummetekî hişyarker û peyamberek hebûye:

«إِنَّا أَرْسَلْنَاكَ بِالْحَقِّ بَشِيرًا وَنَذِيرًا وَإِن مِّنْ أُمَّةٍ إِلَّا خَلَا فِيهَا نَذِيرٌ» - Fatir / 24

Û kerem dikê:

« وَلَقَدْ بَعَثْنَا فِي كُلِّ أُمَّةٍ رَّسُولاً أَنِ اعْبُدُواْ اللّهَ وَاجْتَنِبُواْ الطَّاغُوتَ ...»

“Bi yeqîn, me ji nav her ummetekî pêxemberek rêkiriye ku (bêjê wan:) ‘ibadetê Xudê bikin û xwe ji zêdegavî yên neheq paşda bidin» Nehl / 36. Û eger ji pêxemberan navê hineka di Qur’anê da hatiye, me'na wê ne ev e ku hema pêxember ew tenê bûne. Qur’ana pîroz bi xwe dibêjê ku: hinek pêxember hebûne ku nav ji wan nehatiye birin di Qur’anê da: Nisa /164

«وَ رُسُلاً قَدْ قَصَصْنَاهُمْ عَلَيْكَ مِن قَبْلُ وَرُسُلاً لَّمْ نَقْصُصْهُمْ عَلَيْكَ »

Ev yêk; ya duwê :

Naveroka vê delîlê ew e ku gereke xêncî ji «hiss û 'eql»ê rêkek dî hebê ku ji hidayeta xelkê re behre jê bê girtin û istifade jê bibê, lê vêca hidayet bûna xelkê girêdayî ye bi du şertan ve: *yêk*- ew bi xwe bixazin ji vê ni’meta xudayî behremend bibin; *du*- hinek dî ji behremend bûna wan ra astenga çênekin û pêşiya istifade ya wan ji vê ni’metê negirin. Û bê behr mayîna gelek ji xelkê ji hidayeta pêxemberan ji ber bijartina wan ya nedurust bi xwe bûye û gelek dî jî pêşî li wan hatiye girtin û ji wan nehatiye ku ji hidayeta pêxemberan istifade bikin.

Û kifş e ku pêxemberên Xuda her û her ji rakirina van astenga ra xebat kirine û digel dijminên Xuda nexasma zorbêj û mustekbiran berberekanî kirine, û gelek ji wan di rêka hidayeta xelkê da canê xwe ji dest dane û carna jî ku heval û hogir peyda kirine rabûne şerê zalimên zorgo; ewên ku nedihêlan dînê Xudê berfireh bibê di 'erdê da.

Nukte ya ku cihê diqqet kirinê ye ev e ku: muxtar bûna hereketa tekamulî ya mirov, dikê lazimê xwe ku ev meselên he bi awayek

wusa pêşve biçin ku meydan ji bijartina baş û xiraba her du alîyên heq û batil ra hebê, illa ku serketina zordar û ehlê batil bigehê wê derê ku bi temamî pêşî li hidayeta xelkê bê girtin û nûra heq û hidayetê di nav komelê da bê temirandin, hingê ye ku Xudê Te'ala bi rêkên veşartî (xeybî) ve arîkariya alîyê heq dikê.

Welhasil: eger pêşîgirên vî awayî ser rêka pêxemberan nebûna wê gazî ya wan bigeha guhê hemî xelkê cihanê û wê hemî bi rêka wehyê ve ji niʼmeta hidayeta xudayî behre bibiran. Nixwe gunehê mehrûm bûna gelek ji xelkê ji hidayeta pêxemberan li stûwê wa kesa da ye ku pêşî li berfireh bûna gazî ya wa girtine.

2- eger pêxember hatine rêkirin da ku şert û mercên kamil bûna mirovan temam bikin, nixwe çima ew hebûne jî dîsa ev qas xirabî û jirêderî ketiye nav 'alemê û zêdetirê xelkê di gelek zemana da ketine inkar û kufrê û heta peyrewên dînên 'esmanî jî rabûne hev û dijminî ya hevdu kirine û şerên xûnî û wêranker xistine rê? Gelo çênedibûya ku hikmeta Xudê li ser hebûna hinek esbaba bisekinê ku pêşî li van xirabiyan bê girtin û kêmê kêm hema peyrewên pêxemberan gel hev şer nekin?

Cewaba vê pirsyarê ji fikrîna di taybetî ya ixtiyarî bûna kamil bûna insan derdikevê, çimko çewa hat gotin hikmeta ilahî li ser wê sekiniye ku ji kamil bûna insan ra ixtiyar û bijartin (ne cebr û zor) hebê, da ku kesên bixazin, bikarin rêka heq nas bikin û pê meşîna di wê rêkê da bigehên kemal û seʼadeta xwe. Lêbelê hebûna van şert û mercan ji vê kamil bûnê ra ne bi wê meʼnê ye ku mirov hemî pêkve behrek baş jê bibin û rêka durust bigirin ber xwe. Û bi gotina Qurʼana pîroz, Xuda yê Te'ala di vê cihanê da mirov ji ber vê yêkê çêkiriye da ewî imtihan bikê ku kî ji wan qenckartir e. [1] Û çewa ku gelek caran di Qurʼanê da hatî gotin,

[1] - Binêrin: Hûd / 7 û: Kehf / 7, Mulk / 2, Maide / 48, En'am / 165

eger Xudê Te'ala bixwesta dikariya hemiyan bêxê ser rêka rast û bi temamî pêşiya xwehrî û jirêderîyê bigirê. [1] Lêbelê hingê êdî meydan ji intixab û bijartinê ra nedima û wê me'emilet û kiryarên mirov ji qîmetê kiryarên insanî biketan û hedefa Xudê ji çêkirina insanê muxtar û xweyê bijartinê wê ji nav biçûya.

Hasilê gotinê ev e ku: fesad û xirabî û kufr û neguhdarî ya insan ji ber bijartina wî ya xirab e, û hebûna karînê ji bona van kiryaran di çêbûna wî da hatiye melheze kirin, û gehana lazimî û tebe'atên wê mexseda «bi-t tebe'» e. Û her çend di esil da irade ya ilahî li ser kamil bûna insan e, lêbelê çimko pêvegirê (mute'elliqê) evê iradê şertê muxtar bûnê ye, paşketina ji ber bijartina xirab, nefy nakê û naveroka hikmeta ilahî, ne ew e ku insan hemî bivê nevê bikevin ser rêka durust; her çend ne bi xwest û viyana wî bê.

3- vê gorekê ku hikmeta ilahî li ser vê yêkê ye ku mirov pitir û baştir bigehin kemal û bextewerîyê, gelo ne baştir bû ku Xudê remz û razên tebî'et bi rêka wehyê ve ji xelkê ra eşkere bikê ku pê behre girtin û istifade kirina ji hemî qismên ni'metan mirov leztir bigehê kemala xwe? Çewa ku keşfên hinek tiştên tebî'î di çend sedên paşîn da û çêkirinên wesîle yên jiyanê eserek zehfî hebûye di temedduna (şaristaniyeta) beşer da û eserên baş hebûne ji selametî û pêşî girtina nexweşiyan û berfireh kirina peywendan da û ... kifş e ku eger pêxemberan pê anîna 'ilman û sen'etan û çêkirinên wesîle û navgînên rihetîyê, xizmet ji xelkê ra bidin kirin, wê bikariya bi wa rêka ve ser qudret û hêza xwe ya komelayetî û siyasî ve zêde bikiran û baştir bigehan hedef û

[1] - Binêrin: En'am / 35, 107, 112, 137, 138, Yûnus / 99, Hûd / 118, Nehl / 9, 93, Şûra / 8, Şu'era / 4, Beqere / 253

تِلْكَ الرُّسُلُ فَضَّلْنَا بَعْضَهُمْ عَلَى بَعْضٍ مِّنْهُم مَّن كَلَّمَ اللّهُ وَرَفَعَ بَعْضَهُمْ دَرَجَاتٍ وَآتَيْنَا عِيسَى ابْنَ مَرْيَمَ الْبَيِّنَاتِ وَأَيَّدْنَاهُ بِرُوحِ الْقُدُسِ وَلَوْ شَاء اللّهُ مَا اقْتَتَلَ الَّذِينَ مِن بَعْدِهِم مِّن بَعْدِ مَا جَاءتْهُمُ الْبَيِّنَاتُ وَلَـكِنِ اخْتَلَفُوا فَمِنْهُم مَّنْ آمَنَ وَمِنْهُم مَّن كَفَرَ وَلَوْ شَاء اللّهُ مَا اقْتَتَلُوا وَلَـكِنَّ اللّهَ يَفْعَلُ مَا يُرِيدُ.

amanca xwe.

Cewab ev e ku ihtiyac û niyaza eslî bi wehy û pêxemberîyê gehana wa tişta ye ku beşer bi rêkên me'mûlî ve nekar bin xwe bigehêninê û eger bi wa tişta nezanibin, nikarin berê xwe bidin rêka kemala heqîqî û li ser wê rêkê biçin.

Bi gotinek dî: wezîfe û berpirsyarî ya eslî û esasî ya pêxemberan ew e ku berê xelkê bidin jiyana berew kemalê û di vê rêkê da arîkariya wan bikin ku di her halî da wezîfe ya xwe bizanin û hêz û quwetên xwe di rêka gehana wê hedef û amanca baş da bikar bînin; çi xelkên çolî û koçer û çi jî ewên li ser behra û hewa ra digerin, hemî bihadarên eslî yên insanî û mirovanî nas bikin û bizanin çi berpirsyarî hene di beraberê Xuda yê xwe de û di beraberê xelkê û mexlûqan da; da ku pê pêk anîna ewa berpirsyarî û wezîfan xwe bigehênin kemal û se'adeta heqîqî û ebedî. Lê vêca ixtilaf û yêk nebûna karîn û tiştên tebî'î û sen'etî, çi di zemanekî da û çi di çend zeman û wexta de, kareke ku li ser esasê esbab û 'illetên taybet û xas çêdibin û eserek berketî di kamil bûna heqîqî û sernivîsa ebedî da nîne, çewa ku pêşketinên 'ilmî û sen'etî yên îro ku bûne sebebê berfirehî û behremend bûna pitir ji tiştên maddî û dinyayî, di kamil bûna me'newî û rûhî ya mirova da bê eser bûye û belkî mirov dikarê bêjê esera bervajî hebûye.

Welhasil: hikmeta xudayî ew e ku dixazê mirov pê istifade kirina ji ni'met û xweşî yên maddî jiyana xwe ya dinyayî rêve bibê û pê behre girtina ji 'eql û wehyê berê xwe bidê kemala heqîqî û se'adet û bextewerî ya ebedî. Lê ixtilafa di karîna bedenî û rûhî da û her wiha ixtilafên şert û mercên tebî'î û komelayetî û behremendiya ji 'ilm û sen'etan da heyî girêdayî ye bi şert û mercên tekwînî ve, ku li ser esasê sîstima 'illî û me'lûlî pêk tê; û eva ixtilafa di sernivîsa ebedî ya mirov da esera esasî

nîne, û çêdibê ku hinek kes an kom bi sadetirîn şikl ji ya bin û kêmtirîn behrên maddî û dinyayî bi dest ve anîbin, lêbelê geha bin bilindtirîn derecên kemal û bextewerîyê; û her wiha çêdibê ku hinek kes an birr ji pêşketîtirîn sen'et û ‘ilm û wesîle yên jiyanê behre biribin, lê di wî halî da jî ji ber neşukrî û xwe mezin kirin û zulma li xelkê ketibin binretirîn mertebên bextreşîyê da.

Elbet pêxemberên Xudê xêncî ji wezîfe û berpirsyarî ya xwe ya eslî [yanî hidayet û rêrast kirin bo alîyê kemal û se’adeta heqîqî û ebedî ve] ji jiyana baştira vê dinyayê ra jî gelek arîkariya xelkê kirine û li kûderê hikmeta ilahî kiribê lazimê xwe ewa perde ji ser heqîqetên nenas hilanîne û remz û razên veşartî yên tebî'et deranîne û arîkarî kirine ji pêş xistina şaristaniyeta beşer ra. Mirov dikarê nimûna wan di jiyana hezretê Dawûd û Suleyman û Zulqerneyn da bibînê. [1] Û her wiha ji idare ya komelê ra û ji teybîr dana kar û bara ra xebat kirine, çewa ku hezretê Yûsuf di welatê Misrê da xebat kirî. [2] Lêbelê ev hemî zêdetirê ji wezîfe ya wan bû.

Vê derheqê da ku çima pêxemberan ji pêş xistina hedef û mexsedên xwe ra ji quweta sen'et û iqtisad û çekdarîyê istifade nekirine, gereke bê gotin: hedefa pêxemberan (selamên Xudê li wan bin) hazir kirina meydanê ye ji wî qasî ra ku xelk bikarin agahane û azadane ji xwe re bibijêrin [çewa ku pêşde jî gelek caran me got] û eger bixwestan pê istifade kirina ji quwet û hêzên ne me'mûl qiyam bikin û rabin pêşketina me'newî û kamil bûna azadane ji xelkê ra çênedibû, û xelkê wê ji ber dijwarî ya bikar anîna quwetê peyrewî ji wan bikira; ne ku pê hedefa xudayî û li ser esasê bijartin û intixaba azad.

Mîrê bawerdaran Elî (selam lê bin) vê derheqê da kerem kiriye:

---

[1] - Binêrin: Enbiya / 78 - 82, Kehf / 83 - 97, Sebe’ / 10 - 13

[2] - Binêrin: Yûsuf / 55

"Eger Xuda yê Te'ala bixwesta xeznên zêr û zîv û serçavkên mucewherata û bax û bustanên pir fêkî bidê wan û firindên 'esmana û candarên 'erdê ji wan ra bikiran xizmetkar, wê ew bikira, lê eger we bikira wê imtihan û kirh dan jinav biçûya..."

Eger bixwesta wê hêzek bilind û xurtiyek bê şikestin û padişahiyek bida wan ku xelk ji ber tirsê û berhêvî bûnê teslîmê wan bibûna û dest ji neguhdarî û xwe mezin kirinê bikêşan, hingê wê hedef wek hev lê bihatan, lêbelê Xudê wereng xwestiye ku peyrewiya ji pêxemberan û qebûl kirina kitêbên Wî û guhdan û teslîm bûna xelkê tenê ji ber hedefên xudayî bin û tiştek dî tevlî nebê. Çiqas bela û imtihan mezintir bê kirh û xêra Xuda didê jî zêdetir û pirtir e. [1]

Elbet dema xelkê bi xwest û meyl û viyana xwe û pê bijartinek azad, dînê heq ji xwe re girtin û komela xudayî danîn, hingê dikarin ji hemî şiklên hêz û quwetan di rêka pêşda birina hedefên xudayî û nexasma jinav birina zêdegavan û berevaniya ji heqê bawerdaran, istifade bikin; çewa ku nimûne ya wê di hukûmeta hezretê Suleyman da (selamên Xudê lê bin) tê dîtin.[2]

[1] - Binêrin: Furqan/7 -10, Zuxruf /31 - 35 û Nehc-ul Belaxe. x. Qas'e /192 =
الْحَمْدُ للهِ الَّذِي لبسَ الْعِزَّ وَالْكِبْرِيَاءَ ، وَاخْتَارَهُمَا لنَفْسِهِ دُونَ خَلْقِهِ ، وَجَعَلَهُمَا حِمىً وَحَرَماً عَلَى غَيْرِهِ ، وَاصْطَفَاهُمَا لِجَلالِهِ . وَجَعَلَ اللَّعْنَةَ عَلَى مَنْ نَازَعَهُ فِيهِمَا مِنْ عِبَادِهِ ...

[2] - Binêrin : Enbiya / 81 - 82, Neml / 15 - 44

PIRSYARÊN DERSA 23

Gelo pêxember hemî ji cihekî tenê rabûne? Bi çi delîlê?

Çima gazî ya pêxemberan li hemî 'erdên cihanê da berfireh nebû?

Çima Xudê ew kar nekir ku pêşî li fesad û xirabî û xûnrêjîyê bê girtin?

Çima pêxemberan raz û sirrên tebî'et kifş nekirin da peyrewên wan ji başî yên maddiyata pitir behrê bigirin?

Çima pêxemberan ji pêş xistina mexsedên xwe ra ji quwet û hêza sen'etî û iqtisadî istifade nekirin?

DERSA 24

PARASTÎ BÛNA (‘ISMET) PÊXEMBERAN

Dagirê:

Lazimî ya parastî mana wehyê

Parastinên dî

Parastî bûna pêxemberan

Lazimî ya parastî mayîna wehyê

Piştî ku lazimî ya wehyê ji bo dest ve anîna nasînan lazim hat dîtin, û kifş bû ku hest (hiss) û 'eql tenê têra mirov nakê, meseleyek dî tê pêş ew jî ev e ku: Eger hemî mirov rasterast ji vê wesîla nasînê behrê nagirin û nikarin wehyê bigirin û neçar in ku peyama Xudê bi rêka hinek kesa ve (pêxemberan) dest xwe bêxin, derheq durustî ya vê peyamê da çi piştrastî heye? Û mirov çewa dikarê ji wê yêkê piştrast bê ku şexsê pêxember wehya Xudê bi durustî girtiye û gehandiye xelkê? Û her wiha eger navciyek di navbeyna Xudê û pêxember da heye ewî jî wezîfe ya xwe bi durustî pêk aniye? Çimko rêka wehyê hingê bikêr xelkê tê û dikarê kêmasî yên zanînên beşer rakê ku ji wextê destpêbûnê heta ku bigehê xelkê ji hemî awayê xwehrî û xeletî ya ji qestî û bi xeletî hatibê parastin, eger ji xêncî vê bû û ihtimala xeletî û ji bîr kirinê di wasite û navciyan da hebê an we hebê ku bi qest mefhûmê wê bê guherandin, hingê derîyê şika di xeletî û nedurustî ya peyamê da ji xelkê ra vedibê û dibê sebebê

ji dest çûna piştrastî û bawerîyê. Nixwe ji çi rêkê ve mirov dikarê piştrast bê[1] ku wehya Xudê bi durustî digehê destê xelkê?

Bedîhî ye ku eger heqîqeta wehyê ji xelkê ra nenas bê û nekarin ewê bigirin û jê agah bibin nikarin çavdêrîyê li ser durustî ya kar û wesayita bikin û ji kontorola wan derdikevê, û tenê hingê ku peyamek muxalifê hukmên yeqînî yê 'eql bê dikarê bizanê ku muşkilek li holê heye. Mesela eger kesekî bêjê ji alîyê Xudê ve wehy jêre hatiye ku «ictima'a neqîzeyna caiz an wacib e» an haşa terkîb an zewal di zatê ilahî da mumkin e, mirov dikarê pê hukmê yeqînî yê 'eql ev gotinek pûç û derew e, lêbelê niyaza eslî bi wehyê di wan mesela da ye ku 'eql nikarê ewa sabit an nefy bikê û nikarê pê hilsengandina peyamê bi durustî ya wê bihesê. Di cihên wiha da bi çi rêkê ve dikarê durustî ya naveroka wê wehyê û parastî bûna wê ji guherînên 'emdî an sehwî ya wesayit (=navciyan) sabit bikê?

Cewab ev e ku: çewa ku me di dersa 22 da gotî, 'eql gorekî delîla hikmetê pê dihesê ku ji nas kirina heqîqet û berpirsyarî yên kiryarî ra gereke rêkek dî hebê, herçend agahiyek hemî alî ji wê tunebê jî, hema vê gorekê pê dihesê ku hikmeta ilahî dikê lazimê xwe ku peyamên Wî salim û bêy tevdan bigehê destê xelkê; eger ne, hedef û xerez jinav diçê.

Bi gotinek dî: piştî ku kifş bû gereke peyamên ilahî pê yêk an çend wasita bigehê destê xelkê heta ku meydan ji kamil bûna ixtiyarî ya mirov ra vebê û hedefa xilqetê were cî, pê istinada bi sifetên kemalî yên Xudê sabit dibê ku ev peyam gereke ji guherandinên 'emdî û sehwî parastî bin, çimko eger Xudê nexazê peyamên Xwe bi durustî bigehênê xelkê evahe xilafê hikmetê ye û

[1] - Vê derheqê da Qur'an kerem dikê: Alê 'Imran / 179
مَّا كَانَ اللّهُ لِيَذَرَ الْمُؤْمِنِينَ عَلَى مَا أَنتُمْ عَلَيْهِ حَتَّىَ يَمِيزَ الْخَبِيثَ مِنَ الطَّيِّبِ وَمَا كَانَ اللّهُ لِيُطْلِعَكُمْ عَلَى الْغَيْبِ وَلَكِنَّ اللّهَ يَجْتَبِي مِن رُّسُلِهِ مَن يَشَاء فَآمِنُوا بِاللّهِ وَرُسُلِهِ وَإِن تُؤْمِنُوا وَتَتَّقُوا فَلَكُمْ أَجْرٌ عَظِيمٌ.

irade ya hekîmane ya Xudê ewê nefy dikê; û eger Xudê nezanê ku peyama xwe bi çi rêkê ve û bi rêka çi kesî ve rêkê ku salim û bêy tevdan bigehê bende yên Wî, hingê digel ‘ilm û zanîna Wî ya bênihayet û bêdawî rêk nakevê; û eger nekarê ji vî karî ra kesên layiq bibijêrê û ewa ji hêrişa şeytan biparêzê, hingê digel karîn û qudreta Wî ya bi hedd û sînor rêk nakevê.

Nixwe Xuda yê Te'ala ku her tiştî zanê ihtimal nayê dayîn ku kesekî bibijêrê ku ji xeletî yên wî bê xeber bê (En’am / 124)[1] û evahe ku qudreta Xudê bê hedd û sînor e, ihtimal nayê dayîn ku nekarîbê wehya xwe ji aloz kirina şeytana û ji sehw û nisyanê biparêzê;[2] her wiha ji ber hikmeta ilahî mirov nikarê qebûl bikê ku nexwestibê peyama Xwe bêy xeletî bigehênê xelkê. [3] Vê gorekê mefhûmê ‘ilm û qudret û hikmeta Xuda ew e ku peyama xwe salim û bêy alozî bigehênê bende yên Xwe. Û bi vê anagorê parastî bûna wehyê pê delîl û burhana 'eqlî sabit dibê.

Pê vê gotina jorê parastî mayîna melaîket an melaîketên wehyê; û parastî mayîna pêxemberan di girtina wehyê da û her wiha parastî mayîna wan ji xiyaneta 'emdî û sehwî û jibîr kirinê di meqamê ragehandina peyama ilahî da sabit dibê.

Û ji vêderê ronahî dibê ku çima Qur’ana pîroz berdewam dibêjê ku melaîketê wehyê emîn e; û karîna wî ji parastina emanetê ilahî ra heye; û şeytan nikarin ewê aloz bikin û pêxember hemî emîn in. Welhasil, li ser vê yêkê dişidênê ku wehy tê parastin heta ku bigehê destê xelkê. [4]

Parastinên dî

[1] - ... اللهُ أعْلَمُ حَيْثُ يَجْعَلُ رِسَالَتَهُ ...

[2]- Qur’an vê derheqê da kerem dikê: / Cin / 26 - 28

[3] . لِّيَهْلِكَ مَنْ هَلَكَ عَن بَيِّنَةٍ وَيَحْيَى مَنْ حَيَّ عَن بَيِّنَةٍ وَإِنَّ اللهَ لَسَمِيعٌ عَلِيمٌ ... Enfal / 42

[4] - Binêrin: Şu'era / 193, Tekwîr / 21, E'raf / 68, Şu'era / 107, 125, 143, 162, 178, Duxan / 18, Tekwîr / 20, Necm / 5, Haqqe / 44 - 47, Cin / 26 - 27.

‘Ismet û parastî bûna li ser esasê delîla derbaz bûyî ji melaîket û pêxemberan ra sabit bûyî taybet û mexsûsê girtin û ragehandina wehyê ye, lêbelê hinek parastinên dî hene ku pê vê delîlê sabit nabin, ew bi sê qisman teqsîm dibin:

Yêk- parastî bûna melaîketan

Du- parastî bûna pêxemberan

Sê- parastî bûna hinek mirovan wek imamên pak (s) û hezretê Meryemê û hezretê Fatimayê, ji nebaşiyan.

Derheq parastî bûna melaîketan [xêncî ji girtin û ragehandina wehyê] mirov dikarê ji du tiştan baxivê:

Yêk- parastî bûna melaîketên wehyê di wa tişta da ku bi girtin û gehandina wehyê ve negirêdayî ye; û **ya dî** parastî bûna melaîketên dî ku girêdayî bi mesela wehyê ve nîne, wek:

melaîketên hatîn danîn li ser rizq û quwet û nivîsîna kar û 'emelan û kişandina rûhan û ... .

Derheq pêxemberan da jî xêncî ji mesela wehyê ji du tiştan tê xeberdan:

Yêk- parastî bûna pêxemberan ji gunehan.

Du- parastî bûna wan ji sehw û nisyan û jibîr kirinê. Hema eva du tişta mirov dikarê derheq kesên ne pêxember da jî li ser baxivê.

Derheq parastî bûna melaîketan da xêncî ji girtin û iblaxa wehyê, hingê pê burhana 'eqlî çareser dibê ku mirov bi heqîqeta melaîketan bizanê. Lêbelê xeberdana derheq çewaniya wa da ne karek hêsan û rihet e, ne jî munasibê vêderê ye. Ji ber vê yêkê hema tenê emê du ayetan bînin ku nîşan didin melaîket me'sûm û parastî ne: di ayeta 26 - 27 ya sûretê Enbiya da kerem dikê:

وَ قَالُوا اتَّخَذَ الرَّحْمَنُ وَلَدًا سُبْحَانَهُ بَلْ عِبَادٌ مُّكْرَمُونَ * لَا يَسْبِقُونَهُ بِالْقَوْلِ وَهُم بِأَمْرِهِ يَعْمَلُونَ .

“... Belkî ew 'evdên giranqedr in, di xeberdanê da pêşîyê jê nastînin û bi destûra wî 'emel dikin”.

Û her wiha ayeta 6 ya sûretê Tehrîm kerem dikê:

«لَا يَعْصُونَ اللَّهَ مَا أَمَرَهُمْ وَيَفْعَلُونَ مَا يُؤْمَرُونَ»

“Ewa Xudê destûrê didê wan neguhdarîyê têda nakin û çi emr û destûra ji wan ra bê, pêk tînin ...”

Ev her du ayet rasterast û bê çep û çûr dibêjin ku: melaîket bendeyên hêjayî yên Xuda ne û çi karê bikin bi ferman û destûra Xuda ye û qet neguhdarî ji wan çênabê. Herçend cihê xeberdanê heye derheq gişt melaîketan bikê.

Û xeberdana derheq hinek mirovên ne pêxember munasibê behsa imametê ye. Ji ber wê li vêderê emê behsa parastî bûna pêxemberan bikîn, herçend hinek ji meselên wê tenê bi rêka delîlên neqlî ve (hedîsî û ayetan) sabit dibin, û gereke ewil hucciyeta kitab û sunnetê sabit bibê û paşê mirov delîlê ji wan bênê. Lêbelê çimko ev behs munasibê vî qismê kitêbê ye emê li vêderê jê baxivin, heta di cîyê wê da vêca hucciyet û delîl bûna kitêb û sunnetê bê sabit kirin.

‘Ismet û parastî bûna pêxemberan

Vê derheqê da ku pêxember heta bi çi derecê ji gunehan parastî ne, di navbeyna birên musilmana da ixtilaf heye: Şî'ên duwazde imamî baweriya wan ev e ku pêxember ji wildan û ji dayîk bûnê heta xilaseka 'emrê xwe ji hemî gunehan parastî ne; çi biçok û çi mezin û heta ji ber jibîr kirinê jî nakevin nav guneh ra. Lêbelê hinek ji komên dî hene ku pêxemberan tenê ji gunehên kebîre parastî zanin, û hinek ji zemanê balix bûnê û hinek ji zemanê pêxemberîyê ve ewa ji gunehan parastî zanin.

Û ji hinek birên ehlê sunnet (Heşwiye û hinek komên ehlê hedîs) hatiye gêran ku inkara ‘ismeta pêxemberan kirine û çêbûna gunehan ji wan caiz zanîne, heta di zemanê pêxemberîyê da jî û bi awayê 'emd û qest jî.

Pêşîya sabit kirina ‘ismeta pêxemberan da lazim e li vêderê çend tişt bên gotin:

Yêk- mexsed ji parastî bûna (‘ismet) pêxemberan an hinek kesên dî tenê guneh nekirin nîne, çimko çêdibê keseke me'mûlî jî gunehan nekê nexasma eger 'emr kurt bê.

Belkî mexsed ew e ku kesekî melekeyek nefsanî ya bihêz û quwwet hebê ku di dijwartirîn şert û merca da jî ewî ji gunehan biparêzê û bidê paş; melekeyek ku ji agahî ya kamil û berdewam ya pîs bûna gunehan û irade ya bi hêz, ya kontorola meylên nefsanî dest ve tê.

Û çimko meleke ya bi vî awayî pê dayîna taybeta xudayî çêdibê fa’iliyeta wê tê nisbet dan bal Xuda ve. Nixwe ne we ye ku Xuda yê Te'ala mirovê me'sûm bi zorî ji gunehan paşda bidê û ixtiyar û heqê bijartinê ji wî bigirê.

Parastî bûna wa kesên xweyê meqam û merteba pêxemberî û imametê ji alîyê Xuda ve, bi me'neyek dî jî tê nisbet dan bal Xuda ve, ew jî ev e ku Xudê parastina wan li xwe girtiye.

Du- tişta lazimê ‘ismet û parastî bûnê ew e ku wa karên li ser heram, terk bikê, wek: gunehên ku di hemî şerî'eta da heram û karên ku di zemanê kirinê da di şerî'eta wî bi xwe da heram. Vê gorekê ‘ismet û parastî bûna pêxemberekî pê kirina karekî ku di şerî'eta wî bi xwe da ji wî ra caiz e û di şerî'etên pêşda heram bê, an paş hingê hatibê heram kirin, jinav naçê.

Mexsed ji «guneh» ku mirovê me'sûm ji kirina wê parastî ye, ew kar e ku di zimanê fiqhê da jêre tê gotin «heram» û her wiha

nekirina wî karê ku di fiqhê da jêre tê gotin: «wacib û ferz». Lê kelîma «guneh» û yên wek wê, wek: «zenb» û «'isyan» me'nayek berfirehtir jêra heye ku ji terka «ewla / ya baştir» ra jî tê gotin, evahe dijatî û munafat digel ‘ismetê nîne.

PIRSYARÊN DERSA 24

Parastî bûna wehyê ji kêmasiyan çewa sabit dibê?

Xêncî ji parastî bûna girtin û ragehandina wehyê, çi ‘ismet û parastî bûnên dî hene?

Bi çi rêkê ve mirov dikarê parastî bûna melaîketan sabit bikê?

Derheq parastî bûna pêxemberan da çi gotin hene, û baweriya Şî'an vê derheqê da çi ye?

‘Ismetê te'rîf bikin û lazimî yên wê bêjin.

DERSA 25

DELÎLÊN PARASTÎ BÛNA PÊXEMBERAN

Dagirê: Pêşekî

Delîlên 'eqlî yên ‘ismeta pêxemberan

Delîlên neqlî yên me'sûmiyeta pêxemberan

Sirra me'sûm bûna pêxemberan

Pêşekî

Baweriya bi me'sûmiyeta pêxemberan (s) ji gunehên 'emdî û sehwî yêk ji bawerî yên qet'î û meşhûrê Şî'a ye ku imamên pak (selamên Xudê li ser wa bin) evahe ji peyrewên xwe ra gotine û bi delîlên muxtelif ji vê meselê xeber dane. Yêk ji meşhûrtirîn delîl anîna (ihticac) xeber dana Imam Riza ye (s) ku di kitêbên hedîs û tarîxê da hatiye nivîsîn.

Lê nefy kirina jibîr kirin û nisyanê di karên caiz û me'mûlî da ji wan, cihê ixtilafê bûye û eşkereyê riwayetên ji Ehlê Beytê hatîn gêran jî vê derheqê da valeyê ji ixtilafê nîne û lêkolîna wan muhtacê mecalek berfirehtir e, lê di her hal û karî da ew ji bawerî yên lazim nayê hesab kirin.

Delîlên li ser me'sûm bûna pêxemberan (selamên Xudê li wan bin) bi du desta teqsîm dibin: **Yêk-** delîlên 'eqlî. **Du-** delîlên neqlî.

Herçend pirtirîn piştrastî ji delîlên neqlî hene, lêbelê li vêderê emê ji du delîlên 'eqlî baxivîn û di pey ra emê çend delîlan ji Qur’anê bînîn.

Delîlên 'eqlî yên parastî bûna pêxemberan

Yêk ji delîlên 'eqlî ku nîşan didê pêxemberên Xuda (selamên Xudê li wan bin) ev e ku hedef û amanca eslî ji rêkirina wan ev e ku beşer rêrast bikin bi alîyê ewa durustî û wezîfan ve ku Xuda yê Te'ala daye pêşiya mirovan. Û di heqîqet da ew nimayende û wekîlên Xuda ne di nav wan da ku gereke xelkê ji rêka durust ra hidayet bikin. Vêca eger ev nimayendeyên he ne li pey destûrên Xuda bin û bervajîyê risalet û pêxemberî ya xwe kar bikin, xelk wê gotin û kiryarên wan li dijê hev da bibînin û êdî bawerîyê bi gotinên wan jî nayinin û jê pişt rast nabin û netîce û desthata wê dibê ev ku hedef û amanca rêkirina pêxemberan bi durustî neyê cî. Nixwe hikmet û lutfa xudayî dikê lazimê xwe ku pêxember pak û parastî bin ji gunehan, û xêncî ji gunehan jî gereke karên nelayiq ji ber sehw û jibîr kirinê jî ji wan çênebê, da ku xelk guman nekin ku ew jibîr kirin û xelet bûnê ji xwe ra dikin hêcet da ku gunehan bikin.

Delîla duwê li ser pakî û paqjî ya pêxemberan (selam li wan bin) ev e ku: xêncî ji vî qasî ku ew wezîfedar in wehy û risaleta xwe ji xelkê ra ragehînin û rêka rast û durust nîşa wan bikin wezîfedar û berpirsyar in ku xelkê terbiye û perwerde bikin û ewa jî bi alîyê pakîyê ve bibin û mirovên karîn û isti'dad heyîn bi alîyê kemala insaniyetê ve bilind bikin. Bi gotinek dî: wezîfa pêxemberan ne hema 'elimandin û hîn kirin û rênimûnî kirin e, belkî terbiye kirin û rêberî jî bi hêviya wan ve ye, ew jî terbiyetek giştî û hemî alî ku dagirê terbiyeta muste'idtirîn û bilindtirîn ferdên komelê ye jî. Û ev meqam û mertebe layiqê wa kesa ye ku ew bi xwe di bilindtirîn derece û merteba kemala insanî da bin û kamiltirîn «melekên rûhî» di wan da hebin. Xêncî ji vê jî, kifş e ku esera kiryarî ya terbiyeker di terbiye kirin û perwerde kirina yên dî da gelek pitir e ji esera gotarî ya wî û eger kêmasî û nedurustî di kiryara kesekî da hebê ji gotina wî ra eser û dewsek baş namînê. Nixwe hingê hedefa Xudê ji rêkirina eva

terbiyetkerên komelê tê cî ku ew ji şimtîna gotar û kiryarê parastî bin.

Delîlên neqlî li ser me'sûmiyeta pêxemberan

1- Qur'ana pîroz navê «muxles - hatî xalis kirin»[1] daniye ser komekî ji mirovan ku heta iblîs jî dilê xwe nebiriye li rê wunda kirina wan; çewa ku dema sond xwarî ku zarokên Adem li rê wunda bikê «muxlesan» jê dertênê (istisna dikê). [2] Şik nîne, iblîs ku timahî nekiriye ji rê wunda kirina wan ra eva he ji ber wê ye ku ew ji hemî li rê wunda bûn û nebaşiyan pak û parastî ne, û eger ne dijminî ya şamilê halê wan jî dibê û eger bikariya dest ji rê wunda kirina wan hilnagirta.

Vê gorekê «muxles» beraber e digel «me'sûm û parastî». Û her çend me delîlek nîne ku ev sifet mexsûsê pêxembera ye, lê şik nîne ku ew jî ji muxlesa ne. Çewa ku Xuda hinek ji pêxemberan muxles zanîne. Çewa ku di ayetên 45 û 46 ya sûretê Sâd da hatî:

«وَاذْكُرْ عِبَادَنَا إِبْرَاهِيمَ وَإِسْحَاقَ وَيَعْقُوبَ أُوْلِي الْأَيْدِي وَالْأَبْصَارِ * إِنَّا أَخْلَصْنَاهُم بِخَالِصَةٍ ذِكْرَى الدَّارِ»

Û di ayeta 51 ya sûretê Meryem da hatiye ku:

«وَ اذْكُرْ فِي الْكِتَابِ مُوسَى إِنَّهُ كَانَ مُخْلَصًا وَكَانَ رَسُولًا نَّبِيًّا»

Û her wiha sebebê parastina hezretê Yûsuf (s) ku ketibû pîstirîn cihê şimitînê evê tiştê hesab dikê ku ew «muxles» bû; lewmanê neşimtî. Û di ayeta 24 ya sûretê Yûsuf da kerem dikê:

«وَلَقَدْ هَمَّتْ بِهِ وَهَمَّ بِهَا لَوْلا أن رءا بُرْهَانَ رَبِّهِ كَذَلِكَ لِنَصْرِفَ عَنْهُ السُّوءَ وَالْفَحْشَاء إِنَّهُ مِنْ عِبَادِنَا الْمُخْلَصِينَ»

2- Qur'ana pîroz bê qeyd û bend peyrewiya ji pêxemberan lazim

---

[1]- "Muxles" bi wê me'nê ye ku Xudê ew xalis kiribê û "muxils" ew e 'emelê xwe xalis bikê ji Xudê ra. Di navbeyna me'na herduka da ferq heye.

[2] - Sad / 82 - 83

zanê, wek çewa di ayeta 63 ya sûretê Nisa da kerem dikê:

“Me qet çi pêxember rênekirine illa ku bi izna Xudê guhdariya wan bê kirin». Û guhdana bê qeyd û şert ji wan, hingê durust e ku di dirêjiya guhdana Xuda da bê, û peyrewiya ji wan nekevê di rêza neguhdarî ya Xudê da, eger emrê guhdana mutleq û bê qeyd û şert ji Xuda re û guhdana mutleq û bê qeyd û bend ji wan kesan ra ku we heye xeletî û xwehrî ji wan çêbin digel hev rêk nakevin û dibê sebebê tenaquz û li hev şikandinê.

3- Qur’ana pîroz meqamên ilahî, mexsûsê wan kesan zaniye ku zulm ji wan çênebûbê, hezretê Ibrahîm (s) ku merteba imametê ji zarokên xwe ra xwestibû, di cewabê da wiha jêra hat gotin ku:

“Ehd û soza min nagehê mirovên zalim” [1] Û em zanin ku her guneh kêmê kêm zulma li nefsê ye û her gunehkarek di 'urfa Qur’anê da jêra tê gotin zalim. Nixwe pêxember ku xweyê mertebe ya xudayî ya risaletê ne, dûr û berî ne ji hemî awayên zulm û gunehan. Ji gelek ayet û riwayetan me'sûm bûn û pakî ya pêxemberan (s) dest ve tê, lêbelê hema ev çendê me gotî bes e.

Remz û raza pakî ya pêxemberan

Di axirîka vê dersê da di cî da ye ku em hinekî behsa remz û raz û sirra pakî û me'sûm bûna pêxemberan bikîn. Sirra parastî bûna wan di merteba girtina wehyê da ev e ku girtina wehyê an ji pêka girtina wan tişta ye ku imkana xeletîyê jêra hebê, û kesê ku qabiliyeta girtina wê hebê heqîqetek ya ‘ilmî û zanînê di wî da peyda dibê ku ewê bi şiklek huzûrî dibînê û girêdana wê bi rêkerê wehyê ve bi dil dibînê, çi di vê navberê da melaîket hebê û çi nebê, [2] û imkan tune ku ew kesê ku wehyê digirê dudilî jêre

[1] - Beqere / 124
[2] - Dil di dîtina xwe da derew nekiriye û xelet nebûye. Necm / 11

çêbê û bikevê şikê ku gelo wehy girtiye an ne? An kî jêra wehy kiriye? Û an naverok û mefada wê çi ye? Û eger di hinek ji çêrvêroka da hatiye ku pêxemberek di pêxemberiya xwe da ket şikê, an nezanî naveroka wehyê çi ye û an rêkerê wehyê nas nekir, evahe vir û derew û wek vê ye ku bê gotin kesek di hebûna xwe û kar û barên wijdanî yên xwe da ketiye şikê!!!

Û remz û raza 'ismeta pêxemberan (s) di pêk anîna berpirsyarî û peyam dana ji xelkê ra jî pêşekiyek jêra lazim e bi vî awayî ku:

Karên ixtiyarî yên beşer bi vî awayî çêdibin ku meyl û viyanek di navdeyê mirov da nisbet bi wî karî ku mirov dixazê, çêdibê û ji ber hinek sebeban hildikelijê û mirov bi arîkariya zanîn û pê hesanên muxtelif rêka gehana hedefa xwe bi dest ve tênê û karekî dikê ku digel hev rêk dikevin. Û eger meyl û viyanên muxtelif bikevin di beraberê hev da dixebitê ku ya baştir û bi qîmettir bibijêrê. Lê vêca carna ji ber kêmasiya di zanîn û hilsengandinê û naskirina ya baştir da xelet dibê, an jî xefleta ji ya baştir an uns û hevrêtiya digel ya bê qîmettir dibê sebebê pîs bijartinê û mecalek namînê ji durust fikirînê û bijartina baştir re.

Nixwe çiqas mirov digel heqîqet û durustiya nastir bê û di kontorola meyl û viyanên dilê xwe da qewîtir û bihêztir bê ew qas bijartina wî baştir dibê û zehftir ji şimtîn û xwehriyan xilas dibê û di êmnahîyê da ye. Û hema ev e ku mirovên qabil pê hebûna zanîn û fikrê û behremendiya ji terbiyeta durust, mertebe û derecên kemalê bi dest ve tînin heta ku nêzîkê hudûdên 'ismetê dibin û heta bi wê derecê pêşve diçin ku fikra guneh û karê pîs û nebaş nakin, çewa ku mirovê 'aqil nakevê fikra xwarin û vexwarina jehrî û tiştên pîs û genî da.

Niha eger em ferz bikîn ku qabiliyeta kesekî ji nas kirina heqîqeta ra di axirîn derecê da bê û her wiha sefa û zelalî ya rûhê wî di bilindtirîn mertebê da bê û wek çewa Qur'an dibêjê

tiştek bê wek rûnê zeytûna xalis û zelal û hazirê pêketinê bê; bi awayek wereng ku tu dibêjî qey hema bi xwe bi xwe û bê niyaza bi agir pêt jê bilind dibê: [1] «يَكَادُ زَيْتُهَا يُضِيءُ وَلَوْ لَمْ تَمْسَسْهُ نَارٌ» û ji ber vê sefa û zelalîyê bikevê bin terbiya ilahî da û bi rêka «Rûh-ul Quds»ê ve bê qewî kirin, ew mirovê wiha wê bi awayek xurt û lez mertebên kemalê dest xwe ve bênê û rêka sedsale wê di şevekî da pêve biçê, û heta di zemanê zarokîyê û di zikê dayîka xwe da jî wê ser yên dî ra bê. Ji mirovek wiha ra xirabî û pîsî ya hemî gunehan ronahî ye; qasê ku zerera vexwarina jehrîyê û xwarina pîsatîyê ji yên dî ra ronahî ye. Û hema bi wî awayî ku xwe vedana xelkê ji vexwarina jehrîyê û xwarina pîsatîyê ne cebrî û xurtî ye, welê xwe vedana me'sûm ji guneh jî çi munafat û dijatî digel ixtiyar û heqê wî yê bijartinê tunehin.

PIRSYARÊN DERSA 25

Me'sûm bûna pêxemberan pê delîlên 'eqlî sabit bikin.

Kîjan ayetên Qur'anê ji me'sûm bûna pêxemberan ra dibin delîl?

Sirra parastî bûna pêxemberan di xelet nebûna di girtina wehyê da çi ye?

Me'sûm bûna pêxemberan ji gunehan çewa rêk dikevê digel ixtiyar û heqê wan yê bijartinê?

[1] - Işare ye bal ayeta Nûr / 35 ve.

DERSA 26

JINAV BIRINA ÇEND ŞUBHAN

Dagirê:

Me'sûm çi heq heye ji girtina xêrê re?

Çima me'sûman iqrar dikiran bi gunehan?

Tevlî bûna şeytan di karê pêxemberan da çewa digel ‘ismeta wan rêk dikevê?

Nisbeta 'isyan û nisyanê bo hezretê Adem

Nisbeta derewê bo hinek pêxemberan

Kuştina qibtî bi destê hezretê Mûsa

Nehya pêxember (s) ji şika di risaleta xwe da

Jinav birina çend şubhan

Derheq me'sûmiyeta pêxemberan da (s) hinek şubhe çêbûne ku emê behsa wan bikin û cewab bidin:

1- yêkemîn şubha jê tê xeber dan ev e ku: eger Xudê Te'ala, pêxemberan ji gunehan parastî bin û yêk ji lazimî yên wê ev e ku wezîfe yên xwe bi cî bînin, hingê ixtiyar û heqê bijartinê ji wan ra sabit nabê û di beraberê pêk anîna wezîfan û xwe paşda dana ji gunehan nabin musteheqê xêr û sewabê. Çimko eger Xudê kesek dî jî biparasta wê wek wan lê bihata.

Cewab ji gotinên pêşîyê da kifş bû û derket meydanê. Û hasilê wê ev e ku: parastî bûn (me'sûmiyet) ne bi vê me'nê ye ku mecbûr e wezîfe yên xwe pêk bînê û xwe ji gunehan biparêzê, çewa ku di dersa derbaz bûyî da hatî gotin.

Û evahe ku Xudê parêzerê me'sûma ye jî, ne bi me'na nefya karên wan yên ixtiyarî ye; çimko her çend hemî tişt di nihayetê da bi irade ya tekwînî ya ilahî ve girêdayî ye û eger beyanek ji alîyê Xudê ve hebê, istinada kar bi Wî ve pitir dibê, lêbelê irade ya ilahî di dirêjiya irade ya mirov da ye û ne di kêlekê da û ne ku cîgirê irade ya wî ye.

Ji aliyekî ve jî vêca ev berê xwe dana taybet nisbet bi parastiyan mesûliyet û berpirsyarî ya wan zêdetir dikê û çewa ku xêra li beraberê karê wan da zêde dibê cezayê muxalefetê jî zêde dibê û bi vî awayî wekhevbûn çêdibê di navbeyna xêr û cezayê da, herçend ewê me'sûm ji ber bijartina ewa qenc nabê musteheqê cezadanê. Ev wekhevbûn derheq hemî kesên qenciyek taybet li wan hatî kirin da tê dîtin, çewa ku 'alim û ew kesên bi Pêxember ve (s) girêdayî[1] mesûliyetek girîngtir hene wek çewa xêra karê wan yê qenc pitir cezadana di beraberê gunehan da jî (eger bikin) zêdetir e. [2] Û hema ji ber vê ye ku heçî kesê meqam û mertebeyek me'newî ya bilindtir hebê xetera ketina wî pitir e û tirsa ji şimitîna wî zehftir e.

2- şubha dî ev e ku: gorekê di du'a û munacatên pêxemberan û me'sûmên dî da tê dîtin, ewan xwe gunehkar zanîne û daxaza lêborînê ji gunehên xwe ra kirine, vêca digel vê yêkê çewa mirov dikarê ewan pak û bê guneh bizanê?

---

[1] - Ehzab / 30 - 32 = يَا نِسَاء النَّبِيِّ مَن يَأْتِ مِنكُنَّ بِفَاحِشَةٍ مُّبَيِّنَةٍ يُضَاعَفْ لَهَا الْعَذَابُ ضِعْفَيْنِ وَكَانَ ذَلِكَ عَلَى اللَّهِ يَسِيرًا * وَمَن يَقْنُتْ مِنكُنَّ لِلَّهِ وَرَسُولِهِ وَتَعْمَلْ صَالِحًا نُّؤْتِهَا أَجْرَهَا مَرَّتَيْنِ وَأَعْتَدْنَا لَهَا رِزْقًا كَرِيمًا * يَا نِسَاء النَّبِيِّ لَسْتُنَّ كَأَحَدٍ مِّنَ النِّسَاء إِنِ اتَّقَيْتُنَّ فَلَا تَخْضَعْنَ بِالْقَوْلِ فَيَطْمَعَ الَّذِي فِي قَلْبِهِ مَرَضٌ وَقُلْنَ قَوْلًا مَّعْرُوفًا .

[2] - Hedîs: يغفر للجاهل سبعون ذنبا قبل ان يغفر للعالم ذنبا واحدا

Cewab ev e ku ewan pakan (selewat û selamên Xudê li ser wan bin) ji ber ixtilafa derece û merteban, ku bilindahî ya kemal û qurba ilahî da bûn, ji xwe ra wezîfe û berpirsyariyek pitir ji yên dî didîtan û belkî berê xwe dana ji xeyrî me'bûd bi her awayekî bûya gunehek mezin hesab dikiran û ji ber vê yêkê 'uzrê xwe dixwestan û istixfar dikiran. Û pêşîyê da me got ku mexsed ji me'sûm bûnê parastî bûna ji hemî karan nîne ku bi awayekî kelîma guneh jêra bikar tê birin, belkî mexsed ji wê parastî bûna wa ye ji hemî muxalefetan digel teklîfên lazim û dûr ketina wa ye ji hemî heramên fiqhî.

3- şubha sisê ev e ku: ji me'sûm bûna pêxemberan ra (s) ji ayetên Qur'anê delîl hat anîn ku ew «muxles» in û şeytan nikarê xwe têkel wan bikê, halhale di Qur'ana pîroz bi xwe da derheq pêxemberan da (s) behsa şeytan dikê ku xwe têkel kar û barê wan kiriye, yêk ji wan ayeta 27 ya sûretê E'raf e ku kerem dikê: « "Ey benî Adem, bila şeytan hewe nexapênê, çewa ku dayik û babê hewe ji bihiştê deranî». [1]

Li vêderê xapandina Adem û hewayê û deranîna wan ji bihiştê hatiye nisbet dan bal şeytan ve. Û di ayeta 41 ya sûretê Sâd da ji devê hezretê Eyyûb dibêjê: «Gazî Xuda yê xwe kir ku: Eve hema birastî şeytan pê zehmetî û îzayê xwe têkel min kiriye».[2] Û di ayeta 52 ya sûretê Hecc da awayek yê xwe têkel kirina şeytan ji hemî pêxemberan ra sabit dikê. Çimko wiha kerem dikê: «Û me pêşiya te da çi hinartî û pêxember rênekirine illa ku dema daxaz û hêviyek bikira şeytan xwe têkel wê daxazê dikira ...».

[1] - يَا بَنِي آدَمَ لاَ يَفْتِنَنَّكُمُ الشَّيْطَانُ كَمَا أَخْرَجَ أَبَوَيْكُم مِّنَ الْجَنَّةِ يَنزِعُ عَنْهُمَا لِبَاسَهُمَا لِيُرِيَهُمَا سَوْءَاتِهِمَا إِنَّهُ يَرَاكُمْ هُوَ وَقَبِيلُهُ مِنْ حَيْثُ لاَ تَرَوْنَهُمْ إِنَّا جَعَلْنَا الشَّيَاطِينَ أَوْلِيَاء لِلَّذِينَ لاَ يُؤْمِنُونَ.

[2] - وَاذْكُرْ عَبْدَنَا أَيُّوبَ إِذْ نَادَى رَبَّهُ أَنِّي مَسَّنِيَ الشَّيْطَانُ بِنُصْبٍ وَعَذَابٍ

Cewab ev e ku qe di çi yêk ji va ayeta da têkeliyek ku bibê sebebê muxalefeta pêxemberan (s) digel wezîfên wan bal şeytan ve nehatiye nisbet dan. Çimko hindîke ayeta 27 ya E'raf e, işare dikê bal weswesa şeytan derheq xwarina ji «şecera menhiyye» ku nehya ji xwarina wê nehya tehrîmî nebû, belkî hema tenê ji Âdem û Hewayê ra hatibû gotin ku: eger ji wê bixwin wê ji «cennet»ê derkevin û bên ser 'erdê, û weswesa şeytan bû sebebê muxalefeta wan digel vê nehya «irşadî». Û di esil da ji xwe ew 'alem ne 'alema teklîfê bû û hêca şerî'etek nazil nebûbû û nehatibû. Û ayeta 41 ya sûretê Sâd jî behsa ewa nexweşî û nerihetiya dikê ku ji alîyê şeytan ve ser hezretê Eyyûb da hatîn, û qet çi girêdan bi muxalefea wî hezretî digel emr û nehyên Xudê ve nîne. Û ayeta 52 ya Hecc jî behsa xirabkarî yên şeytan di beraberê karê pêxemberan da dikê û nîşan didê ku şeytan di halê xebatê da ye da ku nehêlê pêxember (s) derheq hidayet kirin û rêrast kirina xelkê da bigehin mexseda xwe û xwesta wan were cî; ku paşî ra Xuda yê Te'ala hîle û xapînokên şeytan jinav dibê û dînê heq qewî dikê û bihêz têxê.

4- şubha çarê ew e ku di ayeta 121 ji sûretê Taha da nisbeta «'isiyan - neguhdarî» û di ayeta 115 ya wê da nisbeta «nisyan - jibîr kirin»ê hatiye paldan bal hezretê Âdem ve (selamên Xudê lê bin). Û ev nisbetên he çewa digel me'sûm bûna wî hezretî rêk dikevê?

Cewaba vê şubhê ji gotinên pêşî ronahî bû û kifş bû ku ev «'isyan û nisyan» ne girêdayî ye bi teklîfa ilzamî ve, ku muheqeq jê hatibê xwestin ku pêk bênê.

5- şubha pêncê ev e ku di Qur'ana pîroz da nisbeta derewê hatiye paldan bal hinek ji pêxemberan ve (selamên Xuda li wan bin) wek çewa di ayeta 89 ya sûretê Saffat da ji devê hezretê Ibrahîm (s) hatî gotin: **«فقال إنى سقيم»** "*hema birastî ez nexweş hal*

im” halhale ne nexweş bû. Û di ayeta 63 ya sûretê Enbiya da ji devê wî hezretî dibêjê: **«قال بل فعله كبيرهم هذا »** *“ne, belkî evî mezinê wan ev kar kiriye û putên piçok şikandine”*; halhale ewî bixwe pût şikandibûn. Û di ayeta 70 ji sûretê Yûsuf da dibêjê: *«paşê gazîkerekî bi dengê bilind gazî kir ku: ey gelî karwaniyan, hema birastî hûn diz in”* **ثُمَّ أَذَّنَ مُؤَذِّنٌ أَيَّتُهَا الْعِيرُ إِنَّكُمْ لَسَارِقُونَ** halhale birayên Yûsuf dizî nekir bûn.

Cewab ev e ku ev gotin ser gotina hinek riwayetan «tewriye - irade ya bi me'nayek dî» bûye ji ber hinek meslehetên dî wiha xeber dane û ji hinek riwayetan jî kifş dibê ku bi ilhama Xuda wereng xeber dane, çewa ku di ayeta derheq qiseta Yûsuf da hatî dibêjê: "*Bi vî awayî me ji Yûsuf ra rêk xist*". Û di her hal û karî da ev derewên bi vî awayî guneh û muxalefeta me'sûmîyê nîne.

6- şubha şeşê ew e ku: di qiseta hezretê Mûsa da hatiye ku kesek ji "qibtiyan" ku gel yêk ji “benî israîl” ketibû cirekêşê kuşt û ji ber vê yêkê ji Misrê revî û dema Xudê emrê wî kir ku biçê Fir’ewniyan gazî bikê ji heqê ra, got: **وَلَهُمْ عَلَيَّ ذَنبٌ فَأَخَافُ أن يَقْتُلُون** – *“ewa li ser min gunehek heye vêca tirsa min ji wê ye ku min bikujin»* Şu'era/14. Di pey ra vêca dema Fir’ewn behsa ewê qetlê jêra kir û da rûyê wî, ewî got: **قَالَ فَعَلْتُهَا إِذًا وَأَنَا مِنَ الضَّالِّينَ** *“dema min ew karî kir, hingê ez li rê şaş bûm”* Şu'era / 20. Ev mesele çewa digel ‘ismeta pêxemberan [pêş pêxemberîyê da jî] rêk dikevê?

Cewab ev e ku kuştina yê qibtî ne ji qestî û 'emdî bû û ji ber veweşandina kulmekî ku lê veweşand hat kuştin; û rista «lehum 'ëleyye zenbun - **لَهُمْ عَلَيَّ ذَنبٌ** » gorekî fikra Fir’ewniyan hatiye gotin û mexsed ew e ku ew min qatil zanin û ez ditirsim ji ber qisas kirinê min ji ber wî ve bikujin; û rista «we ene mine-z zallîn - **وَأَنَا مِنَ الضَّالِّينَ** » an ji wî qasî ra hatiye gotin ku digel Fir’ewniyan biborênê «mumaşatê bikê» heçweku gotibê: hema we hesab bike ku ez hingê rêşaş bûbim, lê niha Xudê ez hidayet

kirime û ez pê delîlên birra û qewî bi alîyê hewe ve hatime. Û an mexsed ji «zelalet - şaşîya di rêkê da» ne agahî ye ji peyhatên wî karî. Û di her hal û karî da delalet nakê li ser muxalefeta hezretê Mûsa digel teklîfa wî ya ilzamî ya xudayî û bivê nevê.

7- şubha heftê ew e ku: di ayeta 94 ya sûretê Yûnus da ji pêxemberê Xuda ra (s) hatiye gotin ku: **«Eger tu di şikê da bî derheq wê ya me ji te ra rêkirî, ji wan bipirse ewên pêşiya te da kitêbê dixwendin. Hema muheqeq heq ji alîyê Xuda yê te ve ji te ra hatiye, vêca muheqeq ne we bê tu bibî ji dudilan».**[1] Û di ayeta 147 ji sûretê Beqere û 60 ji sûretê Âlê 'Imran û 114 ya En'am û 17 ya Hûd û 23 ya Secde da, ewî hezretî nehy dikê ji şik û dudilîyê. Nixwe çewa mirov dikarê bêjê girtina wehyê şik û dudilî têda çênabê?

Cewaba vê şubhê ew e ku: ev ayetên he nabin delîla wî qasî ku ew hezret ketibê şik û dudilîyê, belkî dixazê evê nuktê bêjê ku risalet û pêxemberî ya wî hezretî û heqaniyeta Qur'ana pîroz û naveroka wê ne tiştek wereng e ku cihê şik û dudilîyê têda hebê. Û di heqîqet da ev awayê xeberdanê ji vî qismî ye ku tê gotin **«iyyak-e e'nî wesme'î ya careh»** = dîwaro! Ez ji te ra dibêjm bûkê tu seh bike».

8- şubha heştê ev e ku: di Qur'ana pîroz da hinek guneh nisbeta wan tê dayîn bal Pêxember ve (selat û selamên Xudê li wî û alê wî bin) ku paşê Xudê ewan gunehan 'efû kirine, li wê derê ku kerem dikê: **«da Xudê gunehên te yên pêşî û paşê 'efû bikê».** [2]

---

[1]- فَإِن كُنتَ فِي شَكٍّ مِّمَّا أَنزَلْنَا إِلَيْكَ فَاسْأَلِ الَّذِينَ يَقْرَؤُونَ الْكِتَابَ مِن قَبْلِكَ لَقَدْ جَاءكَ الْحَقُّ مِن رَّبِّكَ فَلاَ تَكُونَنَّ مِنَ الْمُمْتَرِينَ.

[2]- Feth / 2 لِيَغْفِرَ لَكَ اللَّهُ مَا تَقَدَّمَ مِن ذَنبِكَ وَمَا تَأَخَّرَ وَيُتِمَّ نِعْمَتَهُ عَلَيْكَ وَيَهْدِيَكَ صِرَاطًا مُّسْتَقِيمًا.

Cewab ev e ku mexsed ji «zenb - sûc û guneh» di vê ayeta şerîfe da guneheke ku muşrikan pêş hicretê û piştî hicretê ji wî ra hesab dikiran ku xirabiya me'bûdên wan digotan. Û mexsed ji «xufran - lêborîn - 'efû kirin»ê jî jinav birina ewa eser û tişta ye ku we hebû di pey ra çêbin û bên pêş. Û şahid li ser vê tefsîrê ew e ku fetha Mekkehê 'illet û sebebê evê lêborîn û 'efû kirinê hesab dikê, kerem dikê: **"hema birastî me serketinek eşkere da te da ku lêbûrîn çêbê..."** [1] û ronahî ye ku eger mexsed gunehê musteleh û ew gunehê ku em pê zanîn bûya, hingê çênedibûya ku fetha Mekkehê bibê sebeb û 'illet ji lêborînê ra û ev mesele bê me'ne dibûya.

9- şubha nehê ew e ku: Qur'ana pîroz di qiseta zewaca Pêxember (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) digel jina telaq girtî ya Zeyd da kerem dikê: **« ... Tu ji xelkê ditirsî, halhale Xudê musteheqtir e ku tu jê bitirsî»**. Ev gotin çewa digel merteba 'ismetê rêk dikevê? [2]

Cewab ev e ku Pêxember (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) tirsa wî ji wê bû ku ji ber ze'êfî ya îmana xelkê ev kar ku bi destûra Xuda bû û ji bona şikandina 'edetek xelet ya zemanê cahliyetê bû (ku zirzarok jî wek zarokê xwe bi xwe hesab dikiran) karek were hesabê li ser esasê meyla şexsî ya Pêxember (s) û bibê sebebê wê ku xelk ji dîn derkevin. Û Xudê Te'ala di vê ayeta şerîf da agahîyê didê pêxemberê Xwe ku mesleheta berberekaniya digel vê 'edeta cahilî muhimtir e. Nixwe ev ayeta şerîfe qet ne li ber e ku loman li wî bikê.

---

[1] - إِنَّا فَتَحْنَا لَكَ فَتْحًا مُّبِينًا * لِيَغْفِرَ لَكَ اللَّهُ ... -

[2] - Ehzab / 37. وَإِذْ تَقُولُ لِلَّذِي أَنْعَمَ اللَّهُ عَلَيْهِ وَأَنْعَمْتَ عَلَيْهِ أَمْسِكْ عَلَيْكَ زَوْجَكَ وَاتَّقِ اللَّهَ وَتُخْفِي فِي نَفْسِكَ مَا اللَّهُ مُبْدِيهِ وَتَخْشَى النَّاسَ وَاللَّهُ أَحَقُّ أَن تَخْشَاهُ فَلَمَّا قَضَى زَيْدٌ مِّنْهَا وَطَرًا زَوَّجْنَاكَهَا لِكَيْ لَا يَكُونَ عَلَى الْمُؤْمِنِينَ حَرَجٌ فِي أَزْوَاجِ أَدْعِيَائِهِمْ إِذَا قَضَوْا مِنْهُنَّ وَطَرًا وَكَانَ أَمْرُ اللَّهِ مَفْعُولًا.

10- şubha dehê ew e ku: Qur'ana pîroz di hinek cihan da lome û serzeniş li Pêxember (s) kirine, yêk ji wan hingê ye ku Resûlê Xudê (s) iznê didê hineka ku neçin ceng û cihadê, çewa ku kerem dikê: «Xudê li te biborê çima te izn da wan»[1] û derheq terka hinek karên helal da ji bona razî kirina hinek ji jinên xwe, kerem dikê: «ey pêxember çima tu ji xwe ra heram dikî wê ya Xudê ji te ra helal kirî, ji ber wî qasî ku tu razî bûna jinênê xwe bi dest ve bînî ...». [2]

Vêca ev lome yên he çewa digel 'ismeta wî hezretî çêdibin?

Cewab ev e ku ev awayê xeberdanê di heqîqet da «medhe di qalibê 'itabê da» û nîşana dilovanî ya pir ya Resûlê Xuda ye (s) ku heta minafq û nesaxdil jî bêhêvî nedikiran û xefên wan eşkere nedikiran û razî kirina jinên xwe muhimtir digirta ji xwest û viyana nefsa xwe û karek neheream pê sond xwarinekî li ser xwe heram dikira, ne ku haşa guherînê bêxê hukmê Xudê û ya helal ji xelkê ra heram bikê.

Di heqîqet da ev ayet rengê wa ayeta didin ku xebat û dilsojî ya zehfî ya Pêxember nîşan didin, çewa ku kerem dikê: «ji ber ku ew îmanê naynin kêm maye tu canê xwe ji dest bidî»[3] Şu'era/3. An wek wa ayeta ne ku nîşan didin Pêxember (s) zehmetek zehfî di ber 'ibadet û bendetiya Xudê da dikêşa, kerem dikê: «Ta-Ha, me Qur'an ser te da rênekiriye ku tu bikevî zehmetê»[4] Taha / 1- 2.

---

[1] - Tewbe / 43. عَفَا اللهُ عَنكَ لِمَ أذِنتَ لَهُمْ حَتَّى يَتَبَيَّنَ لكَ الَّذِينَ صَدَقُوا وَتَعْلَمَ الكَاذِبِينَ

[2] - Tehrîm / 1. = يَا أَيُّهَا النَّبِيُّ لِمَ تُحَرِّمُ مَا أَحَلَّ اللَّهُ لَكَ تَبْتَغِي مَرْضَاتَ أَزْوَاجِكَ وَاللَّهُ غَفُورٌ رَّحِيمٌ

[3] - لَعَلَّكَ بَاخِعٌ نَّفْسَكَ أَلَّا يَكُونُوا مُؤْمِنِينَ -

[4] - طه، مَا أَنزَلْنَا عَلَيْكَ الْقُرْآنَ لِتَشْقَى -

PIRSYARÊN DERSA 26

Mirovê me'sûm çi zêdahî yên ixtiyarî zêdetir ji yên dî hene? Û karê ku xwe bi parastina Xuda ve girtî çi heqekî ji xêrdanê ra peyda dikê.

Çima enbiya û ewliya xwe gunehkar dizanînan û daxaza lêborînê (istixfar) dikiran?

Têkelîyên şeytan derheq pêxemberan da çewa digel ‘ismeta wan çêdibê?

'Isyan û nisyan ku nisbeta wê bal Adem (s) ve hatiye dayîn, digel ‘ismeta wî çewa çêdibê?

Eger hemî pêxember me'sûm in, nixwe çima nerastî ji devê hezretê Ibrahîm û Yûsuf derketiye?

Şubha di heqê ‘ismeta hezretê Mûsa (s) da û cewaba wê bêjin.

Eger xeletî di girtina wehyê da çênabê, çima Xudê Te'ala pêxemberê xwe ji şik û dudilîyê derheq risaleta xwe da nehy dikê?

Nisbeta guneh ji Pêxember ra (s) di sûretê «Feth» da çewa gel ‘ismeta wî rêk dikevê?

Şubha derheq qesta Zeyd û cewaba wê binivîsin.

Şubha derheq lome kirina li Pêxember (s) û cewaba wê bêjin.

DERSA 27

MU’CIZE

Dagirê:

Rêkên sabit kirina pêxemberîyê

Te'rîfa mu’cizê

Karên xariqul 'ade

Xariqul 'adeyên Xudayî

Xasiyetên mu'cizên pêxemberan

Rêkên sabit kirina pêxemberîyê

Mesele ya binyatî ya sisê di behsa pêxemberîyê da ev e ku durustî ya de'wa pêxemberên rast û derewa kesên bi derew de'wa pêxemberîyê dikin, mirov çewa dikarê ji xelkê ra sabit bikê?

Bê şik eger kesek xirabkar û gunehkar ku 'eql jî bi pîsatî ya wa dihesê, mirovê wiha ne cihê piştrastîyê ye û bawerî pê nayê, vêca çimko şertê ‘ismet û parastî bûnê ji pêxemberan ra heye mirov dikarê derewa wî yê xirabkar derênê, nexasma eger ji karên ne'aqilane ra gazî bikê û gotinên wî hevdu bişikînin û hev negirin.

Ji alîyê dî ve çêdibê ku mirovên bê xerez ji ber borî ya baş ya

kesekî durustî ya wî bawer bikin û jê piştrast bin, nexasma ku gazî ya wî digel 'eql rêk bikevê û 'eql durustî ya gotina wî bidê berçavan. Her wiha çêdibê ku pêxemberî ya kesekî pê pêşgoyî û nasandina pêxemberek dî sabit bibê, bi awayek wereng ku ji wî kesê ku li pey heqîqetê ye cihê şik û şubhê nemînê.

Lê dema delîl û nîşanên bawerî çêker di destê xelkê da tunebin û bişaret û nasandinek jî ji alîyê pêxemberek dî ve nehatibê û negeha bê destê wan muheqeq ji sabit kirina pêxemberîyê ra wê muhtacê delîlek dî bibin. Û Xuda li ser esasê hikmeta xwe ya temam ev yêk vekiriye û hinek mu'cize dane pêxemberan ku ji durustî ya gazî ya wan ra bibin nîşan, û ji ber vê yêkê navê wan kiriye «ayet - nîşan».[1]

Welhasil durustî ya gazî ya pêxemberên rastî bi sê rêka ve sabit dibê:

1- bi rêka wan nîşana ve ku mirov jê piştrast e. Wek rastî û durustî û xwehr nebûna ji rêka heq û durustkarî ya berdewam di dirêjiya jiyanê da. Lê vêca ev rêk ji wan pêxemberan ra heye ku salên dirêj di nav xelkê da jiyane û durustkarî ya wan ji xelkê ra kifş bûye. Lê eger mesela pêxemberek di cewaniya xwe da hatibê rêkirin ku hêca digel xelkê zehf nejiyabê û xelk bi durustî ya şexsiyet û kesatî ya wî nehsiya bin, hingê bi vê rêkê ve û pê va nîşana nikarê bi durustî ya de'wa wî bihesê.

2- rêkek dî ev e ku ew bi rêka pêxemberê pêşîyê da an pêxemberê hevçax hatibê nasandin. Ev rêk jî taybetê xelkekî ye ku pêxemberê wan hebê û ji bîr û hizra wî derheq vî pêxemberî da agah bûbin. Her wiha ev rêk ji pêxemberê ewwilî ra jî ku pêş wî da pêxember tunebûne istifade jê nayê kirin.

---

[1] - Ayet ku bi me'na nîşan e hem ji mu'cizê ra bikar hatiye. Û di cî yên dî da jî ji nîşanên 'ilm û qudret û hikmeta ilahî ra çi 'addî û çi ne'addî ra ayet hatiye gotin.

3- rêka mu'cizê, ku rêkek giştî ye û bikar birina wê gelek berfireh e, ji ber vê çendê emê li vêderê ji bona ronahî bûna pitir ji vê rêkê baxivîn.

Mu'cize çi ye?

Mu'cize ji wî karî ra tê gotin ku ne gorekî 'edetê bê û bi irade ya Xuda ji kesekî çêbê ku de'wa pêxemberîyê dikê û bibê nîşana durustî ya de'we û gazî ya wî.

Çewa ku tê dîtin ev te'rîf dagirê sê gotina ye:

A-- tiştên xariqul 'ade hene ku pêk hatina wan gorekî 'edetê nîne û bi rêka esbab û 'illetên me'mûlî û mute'arif ve (di nav xelkê da heyî - û tebî'î) pêk nayê.

B- hinek ji van tiştên xariqul 'ade, bi irade ya Xudê û bi izna taybet ya Xudê Te'ala ji pêxemberan çêdibin.

C- ev tiştên xariqul 'ade (ne gorekî 'edetê) dikarin bibin nîşan ji durustî ya gotin û gazî ya pêxemberan ra, hingê di istilahê da jêre tê gotin «mu'cize».

Li vêderê emê ji qasê 'unsurên ku mu'cizê pêk tînin baxivîn:

Kar û tiştên xariqul 'ade

Zêdetirê tiştên di vê cihanê da pêk tên û çêdibin bi rêka wan esbab û 'illeta ve ye ku pê ceribandinên cûrbicûr tên zanîn û tên nas kirin, wek tiştên fîzîkî û şîmiyayî û rûhî û rewanî. Lêbelê kêm caran hinek tişt bi awayek dî çêdibin û pêk tên ku mirov nikarê hemî esbab û 'illetên wê pê ceribandinên hissî nas bikê û bizanê, û hinek nîşan hene ku di çêbûna wan da hinek sebebên dî hebin, wek karên 'ecêb ku ji cadûkeran (murtazan) çêdibin û zanayên 'ilman şahidîyê didin ku ev karên he gorekî qanûnên 'ilmên maddî û tecrubî pêk nayin. Ji karên wiha ra tê gotin «xariqul 'ade».

Xariqul 'adeyên Xudayî

Karên xariqul 'ade bi du qisman teqsîm dibin:

Yêk- karên ku her çend sebeb û 'illetên wê yên me'mûlî tunehin, lêbelê sebebên wê yên ne me'mûlî di ixtiyara beşer da ne û mirov dikarê pê hîn kirin û 'elimandinên taybet bi dest xwe ve bênê, wek karên «murtazan».

Du- qismê dî ew karên xariqul 'ade ne ku pêk hatina wan bi izna xas û taybet ya Xuda ve girêdayî ye, û nakevê destê wa kesên girêdan û peywend bi Xudê neyîn, ji ber vê yêkê du taybetî û xasiyet jêra hene. **1-** ʻelimandin û ʻelimîn jêra nîne. **2-** çi hêz û quwetên xurttir ji wê nînin û sebebek dî nikarê ser wê bikevê. Ev xariqul 'ade yên he taybet û mexsûsê 'evdên bijartî yên Xuda ne û qet nakevê destê kesên li pey hewayê nefsê. Lêbelê ne taybetê pêxembera ye û carna welî yên Xuda jî behrê jê digirin, û ji ber vê yêkê di istilaha ʻilmê kelam da ji hemiyan ra «muʼcize» nayê gotin, û dema karek wiha ji kesekî çêbê ku ne pêxember bê jêra tê gotin «keramet». Çewa ku zanînên ne 'edetî yên xudayî jî tenê «wehy û nubuwwet» nîne, û dema zanînek wiha ji kesekî ra bê dayîn jêra tê gotin «ilham» û «tehdîs» û ... .

Li vêderê rêka ji hev nas kirina va her du xariqul 'adeyan «ilahî û ne ilahî» jî hat zanîn; yanî eger kirina karek xariqul 'ade were hîn kirin û mirov bikarê bi'elimê, an faʼilek dî bikarê pêşiya wê bigirê an ewê jinav bibê hingê ew ne ji qismê xariqul 'ade yên xudayî ye. Çewa ku xirabkarî û nedurustî ya bawerî û exlaqê kesekî dikarê nîşanek dî bê ji wê yêkê ra ku peywend û girêdan digel Xuda nîne û mirov dikarê ewê bikê nîşaenk ji şeytanî û nefsanî bûna karê wî ra.

Munasib e ku li vêderê em vê jî bêjîn ku: mirov dikarê bêjê faʼilê karên xariqul 'ade yên ilahî Xudê Te'ala ye (xêncî ji wê faʼiliyeta nisbet bi mexlûqan hemiyan heyî) ji vê nêrînê ve ku pêk hatina

wan bi izna xas û taybeta Xuda ve girêdayî ye; [1] û her wiha mirov dikarê nisbeta wê bidê bal wasita ve ji melaîket û pêxemberan, bi wê nêrînê ku wasite ne, an fa'ilê qerîb in, wek çewa Qur'ana pîroz nisbeta sax kirina miriyan û şifa dana nexweşan û çêkirina firindan dayî bal hezretê 'Îsa ve (s) [2] û di navbeyna va her du nisbeta da dijatî û te'aruzek nîne, çimko fa'iliyeta ilahî di dirêjiya fa'iliyeta 'evda da ye.

Taybetî yên mu'cizên pêxemberan

Gotina sisê ku di te'rîfa mu'cizê da işare pê hat kirin ev bû ku: mu'cizên pêxemberan nîşana durustî ya de'we û gazî ya wa ye, ji ber vê yêkê em dikarîn bêjîn mu'cize yanî ew karê xariqul 'ade ku bi izn û icaza xas û taybet ya Xuda ji wî qasî ra ku bibê delîla pêxemberî ya pêxemberan, pêk tê. Û pê te'mîma di mefhûmê wê da ewa karên xariqul 'ade yên ku dibin delîl li ser imametê jî digirê ber xwe ku jêra tê gotin «keramet», û evahe li beraberê wan xariqul 'ade ya de ne ku bi hêz û quwayên şeytanî û nefsanî pêk tên wek sihr û kehanet û karên murtazan; ew karên ku hem qabilê hîn kirin û 'elimînê ye û hem ji ber hêz û quwetek pitir, bin dikevin; û bi gişt mirov dikarê ne xudayî bûna wan bi rêka xirabî û nedurustî ya bawerî û exlaqê xweyê wan ve bizanê û pê bihesê.

Nukte ya ku gereke li vêderê bê gotin ev e ku: ew tişta mu'cizên pêxemberan rasterast sabit dikê, ew rastbêj bûna wa ye di de'we û gazîyê da, lê vêca durustî ya naveroka risalet û peyamê û lazim bûna guhdarî kirina wan û peyketina fermana wan, evahe jî bi

---

[1]- Binêrin: Re'd / 27 , Xafir / 78 ... وَمَا كَانَ لِرَسُولٍ أَنْ يَأْتِيَ بِآيَةٍ إِلَّا بِإِذْنِ اللَّهِ فَإِذَا جَاء أَمْرُ اللَّهِ قُضِيَ بِالْحَقِّ وَخَسِرَ هُنَالِكَ الْمُبْطِلُونَ.

[2] - Binêrin: Alê 'Imran / 49 , Ma'ide / 110 = إِذْ قَالَ اللهُ يَا عِيسى ابْنَ مَرْيَمَ اذْكُرْ نِعْمَتِي عَلَيْكَ وَعَلَى وَالِدَتِكَ إِذْ أَيَّدتُّكَ بِرُوحِ الْقُدُسِ تُكَلِّمُ النَّاسَ فِي الْمَهْدِ وَكَهْلاً وَإِذْ عَلَّمْتُكَ الْكِتَابَ وَالْحِكْمَةَ وَالتَّوْرَاةَ وَالإِنجِيلَ وَإِذْ تَخْلُقُ مِنَ الطِّينِ كَهَيْئَةِ الطَّيْرِ بِإِذْنِي فَتَنفُخُ فِيهَا فَتَكُونُ طَيْرًا بِإِذْنِي وَتُبْرِئُ الأَكْمَهَ وَالأَبْرَصَ بِإِذْنِي وَإِذْ تُخْرِجُ الْمَوتَى بِإِذْنِي وَإِذْ كَفَفْتُ بَنِي إِسْرَائِيلَ عَنكَ إِذْ جِئْتَهُمْ بِالْبَيِّنَاتِ فَقَالَ الَّذِينَ كَفَرُوا مِنْهُمْ إِنْ هَـذَا إِلاَّ سِحْرٌ مُّبِينٌ.

awayê xeyrê musteqîm û bi-l wasite sabit dibê. Û bi gotinek dî: pêxemberiya pêxemberan (selamên Xudê li wan bin) pê delîla 'eqlî û mu'teber bûna naveroka peyamên wan pê delîla «te'ebbudî» sabit dibê. Binêrin dersa / 4 û 21 ji vê kitêbê.

PIRSYARÊN DERSA 27

Pêxemberên rastî bi çi rêkê ve tên nas kirin? Û di nav va rêka da çi ferq heye?

Nîşanên derewî ya wa yên bi derew de'wa pêxemberîyê dikin çi ye?

Mu'cize çi ye? Te'rîfa wê binivîsin.

Kar û tiştên xariqul 'ade kîjan in?

Ferqa xariqul 'ade yên xudayî û ne xudayî çi ye?

Bi çi rêka ve xariqul 'ade yên xudayî tên nas kirin?

Taybetî û xasiyeta mu'cizên pêxemberan di nav xariqul 'ade yên ilahî da çi ye?

Istilahên «mu'cize» û «keramet»ê bêjin û şîrove bikin.

Mu'cize karê Xuda ye an karê pêxember e?

Mu'cize delîla rastgoyî ya pêxember e, an delîla durustî ya risaletê û naveroka peyamê?

DERSA 28

JINAV BIRINA ÇEND ŞUBHAN

Dagirê:

Gelo i'caz eslê 'illiyetê naşikênê?

Gelo xerqa 'edetê ne di şûna guherîna sunnetên ilahî da ye?

Çima Pêxember (s) xwe paşda dida ji anîna mu'cizê?

Gelo mu'cize burhana 'eqlî ye an delîla qani' kirinê?

Jinav birina çend şubhan

Derheq mu'cizê da hinek şubhe hene ku emê jê baxivîn:

1- şubha ewwil: her tiştek maddî 'illet û sebebek xas û taybet heye ku mirov dikarê bi arîkariya ceribandinên 'ilmî ewa nas bikê, û nenasiya 'illet tiştekî ji ber kêmasiya di alet û wesîlên ceribandinê da nabê delîla tunebûna 'illetek me'mûlî ji tiştan ra. Nixwe derheq xariqul 'adeyan da hema ev tê qebûl kirin ku ew pê 'illet û sebebên nehatîn nas kirin peyda bûne. Û agahî ji 'illetên wan di zemanekî da ku hêca nenas in, mirov dikarê karek mu'cize bênê hesabê. Lê vêca inkara 'illetên qabilê zanîn û nasînê pê tecrubên 'ilmî, bi me'na şikandina eslê 'illiyetê ye û nayê qebûl kirin.

Cewab ev e ku eslê 'illiyetê ji vê pêve tiştek dî nabêjê ku: ji her tiştekî ne serbixwe ra (me'lûl) 'illetek heye, lê vêca evahe ku her 'illetek qabilê nasînê bê, pê tecrubên 'ilmî, qet di naveroka eslê

'illiyetê da nîne û mirov nikarê delîlekî jî ji vê gotinê ra peyda bikê, çimko daire ya ceribandinên ‘ilmê pê karên tebî'î hatiye sînor kirin û mehdûd bûye, û qet nikarê hebûn an nebûn an eser nekirina kar û tiştên werayê tebî'et pê wesîlên ceribandinê sabit bikê.

Lê vêca ev gotin ku: mu’cize agahiya ji 'illetên nenas e. Evahe ne gotinek durust e, çimko eger ev agahî ji rêka 'illetên tebî'î ve hatibê dest hingê ferqa wê digel tiştên tebî'î yên dî namînê û qet karê xariqul 'ade nayê hesab kirin, û eger ew agahî bi awayek xeyrê me'mûl peyda bûbê herçend karê xariqê 'edetê tê hesab kirin û eger peywend bi izna Xudê ve hebê û delîla durustî ya pêxemberîyê bê yêk ji qismên mu’cizê (mu'ciza ‘ilmî) tê hesab kirin (Alê ‘Imran / 49). Lêbelê mirov nikarê mu’cizê di vî qismî tenê da bizanê û qismên dî yên wê inkar bikê. Û paşî ra jî cihê evê pirsyarê her dimînê ku ferqa vê digel xariqul 'ade yên dî û peywenda digel eslê 'illiyetê da çi ye?

2- şubha duwê ev e ku: sunneta Xudê bi vî awayî herikiye û carî bûye ku her tiştekî bi rêkek xas û taybet ve peyda bikê û çêkê, û çewa ku ayetên Qur’anê kerem dikin sunnetên Xuda guherîn jêra nîne (Isra / 77, Ehzab/ 62 , Fatir /43 , Feth /23). Nixwe bê 'edetî (xeriqa 'edetê) ku di şûna guherîn û tevdana sunneta xudayî da tê hesabê bi rêka va ayeta ve tê nefy kirin û merdûd e.

Cewab: ev şubhe wek şubha pêşda ye; pê vê ferqê ku li wê derê pê 'eql delîl dihata anîn û delîla li vê derê hatî ji Qur’anê ye. Û cewab ev e ku: mirov nikarê bêjê yêk ji sunnetên bêguherîn yên Xudê Te'ala ew e ku ji hemî tişta ra hema esbab û 'illetên me'mûlî danîbin, evê gotinê delîl tunehin. Ev gotin wek wê ye ku kesek bêjê: yêk ji sunnetên bê guherîn yên Xudê ew e ku sebebê şewitandinê hema di agir tenê daniye! Û di beraberê va gotina da mirov dikarê evê bêjê ku hebûna çend awayên 'illetan ji me'lûlên

muxtelif ra û evahe ku esbabên ne me'mûlî bikevin şûna esbabên me'mûlî da tişteke ku her û her di cihanê da hebûye, ji ber wê yêkê gereke ew ji sunnetên ilahî bê hesab kirin û gotina: «esbab hema esbabên me'mûlî tenê ne», gereke bi me'na guherîna sunneta Xuda bê zanîn ku ayetên Qur'ana pîroz ewê qebûl nakê.

Di her halî da ayetên pîroz ku guherîn û texyîrê di sunnetên xudayî da qebûl nakê eger bi vî awayî bên tefsîr kirin ku çi esbabên ne me'mûlî nakevin şûna esbab û 'illetên 'addî û me'mûlî da, ev tefsîrek bê delîl e, belkî ev jî bê gotin ku: ayetên zehfî ku nîşan didin mu'cize û karên xariqul 'ade qewimîne, delîlek qewî û bihêz e di dijê evê tefsîr û şîrove kirinê da. Û tefsîra durusta evan ayetan gereke di kitêbên tefsîrê da bê dîtin, lêbelê bi kurtî em vê bêjîn ku: ev desta he ji ayetên pîroz, li pey vê meselê ne ku bêjin me'lûl ji 'illeta xwe paş nakevê (eger 'illet hat me'lûl jî tê) û nabêjin ku çend 'illetî û ketina 'illeta ne me'mûlî di şûna 'illeta me'mûlî da çênabê. Belkî mirov bikarê evê jî bêjê ku qasê yeqînê ku ev ayet behsê dikin hema eser danîna esbab û 'illetên xeyrê me'mûlî û ne'addî ne.

3- şubha sisê ev e ku: di Qur'ana pîroz da hatiye ku gelek caran xelkê anîna mu'cizê û kirina karên xariqul 'ade ji Pêxember (s) xwestine, lêbelê ewî xwe bere nekiriye û qebûl nekiriye (En'am / 37 , 109 , Yûnus / 20 , Re'd / 7 , Enbiya /5). Û eger anîna mu'cizan rêkeke ji sabit kirina pêxemberîyê ra, çima Pêxemberê giranqedr (s) ji vê rêkê istifade nekiriye?

Cewab ev e ku ayetên bi vê pêkê peywend û girêdana wan heye bi wan daxaza ve ku piştî temam bûna delîlê û sabit bûna pêxemberiya wî hezretî bi sê rêka ve, (nîşanên durustîyê, mizgîniya pêxemberên pêşîyê da û anîna mu'cizê) dixwestan û ev xwesta wan ne ji bo eşkere bûna heqîqetê bû belkî ji ber

hinek exraz û rikeberanîyê bû. [1] Û hikmeta ilahî li ser wê sekinî bû ku ji van xwesta ra cewabek neyê dayîn.

Ronahî kirin: hedef ji anîna mu'cizan [ku tiştek istisnayî ye di sîstema cihanê da, û carna li ser daxaza xelkê (wek deva hezretê Salih selamên Xudê lê bin) û carna hema bêxwestin (wek mu'cizên hezretê 'Îsa (selam lê bin) pêk dihatan] nasandina pêxemberên Xudê û temam kirina delîlê bû, ne ji wî qasî ra bû ku mecbûr bibin ji qebûl kirina de'we û gazî ya pêxemberan ra (selamên Xudê li wan bin) û li ber wan teslîm bibin û her wiha ne ji wî qasî ra bû ku pê tevhev kirina esbab û 'illetên me'mûlî, xelkê sergerm û mijûl bikin. Û ev hedefa he dikê lazimê xwe ku cewaba her daxazekî neyê dayîn, belkî cewab dana hineka jî xilafê hikmetê û neqza xerezê (jinav birina hedefê) bê. Wek wa tiştên ku heqê bijartinê ji xelkê digirta û xelk têxistan tengî da ku gazî û de'weta pêxemberan (s) bi zorî û xurtî qebûl bikin; û an ew daxazên ji ber rikeberanîyê an hinek xerezên dî û ne ji peyda kirina heqîqetê ra dixwestan. Çimko hingê wê mu'cize bibûna tevzok û wê xelk ji mijûlahî ra bihatan û temaşa bikiran an jî wê ji feydên şexsî ra xwe bidan dora pêxember, ji alîyê dî ve jî vêca wê dergehê imtihan û ceribandin û bijartina azad bihata girtin û wê xelk ne ji dil û ji ber sebebên dijwar û xurtî û icbarî biketan pey pêxemberan (selamên Xudê li wan bin) û ev her du jî xilaf û bervajîyê hedefa anîna mu'cizan bû.

Lê vêca di cî yên dî da û dema hikmeta ilahî bikira lazimê xwe, hingê daxaza wan qebûl dikiran, çewa ku gelek mu'cize ji Pêxemberê me jî (selat û selamên Xudê lê bin) xuya bûne û gelek ji wan bi neqla mutewatir sabit bûne. Û ser hemiya ra mu'ciza anîna Qur'ana pîroz e ku ji her û her ra heye. Û behsa wê, dê bê kirin di dersên hêjbê da (dersa 32 û 33).

---

[1] - Binêrin: En'am / 35 ,124 , Taha / 133 , Saffat / 14 , Qemer / 2, Şu'era / 3 , 4, 197 , Isra / 59 , Rûm / 58

4- şubha çarê: çimko mu'cize bi izna xas û taybeta Xudê ve girêdayî ye di karê nîşanek bê ji hebûna peywend û girêdanek taybet di navbeyna Xudê û wî yê mu'cize anî da, bi vê delîlê ku ew izna mexsûs dayîyê û bi gotinek dî: karê xwe bi rêka wî ve û bi destê wî pêk aniye. Lêbelê vêca gorekî 'eql ev peywend û girêdan nakê lazimê xwe ku peywend û girêdanek dî jî di navbeyna Xudê û înerê mu'cizê da hebê bi vê me'nê ku Xudê wehyê rêkê û înerê mu'cizê ewê wehyê bigirê. Nixwe mirov nikarê bêjê ku mu'cize delîlek 'eqlî ye ji durustiya de'wa pêxemberîyê ra, û çiqas mirov xwe bişidênê jî ji vê pêve nayê hesab kirin ku: delîlek ihtimalî bê û ji bona qani' kirinê ra bê.

Cewab ev e ku karê xariqul 'ade [herçend xariqul 'adeyê ilahî bê] bi xwe bi xwe nabê delîl ji hebûna peywenda wehyê ra, û ji ber vê yêkê mirov nikarê keramatên welî yên Xudê bikê delîla pêxemberîyê ji wan ra, lê xeberdan derheq kesekî da ye ku de'wa pêxemberîyê dikê û mu'cize ji durustiya de'wa xwe ra aniye. Eger ferzen evî mirovî bi derew de'wa pêxemberîyê bikira[1] [yanî mezintirîn û pîstirîn guneh bikira ku sebebê pîstirîn xirabî yên dinya û axiretê ye] qet nedibûya layiqê ewê peywend û girêdanê digel Xudê Te'ala û hikmeta Xudê qebûl nedikira ku ewê mu'cizê bênê û bibê sebebê li rê wunda kirina xelkê û ewa ji rê derênê (Haqqe / 44 – 46).

Welhasil: 'eql bi başî pê dihesê ku ew kes layiqê peywend û girêdanê ye digel Xuda yê Mute'al ku bikarê mu'cizan bênê, ewê ku xiyanetê li mewla û xweyê xwe nekê û rêka nedurust û bextreşîyê nedê ber bende û 'evdên Wî. Nixwe anîna mu'cizeyê delîlek birra ya 'eqlî ye li ser durustiya de'wa pêxemberîyê.

[1] - Binêrin: En'am / 35 ,124 , Taha / 133 , Saffat / 14 , Qemer / 2, Şu'era / 3 , 4 ,197, Isra / 59, Rûm / 58.

PIRSYARÊN DERSA 28

Eslê 'illiyetê çi ye û çi dikê lazimê xwe?

Çima qebûl kirina eslê 'illiyetê ne dijê qebûl kirina mu'cizê ye?

Çima şîrove kirina mu'cizê bi «agahiya ji 'illetên nenas» tefsîrek nedurust e?

Gelo qebûl kirina mu'cizê dijatî heye digel vê ku: guherîn di sunnetên ilahî da nîne? Çima?

Gelo pêxemberan ji bal xwe mu'cize daniyan an piştî daxaza xelkê?

Çima pêxemberan ji anîna mu'cizê ra cewaba hemî daxazan nedidan?

Ji vê behsê baxivin ku: mu'cize ne delîlek ihtimalî û ji qani' kirinê ra ye, belkî burhan û delîlek 'eqlî ye ji durustiya de'wa pêxemberîyê ra.

DERSA 29

TAYBETÎ YÊN PÊXEMBERAN

Dagirê:

Gelekî ya pêxemberan

Jimara pêxemberan

Nubuwwet û risalet

Pêxemberên ulul 'ezm

Çend nukte û gotin

Gelekî ya pêxemberan

Heta niha me derheq sê meselên binyatî yên pêxemberî û rêbernasîyê xeber da û em gehan vê desthatê ku çimko kêmasî di zanîna beşerî da heye ji bona gehana zanînên lazimên se'adet û bextewerî ya dinya û axiretê, ji ber wê hikmeta ilahî li ser wê sekinê ku pêxemberan hilbijêrê û durustîyên ku ihtiyac pê heyî ji wan ra bêjê da ku bi durustî û bêy aloz bûn bigehênê mirovan, ji alîyê dî ve jî vêca ewa pêxemberan bi awayek wusa bidê nasandin ku huccet û delîl li ser wan temam bibê, û 'umûmîtirîn rêka wê ji gişt xelkê ra anîna mu'cizê ye.

Me ev gotin pê delîlên 'eqlî sabit kirin. Lêbelê ewa delîla delalet nedikir li ser wê yêkê ku gelek pêxember û kitêb û şerî'etên 'esmanî hebin.

Û eger ferzen şert û mercên jiyana mirovan bi awayek bûya ku pêxemberekî bi tenê bikariya niyaz û ihtiyacîyên insan heta axir û dûmahîkê ronahî bikira, bi awayek wereng ku hemî kesî û hemî koman di dirêjiya tarîxê da wezîfe ya xwe pê peyamên wî pêxemberî nas bikira, ne muxalifê eva delîlan bû.

Lê em zanîn ku: 'emr û temenê her insanekî [ku pêxember jî ji wan e] hudûd kirî ye û hikmeta xilqetê ne ev bûye ku yêk pêxember bi tenê heta axirîka cihanê, sax bimînê û ew bi xwe xelkê hemiyan hidayet bikê. Ev ya ewwil.

Du- şert û mercên jiyana mirovan û hal û wez'ê wan di hemî wext û ciha da ne wek hev e û ev ixtilaf û ne wek yêk bûn û guherîna şert û mercan, nexasma aloz bûna kêmkêm ya peywendên komelayetî û carna lazim dibê ku qanûnên nû bên danîn, û eger ev qanûn bi rêka pêxemberekî ve bihatan beyan kirin ku hezaran sal pêşda hatibê rêkirin wê karek bêhûde bihata hesabê û tetbîqa wan ji hinek ciha ra jî wê gelek dijwar bûya.

Sê- di gelek zemanên borî da wesîle yên ragehandin û belavkirina gazî ya pêxemberan (s) bi awayek wereng nebû ku gazî û peyama xwe bigehênin cihaniyan.

Çar- agahî û zanînên ku pêxemberekî dida xelkê xwe, ji ber hinek sebeban û pê derbaz bûna zeman xwehrî diketa navê û tefsîr û şîrove kirinên nedurust jêra peyda dibûna, [1] û piştî çendekî dibûya dîn û olek nedurust. Çewa ku dînê yêkperêsî û tewhîdî yê hezretê 'Îsa yê kurê Meryemê piştî çendekî guherandin ketê û bû dînê «teslîs» û sê kesatîyê.

[1] - Ji zanîna pitir ra binêrin: kitêba “El-Huda îla dîn-il Mustefa” , Merhûmê Belaxî.

Dema ev nukte berçav bên girtin hikmeta gelek bûna pêxemberan (selamên Xudê li ser wa hemiyan bin) û ixtilafa şerî'etên 'esmanî di hinek hukmên ‘ibadetî û komelayetî da ronahî dibê[1] digel wî qasî ku ew hemî di esasên bawerîyê û binyatên exlaqî da rêk diketan (binêrin: Beqere /131 – 137, 285, Alê ‘Imran/19-20). Mesela nimêj di hemî dînên 'esmanî da hebûye herçend çewanî û qibla nimêjê di nav ummetan da ferq kiriye, her wiha zekat û sedeqat di hemî dîna da hebûye herçend miqdar û cihên wê ne wek hev bûye.

Di her hal û karî da bawerî û îmana bi hemî pêxemberan û ji alîyê pêxemberîyê ve tesdîqa wan û qebûl kirina peyam û zanînên wan ku ji wan ra hatîn li ser her kesî lazim e (binêrin: Şûra / 13 , Nisa/136, 152 , Alê ‘Imran/82-85) û derewîn kirin û inkar kirina yêk ji wan inkara hemiyan û inkara yêk hukmê Xudê inkara hukman hemiya ye (Nisa/150, Beqere/85). Elbet wezîfe ya her ummetekî di her zemanekî da ew e ku destûr û fermanên pêxemberê wî zemanî pêk bênê.

Ev jî lazim e bê gotin ku 'eqlê mirov dikarê bi hikmeta gelekî ya pêxemberan û kitêbên 'esmanî û ferqa di nav beyna şerî'etan da heyî bihesê û fêhm bikê; lê nikarê formûlek deqîq ji êjmara pêxemberan û şerî'etên 'esmanî ra bênê, bi awayek wereng ku bikarê biryarê bidê kanê di çi cî û zemanê da gereke pêxemberek an şerî'etek nû were hinartin.

Hema evqas fêhm dikê ku kengê şert û mercên jiyana beşer bi awayekî bê ku gazî ya pêxember bigehê xelkê cihanê û peyam û gotinên wî ji mirovên hêjbên ra parastî bimînin û guherînên zeman hebûna hukmên şer'î yên binyatî û nû nekê lazimê xwe hingê rêkirina pêxemberek dî nelazim e.

[1] - Binêrin: Maide / 48 , Hecc / 67

Êjmara pêxemberan

Çewa ku hat gotin ev rêk ji 'eql re nîne ku bikarê êjmarekî ji pêxemberan û kitêbên 'esmanî ra kifş bikê û evê meselê mirov tenê dikarê bi rêka delîla neqlî ve bizanê. Qur'ana pîroz digel wê çendê ku gotiye Xudê ji her ummetekî ra pêxemberek hinartiye (Fatir /24 , Nehl / 36), lêbelê êjmara ummetan û pêxemberê wan kifş nekiriye; hema tenê navê bîst û çend pêxemberan biriye û qseta çend kesa jî [ku nav ji wan nebiriye] bi kurtî jê xeber daye (Beqere / 246 , û 256). Lêbelê di çend riwayetan da ku ji Ehlê Beytê (s) hatine gêran, hatiye ku Xudê Te'ala sed û bîst û çar hezar pêxember rêkirine, û zincîra pêxemberan pê hezretê Ademê ebul beşer (s) destpê dibê û pê hezretê Muhemmed bin 'Ebdillah (selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) xilas dibê.

Pêxemberên Xuda xêncî ji sifetê «nebî» ku meqamek taybet e ji alîyê Xuda ve ji wan ra heye, hinek sifetên dî jî hene wek: «nezîr» û «munzir» û «beşîr» û «mubeşşir» (Beqere/213, Nisa/ 165) û ji «salih» û «muxlesan» bûn. Hinek ji wan geha bûn dereca «risalet»ê û di hinek riwayetan da êjmara «resûlên Xudê» sêsed û sêzdeh kes hatine gotin (Bihar-ul enwar / c. 11 , s. 32).

Nubuwwet û risalet

Kelîma «resûl» bi me'na «peyamîner û qasid» e; û kelîma «nebî» eger ji madda **«n-b-'e»** bê bi me'na «xweyê xeberê muhimm» e û eger ji madda **«n-b-w»** bê bi me'na «xweyê derece û merteba bilind û girîng» e.

Hinekan guman kiriye ku mefhûmê «nebî» berfirehtir e ji mefhûmê «resûl» bi vê beyanê ku: nebî ew e ku wehy ji alîyê Xudê ve jê re hatibê, vêca çi emrê wî hatibê kirin ku ji xelkê ra bêjê û çi ragehandinê ra emrê wî nehatibê kirin, lêbelê resûl ew

e ku emrê wî bi ragehandina wehyê hatibê kirin.

Lê ev gotinek ne durust e; çimko di hinek ayetan da sifetê «nebî» piştî sifetê «resûl» hatiye (Meryem / 51 , 54), halhale gorekî gotina wan gereke sifetê ku di mefhûmê xwe de «e'em/firehtir» bê (nebî) pêşiya sifetê xas da (resûl) bê gotin. Xêncî ji wî jî delîlek tune ku bêjê ragehandina wehyê mexsûsê bi «resûlan» ve ye.

Di hinek riwayetan da hatiye ku meqamê nubuwwetê ew e ku melaîketên wehyê di xew de bibînê û di hişyarîyê da tenê dengê wî seh bikê, lê xweyê risaletê di hişyarîyê da jî melaîketê wehyê dibînê (el- Kafî / c. 1 , s. 176).

Lê mirov nikarê evê ferqê jî ji mefhûmê kelîmê derênê. Di her halî da ewa tê qebûl kirin ev e ku: nebî ji nezer misdaq ve (ne ji nezer mefhûmê ve) e'emm û berfirehtir e ji resûl; yanî pêxember hemî xweyê merteba nebîtîyê bûne; lêbelê hinek ji wan meqamê risaletê ji wan ra hebûye, ne hemî. Gorekî me pêşda gotî sêsed û sêzdeh resûl hebûne û meqam û dereca wan ji pêxemberên dî bilindtir bûye, çewa ku ew bi xwe jî hemî ne di dereceyekî da bûne (Beqere / 253 , Isra / 55) û hinek ser hineka ra ne û hinek gehane merteba imametê (Beqere / 124 , Enbiya / 73 , Secde / 24).

Pêxemberên ulul 'ezm

Di Qur'ana pîroz da komek ji pêxemberan «ulul 'ezm» hatine nav kirin (Ehqaf / 35); lêbelê xasiyet û taybetîyên wan kifş nebûne. Gorekî hinek riwayetan pênc pêxember ulul 'ezm bûne, bi vê rêzê: hezretê Nûh û hezretê Ibrahîm û hezretê Mûsa û hezretê 'Îsa û hezretê Muhemmedê kurê 'Ebdillah (selat û selamên Xudê li wan bin). Xasiyeta wan [xêncî ji sebr û xweragirî ya baş ku di Qur'anê da jê hatiye xeberdan] ev bûye ku her yêk ji wan kitêb û şerî'etek serbixwe hebûne û pêxemberên dî yên di zemanê wan da hebûn û ewên pey wan ra hatîn bi

şerî'eta wan 'emel kirine û heta wextê yêkî dî ji pêxemberên ulul 'ezm hatî û kitêb û şerî'etek nû anîn.

Li vêderê ev jî ronahî bû ku çêdibê du pêxember di yêk zemanê da hebin; çewa ku hezretê Lût hevçax bûye digel hezretê Ibrahîm (s) û hezretê Harûn digel hezretê Mûsa bûye pêxember û hezretê Yehya di zemanê hezretê 'Îsa (s) da bûye.

Çend nukte

Di dûmahîka vê dersê da derheq pêxemberîyê da emê bi kurtî çend mesela bêjin:

A- pêxemberan hevdu qebûl kirine û mizgîniya hatina pêxemberê pêretir dane (Alê 'Imran / 81). Nixwe eger kesekî got ez pêxember im bere jî pêxemberên pêşda inkar kirin ew derewker e.

B- pêxemberan ucret û kirh ji ber pêk anîna wezîfa pêxemberîyê ve ji xelkê nedixwestan[1] pêxemberê me tenê ku hez kirina ji Ehlê Beyta xwe kiriye kirh û ucreta risaleta xwe (Şûra/23) da ku bidê zanîn gereke pey wan biçin û di heqîqet da feyda wê li ummetê bi xwe dizivirê (Sebe'/47).

C- hinek ji pêxemberan meqamên wek hukûmetê jî hebûne ku nimûna wan hezretê Dawûd û Suleyman in (selamên Xudê li wan bin). Û ji ayeta 64 ya sûretê Nisa ku guhdarî kirina pêxemberan bi awayê gişti ferz kiriye tê fêhmê ku ev meqam ji hemî pêxemberan ra hebûye.

D- cin ku hinek ji mexlûqên muxtar û mukellef in û di halê me'mûlî da mirov ewa nabînin ji de'weta hinek ji pêxemberan agahî peyda kirine û qencên wan îman bi wan anîne û di nav

[1]- Binêrin: En'am / 90 , Yasîn / 21 ,Tûr / 40 , Qelem / 46 , Yûnus / 72, Hûd / 29 - 51 , Furqan / 57 , Şu'era / 109 , 127 , 145 , 164 , 180 , Yûsuf / 104 , Sad / 86

wan da peyrewên hezretê Mûsa û hezretê Muhemmed (selat û selamên Xwedê li ser wî û alê wî bin) [Ehqaf / 29 - 32]. Hinek ji wan jî ketine pey iblîs û inkara pêxemberan kirine (Cin / 1 – 14).

PIRSYARÊN DERSA 29

Hikmetên gelekî ya pêxemberan bêjin.

Nisbet bi gazî ya hemî pêxemberan û destûrên wan xelkê çi wezîfe û berpirsyarî heye?

Kengê hatina pêxemberek nû lazim nîne?

Çend nebî û çend resûl hebûne?

Nebî û resûl çi ferq gel hev hene?

Ji nezer meqamên ilahî ve pêxemberan çi seratî li ser hev hebûne?

Pêxemberên ulul 'ezm kî ne? Û çi xasiyet û taybetmendî hene?

Gelo hebûna çend pêxemberan di zemanekî da çêdibê? Nimûne û misalekî bînin.

Hinek ji wesfên pêxemberan binivîsin.

Ji alîyê îman û kafir bûna bi pêxemberan, cin çend qism in?

DERSA 30

MIROV Û PÊXEMBER

Dagirê:

Pêşekî

Mi'emileta xelkê digel pêxemberan

Sebebên muxalefeta digel pêxemberan

Awayên rûbirû bûna digel pêxebmeran

Hinek ji sunnetên ilahî di teybîra komelê da

Pêşekî

Dema Qur'ana pîroz derheq pêxemberan da daxivê û hinek ji jiyana wa ya ronahî û pir bereket şîrove dikê û tarîxa wan ya nûranî dibêjê, gelek muhimmatê dixwê ji me'emileta ummetan digel wan. Ji aliyekî ve behsa wê dikê ku di beraberê pêxemberan da çi kirine û ji ber çi muxalefet kirine digel wan; û ji alîyê dî ve vêca behsa uslûb û awayê terbiyet û hidayeta pêxemberan dikê û dibêjê kanê çewa digel esbabên kufr û şirk û xwehrîyê berberekanî kirine; û her wiha ji sunnetên ilahî derheq rêve birina komelan axiftiye, nexasma ji nezer peywenda du alî ya pêxemberan û xelkê digel hev ku gelek nuktên ronahîker têda hene.

Ev behsên he herçend rasterast ne girêdayî ne bi meselên bawerîyê û «kelam» ve lêbelê ji ber ku meselên pêxemberîyê ronahî dikin û vê derheqê da gelek tiştên tarî ji tarîtîyê dertînin û gelek tiştên muhim û şîret û 'ibret û hîn kirin têda hene, di vê

dersê da emê ji muhimtirînê wan baxivîn.

Me’emileta xelkê digel pêxemberan

Dema pêxemberên Xuda dihatan û xelk ji perêstin û ‘ibadetê Xuda ra [1] û guhdana destûrên Wî û xwe dûr girtina ji taxûtan û şeytanan û terka zulm û xirabîyê û nekirina guneh û karên pîs ra gazî dikiran, bi gişti xelkê muxalefeta wan dikira; [2] nexasma serok û giregiran û dewlemend û zengînên komelê ku mijûlê keyfa xwe bûn [3] û pê mal û mezinahî ya xwe an ‘ilm û zanîna xwe mexrûr û serxwe çûyî bûn[4] gelek dijwar diketa şer û berberekaniya wan û hinek ji xelkê dî jî pey xwe dikişandan û ji rêka heq paşda didan. [5] Û kêm kêm komek biçok ku zêdetir ji xelkê mehrûm û bêbehrên komelê bûn îman bi pêxemberan daniyan[6] û kêm caran çêdibûya ku komelek li ser esas û binyata bawerîyên durust û mîzan û pîvekên ‘edaletê û guhdarê Xuda û pêxemberan pêk bê û çêbê, wek çewa di zemanê hezretê Suleyman da çêbûyî (selamên Xudê lê bin). Herçend qismek ji zanînên pêxemberan kêm kêm diketa nav ferhenga xelkê da û hineka ew ji hinek dî digirtan û di nav xelkê da belav dibûya, carna jî serokên kufrê ew li ser navê xwe belav dikiran, çewa ku gelek ji sîstimên huqûqî yên cihanê ji şerî'etên 'esmanî hatine girtin û bêy işare kirina bal serkaniya wê ve bi navê xwe li 'alemê belav kirine û belav dikin.

Sebebên muxalefeta digel pêxemberan

[1] - Binêrin: Nehl / 36 û Enbiya / 25 û Fussilet / 14 û Ehqaf / 21.
[2] - Binêrin: Ibrahîm / 9 û Mu’minûn / 44.
[3] - Sebe’ / 34 وَمَا أَرْسَلْنَا فِي قَرْيَةٍ مِّن نَّذِيرٍ إِلَّا قَالَ مُتْرَفُوهَا إِنَّا بِمَا أُرْسِلْتُم بِهِ كَافِرُونَ.
[4]- Xafir - Mu’min / 83 û Qeses / 78 û Zumer / 49
[5] - Ehzab / 67 û Sebe / 3331-
[6] - Hûd / 40 û 31-27

Muxalefeta digel pêxemberan xêncî ji ber pey ketina hewayê nefsê[1] ji ber hinek tiştên dî ne jî; ku mirov dikarê bêjê yêk ji wan serxweçûn û xwe mezin dîtin (istikbar) bû ku di nav giregir û mezin û zengîna da dihata dîtin. [2] Yêk dî ew bû ku bi 'edet û te'essubatên xwe yên cahilî ve girêdayî bûn.[3] Her wiha parastina serkanî yên iqtisadî û mezinahî yên di nav komelê da ji wan ra heyîn [4] û ji alîyê dî ve jî vêca nezanîn û neagahî ya xelkê ku muhim bû ji xapandina wan ra dibûya sebeb ku neyên ser rêka wî dînî ku komek kêm ji bêbehr û mehrûman pêve ew qebûl nekirîn; ewên ji alîyê mezinên qewmê xwe ve hatîn terd kirin. Û gereke zorbêjî ya koma hakim jî di vê meselê da neyê ji bîr kirin. [5]

Awayên rûbirû bûna digel pêxemberan

Muxalifên pêxemberan ji bona pêşî girtina li karê wan bi rêkên muxtelif ve şer û berberekanî dikiran:

A- tehqîr û tevz kirin. Cara ewil komek dixebitiya ku şexsiyeta pêxember pê kêm kirin û tevz û yarî kirin û mesxere kirinê bişikênê[6] da ku xelk êdî pakîyê pê nekê.

B- buxtan û gotinên nelayiq. Piştî wê dest avêtan derew û buxtana û digotan ew «sefêk» û «dîn» in[7] û dema mu'cizeyek anî bûyan tuhmeta sihrê û cadûyê li wan didan, [8] wek çewa ku ji

[1] - Maide / 70.كُلَّمَا جَاءهُمْ رَسُولٌ بِمَا لاَ تَهْوَى أَنْفُسُهُمْ فَرِيقًا كَذَّبُوا وَفَرِيقًا يَقْتُلُونَ ..
[2] - Xafir - Mu'min / 56 û E'raf / 76.
[3] - Beqere / 170 û Maide / 104 û E'raf / 28 û Yûnus / 78 û Enbiya / 53 û Şu'era / 74 û Luqman / 21 û Zuxruf / 23-22.
[4] - Hûd / 86 - 8 û Qeses / 79 - 76 û Tewbe / 34.
[5] - Ibrahîm / 21 û Fatir / 47 û Hûd / 27 û Şu'era / 11.
[6] - Hicr / 11 û Yasîn / 30 û Zuxruf / 7 û Muteffifîn / 32 - 29.
[7] - E'raf / 66 , Beqere / 13 , Mu'minûn / 25
[8] - Zariyat / 29 , 52 - 53 , Enbiya / 3 , Qemer / 2

peyamên Xuda ra digotan «esatîr - çêrvêrok».[1]

C- mucadile û rikeberanî. Dema hinartî yên Xuda bi hikmet û delîl û an pê «cidala ehsen» xeber didan digel xelkê û ji wan ra behsa ne durustî ya kufr û şirk û serxweçûnê dikiran û feydên Xudê perêsîyê digotan û mizgîna se'adet û bexteweriya dinya û axiretê didan bawerdar û qencan, mezinên kufrê nedihêlan xelk guhê xwe bidin wan û dixebitîna ku pê gotinên nementiqî û serve serve xemilandî xelkê bixapînin û nehêlin peyrewîyê ji pêxemberan (selamên Xudê li ser wa bin) bikin (Nûh / 7, Fussilet / 26, En'am / 112 , 121, Xafir / 5 , 35 , E'raf /70 , 71 , Kehf / 56). Û gelektir bi awa û rêçka babkên xwe, xwe nav didan[2] û ji mal û serweta xwe xeber didan û ze'êfî û paş ketinên maddî û feqîrî ya peyrewên pêxemberan ji xwe re dikiran delîla nedurustîya bawerîyên wan (Yûnus / 88 , Sebe' / 35 , Qelem / 14 , Meryem / 77 , Muddessir / 12 , Muzzemmil / 11 , Ehqaf / 11). Û hinek hêcet û bihane çêdikiran wek vê ku: çima Xudê pêxemberên xwe ji nav melaîketan nebijartine? An çima melaîketek digel wan rênekiriye? An çima ewan maldar û zengîn nekirine?[3] Carna jî rikeberanî dighandan wî heddî ku digotan heta wehy ji me ra neyê an em Xuda nebînin û rasterast xeberdanê ji Wî guhlê nebin, em bawerî û îmanê naynin! [4]

D- tirsandin û berhêvî kirin. Awayek dî yê ummetan di beraberê pêxemberan da ku Qur'ana pîroz jê xeber didê ev e ku pêxemberên Xuda û peyrewên wan di tirsandin ji işkence û deranîna ji welatê wan û berbaran û kuştinê[5] û ji alîyê dî ve vêca ji wesîle ya berhêvî kirinê behre werdigirtan, nexasma bi vî

---

[1] - Binêrin: En'am / 25 , Enfal / 31, Nehl / 24, Mu'minûn / 83, Furqan / 5, Neml / 68 Ehqaf / 17 , Qelem / 15 , Muteffifîn / 13
[2] - Beqere/170 , Maide /104, E'raf/ 28 , Enbiya/ 53 , Yûnus/ 78 , Luqman/ 56
[3] - En'am / 7- 9 , Isra / 90- 95 , Furqan /84
[4] - Beqere / 118 , En'am/ 124 , Nisa/ 153
[5] - Binêrin: Ibrahîm/ 13 , Hûd/ 91 , Meryem/ 46 , Yasîn/ 18 , Xafir / 26

awayî ku malek zehfî mesref dikiran da xelkê ji peyrewiya pêxemberan paşda bidin. [1]

H- dijwarî û kuştin. Paşî ra jî ku sebr û xweragirî û camêrî ya pêxemberan (selamên Xuda li wan bin) [2] û ji dil bûn û xwe ragirî ya peyrewên wan didîtan û dinêriyan ku vir û derewên li ser pêxemberan çêdikin êdî bê feyde ne, dest davêtan bikar anîna dijwarîyê di 'emel û kiryarê da; wek çewa gelek pêxemberên Xuda kuştin[3] û koma mirovan ji hebûna mirovên qenc û layiq û salih bê bê behr kirîn.

Hinek ji sunnetên ilahî di rêxistina komela da

Herçend hedefa eslî ji rêkirina pêxemberan (selamên Xudê li ser wa bin) ew bû ku xelk ewa tiştên ji bexteweriya dinya û axireta wan ra lazim dest xwe ve bênin û huccet li ser wan temam bibê,(Nisa/ 65 , Taha / 134) lêbelê Xudê ji ber rehmeta Xwe ya zêde, meydanên rûhê li ber wan vedikiran da ku gazî ya pêxemberan qebûl bikin û bibê arîkarî ji wan ra ji bona herekea bi alîyê kemalê ve. Û çimko mezintirîn sebebê kufr û ber zivirandina ji Xudê û pêxember hissa bê ihtiyacî[4] û xefleta ji niyazên heqîqî bû, Xuda yê Hekîm hinek şert û merc daniyan pêş ku bi ihtiyacîyên xwe bihesin û ji merkeba xeflet û ser xwe çûnê peyar bibin, û ji ber vê yêkê zehmetî û gîrûgirift ji wan ra danîna pêş da ku bi bê quwetî û nekarîna xwe bihesin û berê xwe bidin Xudê (En'am/ 42 , E'raf/ 94).

Lêbelê evî sebebî jî eserek giştî û hemiyanî tunebû û gelek ji xelkê nexasma ewên imkanatên maddî heyîn û salên dirêj zulm û sitem

---

[1] - Binêre Enfal / 36 = إِنَّ الَّذِينَ كَفَرُوا يُنفِقُونَ أَمْوَالَهُمْ لِيَصُدُّوا عَن سَبِيلِ اللّهِ فَسَيُنفِقُونَهَا ثُمَّ تَكُونُ عَلَيْهِمْ حَسْرَةً ثُمَّ يُغْلَبُونَ وَالَّذِينَ كَفَرُوا إِلَى جَهَنَّمَ يُحْشَرُونَ.

[2] - Ibrahîm / 12... وَمَا لَنَا أَلاَّ نَتَوَكَّلَ عَلَى اللّهِ وَقَدْ هَدَانَا سُبُلَنَا وَلَنَصْبِرَنَّ عَلَى مَا آذَيْتُمُونَا

[3] - Beqere/ 61 , 87 , 91 , Alê 'Imran/ 21 , 112 , 181 , Maide/ 70 , Nisa/155

[4] - 'Eleq/ 6 , 7 = كَلَّا إِنَّ الْإِنسَانَ لَيَطْغَى * أَن رَّآهُ اسْتَغْنَى.

kirîn û di nav keyf û xweşiyan da borandîn û bi gotina Qur'anê dilê wan ji ber û koç jî reqtir û hişktir bûyî bi xwe ve nedihatin – (En'am/ 43 , Mu'mînûn/ 76). Û berdewam di nav xewa xefletê da diman û dewam didan rêka xwe ya nedurust. Û we'z û şîretên pêxemberan jî nikariyan ewa hişyar bikin. Û dema vêca Xudê bela û gîrûgirift ji wan dida paş û ji ser wan dida alî, digotan: ev guherîn û hatin û çûna bela û rihetîyê ku di pey hev ra tên lazimiya jiyanê ye û ji yên pêşiya me ra jî hebûye (E'raf/ 183 , 95). Û dîsa dest zulmê dikiran û ser mal û hêzên xwe ve zêde dikiran û xafil bûn ji vê yêkê ku hema ev zêde bûna imkanata davek ya Xuda ye ji bona bextreşî ya wan ya dinya û axiretê ra. (E'raf/ 182 , 183 , Alê 'Imran/ 178 , Tewbe / 55 , 85 , Mu'mînûn / 54- 56).

Welhasil: dema peyrewên pêxemberan bi êjmar û karîn bigehan heddekî ku bikarin komelek serbixwe pêk bînin û berevanîyê ji xwe bikin û digel dijminên Xudê bikevin şer, destûra cihadê ji wan ra dihata (Alê 'Imran/146)[1] û 'ezabê Xudê bi destê wan ser kafiran da dihata.[2] Û eger ew karîn ji wan ra tunebûya, bi destûra pêxemberan xwe ji kafiran paşda digirtan û paşê 'ezabê ilahî ji cihên dî ve ser wê komê da dihata ku hêviya xêrê û tewbê ji wan nebû ('Enkebût / 41 û gelek ayetên dî jî). Û ev e sunneta bê guherîna ilahî di rêxistina komên beşerî da (Fatir/ 43 , Xafir/ 85 , Isra/ 77).

PIRSYARÊN DERSA 30

Me'emileta xelkê di beraberê gazî ya pêxemberan da çewa bûye?

Sebebên muxalefeta digel pêxemberan şîrove bikin.

---

[1]- وَكَأَيِّن مِّن نَّبِيٍّ قَاتَلَ مَعَهُ رِبِّيُّونَ كَثِيرٌ فَمَا وَهَنُوا لِمَا أَصَابَهُمْ فِي سَبِيلِ اللَّهِ وَمَا ضَعُفُوا وَمَا اسْتَكَانُوا وَاللَّهُ يُحِبُّ الصَّابِرِينَ.

[2] - Alê 'Imran / 136

Muxalifên pêxemberan bi çi şiklan muxalefet dikiran?

Sunnetên ilahî derheq rêkirina pêxemberan û me'emileta xelkê digel wan beyan bikin.

DERSA 31

PÊXEMBERÊ ISLAMÊ

Dagirê:

Pêşgotin

Isbata risaleta Pêxemberê Islamê

Pêşgotin

Di dem û dewrên muxtelifê tarîx û li cî û warê cûrbicûrê cihanê da bi dehan hezar pêxemberê ilahî hatin hinartin, û rola xwe ya berkeftî bo hidayet û terbiyeta insana pêk anîn û eserên pîroz di nav civak û cami'eya beşerî da mîrat danîn. Her yêk ji wan, li ser esasa baweriya durust û nirxên pîroz, komek rênimûn û terbiye kirin û bi awayê nemusteqîm tesîrê li yên dî jî kirin. Û hinek ji wan karîn ku civakek tewhîdî û ʻadilane pêk bînin û ewê bidomînin (rêberî ya wê bigirin dest).

Di navbeyna wan da, hezretê Nûh û hezretê Ibrahîm û hezretê Mûsa û hezretê ʻÎsa (selamên Xudê li wa bin) ji alî Xuda yê Te'ala kitêbên ku hemî ehkam û qanûnên ferdî û civakî û wezîfe yên exlaqî û qanûnên ku ji wî zemanî re rewa bûn beyan dikir, pêşkêş û berdestê civakê kirin. Lê belê evan kitêban hevrê digel borîna zemanê bi temamî jinav çûn, an jî ketin ber tehrîfên lefzî û me'newî; û serencam, ayîn û şerî'etên esmanî rengê mesx bûyî li xwe girtin (û şikla xwe yên rastî ji dest dan). Çewa ku Tewrat ya hezretê Mûsa (s) venema, belkî ji destnvîsên hinek ji

peyrewên wî hezretî berhemek hat berhev kirin û bi navê «kitêba pîroz» hat belav kirin.

Heçî kesê bi dilsafî berê xwe bidê «'ehdeyn» (Tewrat û Incîlê) wê pê bihesê ku çi yêk ji wan kitêban ne ew in yên ku ji Mûsa û ‘Îsa (s) ra hatîn hinartin; lê Tewrat, ji bilî vê yêkê ku Xuda yê Te'ala bi şiklê mirovekî didê nasîn (haşa) diyar dikê ku bi gelek tişta nizanê (Tewrat/ kitaba peydabûn, babetê 3, jimare 8- 12) û gelek caran ji hinek karê Xwe poşman dibê (babet 6, jimare 6) û digel yêkî ji bendeyên xwe (hezretê Ye'qûb) digemişê (pehlewanîyê dikê) û nikarê serkevê û di axirîkê da jê hêvî dikê ku desta ji wî bikêşê, da xelk Xuda yê xwe di wî halî de nebînin (babet 32, jimare 24- 32). Û ji bilî nisbetên narewa ku bal pêxemberên ilahî ve didin, çewa ku (haşa) nisbeta zinayê didin bal hezretê Dawûd (s) ve ('ehda qedîm, kitab 2, Simûîl. babet 11) û nisbeta vexwarina 'ereq û nisbeta zinayê digel mehreman didin bal hezretê Lût (s) ve (Tewrat, kitaba peydabûn, babet 19, jimare 30- 38) ji bilî van hemiya bûyera mirina hezretê Mûsa (s) yanî înerê kitêba Tewratê şîrove dikin ku çewa û li kûderê ji dinyayê çû. (Tewrat, kitaba Tesniye, babet 34)

Gelo, hema evan nukteyan ne bes in ku em pê bihesîn ew kitêb, ne ji bal hezretê Mûsa (s) ye?!

Lê rewşa Incîl ji Tewratê jî riswatir e, çimko ewwilen tiştek bi navê kitêba ku ji ‘Îsa (s) ra hatî hinartin tune, ji xwe Fileh bi xwe jî vê yêkê iddi'a nakin ku evê Incîlê hema ew kitêb e ku Xuda bo hezretê ‘Îsa (s) hinartiye; belkî naveroka wê, agahîdanên çendkes ji peyrewên wî hezretî ye. Û ji bilî tecwîza vexwarina 'ereqê, çêkirina wê ji mu’cizeyên ‘Îsa (s) dizanin (Incîla Yûhenna, babet 2).

Bi kurtî, wehyên ku ji bona evan pêxemberên bi qedr nazil bûyî, hatiye tehrîf kirin û nikarê rola xwe di hidayeta xelkê da pêk bênê. Lê, kanê çewa û çima evan tehrîf û destleystina hatine

meydanê, çîrokên dûr û dirêj hene ku li vêderê mecala şîrove kirina wan nîne.[1]

Eve, şeşsed sal paş mîlada Mesîh (s) di wî halî da ku seranserê cihanê di nav tarîtî ya cehl û nezanî û zulmê nûqî bûbû û pêtalên hidayeta ilahî li hemî serzemînan da divemiriyan; Xuda yê Mute'al axirîn û seratirînê pêxemberên Xwe li tarîtirîn û pestpayetirînê cami'eyên wî demê da hinart; da ku pêtal û meş'ela pir bi şewqa wehyê ji her û her ra bona rêrastî ya hemî mirovan bilind bikê; û kitêba ilahî ya cawîdan û dûr ji tehrîf û guherînê berdestê beşer bikê û me'arifên heqîqî û hikmetên esmanî û ehkam û qanûnên ilahî bi xelkê bidê zanîn û hemî insanan berew bexteweriya dinya û axiretê ve rêberî û rênimûnî bikê (binêrin: Cum'e/ 2) [2].

Mîrê bawerdaran ‘Elî (selamên Xudê lê bin) di beşek ji axiftina xwe derheq rewş û ehwalê cihanê da li wextê zuhûr û derketina Pêxemberê Islamê (s) wiha kerem dikê:

«Xuda yê Mute'al, Pêxember (s) li wî demê da hinart ku gelek li ser bi'seta pêxemberên dî ra borî bû; demek kûr û dirêj bû ku xelk di xew da bûn, fitne û şoreş serî hilanî bûn û nebaşî belav bûbûn û hemî tişt ji hev ketibûn. Gurî ya şeran hilbûbû, ronahî li dinyayê da nemabû, tarîtî û nezanî û guneh dinya girtibû; hîle û xapandin eşkere bûbûn. Li wî wextî da belgên dara jiyana beşer zer bûbûn û kes ne berhêvîyê fêkîyê wê bû; ava wê çik bûbû (di 'erdê da çûbû); pêtal û nîşanên hidayetê sar û vemirî bûn; alayên li rê wunda bûnê eşkere bûbûn. Pestpayetî û bextreşî ya dinyayê êrîş anîbû ser xelkê û rûyê xwe yê kirêt eşkere kiribû û

---

[1] - Binêrin : Izhar-ul Heq , Rehmetullahê Hindî . El-Huda îla Dîn-il Mustefa, 'Ellameyê Belaxî. Rahê Se'adet , 'Ellameyê Şe'ranî.

[2] - هُوَ الَّذِي بَعَثَ فِي الْأُمِّيِّينَ رَسُولًا مِّنْهُمْ يَتْلُو عَلَيْهِمْ آيَاتِهِ وَيُزَكِّيهِمْ وَيُعَلِّمُهُمُ الْكِتَابَ وَالْحِكْمَةَ وَإِن كَانُوا مِن قَبْلُ لَفِي ضَلَالٍ مُّبِينٍ.

me'dê xwe girtibû ji ehlê dinyayê; fêkîyê wê fitne bûn û xwarina wê genî û mirar bû û xelkê ku tirs û bizdan ewa lefandibû penahgehek xêncî şûrên xûnmij nedidîtan (Nehcul Belaxe/x.89)[1]

Ji dewrana zuhûra Pêxemberê Islamê (s) girîngtirîn mijar bo her insanê heqîqetxaz (paş xudanasî) lêkolîn derheq nubuwwet û risaleta wî hezretî û heq bûna dînê pîroza Islamê da ye. Û pê isbata vê mijarê ku hevrê ye digel isbata heq bûna Qur'ana pîroz û girîngî ya wê sernavê yêgane kitêba esmanî ya berdest û parastî ji tehrîf û guherînê; rêkek paqij diyar dibê bûna isbata bawerên dî yên sehîh / durust û beyana nizama dînî û her wusa wezîfe û erkên 'emelî û kiryarî ya hemî mirovan heta dûmahîka cihanê; tê zanîn û kilîta çareser kirina meselên cihanbînî û îdeolojîyê destve tê.

Isbata risaleta Pêxemberê Islamê (s)

Di dersa bîst û heftê da hat gotin ku peyamberî ya pêxemberan, ji sê rêka ve şayanê isbatê ye: yêk ji wan rêka, nasyarî digel exlaq û tevgera wan û behre girtina ji wa tiştên mirov jê bawer e. Ya duwê pêşgoyî ya pêxemberên pêşîn e; û ya sisê rêka mu'cizê ye.

Di bareya Pêxemberê Islamê (s) her sê rêk hebûn: ji aliyekî ve xelkê Mekkehê, çil sal jiyana pir bi şanazî ya wî hezretî ji nêzîk ve dîtibûn ku qet çi nuqteyek tarî têda nedihat dîtin û wusa ewî rastbêj û durustkar dizaniyan ku naznavê «emîn» dabûnê. Nixwe derheq kesatiyek wusa gumana vir û iddi'aya derew nedihata dayîn.

Ji alîyek dî ve, pêxemberên pêşîn, mizgîniya bi'seta wî hezretî

---

[1]- أرْسَلَهُ عَلَى حِينِ فَتْرَة مِنَ الرُّسُل ، وَطُول هَجْعَة مِنَ الأُمَمِ وَاعْتِزَام مِنَ الْفِتَن ، وَانْتِشَار مِنَ الأُمُورِ ، وَتَلَظٍّ مِنَ الْحُرُوبِ ، وَالدُّنْيَا كَاسِفَةُ النُّورِ، ظَاهِرَةُ الْغُرُورِ ; عَلَى حِينِ اصْفِرَار مِنْ وَرَقِهَا ، وَإِيَاس مِنْ ثَمَرِهَا ، وَاغْوِرَار مِنْ مَائِهَا ، قَدْ دَرَسَتْ مَنَارُ الْهُدَى ، وَظَهَرَتْ أَعْلاَمُ الرَّدَى ، فَهِيَ مُتَجَهِّمَةٌ لأَهْلِهَا ، عَابِسَةٌ فِي وَجْهِ طَالِبِهَا . ثَمَرُهَا الْفِتْنَةُ، وَطَعَامُهَا الْجِيفَةُ، وَشِعَارُهَا الْخَوْفُ ، وَدِثَارُهَا السَّيْفُ ...

dabûn. (Sef/6)[1] û komek ji ehlê kitêbê li hêviya zuhûra wî bûn û ji nîşankên ronahî û rast derheq wî hezretî da agah bûn (E'raf/ 157 , Beqere/146 , En'am/ 20) û heta ji muşrikên 'Ereb re digotan ku ji nav zarokên Isma'îl (s) [ku qebîleyek ji 'Ereba bûn] kesek wê bê hinartin ku pêxemberên pêşîn û dînên tewhîdî rast dertîne (Beqere / 89) [2] û hinek ji zanyarên Cihû û Fileh, pê nisbet dana wan pêşgoyîyan bal wî hezretî ve, îman anîn (Maide/83, Ehqaf/10) herçend hinek dî ji ber viyanên nefsanî û şeytanî ji pejirîna dînê Islamê xwe dan alî.

Qur'ana pîroz vê derheqê de kerem dikê: **«Ma qey derheq wî (Muhemmed) da zanîna zanyarên benî Israîl ji wan (muşrikên Mekkehê) re ne delîl e?!».** [3]

Nasîna Pêxemberê Islamê (s) ji alî 'alimên benî Israîlê û anagora pêşgoyî û danzanîna pêxemberên pêşîn, wek çewa ku delîlek ronahî ye li ser rastiya risaleta wî hezretî, bona ehlê kitêb bi temamî derheq rastbûna pêxemberên mizgînder û ji yên dî re jî derheq heq bûna Pêxemberê Islamê (selamên Xudê li ser wa hemiya bin) huccet û delîlek razîker dihata hesabê; çimko ew, rastî û durustiya van pêşgoyîyan û hevgirtina nîşan û 'elametên hatibûn diyar kirin, pê çavê xwe didîtin û pê 'aqilê xwe pê dihesiyan.

Ya 'ecêb ev e ku hema li vê Tewrat û Incîla tehrîf bûyî da, digel hemî hewil û xebatên ku bona jinav birina evcûre mizgîniyan pêk hatiye, çendîn nukte tê dîtin ku huccetê li ser heqxazan temam dikê; çewa ku gelek ji 'alimên Yehûd û Nesara ku heqî û

---

[1] - وَإِذْ قَالَ عِيسَى ابْنُ مَرْيَمَ يَا بَنِي إِسْرَائِيلَ إِنِّي رَسُولُ اللَّهِ إِلَيْكُم مُّصَدِّقًا لِّمَا بَيْنَ يَدَيَّ مِنَ التَّوْرَاةِ وَمُبَشِّرًا بِرَسُولٍ يَأْتِي مِن بَعْدِي اسْمُهُ أَحْمَدُ فَلَمَّا جَاءهُم بِالْبَيِّنَاتِ قَالُوا هَذَا سِحْرٌ مُّبِينٌ.

[2] - وَلَمَّا جَاءهُمْ كِتَابٌ مِّنْ عِندِ اللَّهِ مُصَدِّقٌ لِّمَا مَعَهُمْ وَكَانُوا مِن قَبْلُ يَسْتَفْتِحُونَ عَلَى الَّذِينَ كَفَرُوا فَلَمَّا جَاءهُم مَّا عَرَفُوا كَفَرُوا بِهِ فَلَعْنَةُ اللَّهِ عَلَى الْكَافِرِينَ.

[3] - أَوَلَمْ يَكُن لَّهُمْ آيَةً أَن يَعْلَمَهُ عُلَمَاء بَنِي إِسْرَائِيلَ -

heqîqet xaz bûn, pê behre girtina ji van nukte û mizgînan hidayet bûn û bi dînê pîroza Islamê îman anîn.

Her wiha Pêxemberê Ekrem (s) mu'cizên zehfî hebûn ku li kitêbên tarîx û hedîsê hatiye nivîsîn û neqla hinek ji wan gehaye derece ya tewaturê. Lê 'inayeta ilahî derheq danasandina axirîn pêxember û dînê cawîdanî ya wî, pêdivê bû ku ji bilî mu'cizên ku huccetê li ser yên hazir temam dikira û yên dî lazim bû ku ji rêka guhlê bûnê jê agah bibin, mu'cizên cawîdanî bide wî ku ji her û her re, huccetê li ser cihaniyan temam bikê; û ew jî Qur'ana pîroz e.

Ji lew, emê li dersa dî derheq i'caz û mu'cize bûna ewê kitêba pîroz da baxivîn.

PIRSYARÊN DERSA 31

Rewşa kitêbên pêxemberên pêşîn beyan bikin.

Hinek ji nîşanên tehrîf bûna Tewratê şîrove bikin.

Çima Incîla berdestê me, ne cihê bawerîyê ye? Vê yêkê isbat bikin.

Girîngiya mesela risaleta Pêxemberê Islamê beyan bikin.

Rêkên isbata risaleta Pêxemberê Islamê (s) şîrove bikin.

DERSA 32

MU’CIZE BÛNA QUR’ANÊ

Dagirê:

Mu’cize bûna Qur’ana pîroz

Cihet û doralîyên i'caza Qur’ana pîroz

Fesahet û belaxet

Nexwendî bûna înerê Qur’ana pîroz

Hemahengî û nebûna ixtilafê

Mu’cize bûna Qur’ana pîroz

Qur’ana pîroz, yegane kitêba 'esmanî ye ku bi vebir û seraheta temam, diyar kiriye ku kes nikarê wek wê kitêbê ji bal xwe ve bênê, û heta eger ins û cin hemî li hev bicivin û arîkariya hev bikin jî nikarin evê yêkê pêk bênin (Isra/ 88)[1] û ne tenê nikarin kitêbek kamil wek Qur’anê bînin, belkî nikarin deh sûre (Hûd / 13) an jî kurte sûreyek tenê bênin. (Yûnus / 38).

Paş gelek te’kîdan gazî hemiyan dikê û pêşniyariya anîna wek wê didê û pişt ra nekarîna wan ji vê yêkê re ji ber xudayî bûna vê kitêb û risaleta Pêxemberê giranqedrê Islamê (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) didê zanîn. (Beqere / 23 - 24).

---

[1]- قُل لَئِن اجْتَمَعَتِ الإنسُ وَالْجِنُّ عَلَى أن يَأْتُوا بِمِثْلِ هَذَا الْقُرْآنِ لاَ يَأْتُونَ بِمِثْلِهِ وَلَوْ كَانَ بَعْضُهُمْ لِبَعْضٍ ظَهِيرًا.

Ji lew ne cihê şik û dudilîyê ye ku ev kitêba pîroz, iddi'a mu'cize bûna xwe dikê û înerê vê kitêbê, ewê ser navê mu'cizeya cawîdan û burhanek bi vebir derheq pêxemberiya xwe bona her û her ji cihaniyan ra radest kiriye. Û niha jî paş borîna çardeh qernan, ev nidaya ilahî her sibeh û şev bi rêka navgînên dost û dijmin ve digehê guhê cihaniyan û huccet û delîl li ser wan temam dikin.

Ji alîyê dî ve em dizanîn ku Pêxemberê Islam (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) ji yêkem rojên diyar kirina de'wet û gazî ya xwe, digel dijminên kîndar û rikdar rûbirû bû ku qet xwe ji dijatî kirina digel evê ayîna ilahî paşda nedidan û piştî ku ji tehdîd û tetmî'ê bêhêvî bûn biryara kuştina wî hezretî dan. Ku pê teybîra ilahî, digel hicreta bi şev û xefê wî hezretî evê biryarê rezîl û riswa bû. Û piştî hicretê jî dawiya 'emrê wî li ceng û şerên cûrbicûr digel muşrik û yarîderê wa yên Yehûdî da borî. Û ji rihlet û wefata wî hezretî heta niha jî munafiqên navdeyî û dijminên derveyî, her dixebitiyan û dixebitin da ev nûra ilahî bivemirînin û jinav bibin; û qet xwe paşda nedane û nadin û çi ji destê wa hatiye û tê, kirin û dikin. Û eger anîna kitêbek wek Qur'ana pîroz imkan hebûya, qet xwe jê paşda nedidan û berê xwe jê nedizivirandin.

Li vê çaxê da jî ku hemî hêzxurt û mezin dewletên cihanê, Islamê wek dijminê mezin li dijî dagîr kirin û hukûmdarî ya xwe ya zalimane dizanin û bi awayek mucidd û ji dil dijatiya wê dikin û xudanê hemî cûre imkan û navgînên malî, maddî, 'ilmî, siyasî û teblîxatî ne; eger ew bikariyan, bêşik wê kurte sûreyek wek ya Qur'anê baniyan û ewê bi rêka navgînên komelî û teblîxatî di dinyayê da belav bikiran. Çimko evê yêkê, hêsantirîn û erzantirîn û bitesîrtirîn rêk e bona dijatiya digel Islamê û pêşî lê girtina ji pêşrewî û berfirehiya wê.

Ji lew, her kesê ‘aqil û heqîqetxaz paş agahî ji vê yêkê, wê yeqîn bikê ku Qur’ana pîroz kitêbek istisnayî û bênimûne ye; kes nikarê wek wê çêkê û berhev bikê; qet çi kes û çi komek pê çi hevotin û zanînan nikarê wek wê bênê. Yanî hemî taybetîyên yêk mu’cize (xariqul 'adde bûn, ilahî û neqabilê teqlîd bûn, û delîl û burhan bûn ji isbata durustiya nubuwwetê) di xwe da dihebênê. Ji ber vê yêkê baştirîn delîl û burhana bi vebir bo rastiya de'wet û gazî ya Pêxemberê Islamê (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) û heq bûna dînê muqeddesê Islamê ye. Û ji mezintirîn û giranbihatirîn ni’metên ilahî li ser cami'e û komela insanî hema ev e ku evê kitêba pîroz wusa hinartiye ku ji her û her ra mu’cizeyek cawîdan vemînê û delîla rastî û durustiya xwe di xwe da bihebênê. Delîlek ku derk û fêhma delaleta wê, niyaz û ihtiyac bi fêrbûn û pisporîtîyê tune û ji hemî kesan ra qabilê fêhm û pejirînê ye.

Cihet û doralî yên mu’cize bûna Qur’ana pîroz

Niha ku me bi kurtî û sergirtî zanî ku Qur’ana pîroz, peyva ilahî ye û mu’cizeyek mezin e; emê hinek ji cihet û doralîyên i'caza wê binivîsîn û ji ber çavan re derbaz bikîn.

A- fesahet û belaxeta Qur’ana pîroz

Yêkemîn wech û alîyê i'caza Qur’ana pîroz, şîwayî/şîrînî (fesahet) û resayî/zelalî (belaxet) ya wê ye. Yanî Xuda yê Mute'al ji beyana mexsed û ramanên Xwe ra di her meqamekî da şîwatirîn û şîrîntirîn kelam û xweşahengtirîn û bijartîtirîn terkîban bikar aniye ku bi awayê herî zelal û saf, mefhûm û me'neya mexsedên xwe bi xwenda didê fêhmê. Û bijartina kelîme û terkîbên munasib û hemaheng ku me'nî yên bilind û deqîq hene, tenê ji wî kesî ra imkan heye ku ew bi hemî taybetî yên kelîme û doralîyên me'nî yên heqîqî û peywenda di navbeyna wan da zana bê û bikarê pê li ber çav girtina hemî dor û etraf û doralîyên me'nîyên lazim û hay jê mana pêdivê yên rewş û haletê, baştirînê kelîme û

'ibaretan hilbijêrê. Û ihate û serdestiyek wiha bê wehy û ilhama ilahî ji çi yêk ji insana re nehatiye danîn.

Xweşî ya ahenga melekûtî û dilkêşa Qur'anê ji hemiyan ra, û şîrînî û zelaliya wê ji wa yên bi 'Erebî û fennê fesahet û belaxetê dizanin ra, qabilê fêhm e; lêbelê têgehiştina mu'cize bûna fesahet û belaxeta Qur'anê tenê ji wa kesa ra mumkin e ku ji hemî cihetên cûrbicûrê texessusî û taybetî yên peyv û axiftinê agahî hebin û ewê (Qur'an) danin ber peyv û axiftinên dî yên fesîh û belîx û ewa gel hev muqayese bikin; hingê tewan û karîna xwe li beraberê wê da biceribînin ku ev kar tenê ji destê şa'ir û helbestvanên 'Ereb dihata, çimko mezintirîn hunerê 'Ereban, peyv û axiftin bû ku li demê nuzûl û hinartina Qur'anê da, geş bûbû û nimûneyên ji baştirîn şi'r û helbestan paş rexne lê kirina edebî, ewê ser navê baştirîn û biqedrtirînê desthata hunerî hildibijartin û ewê belav dikiran.

'Inayet û hikmeta ilahî, dikê lazimê xwe ku mu'cize ya her pêxember hevrê bê digel 'ilm û hunerê wî wextî, da ku imtiyaz û seratiya i'caza wê ji berhemên beşerî/insanî bi hêsanî bê derk kirin; çewa ku Imam Hadî (s) di cewaba **«Ibn-i Sikkît»** da ku jê pirsî: - «Çima Xuda yê Mute'al, mu'cize ya hezretê Mûsa (selamên Xudê li ser bin) wek "yedê beyza - destê ronahî" û ejdeha kirina gupalê, û mu'cize ya hezretê 'Îsa (selamên Xudê li ser bin) wek şifa dana nexweşan, û mu'cize ya Pêxemberê Islamê (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) wek Qur'ana pîroz diyar kir?»

Kerem kir: «Demê hezretê Mûsa (s) sihr û cadû hunerê wî demî bû, ji ber vê yêkê Xuda yê Mute'al mu'cize ya wî hezretî wek karûbarê wan lê kir heta ku bi nekarîn û 'eczê xwe li beraberê anîna wek wê, têbigehin. Û hunerê rêketî di demê hezretê 'Îsa (s) da kar û fennê pijîşkî / tebabetê bû; ji ber vê yêkê Xuda yê Mute'al mu'cize ya wî hezretî di şifa dana nexweşên bê derman da bi cî kir

da herkes bi mu'cize bûna wê bihesê û têbigehê. Lêbelê hunerê rêketî li demê Pêxemberê Islamê (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) hema peyv û vehûnînê bû ku ji ber vê yêkê Xuda yê Mute'al Qur'ana pîroz bi awayê herî xweş û dilkêş hinart; da hemî bi i'caz û xariqul 'adde bûna wê bihesin û têbigehin. (Kafî,c.1,r. 24).

Belê; mezin û giregirên peyvnasê wî demî, wek Welîdê kurê Muxeyre yê Mexzûmî û 'Utbe yê kurê Rebî'e û Tufeylê kurê 'Emr, bi fesahet û belaxeta bê dawî ya Qur'anê hesiyan û şehdeyî dan ku ewê seratir e ji bijartîtirîn û zelaltirînê peyv û helbestên beşerî (Sîre ya ibn-i Hişam, c. 1 , r. 293 , 410). Û paş borîna sedsala ewil kesên wek "ibnê Ebi-l 'Ewce' û "ibnê Muqeffe'" û "Ebû Şakirê Deysanî" û "'Ebd-ul Melikê Besrî" biryar dan ku karîna xwe li beraberê Qur'ana pîroz da biceribînin û salek temam hemî hêz û quweta xwe bikar anîn, lêbelê kêmtirîn û biçoktirîn tiştekî jî nekirin û serencam hemî li beraberê mezinahiya ev kitêba ilahî çoka 'ecz û heyretê li 'erdê dan û gava ku li mescidul heramê da bona lêkolandina kar û barê xwe yên yêksalî da li hev civiya bûn, Imam Sadiq (s) ji bal wa borî û ev ayeta pîroz telawet kir:

قُل لَّئِنِ اجْتَمَعَتِ الإِنسُ وَالْجِنُّ عَلَى أَن يَأْتُوا بِمِثْلِ هذَا الْقُرْآنِ لاَ يَأْتُونَ بِمِثْلِهِ وَلَوْ كَانَ بَعْضُهُمْ لِبَعْضٍ ظَهِيرًا Sûretê Isra/ 88

B- nexwendî bûna înerê

Qur'ana pîroz, eger ji alî hecmê ve ne ewqas mezin e, lêbelê dagirê enwa' û eqsamê cûrbicûrê me'arif û 'ilm û ehkam û qanûnên ferdî û ictma'î ye û lêkolandina her deste ji wan dikê lazimê xwe ku komên mutixesis û şareza ku li dirêjiya çendîn salan da wê derheqê da destpê tehqîq û lêkolîn û xebata 'ilmî bikin û hêdî hêdî sirr û veşartîyên wê yên nixûmandî kifş bikin û xwe bigehînin heqîqet û rastîyên zehftir, herçend ku kifşa hemî heqayiq û veşartîyên wê, ji bilî wa kesên ku xweyê 'ilm û zanîna ilahî ne ji alîyê Xuda ve hatine teyîd kirin ji kesî ra mumkin nîne.

Ev berhemên cûrbicûr ku kûrtirîn û bilindtirîn me'arif û bala bilindtirîn û biqedrtirînê destûratên exlaqî, û 'adilanetirîn û bihêztirîn qanûnên huqûqî û cezayî, û hekîmanetirîn rêkên 'ibadî û ehkamên ferdî û ictma'î, û bikêrtirîn û bi sûdtirîn we'z û şîretan û bi feydetirîn nuktên tarîxî û dîrokî, û çêkertirîn û islehkertirîn rêbaz û awayên te'lîm û terbiyetê - hevotin û perwerde kirinê di xwe da dihebênê, û bi kurtî: dagirê hemî eslên lazim bona se'adet û bexteweriya di dinya û axiretê bona beşer, pê uslûb û awayek nû û xweş li hev kom kirine, bi wî awayî ku hemî kesan di cami'e û komelê da bikarin qas karîn û imkana xwe jê behre wergirin.

Li hev kom kirina hemî wa me'arif û heqîqetan di berhemek wiha da, ne di karîna mirovên 'addî da ye û kes nikarê wek wê çêkê. Lêbelê ewa ku li ser 'ecêbiya wê ve zêde dikê ev e ku înerê vê kitêba pîroz ew kes e ku qet ders nexwendiye û te'lîm nedîtiye û qet qelemê li ser pelê neaniye û li cihekî dûr ji temeddun û şaremendîyê da perwerde bûye. Û ya 'ecêbtir ev e ku li jiyana xwe ya çil sala pêşiya bi'seta xwe, nimûneyek ji wa peyv û gotinan kes ji wî seh nekiribû û li dewrana risaleta xwe da jî ewa ku ser navê wehya ilahî radest dikira, xweyê uslûb û awayekî wîje û taybet û hemaheng û lihev hatî bû ku bi temamî ewa peyvan ji peyvên wî yên dî cida dikira û ferqek ronahî û eşkere di nav beyna evê kitêbê û peyv û axiftinên dî yên wî diyar dikir. Qur'ana pîroz kerem dikê: (Enkebût / 48)

وَمَا كُنتَ تَتْلُو مِن قَبْلِهِ مِن كِتَابٍ وَلَا تَخُطُّهُ بِيَمِينِكَ إِذًا لَّارْتَابَ الْمُبْطِلُونَ

Li cihek dî dibêjê: (Yûnus / 16).

قُل لَّوْ شَاءَ اللَّهُ مَا تَلَوْتُهُ عَلَيْكُمْ وَلَا أَدْرَاكُم بِهِ فَقَدْ لَبِثْتُ فِيكُمْ عُمُرًا مِّن قَبْلِهِ أَفَلَا تَعْقِلُونَ

Yanî: "Eger Xudê bixwesta minê ev kitêb ji hewe re telawet nekira û minê hewe ji wê agah nekira; çewa ku pêşiya niha da min jiyana xwe digel hewe borandiye (di wî halî da ku nimûneyek ji va peyv û gotinan ji min seh

nekirine) ma qey hûn hizir nakin?!“

Ihtimala zêde ev e ku ayeta 23 ya Beqere « فَأْتُوا بِسُورَةٍ مِّن مِّثْلِهِ » hema işare dikê bal vê cihetê ji i'cazê, yanî ihtimala qewî ev e ku zemîra «mislih» vedigerê bal «'ebdina» ve.

Welhasil: (qet ne mumkin e, lê) eger bê ferz kirin ku bi sedan komên zanyar û 'alim, li hev bicivin û arîkarî bidin hev û kitêbek wiha berhev bikin jî, qet gumana vê yêkê nayê dayîn ku mirovek nexwendî bikarê berhemek wiha çêkê. Ji ber vê yêkê, eşkere bûna kitêbek wiha digel taybetîyên wê ji bal mirovek ders nexwendî, beyangerê cihetek dî ji cihetên i'caza wê ye.

C- hemahengî û nebûna ixtilafê

Qur'ana pîroz, kitêbekî ye ku li dirêjahiya bîst û sê salên risaleta Pêxemberê Ekrem (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) da ku dewranek dijwar û tejî qewimînên tehl û şîrîn bû, hatiye hinartin; lê belê evan qewimînên cûrbicûr û 'ecêb, qet çi tesîrê li rêkûpêkî ya naverok û awayê wê ya bi i'caz da nekir. Hema ev hemahengî û rêkûpêkî ya wê ya di şikl û naverokê da cihetek dî ji cihetên i'cazê tê hesabê; ku her wekî du cihetên dî, li Qur'anê bi xwe da jî işare pê hatiye kirin; li wêderê ku kerem dikê: Nisa/83.

أَفَلاَ يَتَدَبَّرُونَ الْقُرْآنَ وَلَوْ كَانَ مِنْ عِندِ غَيْرِ اللّهِ لَوَجَدُوا فِيهِ اخْتِلاَفًا كَثِيرا

Birastî, her mirovek kêm-zêde li bin tesîra du cûre guherîna da dimînê: yêk ev e ku hêdî hêdî li ser zanîn û hunerên wî zêde dibê, û zêde bûna zanîn û huneran tesîrê li axiftin û gotinên wî dikê û bivê nevê di nav bîst salan da gelek ferq û ixtilaf dikevê peyv û axiftinên wî da.

Ya duwê ev e ku, qewimînên cûrbicûrê jiyanê, dibê sebebê peyda bûna halet û rewşên rewanî û ihsasat û hestên muxtelif; wek tirs û hêvî û kol û şahî û coş û aramî û ... ku evan ixtilafên rewanî û rûhî tesîrê li bîr û hizr û peyv û kiryara mirov da dikê û bivê nevê hevrê digel evan guherîna, awayê peyvên wî jî gelek

dikevin ber guherînê. Û di rastî da guherîna peyv û kelamê li dûv guherîna rûh û rewanê ye ku ew herdu jî li pey rewş û haletên tebî'î û ictima'î ve ne.

Niha eger em ferz bikîn ku Qur'ana pîroz, destçêkirî yê Pêxemberê Ekrem (selat û selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) bi xwe bê, gorekî tesîra guherînên me pêşda jê axift û gorekî rewş û haletên tejî guherîna jiyana wî hezretî, bivê nevê Qur'ana pîroz ji nezer şikl û naverokê ve wê biketa bin ixtilaf û guherînê; halhale têda qet çi eserek ji guherînê nayê dîtin. Vêca evê yêkê dest ve tê ku hemahengî û nebûna ixtilafê di mefhûm û naveroka Qur'ana pîroz da, nîşaneyek dîtir e ji hatina vê kitêbê ji serkaniya zanîna bêdawî û bêbinî ya Xuda yê Mute'al ve; ku Xuda yê Mute'al hakim e li ser tebî'etê, ne ku li bin tesîra tebî'etê da bê.

PIRSYARÊN DERSA 32

Bi çi rengî Qur'ana pîroz iddi'aya mu'cize bûna xwe dikê? Vê yêkê şîrove bikin.

Burhan û delîla i'caza Qur'anê bi kurtî beyan bikin.

Gelo çêdibê evê ihtimalê bê dayîn ku çi kes nexwestiye wek Qur'anê bênê, an aniye û em jê ne agah în? Çima?

Belaxeta bi i'caza Qur'anê şîrove bikin.

Nexwendî bûna Pêxemberê Ekrem (s) çi pêwendî heye digel i'caza Qur'anê?

Nebûna ixtilafê di Qur'ana pîroz da çi delalet li ser mu'cize bûna wê heye?

DERSA 33

PARASTÎ BÛNA QUR'ANA PÎROZ JI TEHRÎF Û GUHERÎNÊ

Dagirê:

Pêşekî

Lê zêde nebûna tiştekî di Qur'ana pîroz

Kêm nebûna tiştekî ji Qur'ana pîroz

Pêşekî

Wek çewa pêşda hatî gotin delîla pêdivêtî û zerureta nubuwwetê, dikê lazimê xwe ku peyamên ilahî bi durustî û bê xwehrî berdestê insan bibê da mirov bikarê bo se'adeta xwe ya dinya û axiretê jê behrê wergirê.

Ji ber vê yêkê wek kitêbên dî yên 'esmanî derheq parastî bûna Qur'ana pîroz da heta wê demê ku radestê xelkê bû, ne cihê behs û şikê ye; lêbelê wek çewa em dizanîn kitêbên dî yên 'esmanî piştî ku berdestê xelkê bûn, kêm-zêde ketin ber tehrîf û guherînê, an jî paşî re bi temamî hatin jibîr kirin, çewa ku îro eserek ji kitêba hezretê Nûh û hezretê Ibrahîm (selam li ser wa bin) venemaye û kitêbên hezretê Mûsa û hezretê 'Îsa (selamên Xudê li wan bin) yên heqîqî û rastî peyda nabin. Li ser vê gotinê pirsyarek tê pêş ku: em ji kûderê bizanîn ewa ku niha ser navê axirîn kitêba 'esmanî (Qur'an) di destê me da ye hema ew kitêb

e ku ji Pêxemberê Islamê (selamên Xudê li ser wî û alê wî bin) hatî hinartin û qet tu guherîn û tehrîfê neketiye têda û çi tişt lê zêde û jê kêm nebûye?

Elbet, ew kesên ku hinek nasyarî digel tarîxa Islam û musilmanan hebin û ji xebat û hewildana Resûlê Xuda (s) û cîgirên wî yên me'sûm û pak (selamên Xudê li ser wî û wa bin) derheq nivîsîn û parastina ayatên Qur'anê agah bin û her wiha ji xebat û himmeta musilmanan bona jiber kirina ayatên Qur'anê xeberdar bin [bi wî awayî ku li şerekî tenê da hejmara şehîdên ku hafizê Qur'anê bûn geha 70 neferan] û her wiha ewên ku ji neql û gêrana Qur'anê li dirêjahiya çardeh qerna da bi awayê mutewatir û her wiha xebata li ser jimartina ayet û kelîme û herf û tiştên wiha agahdar bin, ew dê gumana kêmtirîn tehrîf û guherînê li vê kitêba pîroz da nekin. Lê eger em çavê xwe li delîlên qewî yê tarîxî bigirîn, parastî bûna Qur'ana pîroz pê beyanekî pêk hatî ji yêk delîl û burhana 'eqlî û burhanek neqlî jî bê isbat kirin; yanî çêdibê ku ewil lê zêde nebûna tiştekî di Qur'ana pîrozê da pê delîlek 'eqlî bê isbat kirin û paş sabit bûna vê yêkê ku Qur'ana ku li ber desta ye ji alî Xudê Te'ala ve ye, pê ayetên wê kêm nebûna tiştek ji wê jî bê isbat kirin.

Ji ber vê yêkê, emê mijara parastî bûna Qur'ana pîroz ji her awayê tehrîf û guherînê li du beşên cidagane da danîn ber lêkolînê.

Lê zêde nebûna tiştekî di Qur'anê da

Derheq lê zêde nebûna tiştekî di Qur'anê da musilman hemî icma' kirine û belkî hemî agahên cihanê jê agah in û qet çi qewimînek ku bibê serkaniya ihtimal û gumana lê zêdebûna tiştekî di Qur'anê da neqewimiye û qet çi senedekî derheq vê ihtimal û gumanê da nîne û peyda nabê. Her wiha dibê ku ferz û ihtimala lê zêdebûnê pê delîlek 'eqlî bê betal kirin; bi vê beyanê:

Eger bê ferz kirin ku metleb û gotinek ji derve di Qur'anê da lê zêde bûye bi vê me'na ye ku anîna kitêbek wek Qur'anê mumkin e û evê gumanê digel i'caza Qur'an û nekarîna beşer bo anîna wek wê, rêk nakevê. Û eger bê ferz kirin ku tenê kelîmeyek an jî kurte ayetek (wek مُدْهَامَّتَانِ Rehman / 64) lê zêde bûye dikê lazimê xwe ku intizama peyvê jinav biçê û ji awayê eslî û i'cazê derkevê ku eger wiha be, bi vê me'nê ye ku qabilê teqlîd e û çêdibê ku wek wê bên çêkirin. Çimko nezm û intizama i'cazî ya kelîmeyên Qur'anî bi new' û cûreyên wa kelîme û herfên ku hatîn bijartin girêdayî ye ku pê guherîn û cî bi cî bûna wan, kitêb ji rewş û haleta i'caz û mu'cizeyê derdikevê.

Lewmanê hevrê digel delîl û burhana mu'cize bûna Qur'ana pîroz ku hat isbat kirin, parastî bûna wê ji lê zêde bûn û izafatê tê isbat kirin. Wek çewa pê wê burhanê, jê kêm bûna kelîme û risteyan ku dibin sebebê derketina ayetan ji halet û rewşa i'cazê; tê nefy kirin. Lêbelê jê avêtina sûreyek kamil yan jî metlebek tam bi wî awayê nebê sebebê derketina ayetên dî ji haletê icazê, ihtiyac bi delîl û burhanek dî heye.

Jê kêm nebûna tiştek ji Qur'ana pîroz

Zanyarên mezinê Islamê ji Şî'e û Sunnî, ronahî û tekîd kirine ku: wek çewa ku tiştek li Qur'anê zêde nebûye, tiştek jî jê kêm nebûye. Û ji vê yêkê re gelek burhan û delîl anîne. Lêbelê mixabin ji ber gêran û neqla çend riwayet û hedîsên çêkirî di kitêbên hedîsî ya herdu biran, û fêhma nedurust ji hinek riwayetên cihê bawerîyê, hineka guman kirine an jî li ser vê yêkê tekîd kirine ku hinek ayet ji Qur'ana pîroz hatine derêxstin û jinav çûne.

Lêbelê ji bilî hebûna burhanên vebirî yên tarîxî derheq parastî bûna Qur'ana pîroz ji her awayê tehrîf û guherînê [pê lê zêde kirin an jî pê hezf kirin û jê derêxstin] cida ji hezf û derêxstina ku dibê sebebê ji hev ketina nezm û intzama i'cazî ya wê ku pê

burhana «i'caz»ê nefy dibê; çêdibê ku parastî bûna Qur'ana pîroz ji hezf û derêxstina ayet an jî sûreyek ser bixwe [ku nabê sebebê ji hev ketina nezm û intzama i'cazî ya Qur'ana pîroz] ji Qur'anê bi xwe bê isbat kirin.

Yanî pişti sabit bûna vê yêkê ku Qur'an bi temamî kelamê Xuda ye û berdest e û tiştek lê zêde nebûye, naveroka ayetên wê ser navê qewîtirîn burhanên neqlî û te'ebbudî, dibê huccet (û lazim e bê qebûl kirin). Û yêk ji meseleyên ku ji Qur'anê tê dest hema ev e ku Xuda yê mute'al parastî bûna Qur'anê ji her awayê tehrîf û guherînê zemanet dikê û li xwe girtiye; berevajîyê kitêbên dî yên 'esmanî ku parastina wan bi hêviya xelkê ve hatî dayîn. (Çewa ku Maide/44 derheq zanayên Cihû û Filehan da dibêjê) [1]

Evê meselê ji ayeta 9 ji sûretê Hicr tê dest ku kerem dikê:

إِنَّا نَحْنُ نَزَّلْنَا الذِّكْرَ وَإِنَّا لَهُ لَحَافِظُونَ

Ev ayeta pîroz ji du ristan pêk hatiye: di rsta ewil da «إِنَّا نَحْنُ نَزَّلْنَا الذِّكْرَ » li ser vê meselê da tekîd dikê ku Qur'ana pîroz ji alî Xuda yê Mute'al ve hatiye hinartin û di wextê nuzûl û hinartinê da qet çi guherîn neketiye têda. Û di rista duwê da «وَإِنَّا لَهُ لَحَافِظُونَ» pê bikar anîna dubare ji edat û kelîmeyên tekîdîyê û hey'eta ku delaletê dikê li ser dewam û istimrarê, ji her û her ra parastî bûna Qur'ana pîroz ji her awayê tehrîf û guherînê didê zanîn.

Ev ayeta pîroz herçend lê zêdebûna tiştan di Qur'anê da jî nefy dikê, lêbelê istidlal û delîl anîna bi wê bo nefya ev qismê ji tehrîfê, burhanek dûr û ne li cî da ye; çimko şubheya lê zêdebûna tiştan di Qur'anê, hema evê ayetê jî digirê ber xwe û

[1] - ... بِمَا اسْتُحْفِظُوا مِن كِتَابِ اللهِ وَكَانُوا عَلَيْهِ شُهَدَاء ... -

betal kirin û rakirina vê şubheyê pê vê ayetê ne durust e. Ji ber vê yêkê, me ewê şubheyê pê burhana i'caz û mu'cize bûna Qur'anê ji holê rakir û paşê pê istifade ji ayetên pîroz, parastî bûna Qur'ana pîroz ji hezf û kêm bûna ayet an sûreyek serbixwe (bi wî awayî ku sebebê jinav çûna nezm û intizama i'cazî nebê) jî sabit kir.

Û bi vê pêkê parastî bûna Qur'ana pîroz ji her awayê tehrîf û guherînê yanî lê zêdebûn an jê kêm bûnê, pê gotinek pêkhatî ji yêk burhana 'eqlî û burhanek neqlî tê isbat kirin.

Li dûmahîkê da lazim e ev nukte jî bê gotin ku mexsed ji parastî bûna Qur'ana pîroz ji «tehrîf û guherînê» ne ev e ku hema li kûderê kitêbek bi navê Qur'an peyda bû, Qur'ana kamil û parastî ji xeletî yên nivîserî û qiraetî (xwendinî) ye; an jî qet çi tefsîra xelet û tehrîfên me'newî derheq wê da bê imkan û nemumkin e; an jî ayet û sûretên wê gorekî nuzûlê hatiye rêz kirin. Belkî mexsed ev e ku Qur'ana pîroz ewqas di navbeyna mirovan da bimînê ku heqîqetxazan bikarin û evê imkanê hebin ku ayetên Qur'ana pîroz bi wî awayê hatî hinartin dest ve bînin.

Ji ber vê yêkê, kêmasî hebûn an xelet bûna hinek ji nusxeyên Qur'ana pîroz, an jî ixtilafên di qiraet û xwendinê, an jî rêkûpêk û bi rêz kirina ayet û sûreyên wê berevajîyê rêz û tertîba nuzûlê, an jî hebûna tehrîf û guherînên me'newî û tefsîrên cûrbicûr, ne li dijî parastî bûna Qur'ana pîroz e ji tehrîf û guherîna ku me derheq wê da axift.

PIRSYARÊN DERSA 33

Zemîne û sebebê pêş hatina meseleya «parastî bûna Qur'ana pîroz ji tehrîf û guherînê» beyan bikin.

Çi şahid û burhanên tarîxî derheq parastî bûna Qur'anê da hene?

Parastî bûna Qur'ana pîroz pê çi delîl û burhanan tê isbat kirin?

Lê zêde nebûna tiştek di Qur'anê da isbat bikin.

Gorekî çi delîl û burhanê tiştek ji Qur'ana pîroz kêm nebûye?

Gelo çêdibê mirov hema pê wê delîlê isbat bikê ku tiştek li Qur'anê da zêde nebûye? Çima?

Gelo kêmasî hebûn an xelet bûna hinek ji nusxeyên Qur'ana pîroz, an jî ixtilafên di qiraet û xwendinê, an jî rêkûpêk û bi rêz kirina ayet û sûreyên wê berevajîyê rêz û tertîba nuzûlê, an jî hebûna tehrîf û guherînên me'newî û tefsîrên cûrbicûr, li dijî parastî bûna Qur'ana pîroz ji tehrîf û guherîna ye an ne? Evê yêkê şîrove bikin.

DERSA 34

CIHANÎ BÛN Û DAIMÎ BÛNA ISLAMÊ

Dagirê:

Pêşekî

Cihanî bûna dînê Islamê

Delîlên Qur'anê li ser cihanî bûna Islamê

Daimî û her û her bûna Islamê

Rakirina çend şubhan

Pêşekî

Me zanî ku îmana bi hemî pêxemberan û qebûl kirina hemî gotin û peyamên wan lazim e (dersa 29 ji vê kitêbê) û inkara pêxemberekî an inkara yêk ji hukm û peyamên wî bi me'na inkara rubûbiyeta teşrî'î ya ilahî ye û wek kufra ibilîs e.

Nixwe piştî sabit bûna pêxemberiya Pêxemberê Islamê (s) îmana bi wî û îmana bi hemî ayetên ji wî ra hatîn xwarê û hemî hukm û qanûnên ji alîyê Xuda yê Te'ala ve anîn lazim e.

Lê vêca baweriya bi her pêxember û kitêba asmanî ne bi vê me'nê ye ku 'emel gorekî şerî'eta wî lazim bê hesab kirin; wek çewa ku musilmana bawerî bi hemî pêxemberan û bi hemî kitêbên 'esmanî hene, lê çênabê gorekî şerî'etên pêşda 'emel bikin û pêşde jî işare hat kirin ku berpirsyariya 'emelî ya her ummetekî ew e ku bi destûrên pêxemberê wê ummetê 'emel bikê (dersa 29). Nixwe lazim bûna 'emel kirina xelkê hemiya bi

destûra şerî'eta Islamê hingê sabit dibê ku risaleta pêxemberê Islamê ne taybet û mexsûsê qewmekî tenê bê û her wiha pêxemberek dî piştî wî nehatibê rêkirin û şerî'eta wî nesx nekiribê. Bi gotinek dî: dînê cihanî û daimî bê.

Ji ber vê yêkê lazim e li ser vê çendê bê xeberdan ku: gelo risaleta Pêxember (s) cihanî û daimî ye? An taybetê zemanek kifş û qewm û milletek taybet e?

Ronahî ye ku ev mesele çênabê bi rêka 'eql tenê ve bê vejenîn belkî lazim e ji awayê tehqîq û lêkolîna neqlî û tarîxî behre bê girtin, yanî gereke em binêrin delîl û senedên cî girtî û mu'teber.

Û kesê ku Qur'an û pêxemberî û parastî bûna Pêxemberê Islamê (s) ji xeletîyê jêre kifş bûbê, ji wî ra çi sened û medrek ji kitab û sunnetê mu'tebertir û pitir cihê bawerîyê tunehin.

Cihanî bûna Islamê

Cihanî bûn û mexsûs nebûna vî dînî ji qewm û herêmek xas û taybet ra ji lazimî yên vî dînî ye. Û heta ewên bawerî pê neyîn zanin ku gazî ya Islamê ji hemiya re bûye û ne girêdayî ye bi herêm û cihek xas û taybet ve.

Zêdertirê ji vê jî şahidên zehfî di tarîxê da hene ku Pêxemberê Ekrem (s) ji serokên memleketa re wek Qeyserê Rûmê û paşayê Îranê û padişahên Misr û Hebeşe û Şamata û her wiha ji serokê qebîlên 'Ereba re û ... name û nivîsok û qasid û wekîl rêkirine û ew hemî jî gazî kirin ji bona qebûl kirina vî dînê muqeddes û ew tirsandine ji pey hatên kufr û qebûl nekirinê[1] û eger dînê Islamê ne cihanî bûya û gazî ya giştî û 'umûmî bi cî nehatibûya wê qewm û milletan di qebûl nekirina wê da 'uzr û hêcet hebûna.

[1] - Nivîsokên Pêxember (s) di kitêbên mu'teber da sebt bûne û di kitêbên musteqil da jî hatine nivîsîn wek : Mekatîb-ur Resûl.

Nixwe çênabê îmana bi heqaniyeta Islamê û 'emelê li ser esasê vê şerî'eta ilahî ji hev bên vekirin û tefkîk bibin, ku netêca vê cidahîyê bibê ev ku hinek neberpirsyar bin ji 'emel kirina bi vî dînê ilahî.

Delîlên Qur'anê li ser cihanî bûna Islamê

Çewa ku hat gotin baştirîn û pê bawertirîn delîl û sened û medrek ji sabit kirina vê meselê ra Qur'ana pîroz e ku heqqaniyeta wê di dersên borî de ronahî bû. Û kesê berê xwe bidê vê kitêba ilahî, wê gelek ronahî bibînê ku gazîyên wê gişti û 'umûmî ne û ne girêdayî û taybetê millet û qewm û nijadekî tenê ve ye.

Di gelek ayeta da dibêjê «**يا ايها الناس**–gelî xelkîno»[1] «**يا بنى آدم**» - ya benî Adem - ey zarokên Adem»[2] û hidayeta xwe ji hemî mirova[3] re û ji 'alemê ra hesab kiriye.[4] Hinek ayet risaleta pêxember ji hemî mirova re[5] û ji hemî 'alemê re[6] sabit kiriye. Ayeta 19 ji sûretê En'am gazî ya wî hemî yê wa kesa re zaniye ku ewê guhlê dibin û dibhîzin.[7] Ji alîyê dî ve peyrewên dînên dî bi navê «ehlê kitab» gel wa axiftiye û lome li wan kiriye[8] û risaleta Pêxember (s) ji wan ra jî sabit kiriye û hedefa nazil kirina Qur'anê ser

---

[1] - Beqere/ 21 , Nisa/ 174 , Fatir/ 15 = يَا أَيُّهَا النَّاسُ أَنتُمُ الْفُقَرَاء إِلَى اللّهِ وَاللّهُ هُوَ الْغَنِيُّ الْحَمِيدُ.

[2] - E'raf/ 26, 27 , 28 , 31, 35, Yasîn/ 60

[3] - Beqere/ 185 , 187 , Alê 'Imran/ 138 , Ibrahîm/ 1, 52 , Casiye/ 20 , Zumer/ 41 , Nehl/ 44, Kehf/ 54 , Heşr/ 21 =
لَوْ أَنزَلْنَا هَذَا الْقُرْآنَ عَلَى جَبَلٍ لَّرَأَيْتَهُ خَاشِعًا مُّتَصَدِّعًا مِّنْ خَشْيَةِ اللَّهِ وَتِلْكَ الْأَمْثَالُ نَضْرِبُهَا لِلنَّاسِ لَعَلَّهُمْ يَتَفَكَّرُونَ.

[4] - En'am/ 90 , Yûsuf/ 140 , Sad/ 87 , Tekwîr/ 27 , Qelem/ 52 = وَمَا هُوَ إِلَّا ذِكْرٌ لِّلْعَالَمِينَ.

[5]- Nisa/79,Hec/49, Sebe/ 28 = وَمَا أَرْسَلْنَاكَ إِلَّا كَافَّةً لِّلنَّاسِ بَشِيرًا وَنَذِيرًا وَلَكِنَّ أَكْثَرَ النَّاسِ لَا يَعْلَمُونَ.

[6] - Enbiya/ 107 , Furqan/ 1 = تَبَارَكَ الَّذِي نَزَّلَ الْفُرْقَانَ عَلَى عَبْدِهِ لِيَكُونَ لِلْعَالَمِينَ نَذِيرًا.

[7] - قُلْ أَيُّ شَيْءٍ أَكْبَرُ شَهَادَةً قُلِ اللهِ شَهِيدٌ بِيْنِي وَبَيْنَكُمْ وَأُوحِيَ إِلَيَّ هَذَا الْقُرْآنُ لأُنذِرَكُم بِهِ وَمَن بَلَغَ أَئِنَّكُمْ لَتَشْهَدُونَ أَنَّ مَعَ اللّهِ آلِهَةً أُخْرَى قُل لاَّ أَشْهَدُ قُلْ إِنَّمَا هُوَ إِلـهٌ وَاحِدٌ وَإِنَّنِي بَرِيءٌ مِّمَّا تُشْرِكُونَ.

[8] - Alê 'Imran/ 65,70,71,98,99,110,Maide/ 15,19 =
يَا أَهْلَ الْكِتَابِ قَدْ جَاءكُمْ رَسُولُنَا يُبَيِّنُ لَكُمْ عَلَى فَتْرَةٍ مِّنَ الرُّسُلِ أن تَقُولُوا مَا جَاءنَا مِن بَشِيرٍ وَلاَ نَذِيرٍ فَقَدْ جَاءكُم بَشِيرٌ وَنَذِيرٌ وَاللّهُ عَلَى كُلِّ شَيْءٍ قَدِيرٌ.

Pêxember (s) serketina Islamê li ser dînên dî hesab kiriye. [1] Pê dîtina van ayetan di giştî bûna gazî ya Qur'anê û cihanî bûna dînê pakê Islamê da çi şik û şubhe namînin.

Daimî bûna Islamê

Ayetên hatîn gotin kanê çewa pê kelîmên giştî (wek: benî Adem, en- nas, el- 'alemîn) û pê vî qasî ku berê xeberdanê didê hemî kes û milletan û berê xwe nadê qewmek taybet û gel qewmên ne 'Ereb û ehlê hemî dîna xeber didê, pê vê giştîyê cihanî bûna Islamê sabit dikê; her wiha pê bikar birina zemanê bê qeyd û mehdûd û sînor nekirina Islamê jî ji zemanek taybet ra sabit dikê.

Nexasma gotina «لِيُظْهِرَهُ عَلَى الدِّينِ كُلِّهِ»-"da ewê ser hemî dîna bêxê" (Tewbe / 33, Feth / 38, Sef / 9) cihê çi şik û şubhan nahêlê. Her wiha Fussilet / 41 - 42 kerem dikê:

وَإِنَّهُ لَكِتَابٌ عَزِيزٌ * لَا يَأْتِيهِ الْبَاطِلُ مِن بَيْنِ يَدَيْهِ وَلَا مِنْ خَلْفِهِ تَنزِيلٌ مِّنْ حَكِيمٍ حَمِيدٍ

Ev ayet delalet dikê ku qet çi caran Qur'ana pîroz durustî û mu'teber bûna xwe ji dest nadê, evahe jî delîlek e li ser daimî bûna Islamê. Xêncî ji vê jî delîlên xatemî ya Pêxember (s) (ku di dersek dî da wê jê bê xeberdan) evê çendê ronahî dikê ku ev dîn qet ne mumkin e pê hatina şerî'eta pêxemberek dî nesx bibê.

Her wiha gelek riwayet û hedîs bi vê me'nê gehane destê me ku: "helal--u Muhemmed-in helalun ila yewm-il qiyame we heramuhu heram-un ila yewm-il qiyame" yanî: "ya Pêxember helal an heram kirî, heta roja qiyametê dewam dike."[2] Xêncî ji vê jî daimî bûna Islamê wek cihanî bûna wê ji lazimî yên vî dînê pak e û xêncî ji delîlên heqaniyeta Islamê, ne muhtacê çi delîlê

---

[1] - Tewbe/ 33 , Feth / 38 , Sef/ 9 = هُوَ الَّذِي أَرْسَلَ رَسُولَهُ بِالْهُدَى وَدِينِ الْحَقِّ لِيُظْهِرَهُ عَلَى الدِّينِ كُلِّهِ وَلَوْ كَرِهَ الْمُشْرِكُونَ.

[2] - Kafî/ c. 1 , s. 57 , c. 2 , s. 17. Bihar/ c. 2 , s. 26 , c. 24 , s. 288. Wesail-uş Şî'e / c. 18 , s. 124. حلال محمد حلال الى يوم القيامة و حرامه حرام الى يوم القيامة

dî ye.

Rakirina çend şubhan

Dijminên Islamê ku li pêşî girtina li pêşketina Islamê digerin û vê derheqê da pir dixebtin, pê çêkirina şik û şubhan wiha berve davêjin ku dînê Islamê taybetê xelkê 'Erebistanê bûye û li beraberê xelkê dî de çi berpirsyarî tune.

Hinek ji wa ayetên ji vê meselê ra xwe pê digirin, ew ayet in ku fermana hidayeta mirov û nêzîkên pêxember didin pêxember an dibêjinê ehlê Mekkê û dorûberê wê hidayet bike (Şu'era/ 214, En'am/ 92 , Şûra/ 7 , Secde/ 3 , Qeses/ 46 , Yasîn/ 5 – 6).

Her wiha "Maide/69" ku piştî işare kirina bi Yehûdî û Sabi'î û Nesraniyan pîveka bexteweriya mirov di îman û 'emelê qenc da hesab dikê û navekî ji Islamê ku şer bê ji bextewerî û se'adetê ra nabê.

Xêncî ji vê jî di fiqha Islamî da ehlê kitêb gel muşrikan beraber nehatine girtin, belkî pê dana cizîyê (şûna xums û zekata ku musilman didin) êmnahiya wan di hukmeta Islamî da tê parastin û dikarin bi şerî'eta xwe û hukmên wê 'emel bikin û evahe nîşan e ji wî qasî ra ku ev dîn bi resmiyet hatine nas kirin.

Di cewabê da gereke bê gotin: ayetên ku behsa famîl û eqreba yên pêxember û ehlê Mekkehê dikin, derheq merhele û mertebe yên gazî ya pêxember da ne (s) ku ji mirovên wî yên nêzîk destpê dikê, piştî wê dor digehê ehlê Mekkehê hemîyê û dorûberê wî û di pey ra dewam dikê heta hemî cihaniyan li ber xwe bigirê. Mirov nikarê bêjê ev ayet mexsûsê ayetên cihanî bûna risaleta pêxember in (s), çimko xêncî ji vê ku rengê texsîsê bi va ayeta ve nîne; eger muxessis bê, hingê texsîsa «ekser» çêdibê ku di 'urfa 'uqela de nayê qebûl kirin.

Û ayeta 69 ya sûretê Maide jî li pey vê çendê ye ku bêjê munteseb bûna bi dînekî ji van dînan tenê ji gehana bexteweriya

heqîqî re, ne bes e; belkî sebebê se'adet û bextewerîyê, îmana durust û pêk anîna birpirsyariya ye ku Xudê bende yên xwe mesûl kirine ji pêk anîna wan ra. Û gorekî delîlên cihanî û ebedî bûna Islamê sabit dikin berpirsyariya herkesî piştî hatina pêxember (s) 'emel kirina bi ehkamê vî dînî ye.

Lê vêca seratiya ku di Islamê da ji ehlê kitab ra li ser muşrika hatî me'lûm kirin ne bi vê me'nê ye ku ew ji qebûl kirina Islamê di 'emelên bi hukmê wê, ne berpirsyar in; belkî di heqîqet da zêdahî ya dinyayî ye ku ji ber hinek meslehetan ji wan re hatiye dayîn. Û di nezera Şî'an da ev ne daimî û ji zemanekî ra hatiye vebirîn û li zemanê hatina Imam Mehdî da (s) wê hukmê paşîn derheq wan da bê dayîn û wek kafirên dî wê digel wan jî me'emilet bê kirin. Û çêdibê ev gotin ji: "لِيُظْهِرَهُ عَلَى الدِّينِ كُلِّهِ - da ewê ser hemî dîna bêxê" (Tewbe/ 33, Feth/ 38, Sef/ 9» bê istifade kirin.

PIRSYARÊN DERSA 34

Bi çi awayî herkes lazim e ji şerî'eta Islamê peyrewî bikê?

Delîlên Qur'anî yên cihanî û ebedî bûna Qur'anê binivîsin.

Çi delîlên dî li ser vê gotinê hene?

Bêjin çima memûriyeta pêxember (s) ji hidayeta nêzîkên xwe re ne nîşana cihanî nebûna Islamê ye?

Mucaz bûna ehlê zimmê bi şerî'eta xwe bi çi awayî ji wan re neme'zeret e ji qebûl nekirina şerî'eta Islamê ra?

DERSA 35

XATEMIYYET

Dagirê:

Pêşekî

Delîla Qur'anê li ser xatemiyetê

Sirra xetma pêxemberîyê

Cewaba şubheyekî

Pêşekî

Pê li ber çav girtina daimî bûna Islamê, ihtimala hatina pêxemberekî ku şerî'eta Islamê nesx bikê ji holê radibê, lê cihê vê gumanê dimînê ku pêxemberek dî bû ku ragehîner û murewwicê Islamê bê, çewa ku gelek ji pêxemberên pêşda ev mesûliyet hebûne, çi pêxemberên ku hevçaxê pêxemberê xwe yê şerî'etê, wek hezretê Lût (s) ku di zemanê hezretê Ibrahîm da bûye û li pey şerî'eta wî çûye. Çi jî pêxemberên ku piştî pêxemberên xweyê şerî'etê rabûyî û ji wî peyrewî kirîn, wek pitirê pêxemberên benî israîl. Ji ber vê yêkê gereke behsa xatemiyeta pêxemberê Islamê serbixwe û musteqil jê bê xeber dan, da ku cîhê vê gumanê jî nemînê.

Delîla Qur'anê li ser xatemiyetê

Yêk ji lazimî yên dînê Islamê ev e ku pêxemberî pê Pêxemberê Islamê (s) xetm bûye û gehaye xilasekê û piştî wî hezretî qet çi pêxember nehatine û nayin. Heta nemusilman jî zanin evahe

yêk ji bawerî yên Islamî ye ku gereke her musilmanek ewê bawer bikê û ji ber vê ye ku wek lazimî yên dî yên dînî ne muhtacê delîlê ye, lê di her hal û karî da ev mesele ji Qur'anê û riwayetên mutewatir istifade dibê. Wek: Ehzab / 40 ku bê çep û çûr ewî hezretî xilaseka pêxemberan didê nîşan dan.

Hinek ji dijminên Islamê, derheq wê ayetê da du işkal anîne:

Yêk: ev ku kelîma «xatem» bi me'na gustîrk jî hatiye û belkî di vê ayetê da bi vê me'nê bê.

Du: ferzen xatem bi wê me'na meşhûr bê, mefhûmê ayetê dibê ev ku: silsile ya «nebîyîn»a pê wî hezretî xetm û xilas bûye, ne ku «resûl» jî xetm bûne.

Cewaba işkala ewwil: xatem bi me'na wesîla xetm kirin û xilas kirin e; û gustîrk jî ji ber vê xatem jêra hatiye gotin çimko pê wî name û nivîsok û tiştên wereng muhr dikiran ku xilaseka wê bû.

Cewaba işkala duwê: her pêxemberê ku «nebî» bê «resûl» e jî û pê xilas bûna zincîra enbiya, zincîr û silsila resûla jî digehê xilasekê. Çewa ku pêşda jî hat gotin (dersa 29) herçend mefhûmê nebî ji mefhûmê resûl giştîtir nebê jî, lê li vêderê ji resûl giştîtir e.

Delîlên riwayetî yên xatemiyetê

Di sedan riwayetan da behsa xatemiyeta pêxemberiya pêxemberê Islamê hatiye kirin, yêk ji wan hedîsa menziletê ye[1] ku Şî'e û Sunniya bi tewatur ev hedîs ji pêxember (s) gêrane û bi awayek wereng ku di mefhûmê wê da qet şik û şubhe namînê û ew ev e:

Dema Pêxember (s) ji şerê Tebûkê ra ji Medînayê derket Mîrê bawerdaran 'Elî (s) ji bona rêk û pêk kirina kar û barê musilmana

[1] - Bihar/ c. 37 , s. 254 - 289. Sehîha Buxarî / c. 3,s 58. Sehîha Muslim/ c. 3, s. 323. Sunena Ibn Mace / c. 1, s. 28 . Mustedreka Hakim / c. 3 s. 109. Mesneda Ehmedê Henbel/ c. 1, s. 331 û c. 2, s. 693 , 743.

li Medînayê di cîyê xwe da hişt, vêca ew hezret ji ber ku nekariye di vê cihadê da şirîkatîyê bikê xemdar bû û rondik ji çavê wî hatin. Hingê bû ku pêxember gotê:[1] Ma tu ne razî yî bi vê çendê ku tu ji bona min wekî Harûn bî ji Mûsa re, pê vê ferqê ku paş min ra pêxember nînin (lê Harûn pêxember bû).

Di riwayetek dî da ji pêxember (s) neql bûye: ... Gelî xelkîno, birastî çi pêxember paş min û çi ummet paş hewe tunehin.[2] (Wesail-uş Şî'e/ c. 1; s. 15. Xisal/ c.1; s. 322 û c. 2; s. 487).

Hedîsek dî: Gelî xelkîno, birastî çi pêxember pişti min nînin her wiha çi sunnet jî pişti sunneta min tunehin.[3] (Wesail/ c. 18, s. 555. Men la Yehzuruh-ul Feqîh / c. 4, s. 163).

Her wiha di gelek ji xutbên Nehc-ul Belaxê da[4] û di riwayet û ziyaret û du'ayên imamên pak da (selamên Xwedê li ser wa bin) ev gotin hatiye ku pêxember xatemê pêxembera ye.

Sirra xetma pêxemberîyê

Me pêşda işare kir (dersa 29) hikmeta gelek bûna pêxemberan û li pey hev hatina wan ev bûye ku ji aliyekî ve di zemanên pêşda imkan nebûye ku yêk kes dînê Xudê li hemî cihî û di nav hemî xelka da teblîx bikê û rabigehênê; û ji alîyê dî ve jî vêca berfirehî û tevheviya peywendan û peyda bûna wesîlên nû û cedîd yên komelî û qanûnên nû an guherandina wan lazim hatiye dîtin; û ji alîyê dî ve vêca tehrîf û guherîn têxsitan dînên Xudê evê dikira lazimê xwe ku ji durust kirina zanînên xudayî ra bi rêka pêxemberên dî ve ev kar were cî û durustahî her bimênê.

---

[1] - اما ترضى أن تكون منى بمنزلة هارون من موسى الا انه لا نبى بعدى.
[2] - ايها الناس إنه لا نبى بعدى و لا سنة بعد سنتى ...
[3] - أيها الناس انه لا نبى بعدى و لا امة بعدكم ...
[4] - Xutbe / 1 , 69 , 87 , 129 , 168 , 193 , 230.

Vê gorekê di wan şert û mercan da ku ragehandin û teblîxa risaleta Xuda di hemî cihanê da bi rêka pêxemberekî û arîkar û cîgirên wî mumkin bê; û ehkam û qanûnên yêk şerî'etê bikarê cewaba niyaz û ihtiyacîyên hazir û hêjbên yên komelê bidê; û di wê şerî'etê de meselên hêjbên û nû peyda dibin berçav hatibin girtin; û her wiha pişteke ji parastin û tehrîf nebûn û ne guhertina wê ra hebê, êdî çi sebeb namînin ku pêxemberek dî bê rêkirin.

Lê zanînên me'mûlî yên beşer têra wî qasî nakin ku eva şert û merca fêhm bikin, û hema Xuda yê Te'ala ye ku pê ‘ilm û zanîna xwe ya bê binî wext û demê va şert û mercan zanê û hema Ew e ku dikarê pêxemberîyê xetm bikê û wextê wî eşkere bikê, çewa ku di axirîn kitêba xwe ya 'esmanî da ev kar kir.

Lê xetma pêxemberîyê ne bi vê me'nê ye ku êdî peywend û girêdana hidayetê di navbeyna Xudê û bendên Wî da qût bibê û were birrîn, belkî kengê Xuda yê Te'ala baş û di cî da bizanê ji ‘ilmên xeybî dikarê bidê 'ebdên xwe yên layiq, herçend ne bi şiklê wehy û pêxemberîyê bê. Çewa ku gorekî baweriya Şî'an zanîna bi vî awayî daye imamên pak (selamên Xudê li wa bin). Bi hez kirina Xudê di dersên hêjbên de emê derheq meselên imametê de baxivîn.

Cewaba şubheyekî

Ji gotinên jorî hat dest ku sirra xetma pêxemberîyê ew bûye ku **yêk:** pêxemberê Islamê dikariya bi arîkariya heval û hogir û cîgirên xwe risalet û peyama xwe bigehênê guhê 'alemê. **Du:** kitêba wî ya 'esmanî ji guherîn û tehrîfê parastî ye. **Sê:** şerî'eta Islamê dikarê cewabgo yê niyaz û ihtiyacên beşer bê, heta xilaseka dinyayê.

Lê çêdibê kesek derheq mesela paşîn de şubheyekî bi vî awayî bavêjê meydanê: çewa ku tevheviya wez' û halê komel û cami'e

yên pêşîn û peywendên komî bûne sebeb ku hukmên nû bên xarê an hinek hukm bên guherandin û ji ber vê yêkê pêxemberek dî dihata. Piştî pêxemberê Islamê jî guherînên mezin bi cî hatine û peywend û girêdanên komelî aloztir bûne, çewa çêdibê bê gotin ku eva guherîna şerî'etek nû nekiriye lazimê xwe?

Cewab ev e ku: çewa hat gotin, fêhm kirin û têgehiştina vê çendê ku çi guherîn dibin sebeb heta qanûnên binyatî bên guherandin, ne di heddê beşerê me'mûlî da ye; çimko em bi hemî alîyê 'illet û sebeb û hikmetên hukman ne agah in, lê em pê delîlên daimî bûna Islamê û xatemiyeta pêxember (s) dest ve tênîn ku guherandina qanûnên binyatî yên Islam lazim nîne.

Elbet em peyda bûna hinek tiştên nû yên komelayetî ku hinek muqerreratên nû jêre lazim in nefy nakîn. Lê di şerî'eta Islamê da ji bona van muqerreratên çiqî û cuz'î hinek pîvek û esl û qa'ide hatine deynan ku mirovên xwey selahiyet dikarin pê li nezer girtina wan û li er esasê wan, qanûnên lazim deynin û bi cî bînin. Û tefsîl û dirêjiya gotinê gereke li fiqha Islamî da di behsa ixtiyarên hukûmeta Islamî jê bê xeberdan û li wê derê mirov pey vê meselê bikevê.

PIRSYARÊN DERSA 35

Dema daimî bûna Islamê sabit bû çi niyaz bi behsa xatemiyetê heye?

Xatemiyet çewa pê delîla Qur'anê sabit dibê?

Şubhên vê delîlê û cewaba wê binivîsin.

Sê riwayeta derheq xatemiyetê da bêjin.

Çima zincîra pêxemberan pê hatina pêxemberê Islamê hat xetm kirin û xilas bû.

Gelo xetma nubuwwetê bi me'na girtina rêka behremend bûna ji zanînên xudayî ye? Çima?

Gelo guherînên komelayetî piştî hatina Islamê şerî'etek nû nakê lazimê xwe? Çima?

Niyaz û ihtiyaca komelê bi muqerreratên taze ji bona qewimînên nû peyda bûyî çewa ji holê radibê.

DERSA 36

IMAMET

Dagirê:

Pêşekî

Mefhûmê imametê

Pêşekî

Pêxemberê Islamê (s) piştî hicret kirî û çûî Medînê û xelkê wî piştîvanî û arîkariyek bêkêmasî digel wî û muhaciran kirîn ku leqeba «ensar» ji xwe re girtin, xîmê hukûmet û komelek Islamî darijand û kar û barê wê rêve birin. Mescid-un Nebî xêncî ji vê ku cihê 'ibadet û teblîx û ragehandina risaletên Xudê û terbiyet kirinê bû; cihê cî kirina muhacir û feqîr û jara jî bû û hema li wê derê rewş û halê wan yê aborî û me'îşetî jî berçav dihata girtin; hema wê derê xêncî ji van karan cihê hukm dana nav xelkê da û biryarên 'eskerî û leşkerî û rêkirina ji ceng û cihadê ra û ... jî bû û di yêk gotinê da em dikarin bêjin li wê derê idare kirin û rêve birina kar û barê dîn û dinya xelkê bi destê pêxember (s) pêk dihata û musilmana xwe berpirsyar zanîyan ku destûrên wî hezretî bi cî bînin, çimko ji alîyê Xuda ve destûr hatibû bêy

anîna çi hêcetan û bêy hire wêre guhdariya pêxember (s) bikin[1] û derheq meselên siyasî û leşkerî û hukm danê da jî bi fermanderiya pêxember (s) destûrên şidandî hatibûn. [2]

Bi gotinek dî: pêxemberê Xuda xêncî ji menseba pêxemberîyê, berpirsyariya hîn kirin û ronahî kirina ehkamên Islamê jî bi hêvîyê ve bû, her wiha berpirsyariya hakim û rêve birina komela Islamî jî bi hêvîyê ve bû ... .

Dînê Islamê xêncî ji berpirsyariya 'ibadî û exlaqî, ehkamên siyasî û iqtisadî û huqûqî jî ... hebûn û pêxember (s) xêncî berpirsyariya teblîx û te'lîm û terbiyetê ji alîyê Xuda ve li ser hukm û qanûnên ilahî hatibû deynan û hemî mertebên hukmdarîyê hêviya wî ve bûn!

Ronahî ye dînê ku de'wa wî rehberiya hemî komên beşer e, heta xilaseka 'emrê dinyayê, nisbet bi va mesela nikarê bê xem bê; û komelek ku li ser binyata vî dînî hatibê ava kirin çênabê ev berpirsyarî yên siyasî - hukûmetî têda tunebin ku li bin navê imametê da tên cî kirin.

Lê vêca xeberdan derheq vê da ye ku piştî rihleta pêxember (s) ev meqamê imamet û pêşkarîyê bi hêviya kî ve ye û wê ji kî werbigirê? Gelo çewa Xuda ev mertebe û meqam dabû pêxember (s) daye hinek dî jî? Û ev meqam û mertebe pê dana Xudê digehê meşrû'iyetê? An gelo dana Xudê mexsûs bûye ji pêxember ra û piştî wî ew xelk bi xwe ne, ku ji xwe ra imam û pêşkarekî dibijêrin û ewî dikin mezinê xwe? Û gelo ev heq ji xelkê ra heye?

---

[1] - Alê ‘Imran/ 32 , 132 , Nisa / 12 , 14 , 69 , 80 . Maide / 92 . Enfal/ 1 , 2 , 46. Tewbe / 71. Nûr/ 51 , 54 , 56 . Ehzab / 66 , 71. Hucurat / 14. Feth / 16 , 17. Muhemmed / 32. Mucadile / 12. Mumtehine/ 12. Texabun/ 12. Cin / 23.

[2] - Alê ‘Imran/ 152 . Nisa / 42 , 59 , 65 , 105. Maide / 48. Hecc / 67. Ehzab / 6 , 36. Mucadile / 8 - 9. Heşr/ 7.

Û ev mesele hema ew nuqta eslî ya ixtilafa di navbeyna Şî'e û Sunniya da ye. Yanî ji alîyekî ve Şî'e ser vê bawerîyê ne ku imamet mertebe û meqamek xudayî ye ku ji alîyê Xuda ve tê dayîn ji wan kesa re ku bikêr vî karî tên û Xudê bi rêka Pêxember ve evî karî dikê û mîrê bawerdaran ‘Elî (selam lê bin) kiriye cîgirê xwe yê bêvebir û paşê jî yazdeh kes ji zarokên yêk paş yêkî kiriye imam û ev mertebe daye wan. Û ji alîyê dî ve ehlê sunnet ser vê bawerîyê ne ku imameta xudayî wek nubuwwet û resaletê pê rihleta Pêxember (s) geha xilasekê û xatime peyda kir; û ji wê pêve kifş kirina imam bi hêviya xelkê ve ye. Û heta hinek ji mezinên ehlê sunnet rasterast gotine eger kesek bi zora silah û çek ser xelkê ket, piştî serketinê guhdana wî û ferman birin ji wî li ser xelkê lazim e.[1] Û ronahî ye ku bîr û hizrên wiha rê vedikin ji istifade ya xirab ya zalim û zordar û hîlebazan ra û dibê sebebê ji hev belav bûn û ji rêderî ya musilmanan.

Di heqîqet da ehlê sunnet pê qebûl kirina meşrû'iyeta imamtê bêy danîna ji alîyê Xuda ve ewwilîn sitûnên cuda kirina dîn ji siyasetê vedan û ser baweriya Şî'an hema ev mesele mezintirîn nuqta xwehrîyê ye ji rêka durusta Islama rastî û ‘ibadetê Xudê di hemî şiklê jiyanê da û her wiha cihê bi cî hatina hezaran xwehrî yên dî ne ku piştî rihleta Pêxember (s) di nav musilmana de çêbûne û an wê çêbin.

Ji ber vê yêkê gelek di cî da ye ku mirovê musilman evê meselê bêy teqlîd û bê te'essub tehqîq bikê û vejenê[2] û vê derheqê da rêka durust peyda bikê û hemî alî berevanîyê jê bikê.

---

[1] - Binêrin: El- Ehkam-us Sultaniye, Ebû Ye'lî. û Tercuma Er-Resûl-el E'zem , Semerqendî , s. 40 - 42.

[2] - 'Alimên mezin ev xizmet kirine û rêk ji vejenînê ra vekirine. binêrin: 'Ebeqat-ul Enwar , El-Xedîr , Delail-us Sidq , Isbat-ul Hudat . Ji nav kitêbên kurt binêrin: El-Muraci'at û Esl-uş Şî'e we Usûluha.

Bêy gotin kifş e ku di vê rêkê da gereke meslehet û xêra hemî cihana Islamê berçav bê girtin û nebê sebeb ku rêkên ixtilafê ji istifade ya dijminên Islamê re vebê û mezhebên muxtelif bikevin beraberê hev da û negerek karek bê kirin ku rêza musilmana ji hev bibê û biqetê û hevrêkiya wan li beraberê kafira de jinav biçê; ew tişta ku zerera wê ji musilmana hemiya ra ye û desthatek xêncî lawaz kirin û ze'êf kirina komela Islamî pêve neyî. Lê ji alîyê dî ve vêca negerek parastina hevgirtina musilmana bibê sebeb ku pêşî li tehqîq û lêkolîn û vejenînê bê girtin û ji nas kirina rêka durust û pêk anîna hewayê salim di nav cami'e ya Islamî ra xebat neyê kirin û mesele ya imametê ku fêhma durusta wî eserek zehfî di bexteweriya musilmana ra hem di dinyayê da hem di axiretê da heye, xef û veşartî bimînê.

Mefhûmê imametê

Imamet di luxet de bi me'na pêşkarî û rehberî ye û heçî kesê pêşkarî û rêveberiya komekî li xwe bigirê «imam» jêre tê gotin; çi di rêka heq da bê û çi neheq û nedurust. Çewa ku di Qur'anê da « أئمة الكفر – Tewbe / 12» derheq serokên kafira da bikar hatiye. Kesê ku nimêjker li pey wî mêj bikin jêra tê gotin: «imamê cema'etê».

Lê di istilaha 'ilmê kelam da imamet yanî: «riyaseta hemî alî û berfireh li ser komela Islamî di hemî karên dînî û dinyayî da». Û anîna kelîme ya «dinyayî» ji wî qasî ra ye ku berfirehiya imametê were zanîn; eger ne, rêk û pêk kirina karê dinyayî yê komela Islamî jî ji dîn tê hesab kirin.

Di nêrîna Şî'an da serokatî û riyaseta bi vî awayî hingê meşrû' e ku ji alîyê Xuda ve bê û kesê ku bi isalet (ne bi niyabet) xweyê vê mertebê û meqamê bê, ew ji beyana hukm û zanînên dînî ra ji xeletîyê û her wiha ji gunehan parastî ye. Û di heqîqet da ev imamê parastî ji xelet û guneh, xêncî di pêxemberîyê da wekî dî

di beyana hukm û qanûn û zanînên Islamî da wek wî ye û her wiha di hemî kar û barê hukûmetê da û fermanên wî hemî huccet in û gereke bên guhdarî kirin.

Vê gorekê ixtilafa Şî'e û Sunniya di mesela imametê da di sê meselada derdikevê meydanê:

- Imam gereke ji alîyê Xudê ve bê danîn.
- Gereke ew xweyê zanîna xudadayî û parastîyê ji xeletê bê.
- Gereke parastî ji guneh bê.

Elbet ev parastî bûn, ne mexsûsê imama tenê ye; çimko ser baweriya Şî'an Fatima Zehra jî (selam lê bin) me'sûm e; herçend ne imam e û hezretê Meryem jî (selam lê bin) me'sûm bûye û belkî di nav welî yên Xudê da jî hinek bi vî awayî parastî hebin ku me xeber ji wan nîne. Û di esil da ji xwe nas kirina mirovê me'sûm xêncî bi rêka nasandina Xudê ve nayê nas kirin.

PIRSYARÊN DERSA 36

Pêxemberê Xudê (s) xêncî ji nubuwwet û risaletê çi meqamê dî yê ilahî hebû?

Nuqta eslî ya ixtilafa navbeyna Sunnî û Şî'a da di behsa imametê da çi ye?

Qebûl kirina imameta ku ne mensûbê ilahî bê, çi peyhat hene?

Me'na luxetî û istilahî ya imametê bêjin.

Meselên binyatî yên imametê çi ne?

DERSA 37

NIYAZ Û IHTIYACA BI HEBÛNA IMAM

Dagirê:

Pêşekî

Lazimî ya hebûna imam

Pêşekî

Gelek ji wa yên kûr û hûr di meselên bawerî û 'eqîdetî da nafikirin, guman dikin ixtilafa Şî'e û Sunniyan derheq imametê de hema ev e ku Şî'e dibêjin: Pêxember (s) 'Elî yê kurê Ebû Talib (selam li wa bin) ji cîgiriya xwe ra li ser komelê danî bû, lêbelê Ehlê Sunnet ser wê bawerîyê ne ku tiştek wereng neqewimiye û xelkê ser viyana xwe serokek ji xwe ra danîn, vêca ewî jî paş xwe ve cîgirek ji xwe ra danî û di merteba sisê da vêca danîn û kifş kirina serok ma bi hêviya komek şeş neferî ve û xelîfê çarê dîsa bi bijartina xelkê hat bijartin û me'lûm bû. Û vê gorekê awayek taybet û mexsûs ji kifş kirina serok re di nav musilmana da tunebûye. Û ji ber vê yêkê piştî xelîfê çarê, heçî kesê karîna wî ya leşkerî pitir heyî ev meqam girtiye û bûye xelîfe û serok, çewa ku di memleketên ne Islamî da jî hema hema mesele bi vî awayî bûye.

Bi gotinek dî: wiha guman dikin ku Şî'e ji kifş kirina imam re ser wê bawerîyê ne ku Ehlê Sunnet derheqê kifş kirina xelîfê duwê da bawerî heyîn, ku ji alîyê xelîfê ewil ve hat danîn, digel vê ferqê ku bîr û hizra pêxember (s) ji alîyê xelkê ve nehat qebûl kirin; lê hizra xelîfê ewil ji alîyê xelkê ve qebûl bû!

Lê pê berçav negirtina vê yêkê ku xelîfeyê ewil ev heq ji kûderê anî bû? Û çima pêxember (s) gorekî baweriya Ehlê Sunnet qasê wî ji Islamê ra dil neşewitand û komela nûgehayî ya Islamê bêy serok beredayî hişt, halhale di wextê ji cihadê ra ji Medînê derdiketa ji xwe re cîgir dataniya; û her wiha ewî hezretî bi xwe behsa fitne û ixtilafa pişt xwe ve çêbê behs kiribû, pê li ber çav negirtina va pirsyaran û pirsyarên dî, gereke bê melheze kirin ku ixtilafa Şî'e û Sunniya pêş her tiştî li ser vê meselê ye ku: gelo imamet mertebe û meqamek dînî û li pey şerî'et û danîna ilahî ye, an padişahiyek dinyayî ye û li pey ‘amil û sebebên kom û ictma'î ye û Şî'e li ser wê bawerîyê ne ku heta pêxember (s) bi xwe jî ne wereng bûye ku serbixwe cîgirekî ji xwe ra deynê; belkî gereke vî karî bi emr û fermana Xuda pêk bênê. Û di heqîqet da hikmeta xetma nubuwwetê pê nesb û danîna imam hevrê kir û peywend dayê. Û pê hebûna vî imamî ye ku meslehet û xêr û başiya komela Islamî piştî rihleta pêxember (s) dikarê bigehê ummetê.

Ji vêderê ronahî dibê ku çima imamet di nêrîna Şî'an da bi navê yêk ji «eslên bawerîyê» jê tê xeberdan; ne bi navê hukmê fer'î yê fiqhî, ev jî me'lûm dibê ku çima sê şertên «‘ilm û zanîna xudayî, ‘ismet û nesb»ê di wî da şert zanin; û kanê çima di 'urfa kelamê Şî'î da ev mefhûm digel mefhûmên merce'iyet di nasîna hukmên ilahî û hukûmet û serokatiya cami'a Islamî têkel bûye bi awayek wereng ku tu dibêjî qey biwêja imametê delalet dikê li ser wan hemiyan.

Pê berçav girtina mefhûm û cihê imametê di nav bawerîyên Şî'a da emê derheq durustiya vê bawerîyê da baxivîn.

Lazimiya hebûna imam

Di dersa 22 da ronahî bû ku pêk hatina hedefa ji afirandina mirov girêdayî ye bi vê çendê ve ku bi rêka wehyê ve ew

rênimûnî bibê û hikmeta ilahî dikira lazimê xwe ku hinek pêxemberan rêkê da rêka bexteweriya dinya û axiretê nîşa mirov bikê û niyaz û ihtiyaciya wî ji holê rakin û mirovên ku qabiliyet hene terbiyet bikin û ewa bigehînin axirîn derece ya kemala ku ji wan ra hatî deynan, her wiha eger şert û mercên komelayetî di cî da bin bi cî anîn û icra kirina qanûnên komelayetî li xwe bigirin.

Û di dersa 34 û 35 da jî me ronahî kir ku dînê pakê Islamê hemiyanî û daimî ye û nayê nesx kirin û piştî Pêxemberê Islamê (s) pêxemberek dî nayê. Û xetma pêxemberîyê hingê digel rêkirina pêxemberan rêk dikevê ku axirîn şerî'eta 'esmanî bikarê hemî ihtiyacên beşer ji holê rakê û ew şerî'et heta axirê mana cihanê bimînê.

Derheq Qur'anê da evahe heye, û Xuda yê Te'ala parastina vê kitêba 'ezîz ji guherîn û tehrîfê li xwe girtiye, lêbelê hemî ehkamên Islamî ji eşkereyê ayetan nayê dest, mesela nimêj çend rek'et in û çewa nimêj tê kirin û bi sedan hukmên ferz û sunnetên wê mirov nikarê ji Qur'anê derênê; û bi awayê giştî gereke bê gotin ku Qur'an, ne li bere bi dirêjî behsa hukm û qanûnan bikê, belkî 'elimandin û ronahî kirina wan li ser pêxember e (s) da pê wê zanîna Xuda dayîyê (xêncî ji wehya Qur'an ê) ewa ji xelkê ra bêjê (binêrin: Beqere / 151, Alê 'Imran / 164, Cum'e / 2, Nehl / 64 – 66, Ehzab / 21, Heşr / 7) û bi vî awayî delîl bûn û hucceta sunneta wî hezretî sabit dibê û ji ber wê sunneta wî bûye yêk ji serkanî yên eslî ji nas kirina Islamê ra.

Lê vêca şert û mercê bi zehmetê jiyana wî hezretî wek dûr girtina wî ya çend sale di "Şi'ba Ebî Talib" da û deh sal şer û gîrûgirifta digel dijminên Islamê ev rêk jêre venebû ku hemî ehkam û qanûnên Islamê ji xelkê hemiya ra beyan û ronahî bikê; û qasê ku sehabî jî hîn dibûna tu zemanetek ji parastina

wan ra nebû. Û heta çewaniya destnmêja wî hezretî ku çendîn û çend salan li ber çavê xelkê pêk dihata, ket ber ixtilaf û xirecirê û di halekî da ku hukmên bi vî awayî bikevin ber ixtilafê [ew 'emelê ku niyaz û muhtaciya rojane ya musilmanan û çi tiştên ku bibin sebebê guherîna wê jî li holê naxweyhin] xetera xeletî ya di gêran û guherandina ji qestî derheq hukmên hûr û nexasma hukmên ku dibûna pêşîgir li bayê dilê hineka û feydên wan têxistan xeterê, pitir hebû. [1]

Pê berçav girtina van nuktan ronahî dibê ku hingê dînê Islamê dikarê dînek kamil bê û ihtiyacîyên beşer heta axirîka cihanê ji holê rakê ku di dîn bi xwe da rêkek hatibê melheze kirin ku xêr û başiya komelê bigehêtê, ew başî û xêrên ku pê rihleta pêxember (s) ket ber xeter û jinavçûnê. Û ev rêk ji danîna cîgirek layiq ji bo Resûlê Xuda pêve ne tiştek dî ye. Ew cîgirê ku xweyê zanîna xudadayî bê da bikarê heqîqetên dîn bi hûratî û çiq û belgên wê ve ronahî bikê û xweyê meleke ya ‘ismetê bê, da nekevê bin esera hedefên nefsanî û şeytanî da û nekevê pey bayê dil û ji wê xeterê parastî bê û ji qest xeletîyê neêxê di nav dîn ra. Û her wiha bikarê berpirsyariya terbiyetî ya bi hêviya pêxember (s) ve bû li xwe bigirê û pêk bênê û mirovên qabil bigehênê kemala wan û her wiha di wextê munasib bûna şert û mercên komelayetî da kar û barê hukûmetê li xwe bigirê û teybîra rêve birina karê komel û cam'ê û icra kirina hukm û qanûnên komelî bi rêve bibê û heq û ‘edaletê di cihanê da berfireh bikê û bidê cî kirin.

Welhasil: xetma pêxemberîyê hingê gel hikmetê rêk dikevê ku hevrê bê gel danîna imamê parastî ji guneh û xeletan; imamê ku xêncî ji pêxemberîyê taybetîyên dî yên pêxember (s) hebin.

---

[1] - 'Ellameyê Emînî navê 700 kesa di El-Xedîrê da nivîsiye ku hedîsên derew çêdikiran û nisbeta sed hezar hedîsên derew bal hineka ve hatiye dayîn – El-Xedîr / c. 5, S. 208 û pêve.

Vê gorekê hem lazimî ya hebûna imam sabit dibê, hem lazimî ya ‘ilmê xudadayî û parastî bûna wî; û hem ev ku gereke ji alîyê Xuda ve bê danîn, çimko Ew e ku zanê ev ‘ilm û ev meleke daye kî û Ew e serwer û serokê heqîqî yê 'evdên Xwe û dikarê di merteba binretir da evî heqî bidê hinek bende yên xwe ku şert û mercên lazim di wan da hebin.

Lê ehlê sunnet çi yêk ji van taybetiyan ji xelîfa ra nizanin û nabêjin, ne dibêjin ji alîyê Xudê û pêxember ve hatine danîn û ne jî xweyê zanîna xudadayî ne û ne jî meleke ya ‘ismetê ji wan ra dizanin. Belkî gelek ji xeletî û şimtîn û nekarînên wan ji cewab dana xelkê ra di kitêbên xwe da nivîsîne. Ji wa ye ku: ji xelîfê ewil gêrane ku gotiye: «ان لي شيطانا يعتريني - inne lî şeytanen ye'terînî» û ji xelîfê duwê gêrane ku: "bey'eta gel xelîfê ewil « karê 'ecele û hesab ser nehatî kirin» bûye[1] û her wiha gelek caran gotiye: «لولا علي لهلك عمر - lewla ‘Elîyun le helekel 'Umer»[2] û şimtînên xelîfê sisê[3] û xelîfên Benî Umeyye û Benî 'Ebbas gelek ronahîtir in ku ne hewce yê işare kirinê ne. Û di tarîxê da gelek eşkere ye. Tenê ew Şî'e ne ku sê şertan di duwzdeh imaman da dizanin û pê gotina jorî durustî ya bawerî ya wan di mesela imametê da eşkere û sabit dibê û êdî ne muhtacê delîlên berfirehtir e, lê dîsa jî di dersa hêjbê da emê işare bikîn bal hinek delîla ve ku ji Qur’an û sunnetê hatine dest.

[1] - Binêrin: Şerha Nehc-ul Belaxê / c. 1, s. 1158 , 42 , C. 3, s. 57.
[2] - El-Xedîr/ c. 6 S. 93 û pêve.
[3] - Ew / c. 8, s. 97 û pêve.

PIRSYARÊN DERSA 37

Nezera Şî'an di mesela imametê da û ixtilafa wan digel Sunniyan beyan bikin.

Çima Şî'e imametê eslek yê bawerîyê hesab dikin?

Lazimî ya hebûna imam şîrove bikin.

Ji vê beyanê çi desthat tên dest?

DERSA 38

DANÎNA IMAM

Me di dersa borî da got ku xetma pêxemberîyê bêy nesb û danîna imam xilafê hikmeta ilahî ye; û kamil bûna dînê cihanî û ebedî yê Islamê bi vê ye ku piştî pêxemberê Islamê (s) cîgirên layiq ji wî ra bên deynan û kifş kirin ku xêncî ji pêxemberîyê xwey meqam û mertebe yên wî yên dî bin.

Mirov dikarê gotina jorî ji ayetên Qur'ana pîroz û gelek hedîs û riwayetên Sunnî û Şî'an ku di tefsîra wa ayeta de neql kirîn istifade bikê.

Yêk ji ayetan, ayeta 3 ji sûretê Maide ye ku kerem dikê:

الْيَوْمَ أَكْمَلْتُ لَكُمْ دِينَكُمْ وَأَتْمَمْتُ عَلَيْكُمْ نِعْمَتِي وَرَضِيتُ لَكُمُ الإِسْلاَمَ دِينًا

Ev ayet ku tifaqa ehlê tefsîrê li Heccet-ul Weda'ê da nazil bûye û tenê çend mehan pêşiya rihleta pêxember da (s) hatiye xarê, piştî bê hêvî bûna kafiran ji zerer gehana Islamê « الْيَوْمَ يَئِسَ الَّذِينَ كَفَرُوا مِن دِينِكُمْ فَلاَ تَخْشَوْهُمْ وَاخْشَوْنِ...» li ser vê meselê dişidênê ku îro min dînê hewe kamil û ni'met û başiya Xwe li ser hewe temam kir, pê melheza riwayetên zehfî ku şe'nê nuzûla vê ayetê da hatiye, baş ronahî dibê ku mexsed ji ikmal û itmamê ku di wî wextî da bûye ku kafir bêhêvî bûne ji wê yêkê ku bikarin zererê bigehênin Islamê hingê bûye ku ji alîyê Xudê ve cîgir ji Resûlê Xudê ra (s) hatiye deynan. Çimko dijminên Islamê hêvîdar bûn piştî wefata pêxember (s) nexasma ku zarokên kur jî tunebûn

Islam bimînê bê serok û bikevê ze'êfî û ber jinavçûnê, lê pê danîna cîgirê wî, dînê Islamê geha kemala xwe û ni'met û qencî ya ilahî temam bû û kafir bê umîd û bê hêvî bûn (ji zanîna pitir ra binêrin tefsîra El-Mîzan / tefsîra ayeta jorî).

Ew jî bi vî awayî bû ku dema pêxember (s) ji axirîn hecca xwe (heccet-ul weda') zivirî, hecî hemî li ciyekî bi navê "Xedîr Xum"ê kom kirin û di wextê xwendina xutbeyekî dirêj da ji wan pirsî: **ألست اولى بكم من أنفسكم** – "ma gelo ez ji alîyê Xudê ve ne mezin û serokê hewe me? [1] Hemiya pêkve cewab dan ku: "belê". Vêca milê ʻElî (s) girt û li beraberê xelkê da bilind kir û kerem kir: **من كنت مولاه فعلي مولاه** - "kesê ez serokê wî bim, ʻElî jî serokê wî ye" û bi vî awayî welayeta ilahî ji wî hezretî ragehand guhê hemiyan. Paşê hemî yên hazir gel wî hezretî bey'et kirin û yêk ji bey'etkeran xelîfê duwê bû ku dema bey'et gel mîrê bawerdaran ʻElî (s) kirî gotê: بخ بخ لك يا علي اصبحت مولاي و مولى كل مؤمن و مؤمنة – "mizgînî û şahî ji te ra ey ʻElî! Tu bûyî serokê min û serokê hemî jin û mêrên bawerdar". Ji zanîna zêdetir ra binêrin: "Tebeqat-ul Enwar" û "El-Xedîr"ê.

Hema di vê rojê da bû ku ev ayet hat xarê:

الْيَوْمَ أَكْمَلْتُ لَكُمْ دِينَكُمْ وَأَتْمَمْتُ عَلَيْكُمْ نِعْمَتِي وَرَضِيتُ لَكُمُ الإِسْلاَمَ دِينًا

Û vêca Pêxember da ber tekbîran (Ellah-u Ekber) û kerem kir:

"Temam bûna pêxemberiya min û temam bûna dînê Xudê pê welayeta ʻElî ye piştî min".

Di riwayetekî da ku hinek ji mezinên ehlê sunnet jî (Hemwînî) neql kirine, hatiye ku: Ebû Bekr û 'Umer ji cî rabûn û ji Pêxember pirsîn: "gelo ev welayet taybetî ʻElî ye?" Ewî (s) kerem kir: "taybetî ʻElî û wesî yên min in, heta roja qiyametê". Gotin:

[1] - Işare ye bal Ehzab / 6 ve - النبى اولى بالمؤمنين من انفسهم.

"wesî yên te kî ne?" Kerem kir: «'Elî, bira û wezîr û mîratber û wesî û xelîfê min e li ser ummetê û serokê hemî mu'mina ye piştî min, paşê kurê min Hesen, paşê kurê min Huseyn, paşê neh zarokên min ji pişta Huseyn yêk pê yêkî re, Qur'an gel wa ye û ew gel Qur'anê ne; ne ew ji Qur'anê vedibin û ne Qur'an ji wan vedibê heta li ser hewzê bigehên min. (binêrin: Xayet-ul Meram, bab. 58, hedîs. 4, ku ji Feraida Hemwînî neql bû).

Gorekî ku ji gelek riwayeta tê zanîn Pêxember (s) pêşda emr jêre hatibû ku eşkere û bi awayek resmî imameta Mîrê bawerdaran teblîx bikê û rabigehênê, lêbelê tirsa wî ji wê bû ku newebê xelk guman bikin ew, vî karî ji ber xwe dikê û vêca qebûl nekin. Vêca ji ber wê yêkê li pey furset û derfetek munasib bû ku rêk ji vî karî re hazir bibê, heta ku ev ayet hat: "Maide - 67"

يَا أَيُّهَا الرَّسُولُ بَلِّغْ مَا أُنزِلَ إِلَيْكَ مِن رَّبِّكَ وَإِن لَّمْ تَفْعَلْ فَمَا بَلَّغْتَ رِسَالَتَهُ وَاللّهُ يَعْصِمُكَ مِنَ النَّاسِ إِنَّ اللّهَ لاَ يَهْدِي الْقَوْمَ الْكَافِرِينَ

[ji zanîna pitir ra binêrin tefsîra El-Mîzan]

Pê vê ayetê li ser ragehandina peyama ilahî hat şidandin ku ew peyam jî beraber bû digel peyamên dî hemiyan û ranegihandina wê we bû heçweku risaleta ilahî hemî terk dayî û teblîx nekirî; û mizgînî da wî hezretî ku Xudê Te'ala wê te ji peyhatên wê biparêzê. Di pey hatina vê ayetê re pêxember (s) pê hesiya ku wext û demê munasib gehaye û paş xistina ragehandinê ji vê pêve êdî çênabê. Ji ber wê di Xedîrê da ew peyam ragehand. **(Mezinên ehlê sunnet ev mesele ji heft sehabên Pêxemberê Xuda (s) neql kirine, ew jî ev in: Zeyd bin Erqem, Ebû Se'îdê Xudrî, Ibn 'Ebbas, Cabir bin 'Ebdullahê Ensarî, Burra- bin 'Azib, Ebû Hureyre, Ibin Mes'ûd - binêrin: El-Xedîr, c. 1)**

Elbet ya taybetê vê rojê ragehandina resmî û bey'et girtina ji xelkê bû; eger ne, Resûlê Xudê li dirêjiya pêxemberiya xwe da gelek caran cîgiriya mîrê bawerdaran (s) ji xwe ra behsê kiribû û

hema di wa salên ewwilî yên pêxemberîyê da dema ayeta: «وَأَنذِرْعَشِيرَتَكَ الْأَقْرَبِينَ - mirovên xwe yên nêzîk hişyarîyê bide wan» (Şu'era/ 214) hatî di civata hemî mirovên xwe da got: ewwilîn kesê gazî ya min qebûl bikê ew cîgirê min e. Û ser gotina her kesî, ewwilîn kesê gazî ya pêxember (s) qebûl kirî 'Elî yê kurê Ebû Talib bû. (binêrin: Tebeqat û El-Xedîrê. Her wiha name ya 20 ya El-Muraci'at)

Her wiha dema ayeta Nisa / 59:

يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا أَطِيعُوا اللّهَ وَأَطِيعُوا الرَّسُولَ وَأُوْلِي الأَمْرِ مِنكُمْ

hat xarê û guhdar bûna ji hineka ra bi navê «Ul-ul Emr» bi awayê mutleq û bê qeyd û şert ferz û wacib kir û guhdana wan kir wek guhdana Pêxember (s), Cabir bin 'Ebdullahê Ensarî ji pêxember pirsî: "ev "ul-ul emr" ku guhdana wan di kêleka guhdana te da hatiye danîn kî ne?" Kerem kir: "ew xelîfe yên min in ey Cabir; ew serokên musilmana ne piştî min. Ewwilê wan Elî ibn Ebî Talib e, paşê Hesen paşê Huseyn, paşê Elî ibn Huseyn, paşê Muhemmed ibn 'Elî - Baqir, ey Cabir tu dê Muhemmedê Baqir bibînî û eger te dît selamên min lê bike; paşê es-Sadiq, Ce'fer ibn Muhemmed, paşê Mûsa ibn Ce'fer, paşê 'Elî ibn Mûsa, paşê Muhemmed ibn 'Elî, paşê 'Elî ibn Muhemmed, paşê Hesen ibn 'Elî, paşê nav û kunya wî wek ya min Huccet-ullah fî erzih û Beqîyyetu-hu fî 'ibadih kurê Hesenê kurê 'Elî ...» (Xayet-ul Meram, çapa kevin, s. 267, c. 10, Isbat-ul Hudat, c. 3, s. 123, Yenabî'ul Meweddet, s. 494).

Çewa ku Pêxember (s) gotibû Cabir heta zemanê imameta hezretê Baqir (s) sax ma û selamên Pêxember (s) gehandin wî.

Di hedîsek dî da ji Ebû Besîr neql bûye ku got: "min derheq ayeta "ul-ul emr" da ji Imam Sadiq pirsyar kir-: "derheq 'Elî yê kurê Ebû Talib û Hesen û Huseyn da hatiye xarê. Min got: "xelk dibêjin: "çima Qur'anê 'Elî û Ehlê Beyta wî bi nav nedane

nasandin?" Kerem kir: "bêje wan: dema ayeta nimêjê hat qet nav ji sê rek'et û çar rek'etan nebir. Û ev Pêxember bû ku ew ji xelkê ra tefsîr kir û bi wî awayî ne ayetên zekat û hecê û ... jî. Evê ayetê jî gereke Pêxember (s) ji xelkê ra tefsîr bikê û ewî wiha kerem kir vê derheqê da: "men kuntu mewlah, fe haza Elîyyun mewlah – ew kesê ez mewlayê wî, vêca Elî mewlayê wî ye". Û kerem kiriye:

اوصيكم بكتاب الله و أهل بيتي فأني سألت الله عزوجل أن لا يفرق بينهما حتى يوردهما عليّ الحوض فأعطانى ذالك

Yanî: *"Ez wesiyeta kitêba Xudê û Ehlê Beyta xwe li hewe dikim (ku bikevin pey wan), min ji Xuda xwest ku cudahîyê navbeyna Qur'an û Ehlê Beyta min da çênekê; heta li ser hewz(ê kewserê) ewa bigehênê min û Xuda daxaza min qebûl kir».*

Û kerem kir:

لا تعلموهم فإنهم أعلم منكم، إنهم لن يخرجوكم من باب هدى و لن يدخلوكم فى باب ضلالة

"Ewa hîn nekin û ne'elimînin; çimko ew ji hewe zanatir in,ew qet hewe ji derîyê durustîyê paşda nadin û bi alîyê derîyê rê wunda bûnê ve nabin» (Xayet-ul Meram, c. 3, s. 265).

Gelek caran û di axirîka saxiya xwe da jî kerem kiriye:

إنى تارك فيكم الثقلين كتاب الله و أهل بيتي، إنهما لن يفترقا حتى يردا على الحوض

Ev hedîs mutewatir e û heta bi Tirmzî û Nisayî û Mustedrek û ... jî ji pêxember (s) neql kirine; û me'na wê ev e ku:

"Ez du giranbihaya di nav hewe da dihêlim: kitêba Xudê û Ehlê Beyta xwe ku ew ji hev naqetin heta li bal hewzê (kewserê) bigehên min".

Û kerem kiriye: *"Mesela Ehlê Beyta min di nav hewe da mesela gemiya Nûh e; kesê lê siwar bû xilas bû û yê jê paşve ma xeriqî"* (Mustedrek, c. 3, s. 151). Her wiha gelek caran gotiye

Imam ‘Elî (s): "ente weliyy-u kullu mu'min-in be'dî" - *"piştî min tu serokê hemî muʾmina yî"*. (Mustedrek, c. 3, s. 132, s. 111, Sewa'iq-ul Muweriqe, Ibn Hecer, s. 103, Musnedê Ehmedê Henbel, c. 1, s. 331, c. 4, s. 438 û ...)

Û her wiha bi dehan hedîsên dî ku vêderê ne mecala neqla wa ye. Binêrin: "Kemal-uddîn û Temam-un Ni'me, Sedûq; Bihar-ul Enwar, Meclisî".

PIRSYARÊN DERSA 38

Kîjan ayet behsa danîna imam dikê, delaleta wê şîrove bikin.

Behsa danîna Mîrê bawerdaran (s) ji imametê ra beyan bikin.

Çima Pêxember (s) ragehandina imameta imam ‘Elî paş dêxsita û çi bû ku ilan kir?

Kîjan riwayet delalet dikê ser imameta imaman hemiyan?

Behsa wa riwayeta bikin ku ji imameta Ehlê Beytê daxivin.

DERSA 39

‘ISMET Û ‘ILMÊ IMAM

Dagirê:
Pêşekî
‘Ismeta imam
‘Ilmê imam

Pêşekî

Di dersa 36 de me got ku ixtilafa Şî'e û Sunniya di behsa imametê da di sê ciha da ye: **Yêk:** evahe ku gereke imam ji alîyê Xuda ve bê danîn. **Du:** gereke imam xweyê meleka ‘ismetê bê. **Sê:** gereke xweyê ‘ilm û zanînek xudadayî bê. Di dersa 37 de pê beyanek 'eqlî her sê mesele sabit bûn û di dersa 38 de me işare kir bal hinek delîlên neqlî ve ku imamên pak yên Ehlê Beytê (selamên Xudê li ser wan bin) ji alîyê Xuda ve hatine kifş kirin û danîn; û di vê dersê de jî emê behsa ‘ismeta wan û ‘ilmê xudadayî yê wan bikîn.

‘Ismeta imam

Piştî sabit kirina vê yêkê ku imamet meqameke ku ji alîyê Xuda ve tê dayîn û bi rêka Wî ve gehaye ‘Elî yê kurê Ebû Talib û zarokên wî (selamên Xuda li ser wan bin) mirov dikarê ‘ismeta wan ji vê ayeta şerîfe derênê ku kerem dikê: Beqere / 124

لا ينال عهدي الظالمين

çimko ayet dana meqamê xudayî nefy dikê ji wa kesên guneh kirîn.

Her wiha ayeta «اولوا الأمر - Ul-ul emr» ku guhdana temam ya wan lazim zaniye û daniye di kêleka guhdana Resûlê Xuda de (s), tê fêhmê ku qet çi caran guhdana wan munafat û dijatî digel guhdana Xuda yê Te'ala nînin. Nixwe emrê mutleq bi guhdana wan bi me'na wî qasî ye ku ew parastî û me'sûm in.

Her wiha ‘ismeta Ehlê Beytê pê ayeta tethîrê (Ehzab / 33) jî tê sabit kirin:

« إِنَّمَا يُرِيدُ اللَّهُ لِيُذْهِبَ عَنكُمُ الرِّجْسَ أَهْلَ الْبَيْتِ وَيُطَهِّرَكُمْ تَطْهِيراً»

bi vî awayî ku: irade ya teşrî'î ya ilahî derheq pak bûna bendeyan de ne taybet û mexsûsê kesî ye, nixwe ev irade ku ji Ehlê Beytê re (s) xas û taybet bûye, irade ya tekwînî ya ilahî ye û xulf û xilaf jî têda nîne, çimko ayet kerem dikê: Yasîn / 82

«إِنَّمَا أَمْرُهُ إِذَا أَرَادَ شَيْئًا أَنْ يَقُولَ لَهُ كُنْ فَيَكُونُ»

û tethîr û pakiya mutleq û bê qeyd û nefya hemî awayên pîsatîyê hema ‘ismet bi xwe ye. Û em zanîn çi birekî ji musilmana de'wa me'sûm bûna çi yêk ji nêzîkên pêxember (s) û mensûbên wî nekirine, xêncî ji Şî'an ku gotine hezretê Fatima Zehra keça pêxember (s) û duwazdeh imamên Ehlê Beytê selamên (Xudê li wan bin) me'sûm in. (ji zanîna pitir re binêrin: El-Mîzan û kitêba: el-Imame we-l Wilayet Fi-l Qur'an).

Lazimê gotinê ye ku zêdetirê ji 70 riwayetan ku zêdetirê wan jî zanayên ehlê sunnet gêrane, delalet dikin ku ev ayet derheq «pênc kesên pak» da hatiye xarê (binêrin: Xayet-ul Meram, s. 287 - 293) û Şêxê Sedûq ji Mîrê bawerdaran 'Elî (s) gêraye ku Resûlê Xudê kerem kiriye: "Ey ‘Elî, ev ayet derheq te, Hesen û Huseyn û imamên ji nesla te da hatiye" min pirsî: imamên piştî te çend kes in? Kerem kir: "tu, ey ‘Elî, paşê Hesen, paşê Huseyn û piştî wî kurê wî ‘Elî û piştî wî kurê wî Muhemmed û piştî wî kurê wî Ce'fer, û piştî wî kurê wî Mûsa û piştî wî kurê wî

Muhemmed û piştî wî kurê wî ‘Elî û piştî wî kurê wî Hesen û piştî hingê kurê wî Huccetê Xuda". Vêca wiha lê zêde kir: "navê wan ser binî ya 'erşê Xudê hatiye nivîsîn. Û min ji Xudê pirsî ev navên kî ne? Kerem kir: "Ey Muhemmed ew imamên piştî te ne. Pak û parastî ne û le'neta min li ser dijminê wa ye". (Xayet-ul Meram [çapa kevin] c. 6, s. 293).

Her wiha hedîsa "**Seqeleyn**" ku Pêxember (s) Ehlê Beyta xwe rex Qur’anê daniye û gotiye ji hev naqetin, delîlek ronahî ye li ser parastî bûn û ‘ismeta wan; çimko kirina biçoktirîn guneh heta eger bi sehw û nezanîn bê jî mufariqet û cidahiya ji Qur’anê ye.

‘Ilmê imam

Şik nîne ku Ehlê Beyta Pêxember (s) ji xelkê pitir ji ‘ilmê Pêxember (s) behremend bûne, çewa ku derheq wa da gotî:

«لا تُعلِموهم فإنّهم أعلَمُ مِنكُم»- Ewa hîn nekin; çimko ew ji hewe zanatirn» (Usûlê Kafî, c. 1, s. 294) nexasma Mîrê bawerdaran ku ji zarokiya xwe ve li bal pêxember (s) mezin bûye û heta axirîn bêhnên jiyanê gel wî bûye. Û her û her li ber bû ku tişta ji Pêxember (s) hîn bibê û pêxember derheq wî da got:

«أنا مَدينةُ العِلم و عليٌ بابُها»- Ez bajarê ‘ilmê me û ‘Elî derîyê wê ye»; (Mustedrek, c. 3, s. 226). Û ji mîrê bawerdaran bi xwe hatiye neql kirin ku got:

إنّ رسولَ اللّهِ صلّى اللّه عليه وآله عَلَّمَنِي ألفَ بابٍ، و كُلُّ بابٍ يَفتَحُ ألفَ بابٍ فَذالِكَ ألفَ ألفَ بابٍ، حتى عَلِمتُ ما كانَ و ما يَكونُ إلى يومِ القيامةِ و عَلِمتُ عِلمَ المَنايا و البلايا و فَصلَ الخطاب. (Yenabî'ul Mewedde / s. 88, Usûlê Kafî / c. 1, s. 296)

Yanî: "Pêxember (s) hezar derî yên zanînê nîşa min kirin ku ji her derîkî hezar derî yên dî vedibûna û li ser hev dibin hezar hezar derî. Heta ku ji heçî ya bûyî û ya bibê heta roja qiyametê min agahî peyda kir û ez ‘elimîm ‘ilmê "mena"yan [mirin] û "bela"yan [musîbet] û "fesl-ul xitab"ê [hukmdana heq û durust].

Lê zanîna Ehlê Beytê ne hema ew bûye ku rasterast an bi wasite ji Pêxember (s) hatî girtin, belkî ew bi awayekî ji zanîna ne 'edetî jî behremend bûne. Ku bi awayê «ilham» û «tehdîs»[1] ji wan ra hatiye dayîn. Zanînek wek ya hezretê Xizr (s) û Zulqerneyn (Kafî, c. 1, s. 268) û hezretê Meryemê û dayika hezretê Mûsa (selam lê bin). (binêrin: Kehf / 65 - 98, Alê ‘Imran / 42, Meryem / 17 - 21, Taha / 38, Qeses/ 7) ku carna di Qur’anê de pê te'bîra wehyê jê hatiye xeberdan, elbet mexsed ji wê ne wehya pêxemberîyê ye. Û pê zanînek wiha bûye ku hinek ji imamên pak di 'emrê zarokîyê da gehane meqam û merteba imametê û ji her tiştî xeber hebûn û ne muhtacê ‘elimîna ji yên dî bûn.

Ev mesele ji gelek riwayetan ku ji imamên pak hatiye neql kirin istifade dibê. Lê pêş gotina hinek ji wan emê ewil işare bikîn bal ayetek ya Qur’anê ve ku ji kesekî an ji hinek kesan daxivê ku (Re'd/43)-: «مَن عِندَه عِلمُ الكِتاب» û ewî ji heqqaniyeta Pêxemberê Ekrem ra dikê şahid û didê nasandin. Ayet ev e:

«قُلْ كَفى بِاللّهِ شَهيداً بَيْني وَبَيْنَكُمْ وَ مَنْ عِندَهُ عِلْمُ الْكِتَابِ»

"Bêje: ji şahidiya di navbeyna min û hewe da Xuda û ew kesê zanîna kitêbê heyî bes e». Re'd / 43.

Bê şik ew kesê şahidiya wî di kêleka şahidî ya Xuda da hatiye deynan û bi navê zanayê kitêbê hatiye nasandin, ev zanîna kitêbê ye ku ew kiriye layiqê vê mertebe ya mezin. Di ayetek dî da behsa vî şahidî kiriye, gotiye di pey Pêxemberê Xuda ra ye: Hûd / 17

«أ فَمَن كَانَ عَلَى بَيِّنَةٍ مِّن رَّبِّهِ وَ يَتْلُوهُ شَاهِدٌ مِّنْهُ»

Kelîme ya «minh-u» delalet dikê ser vê yêkê ku ev şahid ji binemala pêxember (s) û Ehlê Beyta wî ye. Gelek riwayet ji rêka

[1] - Binêrin: Usûlê Kafî, Kitab-ul Huccet, s. 264 û 270

Şî'e û Sunniya ve di dest da hene ku ev şahid ‘Elî yê kurê Ebû Talib e (selamên Xudê li wan bin).

Yêk ji wan riwayetan ev e ku Ibnê Mexazlî yê Şafi'î ji 'Ebdullahê 'Eta riwayet kiriye ku got: "rojekî ez li bal imam Baqir (s) bûm ku kurê 'Ebdullahê Selam (yêk ji zanayên ehlê kitab ku di zemanê pêxember (s) da îman anî) wê derê ra derbaz bû, min jê pirsî gelo mexsed ji « وَ مَنْ عِندَهُ عِلْمُ الْكِتَابِ» babê vî ye? Got: "Ne; belkî ‘Elî yê kurê Ebû Talib e (s) ku ayetên (Hûd / 17 û Maide / 55):

«وَ يَتْلُوهُ شَاهِدٌ مِّنْهُ» - «إِنَّمَا وَلِيُّكُمُ اللّهُ وَرَسُولُهُ وَالَّذِينَ آمَنُوا الَّذِينَ يُقِيمُونَ الصَّلاَةَ وَيُؤْتُونَ الزَّكَاةَ وَهُمْ رَاكِعُونَ»

jî derheq wî da hatine".

Her wiha gelek riwayet ji rêka Sunnî û Şî'an ve hatine gêran ku mexsed ji «şahid» di sûretê Hûd da ‘Elî yê kurê Ebû Talib e (Xayet-ul Meram, s. 359) û pê berçav girtina taybetî ya hatî gotin ronahî dibê ku yê ayet behsê dikê ji wî pêve ne kesek dî bûye.

Muhimmî ya hebûna «‘ilm-ul kitab» hingê eşkere dibê ku di qiseta hezretê Suleyman de ku textê Bilqîsê tê hazir kirin, dema em berê xwe didn Qur’anê em dibînin ji wî yê text hazir kirî re wiha dibêjê: Neml / 40

«قَالَ الَّذِي عِندَهُ عِلْمٌ مِّنَ الْكِتَابِ أَنَا آتِيكَ بِهِ قَبْلَ أَن يَرْتَدَّ إِلَيْكَ طَرْفُكَ»

Yanî: "Ewê hinek ji zanîna kitêbê heyî got: «hêj te çavê xwe nenûqandî û pilkê xwe li hev nedayî, ezê textê bilqîsê hazir bikim»".

Ji vê ayetê tê fêhmê ku zanîna hinek ji kitêbê ev esera 'ecêb heye ku textê Bilqîsê ji cihek dûr di bêhnekî de hazir bikê. Û ji vê derê mirov dikarê pê bihesê ku zanîna hemî kitêbê çiqas eserên mezintir hene û ev nukteyeke ku imam Sadiq (s) di hedîsa ku Sedîr ji wî neql kirî da dibêjê:

Sedîr dibêjê: "ez û Ebû Besîr û Yehyayê Bezzaz û Dawûdê kurê Kesîr di civata Imam Sadiq (s) da bûn, û bi kerb û xezeb ve hat rûnişt û kerem kir: "eceb ji xelkê ku guman dikin me ‘ilmê xeybê heye? Halhale ji Xudê pêve kesî ‘ilmê xeybê nîne, û min xwest ez xudama xwe tembîh bikim û ew revî û min nezanî ew li kîjan odê da ye".

Sedîr dibêjê dema imam Sadiq ji civatê rabû da biçê mal, ez û Ebû Besîr û Muyesser gel wî çûyîn û me gotê: em guhrî! Me xeberdana te derheq xidamê da guhlê bû û em we dizanîn hewe zehf ‘ilm û zanîn hene, lêbelê em nabêjîn hewe ‘ilmê xeybê heye.

Ewî hezretî kerem kir: "Ey Sedîr, qey te Qur’an nexwendiye?" Min got belê; kerem kir: te ev ayet xwendiye: Neml / 40

قَالَ الَّذِي عِندَهُ عِلْمٌ مِّنَ الْكِتَابِ أَنَا آتِيكَ بِهِ قَبْلَ أَن يَرْتَدَّ إِلَيْكَ طَرْفُكَ

Min got: belê ez guhrî! Min xwendiye. Kerem kir: "tu zanî evî kesî çiqas ji zanîna kitêbê hebûye?" Min got: tu keremke bêje. Got: "qas dilopekî ji behra berfireh".

Paşê kerem kir: gelo te ev ayet xwendiye:

قُلْ كَفَى بِاللّهِ شَهِيدًا بَيْنِي وَبَيْنَكُمْ وَ مَنْ عِندَهُ عِلْمُ الْكِتَابِ

Min got: belê! Kerem kir: "gelo ewê zanîna kitêbê hemî li balê zanatir e an ewî an ewê hinekî ji kitêbê zanî?" Min got ewê hemî zanîna kitêbê li balê. Vêca işare kir bal singê xwe ve û got: "Sond bi Xudê zanîna hemî kitêbê li bal me ye. Sond bi Xudê zanîna hemî kitêbê li bal me ye" (Kafî, c. 1, s. 257, çapa Dar-ul Kitab).

Hinek dî ji riwayetên derheq zanîna Ehlê Beytê de

Imam Riza (selamên Xudê li ser bin) di hedîsek dirêj behsa imametê da kerem kir: "dema Xudê Te'ala kesekî ji (imametiya) xelkê ra dibijêrê, singfirehîyê didîyê û çavkanîyên hikmetê ser dilê wî da dirêjê û zanînê jêre ilham dikê da ku ji cewabdana çi

pirsyarekî nekar nebê û di nas kirina heqîyê de şaş û heyirî nemînê, vêca ew parastî û li ber tewfîq û arîkarî û şidandina Xuda ye; ji xeletî û şimtînan di emanê da ye, Xuda eva xesletan didîyê da ku delîl bê li ser 'evdan û şahid bê li ser mexlûqan û evahe dana xudayî ye ku heçî kesê ew bixazê didîyê".

Vêca kerem kir: "Gelo, xelk dikarin evî mirovê wiha (nas bikin û) bibijêrin?! Û gelo bijartina wan ev sifet têda hene?!" (Kafî, c. 1, s. 198 - 203).

Ji Hesenê kurê Yehya yê Medainî neql bûye ku dibêjê min ji imam Sadiq pirsî: dema pirsyarek ji imam tê kirin çewa (pê çi zanînê) cewab didê? Kerem kir: "carna jêra ilham dibê û carna ji melaiket dibihîzê û carna her du (Bihar, c. 26, s. 58).

Û di riwayetek dî da imam Sadiq (s) kerem kir: "ew imamê ku nezanê çi bela wê serda bê û karê wî wê bigehê kûderê, ew nabê hucceta Xudê li ser 'evdên Wî". (Kafî, c. 1, s. 258).

Her wiha çend riwayet ji wî hezretî neql bûne ku kerem kiriye: kengê imam bixazê tiştekî bizanê, Xuda yê Te'ala pê didê zanîn (Kafî, c. 1, s. 258).

Her wiha di gelek riwayeta da dîsa ji imam Sadiq riwayet bûne ku kerem kir: "rûh, mexlûqeke mezintir ji Cibraîl û Mîkaîl ku digel pêxemberê Xuda bû (s) û piştî wî digel imama ye (s) û ewan li ser karê wan dişidênê". (Kafî, c. 1, s. 273).

PIRSYARÊN DERSA 39

Pê kîjan ayetan ‘ismeta imam sabit dibê?

Kîjan riwayet delalet dikin ser ‘ismeta imam?

‘ilmê taybetê imam ji çi rêka ve ye?

Di zemanê borî de kî ji van ‘ilman behremend bûye?

Kîjan ayet delalet dikê ser ‘ilmê imam? Behsa delaleta wê bikin.

Muhimmî ya ‘ilm-ul kitabê beyan bikin.

Çend riwayetan derheq zanînên imama da bêjin û binivîsin.

DERSA 40

HEZRETÊ MEHDÎ

Dagirê:

Pêşgotin

Hukmeta ilahî ya cihanî

Soz û we'da Xuda

Nimûneyek ji riwayetan

Veşartî bûn û sirra wê

Pêşekî

Di dersên borî de me hinek hedîsên dagirê navên imamên pak anîn, lê vê derheqê da gelek riwayetên dî jî hene, di hineka da tenê behsa êjmara wan hatiye; di hineka da hatiye ku hemî ji Qureyş in; di hineka de hatiye ku neh kes ji wan ji zarokên imam Huseyn in (s); û di hinek riwayetên ehlê sunnet da û di riwayetên mutewatirên Şî'a da jî navê yêkyêkê wan hatiye (binêrin kitêba Muntexeb-ul Eser, s 10 - 140) her wiha bi rêka Şî'an ve derheq imameta her yêk ji wan da riwayet hene ku li vê derê heta mecala neqla nimûnên hedîsa jî vê derheqê da tunehin (binêrin kitêbên hedîsî wek Bihar-ul Enwar, Xayet-ul Meram, Isbat-ul Hudat û ...).

Ji ber vê yêkê emê di axirîn dersa vê pişkê da behsa imamê duwazdê hezretê Mehdî (s) bikîn û ji kurt vebirînê re tenê emê derheq muhimtirîn nukteyan da baxivîn.

Hukmeta ilahî ya cihanî

Me zanî ku hedefa eslî ji rêkirina pêxemberan ew bûye ku şert û mercên li xwe zêdekirin û ruşd û tekamula mirov bi awayê azad û agahane bi rêka wehyê ve werin cî û her wiha hinek hedefên dî jî wek arîkariya 'eqlanî û terbiyeta yên qabiliyet heyîn ji nezer rûhî û me'newî ve. Her yêk ji pêxemberan li ber bûne ku komelek baş li ser binyatên Xudê perêsîyê ava bikin û berfireh kirina ‘edaletê li seraserê cihanê da daxaza wan bûye, û her yêkî gorekî karîna xwe vê derheqê da xebtiye û hinek ji wan karîne di sînor û hudûdek coxrafiyayî da û di zemanek taybet da hukûmeta ilahî ava bikin û çêkin, lê ji çi yêk ji wan ra çênbebûye ku hukûmetek cihanî deynin.

Elbet pêk nehatina şert û mercan ji vê yêkê ra ne nîşanê kêmasiya di bername û mudîriyeta wan da ye û her wiha ne bi wê me’nê ye ku hedefa ji rêkirana pêxemberan nehatiye cî û muheqeq nebûye; çimko wek çewa hatî gotin hedef, pêk hatina şert û merca ye ji bona seyr û hereketa ixtiyarî ya mirovan «da piştî pêxemberan kesî delîl li ser Xudê tunebê»[1] ne ku mecbûr kirina xelkê ji qebûl kirina dînê heq ra û her wiha mecbûr kirina wan ji peyrewiya rehberên ilahî ra. Û ev hedef pêk hatiye.

Lê di vî halî da jî Xuda yê Te'ala di kitêbên Xwe yên 'esmanî da we'da pêk hatina hukûmeta ilahî li seraserê cihanê da daye, ku mirov di karê ewê pêşgoyîyek hesab bikê ji bona vebûna rêkê ji qebûl kirina dînê heq ra di nav komek mezin û berfireh ji komela insanî da. Ku pê biheve girtina ji mirovên hêjayî û gelek komên berketî û pê arîkariya xeybî 'erqelên li ser rêka hukûmeta cihanî rabê û 'edalet di nav vî xelkê ji zulmê westayî da belav bibê ku mirov dikarê evê hukûmetê hedefa paşîn ji rêkana

[1] - Nisa / 165 = «لِئَلاَّ يَكُونَ لِلنَّاس عَلَى اللهِ حُجَّةٌ بَعْدَ الرُّسُل»

Pêxemberê Xatem (s) û dînê wî yê cihanî û daimî bizanê, çimko derheq wî da kerem kiriye: « لِيُظْهِرَهُ عَلَى الدِّينِ كُلِّهِ - **da ewî ser hemî dîna bêxê»**.[1]

Pê berçav girtina vê yêkê ku imamet temamkerê pêxemberîyê ye û pêk hatina pişka hikmeta xatemiyetê ye, mirov dikarê evê netîcê bigirê ku ev hedef bi rêka axirîn imam ve wê pêk bê. Û ev hema ew gotin e ku di riwayetên zehfî û mutewatir da hatiye gotin. Li vêderê emê ewil çend ayta bînin ku behsê ji vê hukûmetê dikê û di pey ra jî emê hinek riwayetên girêdayî bi vê behsê ve bînîn.

We'da Xudê

Xudê di Qur'anê da dibêjê:

« وَلَقَدْ كَتَبْنَا فِي الزَّبُورِ مِن بَعْدِ الذِّكْرِ أَنَّ الْأَرْضَ يَرِثُهَا عِبَادِيَ الصَّالِحُونَ»

"Me di Tewrat û Zebûrê da nivîsiye ku mîratberên 'erdê mirovên qenc in» û di sûretê E'raf, ayeta 128 da wek vê gotinê ji hezretê Mûsa (selamên Xudê lê bin) neql bûye. Û bê şik we'da Xudê heqq e û wê bê cî.

Li ciyek dî da işare dikê bo çêroka Fir'ewn ku xelk jar kiribûn û kerem dikê:

«وَنُرِيدُ أَن نَّمُنَّ عَلَى الَّذِينَ اسْتُضْعِفُوا فِي الْأَرْضِ وَنَجْعَلَهُمْ أَئِمَّةً وَنَجْعَلَهُمُ الْوَارِثِينَ»

"Em dixazin başiyek zehfî digel jar bûyan bikin û ewa bikin serok û mîratberê 'erdê» (Qeses / 5). Herçend ayet derheq jarên benî Israîl da ye ku wê bigehin qudretê, lê kelîme ya «nurîd» işare dikê bal dewam û istimrara vê we'dê ve û ji ber vê gelek riwayetan ev ayet tetbîq dane ser rabûna imam Mehdî

[1] - Binêre: sûretê Tewbe / 33, Feth / 28, Sef / 9. Her wiha binêre: Kitêba Bihar-ul Enwar, c. 51, s. 50, E. 22 û S 60, E. 58, 59.

(selamên Xudê lê bin). (Bihar, c. 51, s. 54, c. 35, s. 63 - 64).

وَعَدَ اللَّهُ الَّذِينَ آمَنُوا مِنكُمْ وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ لَيَسْتَخْلِفَنَّهُم فِي الْأَرْضِ كَمَا اسْتَخْلَفَ الَّذِينَ مِن قَبْلِهِمْ وَلَيُمَكِّنَنَّ لَهُمْ دِينَهُمُ الَّذِي ارْتَضَى لَهُمْ وَلَيُبَدِّلَنَّهُم مِّن بَعْدِ خَوْفِهِمْ أَمْنًا يَعْبُدُونَنِي لَا يُشْرِكُونَ بِي شَيْئًا وَمَن كَفَرَ بَعْدَ ذَٰلِكَ فَأُولَٰئِكَ هُمُ الْفَاسِقُونَ

"Ew kesên ji hewe îman anîn û karên qenc kirîn wê bigehin xilafet û cîgiriya 'erdê û di nav êmnahîyê da wê 'ibadet û bendetiya Xuda bikin» (Nûr / 55). Û di riwayeta da hatiye nimûna kamila vê we'dê di zemanê hezretê Mehdî da ye (selamên Xudê lê bin). (Bihar, c 51, s 58, c 50, s 54, c 34, 64).

Her wiha riwayetên dî jî hene ku çend ayetên dî jî[1] tetbîq didin gel zemanê wî hezretî ku ji ber dirêj nebûnê em ewa nayinin. (binêrin: Bihar, c. 51, s. 44, 64).

Nimûneyek ji riwayetan

Riwayetên ku Şî'e û Sunniyan ji pêxember derheq hezretê Mehdî da gêrayîn û neql kirîn ser heddê tewaturê ra ye, hema tenê riwayetên ku Sunniyan neql kirîn ser gotina hinek ji 'alimên wan di heddê tewaturê da ne! [2] Hinek ji wan baweriya bi hezretê Mehdî (s) ittifaqî zanîne di nav hemî bir û fireqên musilmana da[3] û hinek ji zanayên Ehlê Sunnet derheq wî û nîşanên eşkere bûna wî da kitêb nivîsîne. [4]

Hinek riwayetên Ehlê Sunnet vê derheqê de

Çend riwayet ji pêxember gêrane ku kerem kiriye: "Eger 'emr û

---

[1] - (wek: ويكون الدين كله لله- لِيُظْهِرَهُ عَلَى الدِّينِ كُلِّهِ - بقية الله خير لكم)

[2] - Binêrin: Sewa'iq Ibn-i Hecer: s. 99. Nûr-ul Ebsar Şeblencî: s. 155, Is'af-ur Raxibîn, s. 140, Futûhat-i Islamiye, c. 2, s. 211.

[3] - Binêrin: Şerhê Ibn-I Eb-il Hedîd ya Nehc-ul Belaxe, c. 2, s. 535, Sebaik-uz Zeheb Suweydî, s. 78, Xayet-ul Meram, c. 5, s. 362.

[4] - Wek kitêba «El Beyan Fî Exbar Sahib Zeman», nivîsîna Hafiz Muhemmed Bin Yusuf Gencî Şafi'î ku li sed sala 7 da dijiya, û kitêba «El Burhan Fî 'Elamat Mehdî Axir Zeman», nivîsîna Mutteqî yê Hindî ku li Qerna 10 da dijiya.

temenê dinyayê ji rojekî pêve nemabê, wê Xudê ewê rojê ewqas dirêj bikê heta kesek ji Ehlê Beyta min û hevnavê min bigehê hukûmetê (hukmetekî çêkê û 'erdê tejî 'edalet bikê çewa ku pêşda tejî zulm û sitem bûbê) [1].

Ji hezretê Ummê Selemê riwayet kirine ku: pêxember gotiye: "Mehdî ji binemala min e û ji zarokên Fatimayê ye"[2].

Ibnê 'Ebbas: Pêxember kerem kir: "'Elî imamê ummetê ye pişti min, û Qaimê Mutezer [Mehdî] ji zarokên wî ye û dema derkevê wê 'erdê tejî 'edalet bikê çewa ku tejî zulm bûyî. (Yenabî'ul Meweddet, s. 294).

Veşartin û sirra wê

Ji taybetîyên imamê duwazdê ku di riwayetên Ehlê Beytê da jê hatiye xeberdan xeybet û veşartin û xef bûna hezretê Mehdî ye.

Ji wan riwayetan yêk jî ji 'Ebd-ul'Ezîmê Hesenî ye ku ji imam Muhemmed Teqî (selamên Xudê li ser bin) û ew ji babê xwe û ji Mîrê bawerdaran neql dikê ku kerem kir: «Qaimê me veşartinek dirêj jêre heye, heçweku ez dibînim di zemanê veşartî bûna wî da Şî'e wek heywanê birsî ku li pey çêrîngehê ye, lê digerin; lê ewî peyda nakin. Heyhê! Herkes ji wan ku di dînê xwe da cîgir bimînê û ji ber veşartî bûna dirêja imamê xwe dilreq nebê di roja qiyametê da wê digel min û di merteba min da bê". Paşê kerem kir: "Dema Qaimê me radibê bey'et ji kesî li ser wî nîne (qet çi hakimekî li ser wî desthelat nîne) û ji ber vê yêkê xef ji dayikê dibê û ji ber çavên xelkê tê veşartin. (Muntexeb-ul Eser, s. 255).

Ji Imam Seccad (selam li ser bin) ji babê wî, ji mîrê bawerdaran

[1] - Binêrin: Sehîha Tirmizî, c. 2, s. 4,6. Sehîha Ebû Dawûd, c. 2, s. 207, Mesned Ibn-i Henbel, c. 1, s. 387, Yenabî'ul Mewedde, s. 186, 258, 440, 448.
[2] - Binêrin: Is'af-ur Raxibîn, s. 134, gêrana ji Sehiha Muslim û Ebû Dawûd û Nisayî û Ibn-i Mace û Beyheqî.

riwayet bûye ku: "Qaimê me du veşartin jêre hene, yêk ji ya dî dirêjtir e, û tenê ewê yeqîna wan qewî û nasîn û zanîna wan durust li ser imameta wî sabit dimînin." (Muntexeb-ul Eser, s. 251). Ji bona kifş bûna sirra veşartî bûnê lazim e em di ser boriya imaman da çavekî bixişikînin:

Çewa ku em zanin piştî Resûlê Xudê (s) pitirê xelkê digel Ebûbekr û paşê 'Umer û paşê 'Usman bey'et kirin û di dûmahîka xilafeta wî da ji ber hinek seragirtinên ne di cî da ku kir, sehabe di beraberê wî da rabûn û ew kuştin û digel Mîrê bawerdara bey'et kirin.

Ew hezret ji alîyê Pêxember ve (s) ji xelîfetîyê ra hatibû danîn û di zemanê xilafeta sê xelîfan da ji ber mesleheta komela nûgehştî ya Islamê xeber neda û bêdeng bû û xêncî ji itmama huccetê ra çi gotin negotin, lê di wî halî da jî heçî karî di feyda Islam û musilmana da bû xwe jê neda paş. Û dewrana hukûmeta wî ku ji çend salekî pêve nebû pê şerê digel eshabê Cemel û Mu'awiye û Xewarican xilas kir û paşî ra jî bi destê yêk ji Xewarican şehîd bû.

Imam Hesenê Mucteba jî bi destûra Mu'awiye hat jehrî dan, û piştî mirina Mu'awiye, kurê wî Yezîd ku hay ji zahir û rûmetê Islamê jî nedima hukûmet û padişahiya Emewî bi dest xwe girt, mesele bi vî awayî pêşda çû heta êdî nav û nîşanek ji Islamê nema. Ji ber vê yêkê Imam Huseyn (s) çareyek ji rabûnê pêve nedît û pê şehadeta xwe qederekî hişyarî ji musilmana re çêkir û Islametî ji jinav çûnê xilas kir, lê şert û merc ji çêkirina hukûmeta Islamî ra pêk nehatin û ji ber vê yêkê imamên dî ji qewî kirina esasên dîn û bawerîyê û belav kirina zanînên dînî û exlaq ra xebitîn û di heddekî da jî ku rêk hebûya xelk di beraberê zulm û zorgoyîyê da radikiran û ew ji pêk hatina hukûmeta ilahî ya cihanî ra hêvîdar dikiran û welhasil yêk pey

yêkî ra hatin şehîd kirin.

Û imamên pak di muddetê dused û pêncî salan karîn pê ragirtina zehmetiyan û muşkilatên sext û dijwar heqîqetên Islamê ji xelkê ra bêjin; çi bi şiklê giştî ji xelkê ra û çi jî bi şiklê taybet û xas ji nêzîkên xwe ra û bi vî awayî zanînên dînî û şerî'eta Muhemmedî (s) bi şiklên muxtelif di nav komelê da belav bû. Û ji aliyekî ve jî di goşe û kenarê memleketê Islamî da kom û hereket û bizav rabûn û çêbûn û heta bi qederekî pêşî li zulm û sitemkaran hat girtin.

Lê her dem hakimên serserî ji we'da rabûna hezretê Mehdî ditirsiyan û ji wê çendê dibizdiyan ku rabê û hukûmeta wan têk bidê, ji ber vê yêkê hakimên zemanê imam Hesenê 'Eskerî da gelek dijwar çavdêrî li ser kirin ku eger Xudê zarokekî bidîyê ewî bikujin, lê irade ya Xuda li ser wê sekinî bû ku hezretê Mehdî bê dinyayê û ji komela beşerî ra bê zexîre kirin. Û ji ber vê yêkê bû ku heta pênc salîyê jî di zemanê saxiya babê xwe da ji mirovên pir nêzîk û taybet pêve kesî ew ziyaret nedikira û piştî wefata babê wî peywenda imam Mehdî bi rêka çar kesan ve **('Usmanê kurê Se'îd, Muhemmedê kurê 'Usman û kurê Se'îd, Huseynê kurê Rûh û 'Elî yê kurê Muhemmedê Semurî)** ku yêk pê yêkî re wekîlê wî yê taybet bûn digel xelkê dewam kir. Û ji wê pêve ji zemanek neme'lûm ra «veşariya mezin» destpê kir û wê dewam bikê heta roja ku cami'e ya beşerî hazir bibê ji hukûmeta ilahî ya cihanî ra û hingê wê bi emr û fermana Xuda derkevê.

Nixwe sirra eslî ya veşariya wî hezretî ev e ku ji zerer gehandina zalim û sitemkaran bê parastin û di hinek riwayetan da işare hatî kirin bal hinek hikmetên dî ve jî ku yêk ji wan imtihan û ceribandina mirova ye, kanê piştî temam bûna delîlê wê çiqas xwe ragirin û bimînin.

Elbet di zemanê veşarîyê da ji xelk bi temamî ji wî bê behr nînin û gorekî di hedîsan da hatî wek roja li piş 'ewran da ye (Bihar, c.

52, s. 92) û xelk ji ronahiya wî behremend in, çewa ku gelek mirov herçend bi awayê nenas ewî ziyaret dikin û ji rakirina nexweşîyên xwe yên maddî û me'newî ra feydê jê dibînin û hema sax bûna wî hezretî sebebek girîng û muhimm e ji dilgermî û hêvîdariya xelkê ra ku xwe durust bikin û hêviya hatina wî bin.

PIRSYARÊN DERSA 40

Hedefa paşîn ji rêkirina pêxemberan çi ye?

Ev hedef çewa pêk tên?

Kîjan ayet mizgîniya hukûmeta ilahî ya cihanî didin?

Hinek riwayetên ehlê sunnet derheq veşariya imam Mehdî da binivîsin.

Behsa veşariya kurt û dirêj û ferqa wan bikin.

Sirra veşarîyê bêjin.

Di zemanê veşarîyê da xelk bi çi awayî ji wî hezretî behremend dibin?

PIŞKA SISÊ

AXIRET NASÎ

DERSA 41

MUHIMMÎ YA XILASEK NASÎYÊ

Dagirê:

Pêşekî

Muhimmî ya baweriya bi zivirînê; roja qiyametê

Muhimmî ya meselê di Qur'anê da

Desthat

Pêşekî

Di destpêka kitêbê da me derheq muhimmî ya lêkolîna dîn û binyatên wê da (tewhîd, nubuwwet, me'ad) axift û ronahî kir ku jiyana insankî di girewa çare dîtina durust e ji va mesla ra.

Di pişka yêkê da (dersên 1-20) ji meselên Xudê nasîyê û di pişka duwê da (dersên 21-40) ji rêk û rêk nasî yê (pêxemberî û pêşkariya dînî) hat xeberdan û niha jî emê derheq muhimtirîn meselên qiyametê da li bin serdêra «xilasek nasîyê» da baxivîn.

Cara yêkê emê behsa taybetî ya vî eslê bawerîyê bikîn û bêjîn kanê çi eser heye li ser jiyana ferdî û komî; paşê emê bêjin ku hebûna bîr û hizra durust derheq me'adê da girêdayî ye bi wê çendê ve ku rûhek nemehsûs û herdaim heyî hebê. Çewa ku heyînnasî bêy baweriya bi Xuda yê Tek, naqis e û kêmasî têda heye bi wî awayî mirovnasî jî bêy baweriya bi rûhê her hebê, ne temam e di pey ra jî vêca emê meselên binyatîyên qiyametê bavêjîn ber lêkolînê û jê baxivîn.

Muhimmî ya baweriya bi qiyametê

Hedefa xebata ji jiyanê ra ew e ku mirov xwest û muhtacî û armancên xwe bi dest ve bênê û bigehê bextewerî û kemala temam. Û çewaniya kar û kiryaran û çewaniya rêk xistina wan girêdayî bi wan hedef û armanca ve ye ku di dinyayê da xebat ji wan ra tê kirin. Nixwe nasîna hedefa paşîn di jiyanê da berpirsyarî ya binyatî heye di kar û kiryara da.

Di heqîqet da sebebê 'eslî di rêçka xebata jiyanê da çewaniya nêrîn û dîtin û nasîna mirov e derheq heqîqet û kemal û bexteweriya xwe da. Kesê ku xwe komekî ji 'unsurên maddî hesab bikê û jiyana xwe vebirîyê di çend rojên jiyana vê dinyayê da bizanê û lezzet û bextewerî û kemalê di jiyanekî xêncî di jiyana vê dinyayê da nebînê, wê bi awayek wereng rabê û rûnê û me'emiletê digel xelkê bikê ku hewcehî û viyanên wî yên vê dinyayê pêk werin.

Lê kesê ku heqîqeta hebûna xwe seratir ji maddiyata dibînê û mirinê xilaseka viyanê hesab nakê û ewê destpêka cî guhaztinê ji vê dinyayê bo dinyaya dî dizanê û rabûn rûniştin û xebatên xwe yên baş wesîleyek hesab dikê bo gehana kemal û bextewerîyê, evêhe wê bername û piroje ya xwe ya jiyanê wereng darêjê ku ji jiyana wî ya her û her ra pir feydetir bê û pitir feydê bigehênîyê. Jiyana dinyayê ewî bêhêvî nakê û paşde nadê ji xebat û pêk anîna mesuliyetê û bi dest ve anîna bextewerî û kemala her û her.

Esera va herdu mirovnasiyan ne tenê di jiyana ferdî da ye, belkî di jiyana komkî û me'emileta duberekî ya mirova di beraberê hev da jî tesîrek zehfî heye. Û baweriya bi jiyana axiretî û xelat û celatê ebedî pir tesîr heye li ser hay jê mana heq huqûqê yên dî her wiha qencî kirin û fedakarî derheq muhtacan da . Û di komel û ictimaékî da ku ev fikr û bîr û bawer sax bê û di halêda bê ji pêk anîn û bi cî anîna qanûnan ra bi awayek durust û dûrê

ji zulmê, kêmtir mirov muhtacê şidandinê û dijwarîyê dibê. Bê şik eger ev bawerî di cihanê da belav bibê û cî bigirê, muşkilat û nexweşîyê nav milleta da jî wê pir kêmtir bibin.

Heta niha kifş bû ku mesela qiyametê û vejenîn û lêkolîna wê derheqê da çiqas muhim û berketî û hêjayî ye û heta baweriya tewhîdê bi tenêkî (bêy baweriya bi qiyametê) nikarê esera temam û bêkêmasî deynê ser jiyana baş û xweşdivê da. Li vêderê ye ku remz û raza muhim girtina edyanên 'esmanî û nexasma dînê hêjayî yê Islamê kifş dibê ku ev esasê bawerîyê ev qas muhim zanîne û pêxemberên Xudê ewqas xebitîne ku baweriya bi qiyametê di dilê xelkê da cî bikin û her daim qahîmtir bikin.

Baweriya bi jiyana axiretê hingê dikarê eserê danê ser reftar û rabûn rûniştin û me'emileta mirovan; çi ferd û çi kom, ku mirov bi awayekî bizanê girêdan heye di navbeyna xebat û kiryarên vê dinyayê û bextewerî û bixtireşiya di wê dinyayê da. Kêmê kêm gereke evqas bê qebûl kirin ku xweşî û 'ezabê axiretê ji ber kiryarên baş û nebaşê vê dinyayê ve ne.

Lê eger wereng bê fikr kirin ku mirov dikarê bexteweri ya axiretê li wê derê bi dest xwe ve bînê [çewa ku mirov xweşî yên dinyayê di vê dinyayê da dest xwe têxê] hingê baweriya bi roja qiyametê wê eserê nedeynê ser kar û kiryarê mirova li vê dinyayê da; çimko gorekî vê bîr û hizrê wê bê gotin ku: ji dest ve anîna bextewerî û xweşî yên vê dinyayê di dinyayê da gereke xebat bê kirin û ji gehana bexteweriya axiretê ra jî gereke paş mirinê û di axiretê da bixebitin!

Vê gorekê xêncî sabit kirina roja qiyametê gereke girêdana di navbeyna va herdu cihana da jî sabit bibê; herwiha girêdana navbeyna kiryarên ixtiyarî yên mirov û bextewerî an bextreşî ya her û her da sabit bibê.

Muhimmî ya qiyametê di Qur'ana pîroz de

Zêdetirê ji sê-yêka ayetên Qur'anê derheq jiyana ebedî da ye. Komek ji ayetan behsa lazim bûna baweriya bi axiretê dikê (wek: Beqere/4, Luqman/4, Neml/3 û...). Birek dî ji ayeta behsa peyhatên inkara qiyametê dikin (Isra/10, Furqan/11,Muminûn/ 74 û ...). Bira sisê ji xweşî yên daimî (Rehman/46-78, Waqi'e/15-38, Dehr/11-31 û ...) û bira çarê ji 'ezabê her û her (Haqqe / 20 - 27, Mulk / 6 - 11 , Waqi'e / 42 - 56 û ...) daxivin. Di hinek ayeta da ji girêdana di navbeyna kiryarên qenc û xirab û desthatên wan yên axiretê behs hatiye kirin. Herwiha bi gelek awaya ji qiyametê hatiye axiftin ku gereke hebê û cewaba şubhe yên inkarkeran hatiye dayîn werwiha serkaniya xwehrî û xirabkariyan inkara qiyametê û roja hesabê hatiye zanîn (Sad/26 , Secde / 140).

Dema mirov hinekî li ayetên Qur'anê da hûr dibê mirov pê dihesê ku qismek zehfî ji got û bêja pêxemberên Xuda digel xelkê behsa qiyametê bûye, heta bi vê jî mirov dikarê bêjê ku xebata wan ji selimandin û sabit kirina vî eslî ra pitir bûye ji sabit kirina eslê tewhîd û yêkatiya Xuda ra. Çimko pirê xelkê ji qebûl nekirina vî eslî ra xwe badidan û dijwartir bûn.

Mirov dikarê dijwariya wan di beraberê vî eslî da li du sebeba da jê baxivê: **Yêk** hema ew sebebê ku di qebûl nekirina hemî tiştên xef û veşartî da heye. **Yê du** wê sebebê taybetê inkara me'adê yanî meyla bal bêqeyd û bendî û bêmesuliyetîyê ve. Çimko wek çewa hat gotin baweriya bi qiyametê û roja hesabê ji qebûl kirina mesuliyetê û hudûd kirina kiryaran û xwe paşda dana ji zulm û xirabî û gunehan ra sebebek eslî û esasî ye û pê inkara wê, rêk ji bayê dil û şehwet û xwest û viyanê ra vedibê.

Qur'ana pîroz behsa evî sebebî dikê û wiha dibêjê:

«أَيَحْسَبُ الْإِنسَانُ أَلَّن نَّجْمَعَ عِظَامَهُ * بَلَى قَادِرِينَ عَلَى أَن نُّسَوِّيَ بَنَانَهُ* بَلْ يُرِيدُ الْإِنسَانُ لِيَفْجُرَ أَمَامَهُ»

"Gelo mirov we guman dikin ku em hestî yên wî (pişt ji hev belav bûnê) kom nakîn? Belê, em kara ne ji durust kirina sertilî yên wî ra. Belkî mirov dixazê pêşiya xwe vekê [bê qeyd û bend bê]" Qiyamet / 3 – 5.

Hema ev rûhê qebûlneker e ku di wa kesa da heye, ewên pê gotar û nivîsînên xwe kelîme ya qiyametê û gotinên dî yên Qur'anê derheq qiyamet û me'adê da me'na wan biguhêzin ser qewimînên vê dinyayê û qiyameta milletan, an mefhûmên bi qiyametê ve girêdayî bi alîyê mefhûmên i'tbarî û ustûreyî ve bikêşin (Neml/68,Ehqaf/17).

Qur'ana pîroz ev mirovên he «şeytanên ins» û «dijminên pêxemberan» zanîne ku pê xeberdanên xwe yên xemilandî rêberê dilan e û xelkê ji îman û bawerî yên durust û peyketina hukmên Xudê paşda didin:

«وَكَذَلِكَ جَعَلْنَا لِكُلِّ نَبِيٍّ عَدُوًّا شَيَاطِينَ الإِنسِ وَالْجِنِّ يُوحِي بَعْضُهُمْ إِلَى بَعْضٍ زُخْرُفَ الْقَوْلِ غُرُورًا وَلَوْ شَاء رَبُّكَ مَا فَعَلُوهُ فَذَرْهُمْ وَمَا يَفْتَرُونَ* وَلِتَصْغَى إِلَيْهِ أَفْئِدَةُ الَّذِينَ لاَ يُؤْمِنُونَ بِالآخِرَةِ وَلِيَرْضَوْهُ وَلِيَقْتَرِفُوا مَا هُم مُّقْتَرِفُونَ»

"Û bi vî awayî me ji her pêxemberekî ra dijminek ji şeytanên ins û cin danîn, ku ji xapandina xelkê ra xeberdanên xemilandî digehênin hevdu. Û eger Xuda yê te bixwesta (bi zorî bûya jî wê pêşî li wan bigirta û) ewa ew kar nedikiran (lê Xudê xelk azad hêlane ji bijartina rêka baş an xirab re) vêca nixwe ewa berde û wa ve bihêle. Û da dilê wa yên bawerî bi axirtê neyîn bi alîyê xeberdanên wan ve biçê û pê razî bibin û derewa wan ji xwe re bigirin» En'am / 112 – 113.

Netîce ya gotarê

Ji bona ku mirov bikarê di jiyanê da rêkekî ji xwe re bibijêrê ku bigehê bexteweriya heqîqî û kemala wî ya nihayî, gereke fikr bikê ku: gelo jiyana mirov pê mirinê digehê xilasekê, an piştî mirinê jiyanek dî ji wî ra heye? Û gelo guhaztina cihê wî ji vê dinyayê bo wê dinyayê wek çûna ji bajarekî bo bajarek dî ye ku dikarê wesîle û xirt û pirtê jiyanê li wê derê jî bi dest ve bênê, an jiyana vê dinyayê pêşekî û zemîne yên xweş û nexweş yên çûna axiretê ye û gereke li vê cihanê da karek bê kirin û desthata kar li wê derê bê dîtin? Û heta ev mesele neyê çareser kirin û hel nebê, nabê dora nas kirina rêkê û bijartinê û darijandina piroje û bernama jiyanê. Çimko heta mexseda seyr û seferê kifş nebê mirov nikarê rêka gehana wê derê kifş û me'lûm bikê.

Di axirîkê da gereke em vê jî bêjin ku: hebûna jiyanekî bi vî awayî herçend kêm û ze'êf bê jî, bes e ji wî qasî ra ku mirovê hişyar û 'eqlimend derheq wê da rakê û pey lêkolîn û vejenînê bêxê. Çimko «qasê muhtemel» bê xilasek e.

PIRSYARÊN DERSA 41

Ferqa bawerî û nebaweriya bi me'adê ji xebat û kiryaran ra bi çi awayî ye?

Baweriya bi qiyametê çewa dikarê eserek baş danê ser jiyanê.

Muhim zanîna Qur'anê derheq baweriya qiyametê bêjin.

Sebebê qebûl nekirina me'adê çi ye û çima xelk vê derheqê da xwe dişidînin?

Ji nimûne yên xebata dilnexweşa ji guherandina baweriya me'adê ra baxivin.

Lazimî ya lêkolîna derheq me'adê da şîrove bikin û bêjin kanê çima seratir e ji lêkolîna derheq meselên dinyayî da?

DERSA 42

BIHEVE GIRÊDAYÎ BÛNA MESELA QIYAMETÊ Û MESELA RÛH

Dagirê :

Milaka wehdetê di mewcûdê sax û xwey jiyan da

Cihê rûh di wucûda mirov da

Milaka wehdetê di mewcûdê xwey jiyan da

Bedena mirovan jî wek hemî heywanên dî ji komekî sillûl pêk hatiye ku her yêk ji wan daima di halê guherîn û jinav çûn û çêbûnê da ye û êjmara wan ji ewwilê çêbûnê ve heta xilaseka jiyana wan guherîn têda çênabê û êjmara sillûlên wê sabit û wek hev e.

Pê berçav girtina evê guherîn û texyîra ku di bedena heywana nexasma insan de çêdibê, ev pirsyar tê pêş ku: pê çi milak û kêşek û pîvekê gereke evê guherîn dikevitê, em yêk tişt û yêk mewcûd hesab bikîn? Halhale çêdibê ku qet û piç û endamên wê di dirêjiya jiyanê da gelek caran guherîn ketibîyê? [1]

---

[1] - Pêş vê pirsyarê de cihê pirsyarek dî jî heye ku: milaka wehdeta komkên sabit û girtî çi ye ? . . . lê ji dirêj nebûnê ra me ev pirsyar li vêderê neanî . binêrin “Amûzişê Felsefe” c. 1 , Ders / 29.

Cewaba bê çep û çûra vê pirsyarê ev e ku pîveka ... hev zeman û nehev zeman e. Herçend hinek sillûl kêm kêm dimirin û sillûlên nû cihê wan digirin, lê bi melheza biheve bûna evê cereyan û herikînê, mirov dikarê evê kom û mecmû'ê ku di halê guherîn û cî guhaztinê da ye yêk tişt hesab bikê.

Lê ev, ne cewabeke ku mirov pê razî bibê, çimko eger xaniyek bê melheze kirin ku ji hinek kelpîç pêk hatiye û kelpîçên wê kêm kêm tên guherîn heta ku pişti wext û demekî kelpîçên pêşîyê de nemînin, mirov nikarê eva kelpîçên nû hema ewî xanîyê pêşda hesab bikê, herçend bi melheza şiklê eşkere çêdibê bê gotin ev hema ew e. Nexasma ewên bi guherîna kelpîçên wê nehesayîn.

Cewaba derbaz buyî yê çêdibê bi vî awayî bê kamil kirin: ev guherîna piçû piçû hingê zererê nagehînin wehdeta evê mecmû'ê ku li ser esasê sebebek navdeyî û tebî'î pêk hatibê, çewa ku di xwey jiyana da tê melheze kirin. Lê guherîna kelpîçan bi wesîla kartêkerek ji derveyî pêk tê û ji ber vê yêkê mirov nikarê nisbeta wehdeta heqîqî bidê balê ve; digel vê guherîna piç û qetan.

Ev cewab, li ser qebûl kirina kartêkerê tebî'î yê wahid ava bûye ku di dirêjiya herkîna guherîna de daima bimînê û tertîb û yêk girtina di nav qet û endaman da xwey bikê. Vêca pirsyar derheq evî ‘amilê kartêker da tê pêş, ku heqîqeta wê çewan e? Û milaka wehdeta wê çi ye?

Gorekî hizra felsefî ya me'rûf, milaka wehtetê di her tiştek tebî'î da «emrê besît» e ku xeyrê murekkeb û nemehsûs e, bi navê «tebî'et» an «sûret»[1]. Evênhe pê guherîna maddê nayin guherîn.

[1] - Eva du kelîma me'nên dî jî hene. Lê li vêderê mexsed sûretê new'î ye.

Di xwey jiyanan da ku kiryarên muxtelif wek xwarin xwarin û li xwe zêde kirin û tewlîd û zarok anîn di wan da heye, ev kartêker bi navê «nefs» hatiye nav kirin.

Felasfê yên pêşîn, nefsa nebatî û heywanî «maddî» û nefsa insanî «mucerred» zanîne. Lêbelê gelek ji feylesofên Islamî ku Sedr-ul Mutiellihînê Şîrazî jî di nav wan da ye nefsa heywanî jî xweyê derceyekê ji tecerrudê hesab kirine û têgehiştin (şu'ûr) û irade ji lewazim û nîşanên wê zanîne. Lêbelê matiriyalîst ku wucûdê di maddê û taybetî yên wê tenê da zanin û rûhê mucerred inkar dikin û maddîyûnên nû (wek pûzîtîwîstan) ku ji binî ve munkirê hemî tiştên nepeyda ne (nemehsûs) û tişta nepeyda qebûl nakin, ewan cewabek durust bo milaka wehdetê di xwey jiyana de nîne.

Gorekî ronahî kirina jorî milaka wehdetê di nebata de nefsa wan ya nebatî ye. Jiyana nebatî di girewa hebûna sûret û nefsa nebatî da ye, di wa cihên xwey qabiliyet da, dema qabiliyeta mewadda jinav biçê sûret an nefsa nebatî jî jinav diçê. Û eger bê ferz kirin ku ew mewadd ji nû ve qabiliyeta peyda kirina sûretê nebatî peyda bikin û nefsa nebatî ya nû ji wan ra bê dayîn, lêbelê du giyayên kevn û nû digel şebaheta temam jî nikarin wehdeta heqîqî hebin û pê hûr nêrînê mirov nikarê bêjê ev nebat û giyayê nû hema ewa pêşda ye.

Lêbelê derheq heywan û insan de, çimko nefsa wan mucerred e, dikarê piştî ji hev belav bûna bedenê jî her bimînê û dema dîsa bikevê di bedenê da evê wehdet **«ewînî»**yê ji wî ra biparêzê. Çewa pêş mirinê da jî hema ev wehdeta rûh milak û pîveka şexs e û guherîna mewaddên bedenê nabê sebeb ku ew, çend kes bê hesab kirin.

Lêbelê eger hebûn û wucûda heywan an insan hema bi vê bedena wî ya dixweyhê û taybetî yên wî yên eşkere bizanê û rûh

jî yêk ji xewassên bedenê bêjmêrê û hesab bikê, heta eger ewê sûret nepeyda yê maddî bizanê ku pê jinav çûna qetên bedenê jinav biçê, ew nikarê bibê xweyê melhezeyek durust derheq qiyametê da. Çimko li ser vê ferzê ku beden qabiliyeta jiyanek nû peyda bikê hinek xasiyetên nû di wî da peyda dibin û êdî milak û pîveka heqîqî ji wehdetê ra ku bê gotin: «ev ew e» namînê. Çimko ferz ew e ku xasiyetên pêşda bi temamî jinav çûne û hinek xasiyetên taze û nû têda çêbûne.

Welhasil: hingê mirov dikarê jiyana piştî mirinê bi awayek durust bidê fikra xwe ku mirov rûh xêncî ji bedenê û xasiyet û e'razên wê bizanê. Heta çênabê mirov wereng hesab bikê ku rûh ewqas tevlî bedenê bûye ku pê jinav çûna bedenê ew jî jinav biçê. Nixwe gereke cara ewil hebûna rûh bê qebûl kirin, her wiha rûh tiştek cewherî bê zanîn, ne ji qismê e'razîn bedenê. Xêncî ji vê jî gereke ji rûh re ew qabiliyet bê zanîn ku musteqill e û dikarê piştî jinav çûna bedenê her bimînê, ne wek sûretên tevlî tişta dibin ku pê jinav çûna wan jinav diçin (ku istilahê da jêre tê gotin: muntebiq di maddê da).

Cî yê rûh di wucûda insan da

Tiştek dî ku gereke li vêderê jê bê xeberdan ev e ku terkîb û hevgirtina rûh û bedenê di mirov de ne wek terkîba avê ye ji oksîjin û îdrojinê ku pê cuda bûna wan ji hev, du 'unwan û serdêrek jinav biçê (ku êdî jêra neyê gotin: av. Belkî bibê tiştek dî). Belkî rûh 'unsur û pêkînerê eslî yê mirov e û heta ku ew heye insaniyeta insan û kesayetî ya kes parastî ye. Hema ji ber vê ye ku guherîna sillûlên bedenê zererê nagehênê wehdet û yêkînî ya mirov. Çimko pîveka yêk bûn û wehdeta heqîqî di mirov da hema yêk bûn û wehdeta rûhê wî ye.

Qur'ana pîroz işare dikê bal vê heqîqetê ve. Di cewaba inkarkerên me'adê de ku digotan: wê çewa mirov piştî ji hev

belav bûnê dîsa ji nû ve qetên bedena wî sax bibin? Kerem dikê:

قُلْ يَتَوَفَّاكُم مَّلَكُ الْمَوْتِ الَّذِي وُكِّلَ بِكُمْ ثُمَّ إِلَى رَبِّكُمْ تُرْجَعُونَ

"Bêje (hûn jinav naçin belkî) melekê mirinê wê hewe bigirê..." Secde/ 11

PIRSYARÊN DERSA 42

Gelo hevgirtina qetên mutexeyirên mecmû'eyekî dikarin bibin pîveka wehdeta wê? Çima?

Mirov dikarê çi milakek dî ji wehdeta terkîbatên organîk ra nîşan bidê?

Bîr û hizra meşhûra felsefî derheq wehdeta mewcûdên murekkeb de nexasma ewên sax û xwey jiyan binivîsin.

Navbeyna « sûretê tebî'î » û nefsê da çi ferq heye?

Nefsa nebatî digel nefsa heywanî û insanî çi fereq heye? Û evê ferqê di behsa me'adê da çi eserek heye?

Fikra durust derheq me'adê da muhtacê çi esl û esasa ye?

Terkîba mirov ji rûh û bedenê çi ferq heye digel terkîbên şîmiyayî?

DERSA 43

TECERRUDA RÛH

Dagirê :

Pêşekî

Delîlên 'eqlî yên tecerruda rûh

Şahidên Qur'anî

Pêşekî

Me zanî ku mesela me'adê bi mesela rûh ve girêdayî ye. Yanî hingê mirov dikarê bêjê: «mirovê ku piştî mirinê sax dibê hema ewê pêşîyê da ye» ku rûhê wî piştî jinav çûna bedena wî dimînê. Bi gotinek dî: herkes xêncî ji bedena xwe ya maddî cewherek ne maddî ku qabil e ji bedenê cuda bibê jêra heye. Eger ne wiha bê ferza saxiya dubare ji wî mirovî ra nabê ferzek ber 'eql .

Nixwe pêşiya wî qasî da ku em ji me'ad û sabit kirina wê baxivîn gereke evahe bê sabit kirin. Ji ber vê yêkê emê di vê dersê de hema ji vê meselê baxivîn û ji sabit kirina wê ra emê bi du rêka ve biçîn: rêka 'eqlê û rêka wehyê[1].

Delîlên 'eqlî yên tecerruda rûh

Ji kevinde feylesof û zanayan derheq rûh da ku di istilaha felsefî

[1]- Çêdibê hinek delîla ji rêka wehyê ve bo sabit kirina me'adê dûr bizanin. Lêbelê pê piçekî kûr fikirînê wê pê biheshê ku delîla bi rêka wehyê ve ji bona sabit kirina me'adî delîlek durust e.

da jêre «nefs» tê gotin xeberdane û jê axiftine[1] nexasma hukemayên Islamî gelek ji vê meselê xem xwarine û di kitêbên xwe de hinek vebir ji vê meselê ra veqetandine xêncî ji wê jî nivîsok û kitêbên serbixwe jî vê derheqê da nivîsîne û bîr û hizr û gumana ku: “rûh 'erezeke ji e'razên bedenê; an sûretê maddî yê (muntebiq di madde ya bedenê de) ye” avêtine ber lêkolînê û jê xeberdane û pê delîlên zehfî nedurustî ya wê dane ber çavan.

Gelek ronahî ye ku behsa berfireh derheq meseleyek wiha da ne munasibê vê kitêbê ye. Ji ber vê yêkê emê bi kurtî jê baxivîn û emê bixebitîn ku xeberdanek ronahî û di wî halî da jî cîgirtî vê derheqê da bêjîn. Ev awayê me destpê kirî dagirê çend delîlên 'eqlî ne ku emê pê vê pêşekî yê destpê bikîn :

Em reng, çerm û şiklê bedena xwe bi çavan dibînîn û zivrî û hilotî ya endamên wê pê hissa lamise pê dihesin û ji navdeyê bedena xwe tenê bi rêka nerasterast ve em dikarîn jê xeberdar bibîn. Lê tirs û hezkirin û kerb û irade û fikra xwe bêy wî qasî em muhtacê endamên hissî bin em pê dihesin û herwiha em agah in ji hebûna vê «min - ez»ê ku xweyê va xasiyeta ye, bêy wî qasî ku em endamên xwe yên hissî bikar bênîn.

Nixwe bi awayek giştî, mirov xweyê du awayên têgehan û idrakê ye: yêk ew idraka ku muhtacê endamên hissî ye, awayek dî jî ya ne muhtacê wê.

Nukteyek dî ev e ku: em dibînin idarkên hissî bi gelek awaya xelet dibin, çêdibê xeletî bikevê awayê ewil yê idrakê ku ji idrakê ra muhtacê endamên hissî ye, bervajîyê awayê duwê yê idrakê ku qet xeletî û nedurustî û şik têda çênabê. Mesela: çêdibê kesek bikevê şikê ku gelo hema rastî rengê çermê bedena wî hema

[1] - Istilaha felsefî ya « Nefs » xêncî wê ye, ya ku di 'ilmê exlaq de jê tê xeberdan ku di beraberê 'eql da bikar tê birin.

wereng e ka çewa dibînê an ne, lêbelê qet çênabê ku kesek bikevê şik û şubhê ka gelo fikrek ya wî heye an ne; gelo qirarek li ser tiştekî daye an ne; gelo kanê şik heye an ne!

Ev hema ew gotin e ku di felsefê da bi vî awayî tê gotin: «'ilmê huzûrî, rasterast bi waq'iyetê bixwe ve digirhê, ji ber vê yêkê xeletî têda çênabê. Lêbelê 'ilmê husûlî çimko bi rêka navcîtî ya sûretê idrakî tê dest, di eslê xwe da çêdibê şik û terdîd têda hebê». (Amûzişê felsefê, c. 1, dersa 13).

Yanî yeqînîtirîn zanîn û agahî yên mirov, zanînên huzûrî ne û ew şuhûd in ku dagirê zanînên nefsê û ihsasat û 'ewatif û haletên dî yên rewanî ne. Nixwe hebûna «min»a ku fêhm bikê û pê dihesê û fikr dikê û biryarê didê, qet şik û dudilî têda nîne; çewa şik di hebûna tirs û hez kirin û kerb û fikr û iradê da nîne.

Niha pirsyar ev e ku: gelo ev «min - ez» hema ew bedena maddî ya mehsûs e û ev haletên rewanî jî ji e'razên bedenê ne, an wucûda wan tişteke xêncî ji wucûda bedenê, herçend «min -ez» girêdan û peywendek nêzîk digel bedenê heye û gelek ji karên xwe bi rêka bedenê ve pêk tênê û hem eserê lê dikê û hem eserê jê dibê?

Pê li ber çav girtina ya hatî gotin cewaba vê pirsyarê bi rihetî tê dest. Çimko: ji aliyekî ve «min» bi 'ilmê huzûrî tê dest, lê beden bi arîkariya endamên hissî tê nas kirin, nixwe: min, ku hema nefs û rûh e tişteke xêncî ji bedenê.

Ji alîyê duwê ve, «min - ez» mewcûdeke ku bi dirêjiya dehan salan pê wesfê wehdet û kesayetiyek heqîqî dimînê û em pê 'ilmê huzûrî ku xeletî têda çênabê bi vê wehdet û kesatîyê dihesin. Halhale qet û piçên bedenê gelek caran tên guherîn û qet çi milaka heqîqî ji wehdeta vê yêk bûna piçên wê yên pêşî û paşîyê ra tunehin.

Sê, «min - ez» hebûnek besît e ku ji hev venabê, mesela mirov nikarê ewê bikê du nîv «min»; halhale qet û endamên bedenê gelek in û çêdibê ji hev vebin.

Çar, çi yêk ji haletên rewanî wek ihsas û irade û ... xasiyetê eslî yê tiştên maddî wek dirêjî û ji hev vebûnê di wan da tune û tiştên bi vî awayê ne maddî, mirov nikarê ji barkirîyên maddê (beden) hesab bikê. Nixwe cihê van e'razên cewherî, ne maddî (mucerred) ye. (binêre: Amûzişê felsefe, c. 2, dersa 44 û 49).

Yêk ji delîlên dilrihetker vê derheqê da ku rûh musteqill e û piştî mirinê dimînê, xewnên rast û durust in ku hineka piştî mirinê tiştên rast û durust ji yê xewn dîtî ra gotine, her wiha keramatên welî yên Xudê û heta hinek ji karên murtaza jî dikarin sabit bikin ku rûh mucerred e. Xeberdan vê derheqê da dirêj e û muhtacê kitêbek serbixwe ye.

Şahidên Qur'anî

Hebûna rûhê insanî di nezera Qur'anê da bê şubhe ye, rûhek ku ji ber hêjan û şerafeta wê nisbeta wê hatiye dayîn bal Xudê ve (Kafî/ c. 1, s. 134) çewa ku Qur'an derheq çewaniya xuliqandina mirov da dibêjê: Secde / 9

"Û ji rûhê Xwe yê taybetê Wî pif kirê" «وَنَفَخَ فِيهِ مِن رُّوحِهِ»

Ne ku haşa tiştek ji zatê Xudê vebê û bigehê insan, belkî yanî ew rûhê taybet ku nisbeta wê tê dayîn bal Xudê ve.

Derheq afirandina hezretê Adem selam lê bin da dibêjê:

«و نفخت فيه من روحى– Min ji rûhê Xwe pif kirê».(Hicr/29,Sad/72).

Her wiha ji ayetên dî tê fêhmê ku rûh tişteke xêncî ji beden û pêvegirêdanên wê û dikarê bêy beden bimînê û hebê. Ji va ayeta ye Secde / 10 – 11.

Ji devê kafira neql dikê ku:

« وَقَالُوا أَئِذَا ضَلَلْنَا فِي الْأَرْضِ أَئِنَّا لَفِي خَلْقٍ جَدِيدٍ بَلْ هُم بِلِقَاءِ رَبِّهِمْ كَافِرُونَ » - Ma dema em di 'erdê da wunda bûn (mirîn) ma gelo ji nû ve emê bên çêkirin?».

Ayeta pêretir wiha cewab didê:

« قُلْ يَتَوَفَّاكُم مَّلَكُ الْمَوْتِ الَّذِي وُكِّلَ بِكُمْ ثُمَّ إِلَى رَبِّكُمْ تُرْجَعُونَ » - bêje (hûn wunda nabin belkî) melekê mewtê ku li ser hewe hatiye deynan wê hewe bigirê û di pey ra hûnê bi alîyê Wî ve bên zivirandin».

Nixwe milak û pîveka huwîyet û kesayetî ya mirov hema rûhê wî ye ku melaîketê memûrê can girtinê ewî rûhî distênê û tê parastin, ne ku qetên bedenê ji hev dikevin û di 'erdê da belav dibin.

Qur'ana pîroz li cihek dî da kerem dikê:

«اللَّهُ يَتَوَفَّى الْأَنفُسَ حِينَ مَوْتِهَا وَالَّتِي لَمْ تَمُتْ فِي مَنَامِهَا فَيُمْسِكُ الَّتِي قَضَى عَلَيْهَا الْمَوْتَ وَيُرْسِلُ الْأُخْرَى إِلَى أَجَلٍ مُسَمًّى إِنَّ فِي ذَٰلِكَ لَآيَاتٍ لِّقَوْمٍ يَتَفَكَّرُونَ»

"Xuda cana (an kesayetiyan) di wextê mirina wan da digirê û her wiha wî yê di xewê da nemirî (ewê ku xew ve çûye û mirina wî negehaye) vêca ewê mirina wî gehayî, dihêlê û yê dî heta demek kifş kirî ber didê". Zumer/42.

Derheq çewaniya mirina zalima da jî wiha dibêjê:

«وَلَوْ تَرَى إِذِ الظَّالِمُونَ فِي غَمَرَاتِ الْمَوْتِ وَالْمَلَآئِكَةُ بَاسِطُوا أَيْدِيهِمْ أَخْرِجُوا أَنفُسَكُمُ ...»

"Dema zalim li ber sekerata mirinê û melaîketa destê xwe vekirine (û dibêjin wan) canên xwe derînin - teslîm bikin ..." En'am / 93.

Ji van ayetan û ayetên dî ku ji ber kurtîyê me neanîn, ronahî dibê ku nefsiyet û kesayetî ya her kesî bi wê ye ewa Xudê û

melekê mewtê û melaîketên memûrê rûh sitandinê ewê digirin. Û jinav çûna bedenê zererê nagehênê man û wehdeta şexsî ya mirov.

Desthat ev e ku: *Yêk:* di mirov da tiştek bi navê rûh heye. *Du:* rûhê mirov qabiliyeta manê û cida bûna wê ji bedenê heye û ne wek e'raz û suwerên maddî ye ku pê jinav çûna wê ew jî ji nav diçin. *Sê:* huwîyet û kesayetî ya herkesî bi rûhê wî ve girêdayî ye. Bi gotinek dî: heqîqeta her kesî hema rûhê wî bi xwe ye; û beden nisbet bi rûh berpirsyariya alet û wesîlan heye.

PIRSYARÊN DERSA 43

Ji ‘ilmê huzûrî û husûlî baxivin û ferqa wan bêjin.

Delîlên 'eqlî yên mucerred bûna rûh şîrove bikin.

Ji tecerruda rûh ra ji çi rêkên dî behre tê girtin?

Ayetên behsa vê meselê dikin jê baxivin.

Desthata van ayetan bêjin.

DERSA 44

SABIT KIRINA ME'ADÊ

Dagirê:

Pêşekî

Burhana hikmetê

Burhana ‘edalet ê

Pêşekî

Çewa di ewwilê vê kitêbê da hatî gotin baweriya bi me'ada roja qiyametê yanî sax bûn û zivirîna herkesî di cihana axiretê da yêk ji eslîtirîn baweriya ye di hemî dînên 'esmanî da.

Pêxemberên Xudê jî gelek li ser vî eslî şidandine û li ser sekinîne û ji qahîm kirin û cî kirina vî eslî ra di dilê xelkê da gelek ketine zehmetê. Û di Qur’anê da jî baweriya bi qiyametê û ‘edaletê hevrê ye digel baweriya bi Xuda yê tek û tenê; û di bîst û çend ayetan da kelîma «Ellah» û « Yewm-ul axir - roja axiretê» gel hev hatine (xêncî ji vê jî gotinên derheq axiret û meselên bi wê ve girêdayî di zêdetirê ji 2000 ayeta da hatine).

Di destpêka vê pişkê da jî me got kanê tehqîq û lêkolîna derheq xilasî nasîyê da çiqas muhim û girîng e. Û me ronahî kir kanê fikra durust derheq me'adê da ava bûye li ser qebûl kirina rûhekî ku milak û pîveka kesayetî û huwîyeta her kesî bê. Û piştî mirina wî her bimînê, heta mirov bikarê bêjê: ewê ji dinyayê

çûyî hema ew bi xwe di 'alema axiretê da sax dibê. Paşê jî ji sabit kirina rûhekî bi vî awayî me delîl ji 'eql û wehyê anîn da 'erd û zemîne rast bibin ji vê çendê ra ku derheq behsa eslî ya jiyana ebedî ya mirov bê xeberdan. Vêca eve dor geha vê yêkê ku em ji vî eslê giring û muhim yê bawerîyê baxivîn.

Wek çewa mesela rûh bi du rêkên ('eql û neqlê ve) sabit dibûya, ev mesele jî bi du rêkan ve sabit dibê. Di vê dersê da emê ji du delîlên 'eqlî behs bikîn ku lazimî ya roja qiyametê sabit dikin. Piştî hingê emê ji birek ayetên Qur'anê baxivîn ku derheq hebûn û lazimiya me'adê da ne.

Delîl û burhana hikmetê

Me di pişka xudanasîyê da got ku xuliqandina Xudê ne pûç û bê hedef e, belkî heziya ji xêr û kemalê ku zatê ilahî ye, bi-l isale bi zat ve û bi-t tebe' bi eserên wê ve girhaye ku xweyê hinek mertebe yên xêr û kemalê ne. Ji ber vê yêkê cihan bi awayek wereng xuliqandiye ku zêdetirîn başî û kemala mumkin pêve bê. Û bi vî awayî me sifetê hikmetê sabit kir û desthata wê ev e ku mexlûqan bigehênê xilaseka kemalê ku layiqê wa ye.

Lê vêca çimko cihana maddê mala tezahumata ye û başî û kemala tiştên maddî dikevin li beraberê hev da û pêşîyê li hev digirin teybîra hekîmane ya ilahî li ser wê sekinye ku bi awayekî ewa bêxê rê û tertîb bikê ku pêkve û li ser hev başî û kemalên pitir jê çêbin û bên meydanê; bi gotinek dî: cihan xweyê hevgirtinekî baştir û sipehîtir bê. Û ji ber vê ye ku 'unsur û qas û çewanî ya kar û bar û hereket û bizavan di wê da bi awayek wereng hat danîn ku bû sebebê çêkirina giya û heywanat û afirandin û xuliqandina mirov [ku kamiltirîn mexlûqê cihanê ye] û eger cihana maddê bi awayek wereng çêbûba ku di wê da rêka peyda bûna xwey rûhan ne mumkin bûya evahe wê xilafê hikmetê bûya.

Li vêderê emê ser ya borî ve zêde bikîn ku pê li ber çav girtina vê meselê ku mirov xweyê rûhekî ye ku qabiliyeta mayînê jêra heye û dikarê kemalatên ebedî û herdaimî bi dest xwe ve bênê; ew jî ew kemalên ji nezer biha û qîmet ve gel kemalên maddî nayin qiyas kirin, eger jiyana wî sînor kirî bê di çarçova jiyana vê dinyayê tenê da, hingê digel hikmeta Xudê rêk nakevê. Nexasma dema em dibînin jiyana dinyayê tevlî ye digel zehmetî û nexweşî û dijwarî û tengaviyan. Û xalib ev e ku heta mirov lezzet û xweşiyekî dest ve bênê gelek nexweşî jî di pey da tên û zêdetir ev e ku bêy nexweşî lezzet û xweşî nayin dest, heta bi wê derecê ku ewên hesabker dibêjin: ev hemî zehmet û nexweşî ji bona gehana lezzetên mehdûd û sînor kirî nahêjitê. Û hema ji van hesabkirina ye ku berê hineka dikevê pûçî û bêhûdetîyê. Û heta hineka dikişênê bi alîyê xwekujîyê ve; halhale hez kirina ji jiyanê viyanek fitrî û sirûştî ye.

Rastî eger jiyana mirov ji vê pêve ne tiştek dî bûya ku li pey hev xwe bêxê zehmetê û gîrûgiriftên tebî'î û komelayetî li ser xwe qebûl bikê heta bêhnekî bi keyf û şahî derbaz bikê û lezzet û xweşîyê bibê û vêca ji ber westana zêde xew ve biçê; heta bedena wî hazirê xebata nû bibê û dîsa ji ewil ve dest bavêjê kar û bixebitê; heta luqmeyek nan dest xwe bêxê û bêhnekî ji xwarina wê, xweşîyê bibînê û êdî ne tiştek dî! 'Eql evê teselsula zererî û melal îner baş nizanê û nabêjitê baş e. Mesela jiyanek wiha di baştirîn wez' û halê wê da wek wî ajokî ye ku otomobîla xwe bigehênê benzînxanê; vêca amana xwe ya benzînê tejî bikê, vêca benzîna heyî bimezîxênê û xwe bigehênê benzînxaneyek dî û dîsa ewî karî bikê û berdewam bê li ser vî karê xwe, heta otomobîla wî kevn bibê û ji hev bikevê, an li tiştekî bikevê û biperçiqê.

Kifş e ku desthata mentiqî ya nêrînek wiha li jiyana mirov xêncî ji gehana pûçîyê, ne tiştek dî ye.

Ji alîyê dî ve jî vêca yêk ji xerîze yên eslî yên mirov hez kirina ji man û jinav neçûnê ye; evahe di zatê mirov da hatiye danîn û wek wê hêzê ye ku ewî bi alîyê ebediyetê ve dibê û her car ji paldana wî ra pitir lê dişidênê. Vêca eger were melheze kirin ku serhata evî palderî, xêncî vê ne tiştek dî ye ku li tehtekî bikevê û ji hev belav bibê, gelo çêkirina evê hêza palder munasibê evê xayet û nihayetê ye? Nixwe hebûna evê meyla fitrî hingê munasibê hikmeta Xuda ye ku jiyanek dî hebê, xêncî ji vê jiyana ku jinav diçê û xilasek jêra heye.

Welhasil: dema ev herdu pêşekî di kêleka hev da tên deynan [yanî: hikmeta ilahî û imkana jiyana ebedî ji mirov re tê danîn] em digehin vê desthatê ku gereke jiyanek dî xêncî ji vê jiyana sînorkirî ya dinyayê ji mirov ra hebê heta ku ne bervajîyê hikmeta ilahî bê.

Û mirov dikarê meyla fitrî û hermayînê bikê pêşekiyek dî û deynê rex hikmeta ilahî û bikê delîlek dî ji vê meselê ra.

Ji qasê hatî gotin ev jî ronahî bû ku jiyana ebedî ya mirov gereke bi awayek wereng bê ku zehmetî ya ku di jiyana dinyayê da heyî li wê da nebê. Eger ne, dewama jiyana vê dinyayê eger heta ebed jî mumkin bûya digel hikmeta ilahî rêk naketa.

Delîla ‘edaletê

Di vê dinyayê da mirov ji bijartina karê baş û xirab ra azad e. Ji aliyekî ve hinek tên dîtin ku 'emrê xwe hemîyê di ‘ibadetê Xudê û xizmeta ji xelkê ra diborînin, ji alîyê dî ve jî ew xirabkar tên dîtin ku ji gehana bayê dil û hewayê nefsa xwe ra kirêttirîn zulma û pîstirîn gunehan dikin. Û di eslê xwe da jî hedefa ji çêkirina insan di vê dinyayê da ku heqê bijartin û irade jî jêra hatine dayîn û ketiye ser du riyanê, du riyana heq û batil û başî û xirabîyê da ku bikevê ber imtihanên cûrbicûr û irade û viyan û bijartin bi rêka xwe ya kemalê ve biçê. Da ku bigehê desthata

kar û 'emelê xwe yê ixtiyarî û xêr û cezayê wan dest xwe ve bênê. Û di heqîqet da seraserê jiyana dinyayê ji mirov ra meydana imtihan û mijûl bûna li xwe ye û heta li axirîn bêhnên jiyana xwe da jî evahe jêra diherikê û berdewam e.

Lê em dibînin ku baş û xirab li vê dinyayê da nagehin xêr û cezayê layiqê kiryarên xwe. Heta ku hinek xirabkar ji xweşîyên pitir behremend in. Û ji binî ve jiyana dinyayê nikarê gelek ji xêr û cezayê kiryaran eda bikê. Mesela kesê ku bi hezaran mirovê bê guneh kuştine, ji yêk carê pê ve mirov di dinyayê da nikarê ewî bikujê, vê gorekê cinayetên wî yên dî wê bêceza bimînin. Halhale naveroka 'edaleta ilahî ew e ku heçî kesê çi başî an xirabî kirî netîce û desthata wê bibînê.

Nixwe çewa ku ev dinya cihê ceribandin û pêk anîna wezîfa ye gereke cihanek dî jî hebê ku cihê xêrdan û cezadan û derketina netîce ya karan bê û herkes bigehê wê ya layiqê xwe û 'edaleta Xudê bi temamî pêk bê.

Ji vê xeberdanê ev jî ronahî bû ku cihana axiretê ne cihê bijartin û intixaba rêkê û pêk anîna kar û 'emela ye. Emê di dersên hêjbê da li ser vê meselê pitir xeber bidîn.

PIRSYARÊN DERSA 44

Hikmeta ilahî û peywenda wê digel nizama "ehsen" şîrove bikin.

Burhana hikmetê pê du teqdîran bêjin.

Ji vê delîlê xêncî sabit kirina me'adê çi tiştê dî istifade dibê?

Berfireh ji burhana ‘edaletê baxivin.

Çi nukteyek ji delîla ‘edaletê tê dest?

DERSA 45

RABÛNA QIYAMETÊ GOREKÎ QUR'ANÊ

Dagirê:

Pêşekî

Inkara me'adê bêdelîl e

Tiştên wek me'ad û qiyametê

Şîn bûna giya

Xewa Eshabê Kehf

Sax bûna heywanan

Sax bûna hinek mirovan

Pêşekî

Mirov dikarê ayetên Qur'anê derheq sabit kirina zivirîna li qiyametê û cewabdana munkiran bikê pênc bir û deste:

1- ayetên ku dibêjin çi delîl li ser nebûna me'adê nînin. Ev ayet inkarkeran ji çek dikê.

2- ayetên işare dikin bal qewimînên wek me'adê ve da ku pêşiya bîr û hizra dûr bûna me'adê bigirin.

3- ayetên şubhên inkarkerên me'adê xelet dertênê û imkana wê sabit dikê.

4- ayetên ku hatina me'adê we'da ilahî hesab dikê û me'adê di heqîqet da pê gotina du xeberê sadiq sabit dikê.

5- ayetên işare dikin bal burhan û delîla 'eqlî ve li ser lazimî ya me'adê.

Di heqîqet da sê deste yên ewil berê wan li imkana me'adê ye û du deste yên paşî jî berê wan li lazimî ya hebûna me'adê ye.

Inkara me'adê bêdelîl e

Yêk ji awayên delîl anîna Qur'anê digel xweyên bawerîyên nedurust ew e ku delîlê ji wan dixazê da ronahî bibê 'eqîde û baweriya wan binyata 'eqlî û mentiqî jêre tunehin, çewa ku di çend ayeta da hatiye: **« هاتوا برهانكم - delîla xwe bînin»**. (Beqere / 111; Enbiya / 24, Neml / 64).

Û di hinek cihên dî da kerem dikê xweyên bawerîyên nedurust, zanîn û baweriyek rêk ketî digel durustîyê tunehin û baweriya wan ne paldayîyê ser delîl û burhanê ye û bi gumana bê delîl û muxalifê durustîyê 'emel dikin [1].

Derheq munkirên me'adê da jî kerem dikê:

«وَقَالُوا مَا هِيَ إِلَّا حَيَاتُنَا الدُّنْيَا نَمُوتُ وَنَحْيَا وَمَا يُهْلِكُنَا إِلَّا الدَّهْرُ وَمَا لَهُم بِذَٰلِكَ مِنْ عِلْمٍ إِنْ هُمْ إِلَّا يَظُنُّونَ»

"[Kafiran] Gotin: xêncî jiyana vê dinyayê jiyanek nîne ku em dimirin û dijîn, xêncî ji zeman tiştek dî me jinav nabê (halhale) ewa zanîn vê derheqê da nîne û hema guman dikin». Casiye / 24.

Di ayetên dî da li ser vê çendê şidandiye ku inkara me'adê ji gumana bê delîl û nedurust pêve ne tiştek dî ye. [2]

Elbet çêdibê gumanên bê delîl dema digel bayê dil rêk ketî bin

[1] - Istilaha felsefî ya « Nefs » xêncî wê ye ye ku di 'ilmê exlaq de jê tê xeberdan ku di beraberê 'eqil da bikar tê birin.
[2] - Qeses / 39, Kehf / 36. Sad / 27.Casiye /32. Inşiqaq /14.

bibê cihê baweriya hewaperêsan (Qiyamet / 5) û ji ber kiryarên munasibê wan û kirina gunehan kêm kêm ji wan ra bibê baweriyek temam (Rûm/ 10, Muteffifîn/10-14) heta bi wê derecê ku mirov xwe li ser wê bawerîyê bişidênê (Nehl/38).

Qur'ana pîroz gotinên inkarkerên me'adê gêraye ku xalib evê dibêjin: çewa wê zivirîna dubare hebê, evahe tiştek dûr e! Carna jî işare dikin bal hinek şubhên ze'êf ve ku serkaniya wan dîsa dûr zanîna wan ya hatina qiyametê ye. [1] Ji ber vê yêkê ji aliyekî ve behsa wa tişta dikê ku wek qiyamet û me'adê ne, da ku şubhe rabê[2] û ji alîyê dî ve cewaba şubhan didê da ku qet çi şubhe nemînin û imkana hatina me'adê bi temamî sabit bibê. Lêbelê bi vî qasî jî bes nakê û xêncî ji yeqînî bûna evê we'da ilahî bi rêka wehyê ve delîla 'eqlî li ser lazim bûna me'adê işaret dikê û emê di dersên hêjbê da behsê jê bikîn.

Qewimînên wek me'adê

1- şîn bûna giya: sax bûna mirov piştî mirinê ji wî alî ve ku saxiya piştî mirinê ye; wek şîn bûna giya ye di 'erdê da, ku piştî hişk bûn û mirinê şîn dibê û derdikevê. Û ji ber vê ye ku fikirîna di vê meselê da ku illeh li ber çavê herkesî diqewimê bes e ji wê yêkê ra ku pê bihesê çêdibê ku mirov piştî mirinê sax bibê. Tişta bûyî sebeb ku gelek muhim neyê zanîn ew e ku ev şîn bûn her û her li ber çavê herkesî diqewimê û çêdibê; eger ne, qet ferq nakê gel sax bûna mirov piştî mirinê ku dibêjinê me'ad.

Daim Qur'ana pîroz ji dirandina evê perdê ra berê xelkê didê çewaniya şîn bûna giya û rabûna dubare ya mirovan, di me'adê

[1] - Hûd / 7. Isra / 51. Saffat/ 16 , 53. Ehqaf / 18. Qaf / 3. Waqi'e /47 , 48. Muteffifîn/ 12 - 13. Nazi'at/ 10 - 13

[2] - Tiştên wek hev hukmê herduka di wî qasê wek hevda yêk e. Hukm-ul Emsal Fî Ma Yecûz we Ma La Yecûz Wahid.

da jî dişibihênê wê[1] . Li ciyekî da Qur'an kerem dikê:

«فَانظُرْ إِلَى آثَارِ رَحْمَتِ اللَّهِ كَيْفَ يُحْيِي الْأَرْضَ بَعْدَ مَوْتِهَا إِنَّ ذَٰلِكَ لَمُحْيِي الْمَوْتَى وَهُوَ عَلَى كُلِّ شَيْءٍ قَدِيرٌ»

"Vêca binêre eserên rehmeta Xuda yê xwe ku çewa 'erdê piştî mirina wê sax dikê, hema birastî Ew saxkerê mirîya ye û Ew her tiştî dikarê bikê» Rûm / 50.

2- xewa Eshabê Kehf: Qur'ana pîroz piştî gêrana qiseta Eshabê Kehf ku gelek tiştên hîn kirinê têda hene kerem dikê:

« وَكَذَٰلِكَ أَعْثَرْنَا عَلَيْهِمْ لِيَعْلَمُوا أَنَّ وَعْدَ اللَّهِ حَقٌّ وَأَنَّ السَّاعَةَ لَا رَيْبَ فِيهَا»

"Bi vî awayî me (xelk) bi wan hesandin, da bizanin ku we'da Xuda rast e û muheqeq qiyamet wê bê û şik û şubhe têda nîne» Kehf / 21.

Bê şik agahiya ji vê qewimîna 'ecêb ku komek di dirêjiya çend sed sala de (300 salên şemsî = 309 salên qemerî) di xew da bin û piştî hingê ji xew hişyar bibin, eserekî taybet heye ku berê xelkê bikevê me'adê û dûr bûna wê ji holê rabê. Çimko xew tiştek wek mirinê ye «en-newm-u ex-ul mewt - xew, birayê mirinê ye» û her hişyar bûnek wek sax bûna piştî mirinê ye, lêbelê di xewa me'mûlî da kar û barên jiyankî (bîolojîkî) yên bedenî bi awayek tebî'î dewam dikê û zivirîna rûh, mirov nahêlê 'ecêbmayî; lê bedena ku sêsed salan ji mewaddên xwarinê bê behr bimînê gereke gorekî qanûna ku di tebî'et da heyî bimirê û jinav biçê û êdî haziriya lê zivirîna rûh tunebê. Nixwe çêdibê qewimînek wiha berê mirov bidê 'alemekî xêncî ji vê 'alema tebî'î û fêhm bikê ku her û her newereng e ku zivirîna rûh muhtacê şert û esbabên tebî'î bê. Nixwe sax bûna dubareya mirov herçend rêk nekevê

[1] - E'raf / 57. Hecc/ 5,6. Rûm/ 19. Fatir / 9. Fussilet /19 Zuxruf / 11, Qaf / 11.

digel jiyan û mirina vê 'alemê, imkan jêra heye û çi neweyî têda nîne û gorekî we'da Xuda ku daye: wê pêk bê.

3- sax bûna heywanan: Qur'ana pîroz behsa sax bûna ne gorekî 'edetê ya çend heywanan dikê, yêk ji wan: ew çar firindên ku bi destê hezretê Ibrahîm (s) sax bûyîn (Beqere / 260) her wiha sax bûna merkeba yêk ji pêxemberan ku emê di rûperên hêjbê da behsa wê bikîn. Û eger sax bûna heywanekî çêbê û imkan jêre hebê ji mirova re jî mumkin e.

4- sax bûna hinek mirovan di vê dinyayê da: muhimtir ji wa yên me gotîn, sax bûna hinek mirova ye di vê dinyayê da ku Qur'ana pîroz çend nimûne ji wan dibêjê: yêk ji wan qiseta yêk ji pêxemberên benî israîl e. Di seferek ya xwe da ber hineka ra derbaz bû ku hemî mirîbûn û bedena wan ji hev ketibû û felişî bûn. Ji nişkê da di fikra wî ra derbaz bû ku çewa wê dîsa sax bibin! Xudê Te'ala canê wî girt û piştî û sed salan dîsa sax kir û gotê: "Tu çiqas li vêderê mayî?" Ew heçweku ji xew hişyar bûyî got: "rojekî an hinekî ji rojê!" Jêre hat gotin: "ne, belkî tu sed salan li vêderê mayî! Vêca binêre ku ji aliyekî ve nan û ava te guherîn û xirabî neketîyê û ji alîyê dî ve merkeba te ya suwariyê jinav çûye û ji hev ketiye! Vêca binêre ka çewa emê hestî yên vî heywanî li hev suwar bikîn û dîsa guşt pêve bikîn û ewê sax bikîn" (Beqere / 259). Yêk dî behsa komek ji benî israîl e ku gotin hezretê Mûsa (s): "heta em eşkere Xudê nebînin qet em bawerîyê naynin!" Û Xudê pê birûskekî ew jinav birin û di pey ra bi xwesta hezretê Mûsa (s) dîsa ew sax kirin (Beqere / 55 – 56).

Her wiha sax bûna yêk ji benî israîliyan ku di zemanê hezretê Mûsa (s) da hatibû kuştin. Ew jî pê lêdana hinek ji guştê gulika hatî ser jê kirin, çewa ku di sûretê Beqere da hatî û ji ber wê ye ku sûret bi vî navî hatiye nav kirin. Di paşîka behsê da wiha hatiye: (Beqere 67 – 73).

«كَذَٰلِكَ يُحْيِي اللَّهُ الْمَوْتَىٰ وَيُرِيكُمْ آيَاتِهِ لَعَلَّكُمْ تَعْقِلُونَ»

"Eha, Xudê bi vî awayî mirîya sax dikê û nîşanên Xwe ji hewe ra dixweyhênê; da belkî hûn bidin 'eqlê xwe"

Her wiha sax bûna mirîyan bi destê hezretê ‘Îsa (s) mirov dikarê bikê nîşanek ji imkana me'ada roja qiyametê ra (Alê ‘Imran / 49, Maide / 110).

PIRSYARÊN DERSA 45

Qur’ana pîroz bi çi awayî gel inkarkerên me'adê muqabile dikê?

Şîn bûna giya çewa wek me'adê ye? Vê derheqê da Qur’an çi dibêjê?

Ji qiseta Esahbê Kehf çi tişt derheq me'adê da jê tê fêhmê?

Mesela sax bûna çar firindên hezretê Ibrahîm û girêdana wê bi behsa me'adê ve çi ye?

DERSA 46

CEWABA QUR'ANÊ BO ŞUBHÊN INKARKERAN

Dagirê:
Şubha i'ada me'dûm
Şubha nebûna qabiliyeta bedenê ji saxbûna dubare re
Şubha derheq qudreta fa'il da
Şubha derheq 'ilm û zanîna fa'il da

Ji delîl anînên Qur'ana pîroz di beraberê inkarkerên me'adê da û ji awayê xeberdanê, wereng tê fêhmê ku hinek şik û şubhe di mejîyê wan da hebûne ku me gorekî cewaba hatî dayîn bi vî awayî rêk xistiye:

1- şubha i'ada me'dûm

Pêşî da me got Qur'ana pîroz cewaba wa kesa didê ku digotan: «çewa çêdibê mirov piştî ji hev ketin û belav bûnê dîsa bedena wî sax bibê?» cewabek bi vî mefhûmî didê ku: kesayetî û huwîyeta hewe bi rûhê hewe ye; ne bi beden û endaman ku di 'erdê da belav dibin. [1]

Ji vê got û bêjê mirov dikarê fêhm bikê ku serkaniya inkara kafiran hema ew şubha felsefî ye ku bi navê «mehal bûna i'ada me'dûm» jê tê xeberdan. Yanî wan wereng fikr dikiran ku mirov

[1] - Secde / 11-10 = وَقَالُوا أَئِذَا ضَلَلْنَا فِي الْأَرْضِ أَئِنَّا لَفِي خَلْقٍ جَدِيدٍ بَلْ هُم بِلِقَاءِ رَبِّهِمْ كَافِرُونَ* قُلْ يَتَوَفَّاكُم مَّلَكُ الْمَوْتِ الَّذِي وُكِّلَ بِكُمْ ثُمَّ إِلَى رَبِّكُمْ تُرْجَعُونَ.

hema ev bedena maddî ye ku pê mirinê difelişê û ji hev dikevê û jinav diçê. Û eger dîsa ji nû ve sax bibê wê bibê mirovek dî, çimko zivirandina tişta ku jinav çûyî mehal e û imkana zatî jêre tunehin.

Cewaba vê pirsyarê ku ji Qur'anê tê dest ev e: kesayetiya şexsî ya herkesî bi rûhê wî ve girêdayî ye. Bi gotinek dî: me'ad, ne zivirandina ya jinav çûyî ye (i'ada me'dûm), belkî zivirîna wî rûhî ye ku heye.

2- şubha nebûna qabiliyeta bedenê ji sax bûna dûbare re

Şubha pêşda derheq imkana zatî ya me'adê da bû û ew şubhe ji qismê imkana qewimîna wê da ye. Yanî egerçi gorekî 'eql zivirîna rûh li bedenê ne mehal e û eger were melheze kirin qet tu dijatî têda nayê dîtin, lêbelê pêk hatina wê girêdayî ye bi qabiliyet û kêrhatina bedenê ji vê yêkê re. Û em dibînin ku çêbûna jiyanê girêdayî ye bi esbab û şerayita ve ku kêm kêm çêdibin. Mesela, nutfeyek di rehimekî da cî bibê û şertên munasib ji ruşda wê ra hebê heta ku kêm kêm bibê zarokek temam û bikevê ser şiklê mirov û were dinyayê. Lê bedena jihevketî êdî nikarê jiyana dubare peyda bikê.

Cewaba vê pirsyarê ev e ku: ev sîstima ku di vê 'alemê da tê dîtin, ne sîstimeke ku hema ew tenê hebit û bes, her wiha ye esbab û sebebên ku di vê cihanê da pê tecrubê hatîn nas kirin, nixwe çêdibê hinek esbab û tiştên dî jî hebin. Şahidê wê jî ev e ku hema di vê cihanê bi xwe da jî qewimînên ji 'edetê der qewimîne wek: sax bûna hinek heywan û insanan.

Ev cewab ji qewimînên ji 'edetê der ku di Qur'anê da behs jê hatiye kirin tê dest.

3- şubha derheq qudreta fa'il da

Şubheyek dî li vê derê heye, ew jî ev e ku ji pêk hatina tiştekî ra

xêncî ji imkana zatî û qabiliyeta qabil, qudret û quweta fa'il jî şert e. Û kî gotiye ku Xudê dikarê mirîya sax bikê?!

Ev şubhe ji alîyê wa kesa ve ye ku qudret û quwet û hêza bê binî ya Xudê nas nekirine û pê nizanin.

Cewab ev e ku quwet û hêza Xudê bêhedd û bêsînor e û heçî tişta mumkin-ul wuqu' ji bin karîn û qudreta Xudê ne der e. Çewa ku ev alema he bi v mezinahî ya xwe ve çêkirî.

« أَوَلَمْ يَرَوْا أَنَّ اللَّهَ الَّذِي خَلَقَ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضَ وَلَمْ يَعْيَ بِخَلْقِهِنَّ بِقَادِرٍ عَلَى أَنْ يُحْيِيَ الْمَوْتَى بَلَى إِنَّهُ عَلَى كُلِّ شَيْءٍ قَدِيرٌ»

"Ma pê nehesane, Xuda yê ku 'esman û 'erd xuliqadîn û ji ber xuliqandina wan ji kar neketî, dikarê mir'ya sax bikê? Belê; Ew her karî dikarê bikê» (Ehqaf/33). Û binêrin: Yasîn / 81, Isra / 99, Saffat / 11, Nazi'at / 27.

Xêncî vê jî xuliqandina dubare, ne zehmettir e ji xuliqandina cara yêkê û ne muhtacê hêz û quwetek pir e. Belkî çêdibê bê gotin ku rihettir e< çimko ji zivirîna rûh pêve ne tiştek dî ye.

«فَسَيَقُولُونَ مَن يُعِيدُنَا قُلِ الَّذِي فَطَرَكُمْ أَوَّلَ مَرَّةٍ فَسَيُنْغِضُونَ إِلَيْكَ رُؤُوسَهُمْ»

"Wê bêjin: kî wê me bizivirênê? Bêje ewê cara ewil hûn xuliqandîn. Vêca wê serê xwe bi alîyê te ve bihejînin".[1]

«وَهُوَ الَّذِي يَبْدَأُ الْخَلْقَ ثُمَّ يُعِيدُهُ وَهُوَ أَهْوَنُ عَلَيْهِ وَلَهُ الْمَثَلُ الْأَعْلَى فِي السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضِ وَهُوَ الْعَزِيزُ الْحَكِيمُ»

"Û Ew e yê dest xuliqandinê dikê, di pey ra ewê dizivirênê û ew (zivirandin) jêra rihettir e..." (Rûm / 27).

4- şubheyek derheq zanîna fa'il da

[1] - Secde / 11-10 = وَقَالُوا أَئِذَا ضَلَلْنَا فِي الْأَرْضِ أَئِنَّا لَفِي خَلْقٍ جَدِيدٍ بَلْ هُم بِلِقَاء رَبِّهِمْ كَافِرُونَ* قُلْ يَتَوَفَّاكُم مَّلَكُ الْمَوْتِ الَّذِي وُكِّلَ بِكُمْ ثُمَّ إِلَى رَبِّكُمْ تُرْجَعُونَ.

Şubhe ev e ku eger Xudê mirovan sax bikê û xêr û cezayê wan bidîyê, gereke ji aliyekî ve eva bedena hemiya ku bûne ax û tevhev bûne ji hev veqetênê da her rûhek li bedena xwe bizivirê û ji alîyê dî ve jî gereke hemî karê baş û xirabên wan hemiyan di dirêjiya mîlyon salan de li bîra wî da mabê da gorekî başî û xirabiya wan başî û ceazyê bidê!

Cewab: Ev şubhe jî ji nezanîn û pê nehesana zanîna Xudê serkanî girtiye û cewab ev e ku ‘ilm û zanîna Xudê bi hedd û sînor e û her tişt li bin zanîna Xuda da ye û ‘ilmê Wî dora her tiştî girtiye û qet Xudê tiştekî jibîr nakê:

Fir’ewn got hezretê Mûsa (s): "eger Xudê me hemiya sax bikê û bikişênê ber mehkemê, halê wa mirovên pêşda mirîn û jinav çûyîn wê çi bê: « فما بال القرون الأولى ». Cewaba xwe wiha ji hezretê Mûsa girt: «‘ilm-uha 'inde Rebbî .. علمها عند ربی لا یضل ربی و لا ینسی zanîna hemiyan li bal Xuda yê min e, Xuda yê min, ne li rê wunda dibê û ne jî jibîr dikê» Taha / 52-51. binêrin: Qaf / 4 - 2.

Û di ayeta 79 ya sûretê Yasîn da cewaba du şubhên jorî wiha hatiye dayîn: “(Ey pêxember!) Bêje wê Ew kes miriya sax bikê Ewê ewil ew çêkirîn. Û Ew zana ye bi her mexlûqekî”.

PIRSYARÊN DERSA 46

Şubha mehal bûna i'ada me'dûm û cewaba wê bêjin.

Şubha qabil nebûna bedenê ji saxiya dûbare ra û cewaba wê bêjin.

Şubha derheq qudreta fa’il da bêjin û cewaba wê bidin.

Şubha zanîna fa’il û cewaba wê çi ye?

DERSA 47

WE'DA XUDÊ DERHEQ QIYAMETÊ DA

Dagirê:

Pêşekî

We'da muheqeq ya Xudê

Işare bal delîlên 'eqlî ve

Pêşekî

Qur'ana pîroz ji aliyekî ve bi navê gotin û peyam û kelamê ku ji alîyê Xudê ve hatiye derheq qiyamet û me'adê da dibêjê muheqeq qiyamet wê werê û şik û şubhe tê da tune û we'da Xuda heq û hetmî ye û xilaf têda tuneye. Û bi vî awayî delîlê li ser mirov temam dikê. Ji alîyê dî ve jî vêca işare dikê bal delîlên 'eqlî ve ku gereke zivirîna roja qiyametê hebê, da ku meyla xelkê ji wêderê ra zêdetir bikê û ji wan ra bibê delîla li ser delîlê. Nixwe Qur'ana pîroz ji sabit kirina me'adê ra bi du awaya ne û dibin du qism, emê jî bi wî awayî jê xeber bidîn û ji her qismekî ra hinek ayetan bênîn.

We'da muheqeq ya Xuda

Qur'ana pîroz rabûna qiyametê û sax bûna hemî mirovan di axiretê da karek yeqînî û bê şik û şubhe zaniye:
إِنَّ السَّاعَةَ لَآتِيَةٌ لَّا رَيْبَ فِيهَا وَلَكِنَّ أَكْثَرَ النَّاسِ لَا يُؤْمِنُونَ (Xafir/ 59. Û Alê 'Imran / 25, 9; Nisa / 87, En'am / 12, Kehf/21, Hecc/7, Şûra / 7, Casiye / 26 û 32).

Û we'da rast û durust û bêy xalaftin zaniye: [1]

وَأَقْسَمُوا بِاللّهِ جَهْدَ أَيْمَانِهِمْ لاَ يَبْعَثُ اللّهُ مَن يَمُوتُ بَلَى وَعْدًا عَلَيْهِ حَقًّا وَلَـكِنَّ أَكْثَرَ النَّاسِ لاَ يَعْلَمُونَ

Gelek caran ji pêk hatina wê ra sond xwariye:

قُلْ بَلَى وَرَبِّي لَتُبْعَثُنَّ ثُمَّ لَتُنَبَّؤُنَّ بِمَا عَمِلْتُمْ وَذَلِكَ عَلَى اللَّهِ يَسِيرٌ» – "bêje: belê, sond bi Xuda yê min ku hûnê bên rakirin û xeberê wê ya hewe kirî wê ji hewe ra bê dayîn û ew ji Xudê ra rihet û hêsan e"[2].

Û ji muhimtirîn berpirsyariya pêxemberan ew e ku nisbet bi qiyametê xelkê hişyar bikin: Xafir /15.

«يُلْقِي الرُّوحَ مِنْ أَمْرِهِ عَلَى مَن يَشَاء مِنْ عِبَادِهِ لِيُنذِرَ يَوْمَ التَّلَاقِ»

Vê derheqê da binêrin: En'am/130, 154, Re'd / 2, Şûra / 7, Zuxruf / 61, Zumer / 71.

Û ji inkarkerên wê ra bextreşî ya ebedî û 'ezabê cehnemê daniye: Furqan / 11. Û binêrin: Isra / 10, Sebe' /8, Mu'minûn / 74.

Nixwe kesê durustiya vê kitêba esmanî yanî Qur'anê qebûl kiribê qet çi behane û hêcet ji inkara me'adê ra jêra namînin û di pişka pêşîyê da me ronahî kir heqaniyeta Qur'anê ji her mirovê heqîqet xaz û xwey insaf ra çêdibê derkevê meydanê, ji ber vê yêkê kesî li beraberê qebûl nekirina wê da çi 'uzr û hêcet nînin xêncî ewê kêmasî di 'eql û fêhma wî da hebê an ji ber sebebek dî nekarî bi heqiya wê bihesê.

Işare bo delîlên 'eqlî

[1]- Nehl / 38. û binêrin: Alê 'Imran - 9, 191, Nisa 122, Yûnus / 4, 55, Kehf / 21, Enbiya / 103, Furqan 16, Luqman 9, 33, Fatir 5, Zumer 20, Necm 47, Casiye 32, Ehqaf / 17.

[2] - Texabun / 7. û binêrin: Yûnus / 53, Sebe' / 3.

Gelek ji ayetên Qur'ana pîroz bi awayekî ne ku nîşan didin hebûna qiyametê ji wan tişta ye ku 'eql ewê lazim zanê heçweku işare bê bal burhana hikmet û ‘edaletê ve (ku di dersa 44 da jê hat xeberdan). Yêk ji wan ev e ku bi awayê pirsyar û istifhama inkarî kerem dikê: «أَفَحَسِبْتُمْ أَنَّمَا خَلَقْنَاكُمْ عَبَثًا وَأَنَّكُمْ إِلَيْنَا لَا تُرْجَعُونَ - ma gelo hewe guman kiriye me hûn jixwede çêkirine û hûn qet bi alîyê me ve nayin zivirandin?». Mu'minûn / 115.

Ev ayet gelek ronahî dibêjê: eger me'ad û zivirîna bal Xuda yê Te'ala ve nebê, xuliqandin û afirandina mirov pûç û bêhûde ye, lê Xuda yê şehreza yê hekîm karê pûç û bêhûde jê çênabin, nixwe wê cihanek dî jî çêkiribê ku xelk bal Wî ve bên zivirandin.

Ev burhan, qiyasek istisnaî ye û pêşekî ya wê ya ewil ku qeziye ya şertiye delalet dikê ser vê yêkê ku: hingê xuliqandin û afirandina insan di vê cihanê da hedef û armanca hekîmane jêra heye ku di pey jiyana vê dinyayê da bi alîyê Xudê ve biçê û cihana axiretê da bigehê desthata kiryarên xwe. Ev mulazimeya di navbeyna va herduka da heyî di behsa burhana hikmetê da (dersa 44) derbaz bû û li vêderê nelazimê dubare kirinê ye.

Lê vêca pêşekî ya duwê (Xuda karê pûç û bêhûde nakê) hema mesela hikmeta ilahî û bêhûde nebûna karên Wî ye ku di pişka Xudê nasîyê da hat sabit kirin. Derheq delîla hikmetê da jî axiftin hat kirin. Vê gorekê ev ayet hema dibê gotinek wek delîla hatî gotin.

Li vêderê em ser ve zêde bikîn ku: pê vê nêrînê ku xuliqandina insan hedefa paşî bê ji xuliqandina cihanê ra, hingê eger jiyana mirov di vê cihanê da bêhûde û bê armancek hekîmane bê xuliqandina cihanê jî dibê bêhûde û pûç dibê. Evê meselê mirov

dikarê ji ayetan fêhm bikê ku hebûna axiretê ji ber afirandina hekîmane ya cihanê hesab dikê. Mesela di wesfê 'eqilmendan da (ul-ul elbab) wiha dibêjê:

«وَ يَتَفَكَّرُونَ فِي خَلْقِ السَّمَاوَاتِ وَالأَرْضِ رَبَّنَا مَا خَلَقْتَ هَذَا بَاطِلاً سُبْحَانَكَ فَقِنَا عَذَابَ النَّارِ»

"Û derheq afirandina 'esmana û 'erdê da difikirin (û dibêjin:) ey Xuda, Te ev jixwede çênekiriye, tu pak û dûr î (ji kirina karê pûç û bêhûde) vêca me ji 'ezabê agir paşda bide" Alê ʻImran / 191.

Ji vê ayetê istifade dibê ku fikr kirina derheq çêkirina 'esmana û 'erdê da mirov bi hikmet û şehrezatiya Xuda dihesênê. Yanî Xuda yê şehreza ji çêkirina vê cihanê hedefek hekîmane hebûye û ew pûç û bêçine çênekiriye; û eger cihanek dî tunebê ku hedefa paşîn ya xuliqandinê bê, wê xuliqandina Xudê bêhûde û bêçine bê.

Desteyek dî ji ayetan ku işare dikin bal delîla 'eqlî ya hebûna qiyametê digel delîl û burhana «ʻedalet»ê rêk dikevin (di dersa 44 da jê hat xeberdan). Binêrin ayetên jêrî: Sad / 28, Xafir / 58, Qelem / 35, Yûnus / 4.

Bi vê me'nê ku 'edaleta Xuda dikê lazimê xwe ku qenckar û xirabkaran bigehênê desthat û netîce ya kar û 'emelê wan, û dûmahîka wan ji hev biqetênê; çimko di vê dinyayê da ev qetandin çênabê. Nixwe muheqeq wê cihanek dî hebê ku 'edaleta Xwe di wê da nîşan bidê û pêk bênê.

Casiye / 21 - 22 ji vê pêkê ye:

«أَمْ حَسِبَ الَّذِينَ اجْتَرَحُوا السَّيِّئَاتِ أَن نَّجْعَلَهُمْ كَالَّذِينَ آمَنُوا وَعَمِلُوا الصَّالِحَاتِ سَوَاء مَّحْيَاهُم وَمَمَاتُهُمْ سَاء مَا يَحْكُمُونَ * وَخَلَقَ اللَّهُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضَ بِالْحَقِّ وَلِتُجْزَي كُلُّ نَفْسٍ بِمَا كَسَبَتْ وَهُمْ لَا يُظْلَمُونَ»

"Ma ewên karên pîs kirîn we guman kirine ku emê wan

û yên îman anîyîn û karê qenc kirîn beraber ragirîn, bi awayekî ku jiyan û mirina wan wek hev bê (û çewa ku di xweşî û bela û şahî xemên vê dinyayê da şirîk in, piştî mirinê jî gel hev ferq nakin û wek hev in)? Çi pîs hukm didin. Û Xudê, 'esman û 'erd heq (xwey hedef û amanc) çêkirine û da heçî kesê çi kirî bigehêtê û zulm li wan neyê kirin".

Mirov dikarê: «خَلَقَ اللَّهُ السَّمَاوَاتِ وَالْأَرْضَ بِالْحَقِّ» işare bizanê bo delîl û burhana hikmetê. Çewa ku çêdibê delîla ‘edaletê jî li ser esasê delîla hikmetê bê danîn. Çimko wek me pêşda di behsa 'edaleta ilahî da gotî, «'edl» yêk ji dagirên hikmetê ye.

PIRSYARÊN DERSA 47

Qur'ana pîroz çewa qiyametê sabit dikê?

Kîjan ayet işare ne bal delîla hikmetê ve? Jê baxivin.

Kîjan ayet işare ne bal burhana 'edaletê ve? Jê baxivin.

Çewa çêdibê ku delîla 'edaletê bizivirê ser delîla hikmetê.

DERSA 48

TAYBETÎ YÊN 'ALEMA AXIRETÊ

Dagirê:

Pêşekî

Taybetîyên 'alema axiretê di nêrîna 'eql da

Pêşekî

Derheq wa tiştên neceribandî û ew tiştên ku ne pê dîtina navdeyî û ne jî pê ‘ilmê huzûrî idrak nebûne û nehatine dîtinê û hest û hissa mirov pê nehesayî, mirov nikarê wê derheqê da nasînek temam hebê.

Bi vê nêrînê çênabê mirov berhêvî bê ku bi awayek berfireh û hûr xeberê heqîqeta axiretê bigirê û bizanê û bigehê xilaseka zanînê derheq wê da. Belkî gerek evqas bes bê ku qasê ji rêka 'eql û cîyê gehayî me vê derheqê da.

Lê bi xem ve em dibêjin, hinek xebitîne ku 'alema axiretê wek 'alema dinyayê bidin nasandin û heta bi wêderê pêşve çûne ku guman kirine bihişta axiretê di çend girovirên 'esmana da an hema di vê dinyayê bi xwe da ye û rojekî ji ber pêşketina zanistê mirov wê xwe bigehênitê û biçê têda û li wêderê jiyanek xweş û rihet biborênê!

Ji alîyê dî ve vêca hineka qewimîna axiretê bi xwe inkar kiriye û bihişta berîn hema exlaqên hêjayî hesab kirine ku mirovên hêjayî û xizmetkarên komelê, dil dane wan û ferqa di navbeyna dinya û axiretê da hema ferqa feyde û bihadaran guman kirine.

Di cî da ye ku ji desta ewil bê pirsîn: eger bihişta axiretê di girovirekek dî da ye û yên hêjbên wê bigehênê û biçinê, nixwe sax bûna mirovan di roja qiyametê da ku ser gotina Qur'anê roja kombûnê ye, çi me'ne jêre dimînê?! Û çewa wê xêr û cezayê herkesî li wê derê bê dayîn?!

Û di cî da ye ku ji desta duwê bê pirsîn: eger bihişt ji bihadarên exlaqî pêve ne tiştek dî ye [nixwe cehnem jî hema ji tiştên pîs û bê biha pêve ne tiştek dî ye] nixwe ev hemî ayetên Qur'anê ji sabit kirina zivirîna roja qiyametê ra û sax bûna insan piştî mirinê, ji ber çi ye? Ma gelo neheqî bû eva pêxemberên Xudê ev me'ne rasterast bigotan da neketan ber tuhmet û tevz kirinê?!

Dema em ji van gotinên beredayî derbaz bibin, vêca em dighin got û bêj û xirecira feylesof û mutekelliman derheq me'ada cismanî û rûhanî da û behsên vê dereqê da kanê gelo ev cihana maddî bi temamî wê jinav biçê an ne; gelo bedena axiretî hema ev bedena dinyayî bi xwe ye an bedeneke wek wê û ... .

Ev xebat û got û bêjên 'eqlî û felsefî di rêka ronahî kirina heqîqetê da her çend qedr û qîmet gereke jêre bê deynan, lêbelê çênabê em berhêvî bin ku me bigehênin xilaseka zanînê vê derheqê da û şêlotîyê bi temamî jinav bibin û welê bikin heçweku me dîtî.

Ma hema derheq dinyayê da em bêjin, gelo hemî heqîqet û durustîyên wê derketine meydanê? Ma zanayên zanista, karîne hemî çiqên meselên zanista xwe kifş û eşkere bikin û bigehin xilaseka zanînê? Ma gelo dikarin derheq dahata cihanê da bêy xeletî bîr û hizra xwe bavêjn meydanê?

Ma gelo zanin eger hêza rakêşanê ji cihanê bê girtin an bizava elektorona bisekinê wê çi biqewimê? An gelo evahe wê biqewimê an ne?

Gelo feylesofa kariye hemî mesele yên 'eqlî yên girêdayî bi hal û meselên vê dinyayê ve hel û çareser bikin? ...

Vêca Nixwe emê çewa bikarîn bi arîkariya vê zanîna xwe ya sînor kirî û kêmasî têda heyî bi wa heqîqetên wê 'alemê bihesin ku wê derheqê da me qet tecrube nîne?! Elbet kêmasiya zanîna beşer ne bi wê me'nê ye ku qet çi tiştî bi çi awayî nikarê bizanê an negerek derheq naskirina baştir ya cihanê da bixebitê. Bê şik mirov dikarê pê 'eqlê Xudê dayî gelek ji heqîqetan nas bikê û pê arîkariya hiss û tecrubê gelek ji remz û razên tebî'et kifş bikê.

Elbet gereke ji zêdekirina zanînê ra em dewamê bidîn xebatên 'ilmî û felsefî, lê gereke em hedd û sînorê 'eqlî bizanîn û ji heddê wê derbaz nekîn. « وَمَا أُوتِيتُم مِّنَ الْعِلْمِ إِلاَّ قَلِيلاً », Isra / 85.

Waqi' bînî ya 'alimane, nefs sivikiya hekîmane, û hay jê mana mesûlane ya dînî, me hay didê ji wî qasî ra ku em xwe biparêzin ji gotinên qet'î derheq heqîqetên qiyametê û 'alema xeybê da û em bê delîl mesela tewîl û me'ne nekîn, xêncî di wî heddî da ku 'eql û Qur'anê izna wê ji me ra dayî. Di her hal û karî da ev qas ji mirovê bawerdar re bes e ku bawerî hebê bi wê ya ji alîyê Xuda ve hatî xarê; herçend nekaribê hemî çiqên wê ji hev veqetênê. Nexasma ew tiştên ku 'eql û tecrube nikarê bigehêtê.

Niha em bibînin kanê heta bi çi derecê em dikarin bi rêka 'eql ve ji wesf û taybetî yên 'alema axiretê û ferqa wê digel 'alema dinyayê baxivîn.

Taybetî yên 'alema axiretê di nêrîna 'eqil da

Pê fikirîna di delîlên hatîn gotin da derheq lazimiya zivirîna qiyametê, mirov dikarê hinek taybetiyan ji axiretê ra bêjê ku

girîngtirînê wan ev in:

1- ewwilîn taybetî ku nexasma ji delîla ewil tê dest, ev e ku gereke ebedî û her û her bê. Çimko di wê delîlê da hatibî şidandin li ser vê çendê ku heyata ebedî mumkin e û mirov meyla fitrî heye ji heyata ebedî ra, vêca pêk hatina wê ji hikmeta Xuda ye.

2- taybetiya dî ku ji herdu delîla tê dest û di bin delîla ewil da jî işare pê hat kirin ev e ku: gereke 'alema axiretê wereng bê ku xweşîyên wê xwerî bin û şêlotî û zehmetî digel nebê, da eger kesek geha kemala insanîyê û qet şêlotiya gunehan bi xwe re nebirin ji vê bextewerîyê behremend bibê, bervajîyê dinyayê ku bexteweriyek wiha dest mirov nakevê. Belkî bextewerîyên dinyayê nisbî û tevlî zehmetî û nexweşiyan e.

3- alema axiretê kêmê kêm gereke du qism û pişk bê ji rehmet û 'ezabê. Da qenc û xirab ji hev veqetin û her yêk bigehê desthata xwe ya dinyayê. Û ev herdu ew in ku jêre bihişt û cehnem hatiye gotin.

4- nexasma ji burhana ‘edaletê tê dest: 'alema axiretê gereke ewqas berfireh bê ku xêr û cezayê mirov hemiyan bi hemî karê wan yê qenc û xirab ve ji wan re bê dayîn. Mesela eger kesekî bi neheqî bi mîlyona mirov kuştibin ev imkan li wêderê hebê ku cezayê wî li beraberê hemiya da jêre bê dayîn, an eger yêkî wesîle ya jiyana bi mîlyona mirov hazir kiriye li beraberê hemîyê da xêra xwe wergirê.

5- axiret mala ceza û xêrê ye; ne mala teklîf û 'emel. Evahe zehftir ji burhana ‘edaletê tê dest.

Ronahî kirin: ev dinya wereng e ku mirov têda meyl û viyan hene ku tezahum çêdibê û dikevin ber hev û her û her li ser durêkîyê ye ku yêkî ji herduka bibijêrê û ji vêderê ye ku mesela

teklîf û 'emel tê meydanê û ev teklîf heta axirê 'emrê mirov dewam dikê, vêca hikmet û 'edaleta Xudê dikê lazimê xwe ku ewên wezîfe û teklîf û berpirsyariya xwe pêk anî xweşîyê bidîyê ku layiqê wî bê û her wiha ewên teklîfa xwe pêk neanîn jî bigehin cezayê xwe. Vêca eger ev hal ji 'alema axiretê ra jî hebê hingê gorekî hikmet û 'edaleta Xudê alemek dî hebê ku xêr û cezadan têda bê dayîn...

Û ji vê derê yêk ji muhimtirîn ferqa 'alema axiretê û dinyayê kifş dibê ew jî ev e ku: yanî dinya 'alema bijartin û imtihanê ye û axiret 'alema dana xêr û cezayê wan başî û xirabîyên mirova ye ku di 'alema dinyayê da kirine. Imam ‘Elî (s): إن اليوم عمل و لا حساب و غدا حساب و لا عمل – Nehc-ul Belaxe, Axiftina / 42.

PIRSYARÊN DERSA 48

Çima em nikarin 'alema axiretê hûr û kûr nas bikîn û jê bizanîn?

Du fikrên xelet derheq axiretê da bêjin û xeleta wan beyan bikin.

Bi çi rêkê ve em dikarin taybetîyên axiretê bizanin.

Bi nêrîna 'eqil, taybetîyên 'alema axiretê bêjin.

DERSA 49

JI MIRINÊ HETA QIYAMETÊ

Dagirê: Pêşekî

Hemî mirov wê bimirin

Yê can digirê

Rihet û dijwar girtina can û rûhan

Qebûl nebûna îman û tewbê di wextê mirinê da

Xweziya zivirîna li dinyayê

'Alema berzexê

Pêşekî

Me zanî ku pê vê zanîna mehdûd û sînor kirî ya xwe, em nikarîn bigehin biniya zanîna derheq qiyametê û 'alema xeybê. Û tenê gereke em pê nasînên giştî yên ku 'eql bi me didê nas kirin û wesfên ku bi rêka wehyê ve ji me ra hatî gotin bes bikîn. Di dersa pêşîyê da me behsa desthatek giştî kir derheq qiyametê da gorekî 'eql. Û di vê dersê da jî emê gorekî Qur'anê behsa hinek ji wesfên wê bikîn.

Helbet çêdibê hinek wêje yên ku di wesfê axiretê da bikar tên birin û wêje yên muteşabih bin ku bi awayek temam rêk nekevin digel ya waqi'î û ev ne ji ber kêmasî ya di gotinê da ye; belkî ji ber kêmasî ya fêhma me da ye. Bêguman pê berçav girtina avahî yê fikrî yê me kelîme yên Qur'anê bikar birîn baştirîn in.

Û çimko beyanên Qur'anê pêşekî yên axiretê jî ber xwe girtiye ji ber wê emê xeberdanê ji mirinê dest pê bikîn.

Her mirovek wê bimirê

Qur'an li ser vê yêkê dişidênê ku mirov hemî (belkî hemî xwey rûh) wê bimirin û di vê 'alemê da qet çi kes ebedî namînê:

«Heçî kesê li ser 'erdê heyî wê fanî bê». Rehman / 26

«Herkes wê mirinê tam bikê» Alê 'Imran / 185, Enbiya / 35

«Ey pêxember muheqeq tu dê bimirî û ew jî wê bimirin» Zumer / 30

«Pêş te da me ebedî bûn ji kesî ra qirar nedaye. Ma vêca gelo eger tu mirî wê ew ebedî bimînin?» Enbiya / 34.

Vê gorekê mirin qanûnek gişti ye ji hemî candarên cihanê ra.

Cangîr

Qur'ana pîroz ji aliyekî ve girtina rûh û cana nisbet didê bal Xudê ve: «Xudê canan digirê di wextê mirina wan da» Zumer / 42.

Û ji alîyê dî ve melekê mewtê memûrê can girtinê nîşan didê:

«Bêje melekê mirinê ku li ser hewe hatiye deynan wê hewe bigirê...» Secde /11. Û li ciyek dî da nisbeta can girtinê didê bal hinek melaîketa ve ku ewa ji can girtinê ra rêdikê:

«حَتَّىَ إِذَا جَاء أَحَدَكُمُ الْمَوْتُ تَوَفَّتْهُ رُسُلُنَا وَهُمْ لاَ يُفَرِّطُونَ- heta dema mirina yêk ji hewe bê hinartî yên me ewî digirin» En'am / 611.

Ronahî ye ku eger kesek karê xwe bi rêka kesek dî ve pêk bênê çêdibê ew kar bi alîyê herduka ve jî bê nisbet dan. Û eger yê duwê jî vêca wî karî pê kesek dî bi cî bênê ew kar çêdibê were nisbet dan bal hersêka ve jî. Û çimko Xudê girtina rûh û cana bi rêka melekê mewtê ve pêk tênê û Ewî jî hinek melaîketên memûr hene ku li bin fermana Wî da ne; her sê nisbet durust in.

Rihet û zehmet girtina rûhan

Ji Qur'anê tê fêhmê ku rûh sitandina melaîketa, hemî ne bi awakî ye, belkî canê hinek bi rihetî û bi qedr û qîmet digirin û yê hineka bi dijwarî û rezîl kirin digirin.

Derheq bawerdara da Qur'an wiha ji rûh sitandina wan daxivê:

«Ewên melaîket canê wan bi xweşî distînin û selam (û qîmet)ê didin wan». Nehl / 32. Û binêrin: En'am / 93.

Derheq kafiran da jî kerem dikê:

«Dema melaîket rûhê kafira distînin li rû û pişta wan didin...» Enfal / 50 û binêrin: Muhemmed / 27.

Û belkî mirov bikarê bêjê navbeyna bawerdar û kafira da jî gorekî dereca bawerî û kufra wan rihetî û dijwarî ferq dikê.

Qebûl nebûna îman û tewbê li demê mirinê

Dema mirina kafir û gunehkara digehê û ji jiyana dinyayê bê hêvî dibin ji borî ya xwe poşman dibin û îman û tewbê ji xwe nîşan didin; lê qet ji wan nayê qebûl kirin. Qur'an kerem dikê:

«... Roja ku hinek ji nîşanên Xuda yê te eşkere bibin, îmana kesekî ku pêşda bawerî neaniye an di halê îmanê da karek qenc nekiriye jêra feyde nakê». En'am / 50. Û binêre: Sebe' / 51 - 53, Xafir / 85, Secde / 29. Û:

"Û tewbe nîne ji wî kesî ra yê karên xirab dikê, heta mirina yêk ji wan bigehê dibêjê: niha min tewbe ye!» Nisa/18.

Ji zimanê Fir'ewn neql dikê dema ket ber nûqî bûnê got:

«وَجَاوَزْنَا بِبَنِي إِسْرَائِيلَ الْبَحْرَ فَأَتْبَعَهُمْ فِرْعَوْنُ وَجُنُودُهُ بَغْيًا وَعَدْوًا حَتَّى إِذَا أَدْرَكَهُ الْغَرَقُ قَالَ آمَنتُ أَنَّهُ لا إِلـهَ إِلاَّ الَّذِي آمَنَتْ بِهِ بَنُو إِسْرَائِيلَ وَأَنَا مِنَ الْمُسْلِمِينَ»

"Min bawerî anî ku çi ilah xêncî ji Wî yê benî Israîl îman pê anî, nînin û ez ji ehlê Islamê me». Di cewabê da tê gotin:

«آلآنَ وَقَدْ عَصَيْتَ قَبْلُ وَكُنتَ مِنَ الْمُفْسِدِينَ»

"Niha, vê gavê?! Halhale te pêşda neguhdarî kiriye û tu xirabkar bû". Yûnus / 90 - 91.

Xweziya zivirîna li dinyayê

Qur'ana pîroz ji kafir û xirabkaran digêrê û neql dikê dema mirina wan digehê an 'ezabek jinavber ser wan da tê xwezîyê dixazin ku xwezî li dinyayê bizviriyan û bibûna ji ehlê îman û qenckaran. An ji Xudê dixazin ku wa li dinyayê bizivirênê da xwe çêkin û ya ji dest dayîn dest ve bênin, lêbelê ew xwesta wan nayê cî û pêk nayê[1].

Li hinek ayeta da vê jî dibêjê ku eger bihatan zivirandin jî wê dîsa wek derbazbû ya xwe bikiran. En'am / 27 - 28.

Û di roja qiyametê da herwiha wê daxazên dî jî hebin ku qet çi yêk ji wan nayê qebûl kirin: Mu'minûn / 99 - 100.

«حَتَّى إِذَا جَاء أَحَدَهُمُ الْمَوْتُ قَالَ رَبِّ ارْجِعُونِ * لَعَلِّي أَعْمَلُ صَالِحًا فِيمَا تَرَكْتُ كَلَّا إِنَّهَا كَلِمَةٌ هُوَ قَائِلُهَا»

"Heta hingê ku mirina yêk ji wan bigehê dibêjê: ey Xuda! min bizivirîne, belkî ez karê qenc di wê ya min terk dayî da bikim. Nexêr, ew gotineke ku ew dibêjê".

[1] - Qur'ana pîroz zivirîna wa kesa li dinyayê nefy dikê ku 'emrek di kufr û bê emrîyê da borandine û di halê mirinê da daxaza zivirîna li dinyayê dixazin û her wiha zivirîna ji 'alema qiyametê bo dinyayê qebûl nakê. Û evahe ne bi wê me'nê ye ku bi çi awaya zivirîna li dinyayê çênabê. Me pêşîda jî Got ku hinek hebûne pişti mirinê li vê dinyayê da dîsa sax bûne. Û gorekî baweriya Şî'an pişti hatina Imam Mehdî (s) wê hinek li dinyayê bizivirin.

« أَوْ تَقُولَ حِينَ تَرَي الْعَذَابَ لَوْ أَنَّ لِي كَرَّةً فَأَكُونَ مِنَ الْمُحْسِنِينَ ... An dema 'ezab dibînê dibêjê: xwezika min zivirînek hebûya, vêca ez bibûma ji qenckaran». Zumer / 58. Binêrin: Şu'era /102.

«وَلَوْ تَرَي إِذْ وُقِفُوا عَلَى النَّارِ فَقَالُوا يَا لَيْتَنَا نُرَدُّ وَلاَ نُكَذِّبَ بِآيَاتِ رَبِّنَا وَنَكُونَ مِنَ الْمُؤْمِنِينَ» "Dema ji agirê cehnemê ra tên raber kirin, dibêjin: xwezî em bihatan zivirandin û êdî me ayetên Xuda yê xwe inkar nekiran û em ji bawerdaran bûna". En'am / 27 – 28. Û binêrin: E'raf / 53.

«وَلَوْ تَرَي إِذِ الْمُجْرِمُونَ نَاكِسُو رُؤُوسِهِمْ عِندَ رَبِّهِمْ رَبَّنَا أَبْصَرْنَا وَسَمِعْنَا فَارْجِعْنَا نَعْمَلْ صَالِحًا إِنَّا مُوقِنُون» "Hingê ku ewên xirabî kirîn serê xwe li bal Xuda yê xwe çemandine (û dibêjin:) ey Xuda! me dît û bihîst, vêca me bizivirîne da em karê qenc bikîn. Hema birastî em ehlê yeqînê ne". Secde / 12. û binêrin: Fatir / 37.

Ji van ayetan bi başî tê dest ku 'alema axiretê ne cihê bijartin û 'emel kirina bi teklîf û berpirsyariya ye. Û heta yeqîn ku di wextê mirinê da çêdibê eserek ji tekamula mirov ra tune û ewî nakê musteheqê xêrê. Ji ber vê ye ku gunehkar û xirabkar xweziya zivirîna li dinyayê dixazin, da bi bijartin û ixtiyar bawerîyê bênin û karê qenc bikin.

'Alema berzexê

Ji ayetên Qur'anê tê fêhmê ku mirov piştî mirinê û pêşiya qiyametê dewranekî di 'alema qebir û berzexê da diborênê û li wê derê awayek yê şahî û lezzetê an xem û nexweşîyê dibînê. Û di gelek hedîsa da heye ku mirovê xwey îmanê gunehkar ji ber hinek zehmetî û nerihetiyan ku gorekî gunehê xwe dibînê pak dibê da di 'alema qiyametê da barê wî sivik bibê.

Ji ber ku ayetên derheq 'alema berzexê da muhtacê tefsîr kirinê ne me ji anîna wan xwe da paş û tenê yêkî emê bînin ku kerem

dikê:

«.. وَمِن وَرَائِهِم بَرْزَخٌ إِلَى يَوْمِ يُبْعَثُونَ - Û pişti mirina wan berzexek heye heta roja ku tên rakirin». Muminûn / 100.

PIRSYARÊN DERSA 49

Gotina Qur'anê derheq her û her nebûna mirov di dinyayê da bêjin û işare bikin bal ayetan bi xwe ve.

Kî rûh distênê? Û derheq kom kirina me'ne û gotina di ayeta da heyî hewe çi gotin hene?

Di navbeyna rûh sitandina da çi ferq heye?

Derheq îman û tewbe ya di halê mirinê da baxivin û aytetên wê jî nîşan bikin û işare bikin balê ve.

Qur'ana pîroz kîjan zivirîna li dinyayê qebûl nakê? Gelo nefya vê zivirînê dijatiyek gel baweriya bi rec'etê heye? Çima?

Behsa 'alema berzexê bikin.

DERSA 50

ŞIKLÊ QIYAMETÊ DI QUR'ANÊ DA

Dagirê:

Pêşekî

Halê 'erd û behr û çiyan

Halê 'esman û stêran

Pifdana "sûr"a mirinê

Pifdana "sûr"a jiyan û destpê bûna qiyametê

Peyda bûna hukûmeta ilahî û jinavçûna sebeb û neseban

Mehkeme ya 'edla ilahî

Berew sekingeha ebedî

Bihişt / Cennet

Cehnem / Dojeh

Pêşekî

Ji Qur'anê tê fêhmê ku rabûna qiyametê ne hema tenê pê sax bûna dubare ya mirov pêk tê; belkê hemî tişt tevhev dibê û sîstima 'alemê serûbin dibê û 'alemek dî pê hinek taybetî yên dî peyda dibê, 'alemek wereng ku em nikarin tê bigehin ka çewan e û em hûr û kûr nikarîn ji taybetîyên wê bizanîn. Vêca hingê ye ku mirov hemî, ji ewil heta axir sax dibin û digehin desthata kar û 'emelê xwe û ji her û her ra di nav xweşiyan da an di 'ezabê da dimînin.

Çiko ayetên vê derheqê da pir zêde ne û anîna hemiyan gotinê dirêj dikê; emê hema ji naveroka hineka tenê baxivin.

Halê 'erd û behr û çiyan

Lerzînek mezin di 'erdê da peyda dibê[1] û heçî ya di nav da ye, wê derkevê meydanê (Zilzal / 2, Inşiqaq / 4) û qet û piçên wê dê ji hev belav bibin û piç piç bibê (Haqqe / 14, Fecr / 21); wê behr bikelişin û şeq bibin (Tekwîr / 6, Infitar / 3) û çiya biherikin[2] û biperçiqin û ser hev da biçin (Haqqe / 4, Waqi'e / 5) wê wek girkê xîzê lê bên (Muzzemmil / 14) û paşê wê wek hirî ya hatî jenîn lê bên (Me'aric / 9, Qari'e / 5) vêca wê li hewa re belav bibin (Taha / 105 – 107, Murselat / 10) û ji wan çiyayên bilind xêncî ji serab û leylanekî tiştek namînê (Kehf / 8, Nebe' / 20).

Halê 'esman û stêran

Heyv (Qiyamet / 8) û roj (Tekwîr / 1) û stêrên mezin ku hinek ji wan çend mîlyon cara ji rojê mezintir û ronahîtir in, tarî dibin û ronahiya wan ji wa tê girtin (Tekwîr / 2), û sîstim û bizav û hereketa wan têk diçê û roj û heyv digehin hev (Infitar / 2, Qiyamet / 9) û ew 'esmanê ku wek banekî li ser vê cihanê da girtiye wê sist bibê û ji hev bikevê (Tûr / 1, Haqqe / 16) û bikelişê û qet qet bibê (Rehman / 37, Haqqe / 16, Muzzemmil / 18, Murselat / 9, Nebe' / 19, Infitar / 1, Inşiqaq / 1) û wê li hev bê pêçan (Enbiya / 104, Tekwîr / 11) û wê wek hêsinê heliyayî lê bê (Me'aric / 8) û wê hewayê cihanê tejî dûy [dûman] û 'ewr bibê (Furqan/25, Duxan/10).

Sûra mirinê

Di vî halî da wê sûra mirinê bê pifdan û hemî tiştên sax wê bimirin (Zumer / 68, Haqqe / 13, Yasîn / 49) di cihana tebî'et da eserek

[1] - Binêrin sûretên: Zilzal / 1, Hecc / 1, Waqi'e / 4, Muzzemmil / 14.
[2] - Kehf / 47, Nehl / 88, Tûr / 10, Tekwîr / 2.

ji jiyanê namînê û tirs û dehşet û bizdhan dikevê di rûh û cana da (Neml / 87 - 89) xêncî ji wa yên ku ji remz û razên cihanê agahî hebûn û dilê wa tejî ji nasîn û hezkirina Xuda.

Sûra saxîyê û destpê bûna qiyametê

Di pey ra wê cihanek dî ku ji her û her manê ra qabil bê wê peyda bibê (Ibrahîm / 48, Zumer / 67, Meryem / 38, Qaf / 22) û rûyê cihanê wê pê ronahiya Xuda ronahî bibê (Zumer / 69) û wê sûra jiyanê bê pifdan (Zumer / 68, Kehf / 99, Qaf / 20, 42, Nebe' / 18, Nazi'at 13-14, Muddessir / 8, Saffat / 19) û mirov hemî (belkî heywan jî - En'am / 38, Tekwîr / 5) wê di cî da sax bibin (Kehf / 47, Nehl / 77, Qemer / 50, Nebe / 18) bi dehşet û bizdhan (Qaf / 20) wek kulî û pelpelîtankên di hewa re belav dibin (Qari'e / 4, Qemer / 7) bi lez û bez (Qaf/44, Me'aric / 43) wê bi alîyê Xuda ve bikevin rê (Yasîn /51, Muteffifîn / 30, Qiyamet / 12, 30 û ...) û hemî pêkve wê li ciyek mezin kom bibin (Kehf / 99, Texabun / 9, Nisa / 87, En'am / 12, Alê 'Imran / 9, Hûd / 103) û pirtir wereng hizir dikin ku sekina wan di 'alema qebr û berzexê da qasî se'etekî an rojekî û an çend rojan bûye. (Rûm / 55, Nazu'at / 46, Yûnus / 45, Isra / 52, Taha / 103 - 104, Mu'minûn / 113, Ehqaf / 35).

Eşkere bûna hukûmeta ilahî û birîna sebeb û neseban

Di wê 'alemê da heqîqet eşkere dibin û hukûmet û seltenet û padişahiya Xuda bi temamî bi cî tê, heybet û tirsek wereng ser xelkê da digirê ku kes nikarê gotin û xeberdanekî bêjê û herkes di fikra xwe da ye û heta zarok ji dê û babên xwe û eqreba û famîl ji hev direvin û ji binî ve nisbeta neseb û sebeb û girêdanan tê birîn û dostî û hevaletiya li ser binyata menfî'et û pîvek û kêşekên dinyayî û şeytanî çêbûyîn dibin dijminî (Zuxruf / 67) û ji ber texsîratîyên ku di dinyayê da kirîn, hesret û poşmanî dilê wan dinixûmênê (En'am / 31, Meryem / 39, Yûnus / 54).

Mehkema 'edla ilahî

Vêca mehkeme ya 'edla ilahî wê pêk bê û kar û 'emelê hemî hazir bibê (Alê ‘Imran / 30, Tekwîr / 14, Isra / 49) û nivîsoka 'emelan wê bê belav kirin (Isra / 13 - 14, 71, Haqqe / 19, 25, Inşiqaq / 7, 10) û nisbet dana kar û 'emelan bal xweyê wan ve ewqas eşkere ye ku êdî nelazim e ku jê bipirsn te çi kiriye? (Rehman / 39). Di vê mehkemê da melaîket û pêxember û mirovên ku li bal Xuda biqedr in ji şahidîyê ra hazir dibin[1] û xêncî ji wan vêca dest û pî û çermê bedenê jî li ser mirov şehdeyîyê ddin[2] û hûr hûr hesaba xelkê tê dîtin û pê mîzana xudayî tê kêşan[3] û li ser esasê 'edalet û dadgerîyê derheq wan da hukm tê dayîn[4] û herkes netîce û desthata kar û xebata xwe dibînê[5] û ji qenckaran ra deh beraberê wê tê dayîn (En'am / 160) û kes barê kesî ranakê;[6] lê ew kesê ku xelk ji rê deraniye xêncî gunehê xwe, qas gunehê wa yên li rê wunda kirîn jî li wî tê kirin bêy wî qasî ku ji gunehê wa yên guneh kirîn kêm bibê.[7] Û bedel û şûnek ji kesî nayê qebûl kirin (Beqere / 48, 123, Alê ‘Imran / 91, Luqman / 33, Maide / 36, Hedîd / 15); şefa'eta kesî qebûl nabê (Beqere / 48, 123, Muddessir / 48) xêncî şefa'eta wa yên ji alîyê Xuda ve izna wan hatiye dayîn û pê pîvekên ku Xudê pê razî ye şefa'et bikin.[8]

---

[1] - Zumer / 69, Beqere / 143, Alê ‘Imran / 140, Nisa / 4169 ,, Hûd / 18, Hecc / 78, Qaf / 21, Nehl / 84, 89.
[2] - Nûr / 24, Fussilet / 20, 21.
[3] - E'raf / 8, 9, Enbiya / 47, Mu'minûn / 102, 103, Qari'e / 6 - 8.
[4] - Yûnus / 54, 93, Casiye / 17, Nehl / 78, Zumer / 69, 75.
[5] - Necm / 40, 41, Beqere / 281, 286, Alê ‘Imran / 25, 161, En'am / 70, Hûd / 111, Ibrahîm / 51, Taha / 15, Xafir / 17, Casiye / 22, Tûr / 21, Mudessir / 38, Zumer / 24.
[6] - Necm / 39, En'am / 146, Fatir / 18, Zumer / 7.
[7] - Nehl / 25, 'Enkebût / 13. Her wiha ji vêderê gumana vê yêkê tê pêş ku ew kesên dibin sebebê hidayeta yên dî, xelat û padaşên wan wê du beraber bê; çewa ku vê derheqê da riwayet zehf in.
[8] - Enbiya / 28, Beqere / 255, Yûnus / 3, Meryem / 87, Taha / 109, Sebe' / 23, Zuxruf / 86, Necm / 26.

Bi alîyê sekingeha ebedî ve

Di pey ra hukmê Xudê tê eşkere kirin (E'raf / 44) û qenckar û xirabkar ji hev diqetin û cida dibin[1] û bawerdar rû sipî û dilşa û bi ken bi alîyê bihiştê ve[2] û kafir û munafiq rû reş û xemdar û bi kol û xem ve û bi ser şûrî û zelîlî bi alîyê cehnemê ve tên birin. [3] Hemî pêkve di cehmenê ra derbaz dibin (Meryem / 71, 72) di halekî da ku rûyê bawerdaran ronahî didê û rêka wan ronahî dikê (Hedîd / 12) û kafir û munafiq di tarîtîyê da diborînin.

Munafiqên ku di dinyayê da têkeliya bawerdaran kirîn gazî wan dikin ku berê xwe bidin me; da em ji ronahiya hewe behrê bigirîn, vêca cewaba wan didin ku: "ji ronahî girtinê ra paşve bizivirin (herin dinyayê)!" Dîsa dibêjin: "ma di dinyayê da em ne digel hewe bûn?" Vêca vê cewabê guhlê dibin ku: "çire; hûn di eşkereyê de digel me bûn, lê hewe xwe bêçare kir û dilê hewe şik û şubhe têda hebû û hûn dilreq bûn û îro êdî karê hewe xilas e û ji hewe û kafiran şûn û bedel nayê qebûl kirin". Û paşî re kafir û munafiq dikevin cehnemê da (Hedîd / 13-15, Nisa / 140).

Dema bawerdar nêzîkê bihiştê dibin derîyên wê vedibin û melaîketên rehmetê ber wan ve tên û pê selam û qedr û qîmetê mizgîniya bexteweriya daimî didin wan (Zumer / 73, Re'd / 22-24).

Ji alîyê dî ve vêca dema kafir û munafiq digehin cehnemê derîyên wê vedibin û melaîketên 'ezabê li wan dixurin û lomê li wan dikin û we'da 'ezabê daimî didin wan (Zumer / 71 - 72, Tehrîm 6, Enbiya /103).

---

[1] - Enfal / 37, Rûm 14 - 16, 43, 44, Şûra / 7, Hûd / 105 - 108.
[2] - Zumer / 73, Alê 'Imran / 107, Meryem / 85, Qiyamet / 24 - 42, Muteffifîn / 24, Xaşiye / 8, 'Ebes / 38, 39.
[3] - Zumer / 60 - 71, 73, Alê 'Imran / 106, En'am / 124, Yûnus / 27, Meryem / 86, Taha / 101, 126, Ibrahîm / 43, Qemer / 8, Me'aric / 44, Xaşiye / 2, Isra / 72, 97; 'Ebes / 40, 41.

Bihişt[1]

Bihiştê de bax û bustanên berfireh, bi firehiya 'esmana û 'erd ku bi enwa' û eqsamê daran hatî nixûmandin hene, her wiha hemî awayên fêkîyê berdest û qesrên xweş û çem û rûbarên ava zelal û şîr û hingivî û şeraba pak û ji her tiştekî li ser meyl û viyana bihiştiyan û ser viyan û xwesta wan re ji wan ra heye.

Bihiştî pê libasê hevrîşem û eqsamên xeml û zînetan û li beraberê hev da li ser textên zînetkirî û cihkên nerm pal didin û mijûlê hemd û sipasiya Xuda ne û gotinên bêhûde û pûç nabêjin û nabhîzin; ne serma ewa diêşênê û ne germa; ne zehmet û westan û melal hene û ne tirs û xem; her wiha dilê wan ji kerb û kînê vale ye.

Xizmetkarên sipehî rex wan ve li bizav û herektê da ne û pê firaxên bihiştî şeraba cennetê li ber wan digirin ku vexwarina wê lezzetek pir zêde têda heye û çi nexweşî û afet jê çênabê û ji enwa' û eqsamê fêkî û guştê firindan û teyran dixwin û di kêleka hevjînên ciwan û dilovan û pak û paqij da ne û xweşîyê ji hev dibînin û seratir ji her tiştî jî vêca ji xweşiya rûhî ya razî bûna

[1] - Vê derheqê da binêrin sûretê: Alê ‘Imran / 133, Hedîd / 21, Haqqe / 23, Dehr / 6, 18, 21, Muteffifîn / 28, Beqere / 25, Alê ‘Imran / 15, Muhemmed / 15, Nehl / 31, Furqan / 16, Zumer / 34, Fussilet / 31, Şûra / 22, Zuxruf / 71, 70, Qaf / 35, Kehf / 31, Hecc / 23, Fatir / 33, Duxan / 53, Dehr / 21, E’raf / 32, E’raf / 43, Yûnus / 10, Fatir / 34, Zumer / 74, Meryem / 62, Nebe / 35, Xaşiye / 11, Dehr / 13, E’raf / 35, Hicr / 48, E’raf / 43, Hicr / 47, Waqi’e / 17, Dehr / 19, Saffat / 45 - 47, S ,51 / Tûr / 23, Zuxruf / 71, Waqi'e / 19 - 18, Dehr / 5, 6, 15, 19, Nebe / 34, Muteffifîn / 25 - 28, S ,51 / Tûr / 22, Rehman / 52, 68, Waqi'e / 20 - 21, Murselat / 42, Nebe’ 32, Beqere / 25, Alê ‘Imran / 15, Nisa / 57, Saffat / 48 - 49, S 52 /, Zuxruf / 70, Duxan / 54, Tûr / 20, Rehman / 56, 70 - 74, Waqi'e / 22, 23, 3 - 37, Nebe’ / 33 , Alê ‘Imran / 15, Tewbe / 21, 72, Hedîd / 20, Maide / 119, Mucadile / 29, Beyyîne / 8, Secde / 17, Beqere / 28 - 82, Alê ‘Imran / 107, 36, 198, Nisa / 13122 ,57 ,, Maide / 85, 119, E’raf / 42, Tewbe / 22, 72, 89, 100, Yûnus / 26, Hûd / 23, 108, Ibrahîm / 23, Hicr / 48, Kehf / 3, 108, Taha / 76, Enbiya / 102, Mu’minûn / 11, Furqan / 16, 76, 'Enkebût / 58, Luqman / 9, Zumer / 73, Zuxruf / 71, Ehqaf / 14, Q / 34, Feth / 5, Hedîd / 12, Mucadile / 32, Texabun / 9, Telaq / 11, Beyyîne / 8.

Xudê behremend in; ewqas di nav şahî û keyfê da ne ku mirov nikarê wesfê wê bidê û ev xweşî û şahî û bextewriya pir xweş û lezzet daimî ye û ji her û her ra wê di nav da bimînin û xilasek jêra tunehin. (Duxan / 56, Fussilet / 8, Inşiqaq / 25, Tîn / 6).

Cehnem

Cehnem cihê wan kafir û munafiqa ye ku qet çi ronahiyek ji îmanê di dilê wan da neyî (Nisa / 140 û gelek ayetên dî), firehiya wê (dojehê) ewqas e ku hemî xirabkar têda cih dibin û hêca dibêjê: **"hel min mezîd!"** (Qaf / 30). Pêkve agir e û agir; 'ezab e û 'ezab!

Pêta agir ji hemî aliya ve difûrê û dengê wê yê zehfî û fûrfûra wê ser tirs û bizdanê ve zêde dikê,[1] ser û çavan reş û kirêt û genî û me'd girtî ne,[2] heta di rûyê melaîketên cehnemiyan da jî qet çi dilovanî û merhemet û nermî xuya nakê (Tehrîm / 91).

Cehnemî pê qeyd û lele û zincîrên hêsinî hatine girêdan,[3] û agir hemî bedena wan li ber xwe girtiye (Ibrahîm / 50, Furqan / 13, Enbiya / 98, Cin / 15, Tehrîm / 6) û ew bi xwe şewata agir in,[4] di cehnemê da xêncî ah û nalîn û qîr û hewara cehnemiya û xurîn û deng û qîra cehnemvanan nayê bihîstin (Furqan/13, 14, Inşiqaq / 11). Ava kel dirêjin ser ser û rûyê xirabkaran ku navdeyê wa jî dihelênê (Hecc / 19, 20, Duxan/48) û dema ji ber têhnîşkê daxaza avê dikin avek kel û germ û genî û bêhno didin wan ku hema lez û bez vedixwin û ser xwe da dikin;[5] ziqqum, xwarina wa ye ku di nav agirê cehnemê da çêdibê û xwarina wê li ser şewata wan ve zêde dikê; [6] cilkê wan ji maddeyekî reş e ku bi bedenê ve dizeliqê û ser 'ezabê wan ve

[1] - Hûd / 106, Enbiya / 100, Furqan / 12, Mulk / 7, 8.
[2] - Alê 'Imran / 106, Mulk / 27, Mu'minûn / 104, Zumer / 60.
[3] - Re'd / 5, Ibrahîm / 49, Sebe' / 33, Xafir / 71, 72, Haqqe / 32, Dehr / 4.
[4] - Beqere / 24, Alê 'Imran / 10, Enbiya / 98, Cin / 15, Tehrîm / 6.
[5] - En'am / 70, Yûnus / 4, Kehf / 29, Waqi'e / 42 - 44, 55, Muhemmed / 15.
[6] - Saffat/62-66, Sad / 57, Duxan / 45, 46, Waqi'e / 52, 53, Nebe / 25, Xaşiye / 6, 7.

zêde dikê (Ibrahîm / 17, Taha / 74, Fatir / 36), hevcivatî yên wan şeytan û cinnên gunehkar in ku hema daxaza wan dûriya ji wan e (Zuxruf / 38, 39, Şu'era /94, 95, Sad / 85) û hemî le'netê li hev dikin (E'raf / 38, 39, 'Enkebût / 25, Murselat / 35, 36).

Dema bixazin 'uzrê xwe vexazin, xurîna "bicehimin" - "dûr bikevin"-"kir û bêdeng bibin" dibihîzin û bêdeng dibin (Mu'minûn / 108, Rûm / 57, Xafir / 52, Murselat / 35, 36); vêca xwe davêjin ber bextê cehnemvana ku ji Xudê bixazin piçekî ji 'ezabê wan kêm bikê, evê cewabê guhlê dibin ku: "ma Xudê pêxemberên Xwe rênekirin nav hewe û delîl û huccet ser hewe temam nekir?" (Xafir / 49, 50).

Vêca carek dî daxaza mirinê dikin û evê cewabê seh dikin ku: "hûnê ji her û her ra di cehnemê da bimînin" (Zuxruf / 77), herçend mirin ji hemî aliyan ve ser wan da dibarê, lê namirin (Ibrahîm/17, Taha/74, Fatir/36). Çiqa çermê bedena wan bişewitê çermek nû çêdibê û 'ezabê wan dewam dikê (Nisa / 56).

Daxaza hinek av û xwarinê ji bihiştiyan dikin, evê cewabê guhlê dibin ku: "Xuda xweşî yên bihiştê ji hewe ra heram kirine" (E'raf / 50).

Bihiştî ji wan dipirsin: "çi bû sebebê bextreşî ya hewe û hûn kişandin nav cehnemê?" dibêjin: "em ne ehlê mêj û 'ibadet bûn û me arîkariya reben û jaran nedikira û em digel pîseka bûn û me qiyamet inkar dikira û bi derew zaniya" (Muddessir / 47-39). Vêca ew bi xwe radibin hev û dikin xirecir (Sad / 64-59).

Ewên li rê wunda bûyîn dibêjin yên li rê wunda kirîn: "ev hûn bûn ku hewe em xelitandin û li rê wunda kirin", ew cewab didin: "hewe bi keyf û dilê xwe peyrewî ji me kir û hûn ketin pey me" (E'raf / 38-39, Saffat / 27 - 33, Qaf / 27 - 28).

Bindest dibêjin serdestan: "ev hûn bûn hewe em bextreş kirîn"; ew dibêjin: "qey me hûn bi zorî ji rêka rast deranîn?" (Ibrahîm / 21, Sebe' / 31 - 33).

Vêca paşî re dibêjin şeytan: "ev tu bû, bûyî sebeb heta em ji rê derkevin". Vêca şeytan di cewaba wan da dibêjê: "Xudê soza rast da hewe û hewe qebûl nekir û min soza derew da hewe û hewe qebûl kir, vêca nixwe şûna ku hûn loman li min bikin, li xwe bikin û îro kes ji me nikarê arîyê dî bikê û li hana wî biçê" (Ibrahîm / 22) û bi vî awayî çi çare ji wan ra namînê xêncî ku xwe li ser 'ezabê xwe yê daimî mit bikin. [1]

[1] - Beqere / 39, 81, 162, 217, 257, 275, Alê ‘Imran / 88, 116, Maide / 37, En’am / 128, E’raf / 36, Tewbe / 17, 63, 68, Yûnus / 27, 52, Hûd / 107, Re'd / 5, Nehl / 29, Kehf / 108, Taha / 101, Secde / 20, Mu’minûn / 103, Ehzab / 65, Zumer / 72, Xafir / 76, Zuxruf / 74, Mucadile / 17, Texabun / 10, Cin / 23, Beyyîne / 6.

PIRSYARÊN DERSA 50

Wez' û halê 'erd û 'esmana li qiyametê da beyan bikin.

Çewaniya destpêka qiyametê û wesfên wê bêjin.

Ji mehkema 'edla ilahî baxivin.

Behsa çûna mu'min û kafiran bal sekingeha wan ya ebedî ve bikin.

Ji xweşîyên bihiştê baxivin.

Behsa cehnem û cehnemiyan û wez' û halê wan bikin.

Got û bêja cehnemiyan beyan bikin.

DERSA 51

MUQAYESE YA DINYA Û AXIRETÊ

Dagirê: Pêşgotin

Fena bûna dinyayê û ebedî bûna axiretê

Veqetana 'ezab ji xweşiyan di axiretê da

Isaleta axiretê

Desthata bijartina jiyana dinyayê

Pêşgotin

Ew nasîna me pê 'eql û neqlê derheq axiretê da peyda kirî ev imkan da me ku em bikarîn ji çend milan ve dinya û axirtê gel hev qiyas bikîn. Elbet ev muqayese di Qur'ana pîroz da jî hatiye kirin û em dikarîn pê behre girtina ji Qur'ana pîroz û mubarek hilsengênekî durust derheq jiyana dinya û axiretê da pêk bînîn û seratiya 'alema axiretê bidîn berçavan.

Jinav çûna dinyayê û ebedî bûna axiretê yêkemîn ixtilafa eşkere di nav 'alema dinya û 'alema axiretê da mehdûd bûna 'emr û temenê dinyayê û ebedî û daimî bûna axiretê ye.

Di vê dinyayê da ji 'emrê her kesekî ra xilasek û temam bûnek heye ku ji nêzîk ve an piçekî derengtir wê bigehê. Heta eger kesek bi sedan an hezaran sala jî 'emr bikê paşî ra pê guherînên ku di cihana tebî'et da di wextê «pifdana sûra ewil» da çêdibê, wê xilas bibê û bigehê axir. Çewa ku di dersên pêşî de jê hat xeberdan. Ji alîyê dî ve vêca dorûberê 80 ayetên Qur'anê ji ebedî

bûn û her mayîna roja axiretê daxivin (binêrin ayetên xulûd û her û her mayîna bihişt û cehnemê) û eşkere ye ku mutenahî her çiqa dirêj bê jî, qet nisbetek bal ne mutenahî ve tunehin.

Nixwe 'alema axiretê ji nezer dewam û manê ve seratiyek mezin ser dinyayê heye û ev gotin di gelek ayeta de pê «ebqa - ya mayînê» bona axiretê[1] û «qelîl - kêm» bûna dinyayê[2] hatiye nîşan dan. Û di ayetên dî da jiyana dinyayê şebihandiye giyayekî ku çend rojekî kesk e û paşê ji nêzîk ve diçilmisê û paşî ra hişk dibê û jinav diçê;[3] li ser vê me'nê şidandiye. Û di ayetekî da jî kerem kiriye: "ewa li bal Xudê baqî ye û dimînê" (Nehl / 96).

Cuda bûna xweşîyê ji 'ezab di axiretê da

Ferqek dî ya binyatî navbeyna jiyana dinyayê û jiyana axiretê da ev e ku xweşîyên dinyayê û jiyana wê tevlî zehmet û nexweşîyê ne, ne wereng e ku birek ji xelkê her daim şahî û di nav xweşîyê da bin û bir û deste ya dî bervajîyê wan her di nav xem û 'ezab û nexweşîyê da bin, belkî xelk hemî bi awayê hem xweşî û şahî bûn ser wan da tê û hem xemdar dibin û nexweşî ser wan da tê.Lêbelê 'alema axiretê du pişkên ji hev cida û veqetayî ye (bihişt - cehnem), di pişkekî da qet nexweşî û xem û tirs û 'ezab nîne û di pişka dî da jî xêncî ji 'ezab û nexweşî û xem û tirsê tunehin.

Ev li ber hev girtin û muqayese di Qur'anê da jî hatiye û seratî ya xweşîyên axiretê û nêzîk bûna Xudê ser ni'metên dinyayê ra hatiye girtin, çewa ku nexweşîyên axiretê jî ser nexweşîyên dinyayê ra zaniye[4].

---

[1]- Kehf / 36, Meryem / 76, Taha / 73, 131, Qeses /60, Şûra / 36, Xafir / 39
[2] - Alê 'Imran / 197, Nisa / 77, Tewbe / 38, Nehl / 117.
[3] - Yûnus / 24, Kehf / 45, 46, Hedîd / 20.
[4] - Re'd / 34, Taha / 127, Secde / 21, Zumer / 26, Fussilet / 16, Qelem / 33, Xaşiye / 24.

Eslî bûna axiretê

Ferqek dî ya muhim navbeyna dinya û axiretê da ev e ku jiyana dinyayê pêşekî ya axiretê ye û wesîle ya dest ve anîna bextewerî ya her û her e. Û ji ya axiretê jiyana axirîk û eslî ye û herçend jiyana dinyayê û xweşîyên wê xwesta mirov e; lê pê vê nêrînê ku hemî pêkve wesîle ya imtihan û wesîle ya tekmula heqîqî û dest ve anîna bextewriya ebedî ye, nikarê eslî bê û biha û qîmetê heqîqîyê wê girêdayî ye bi wî qût û rizqî ve ku mirov ji jiyana xwe ya ebedî re berhev dikê (Qeses / 77).

Ji ber vê çendê eger kesek jiyana axiretê jibîr bikê û berê xwe bidê xweşîyên dinyayê û lezzetên wê ji xwe re bikê hedef, ewî bihayê wê yê rastî nas nekiriye û jêre bihayek xeyalî daniye, çimko ewî wesîle di şûna hedef û armancê da daniye. Û karek wiha xêncî mijûlî û xaphanê ne tiştek dî ye, [1] ji ber vê yêkê ye ku Qur'ana pîroz jiyana axiretê, jiyana heqîqî û rastî zaniye ('Enkebût / 64, Fecr / 24).

Gerek ev jî bê zanîn: Nebaşîyên ku ji dinyayê ra hatîn gotin, girêdayîne bi awayê nêrîna mirovê dinyaxaz ve; eger ne, jiyana dinyayê ji bendeyên layiq yên Xuda re ku bi heqîqeta jiyana dinyayê hesiyane û bi çavê wesîlê berê xwe didinê û ji her bêhnek ya 'emrê xwe ji bexteweriya xwe ya ebedî ra behrê jê digirin, ji wan ra ne tenê xirabiya dinyayê nehatîye gotin û dinya ne xirab e, belkî gelek jî xwey qîmet û bihadar e.

Netîce ya bijartina jiyana dinyayê

Wek çewa hatî gotin gorekî ewê seratiya pir zêde ya axiretê li ser dinyayê, bijartina jiyana dinyayê li ser axiretê karek bê 'eqlî ye (E'la / 16, Fecr / 24) û desthatek ji xem û puşmanîyê pêve jêre nîne,

[1] - Alê 'Imran / 185, 'Enkebût / 64, Muhemmed / 36, Hedîd / 20

û pîsatî ya vî karî hingê pitir eşkere dibê ku mirov bizanê xêncî ji dest dana xweşîyên ebedî bextreşî ya ebedî jî pêve tê. Û kesê axiretê jibîr bikê an inkar bikê, ne hema ji xweşîyên bihiştê bê behr dibê belkî ji her û her re wê 'ezabê cehnemê dest xwe ve bênê û zerera wî çend beraber e (Kehf/104-105, Hûd/22, Neml / 4- 5).

Ev e ku Qur'ana pîroz ji aliyekî ve behsa seratî ya xweşî yên axiretê dikê û hişyarîyê didîyê ku newebê jiyana dinyayê hewe bixapênê; [1] ji alîyê dî ve jî zererên dildana dinyayê û jibîr kirina axiretê û inkar an şika di cihana ebedî da dijmêrê û ser vê yêkê dişidênê ku ev karê he dibê sebebê bextreşî ya her û her[2]. Ne wereng e ku yê dinyayê dibijêrê hema tenê ji xêra axiretê bêbehr dibê, belkî xêncî ji wê ceza û nexweşiya ebedî jî li ser cih dibê.

Û sirra wê ev e ku mirovê dinyaxaz û dinyaperês karîn û isti'dadên ku Xuda dayînê zayi' kiriye û jinav biriye û dara ku gereke fêkîyê bexteweriya ebedî pêve bihata hişk kiriye û bêfêkî hiştiye û hay ji heqê qenckerê heqîqî (ibadet) nemaye û qencîyên ku Wî dayînê di rêka razî bûna Wî da mesref nekiriye û hema ev kes e ewê dema desthata evê bijartina xwe ya xirab dibînê, dixazê ku xwezî ax bûya û evahe nehat bûya serê wî (Nebe' / 40).

PIRSYARÊN DERSA 51

Ferqên navbeyna dinya û axiretê da yêk yêk bêjin.

Dinya ji çi alî ve melamet lê hatiye kirin.

Zererên dinyaxazîyê şîrove bikin.

Çima bê îmaniya bi axiretê dibê sebebê 'ezabê ebedî?

---

[1] - Beqere / 102, 200, Tewbe / 38, Rûm / 33, Fatir / 5, Şûra / 20, Zuxruf / 32, 35.

[2] - Isra / 10, Beqere / 86, En'am / 130, Yûnus / 7, 8, Hûd 15, 16, Ibrahîm / 3, Nehl / 22, 107, Mu'minûn / 74, Neml / 4, 5, 66, Rûm / 7, 16, Luqman / 4, Sebe' / 8, 21; Zumer / 25, Fussilet / 7, Nazi'at / 38, 39.

DERSA 52

PEYWENDA DINYA Û AXIRETÊ

Dagirê:

Pêşekî

Dinya zevî ya axiretê ye

Xweşîyên dinyayê ne sebebê bexteweriya axiretê ne

Xweşîyên dinyayê ne sebebê bextreşî ya axiretê ne

Desthat

Pêşgotin

Me zanî ku jiyana mirov hema ne ew e li vê dinyayê da, belkî wê dîsa sax bibê û her û her di 'alema axiretê da sax bimînê. Her wiha me zanî ku jiyana heqîqî û rastî, jiyana axiretê ye; bi awayek wereng heta ku di beraberê wê [jiyana axiretê] da ne layiq e mirov navê jiyanê deynê ser jiyana dinyayê.

Niha dor gehaye wê yêkê ku em behsa girêdana di navbeyna dinya û axiretê da bikîn. Elbet ji gotinên pêşda qederekî ev girêdan ronahî bû. Lê ji ber xwehr fikrî yên ku vê derheqê da heyîn baş e ku em pitir vê derheqê da baxivîn, da ku pê delîlên 'eql û gotinên Qur'anê girêdan û peywenda ku navbeyna dinya û axiretê da heyî ronahîtir bibê.

Dinya zevî ya axiretê ye

Gotina me ya ewil vê derheqê da ew e ku se'adet û şeqaweta (bextewerî û bextreşî) axiretê li pey me'emilet û kiryarên mirov e

di dinyayê da. Ne werng e ku ji dest ve anîna xweşîyên axiretê ra mirov bikarê li wêderê kar û xebatekî bikê, an ewê qewîtir û 'eqilmendtir bikarê xweşî yên zehftir dest xwe ve bênê an ewê hîlebaztir bikarê ji desthata yên dî ji xwe re bibê, çewa ku hinek nezan wereng guman dikin û 'alema axiretê bi temamî ji 'alema dinyayê cuda hesab dikin.

Qur'ana pîroz ji devê hinek kafiran neql dikê ku: «(yê dinyaxaz got:) Ez guman nakim qiyamet rabê û eger (rabê û) ez bi alîyê Xuda yê xwe ve bêm zivirandin, ez baştirê ji xweşîyên dinyayî li wêderê bi dest ve bînim» (Kehf / 36).

Û li sûretê Fussilet, ayeta 50 da jî dibêjê: «Ez guman nakim qiyamet rabê û eger (rabê û) ez bal Xuda yê xwe ve bêm zivirandin, minê li bal Wî baştirîn xweşî û ni'met hebin».

Evan kesan an guman kiriye ku di axiretê da jî wê pê xebata xwe xweşîyên zehfî bikarin dest ve bînin, an gumana wan ew bûye ku behremendiya wan ji xweşîyên dinyayê nîşana lutf û merhemeta Xuda ya taybet e ji wan ra; nixwe ev lutf û merhemet di axiretê da jî ji wan ra heye!

Di her hal û karî da eger kesek axiretê serbixwe û ne girêdayî bi dinyayê ve bizanê û karê dinyayê di xweşî û 'ezabê axiretê da bê tesîr bizanê, ewî bawerî bi qiyameta ku yêk ji ruknên baweriya dînên 'esmanî ye neaniye. Çimko ev esl bi xêr û ceza û kiryarên dinyayî ve girêdayî ye û li ser vê yêkê ava bûye û ji ber vê ye ku dinya bazar û ticaretxane an zevî û mezre'e ya axiretê hatiye nav kirin. Ku gereke li vêderê kar û xebat bê kirin û bê çandin û li

wêderê jê hilanî û çinî. [1] Mefhûmê delîlên me'adê û gotinên Qur'anê jî ji vê pêve ne tiştek dî ye.

Xweşîyên dinyayê ne sebebê bexteweriya axiretê ne

Hineka jî wereng fikr kiriye ku xweşî û zarok û malê dinyayê sebebê rihetî û xweşiya axiretê ne jî. Û belkî çal kirina zêr û zîv û mucewherat û tiştên xwarinê digel mirîyan ji vê xeyal û bîr û hizrê hatibê meydanê.

Qur'an kerem dikê ku ew mal û zarok bi xwe bi xwe dibin sebebê nêzîkiya Xuda (Sebe' / 37) ne jî di cihana axiretê da feydê digehînin kesî (Şu'era /88; Luqman/33, Alê 'Imran/10,116, Mucadile / 17) û ji xwe ev awayê peywend û wesîle yên dinyayî li wêderê jinav diçin (Beqere / 166, Mu'minûn / 101) û herkes heyî û hemî tiştên xwe ber didê (En'am / 94) û tek û tenê bi alîyê Xuda yê xwe ve tê heşr kirin û birin (Meryem/80,95) û tenê peywend û girêdanên me'newî û xudayî dimînin û ji ber vê ye ku bawerdarên ku digel hevjîn û zarok û famîl û eqreban peywend û girêdanên îmanê hebin di bihiştê da digel hev in (Re'd / 23, Xafir / 8, Tûr / 21).

Welhasil: peywend û girêdana ku di navbeyna dinya û axiretê da heyî ne wek peywendên di nav tiştên dinyayî da ne. Ne wereng e ku her kes di dinyayê da keyfxweştir û qewîtir û sipehîtir û dewlemendtir bê, di axiretê da jî dê wereng bê; eger ne, gerek Fir'ewn û Qarûn behremendtir bûna ...!

Hinek ji nezanan guman kirine ku meala ayeta Isra / 72 «Û kesê di vê dinyayê da kor bê di axiretê da jî kor û li rê windatir e»; ev e ku behremendî û selametiya dinyaî girêdanek

[1] - Lazim e mirov hay ji vê yêkê hebê ku di Qur'ana pîroz da mizgîniya padaş û xelatên dinyayî jî hatiye dayîn, lêbelê padaş û cezaya kamil û daimî taybetî yê axiretê ye.

rasterast gel selametî û behremendî ya axiretê heye, halhale korî ya di ayetê da ne korîtî ya bedenî û eşkere ye, belkî mexsed korîtî ya dil e. Çewa ku di ayetek dî da kerem dikê: «Çav kor nabin, belkî ew dilên di singa da kor dibin» (Hec / 46).

Taha / 124-126 kerem dikê:

«وَ مَنْ أَعْرَضَ عَن ذِكْرِي فَإِنَّ لَهُ مَعِيشَةً ضَنكًا وَنَحْشُرُهُ يَوْمَ الْقِيَامَةِ أَعْمَى ﷻ قَالَ رَبِّ لِمَ حَشَرْتَنِي أَعْمَى وَقَدْ كُنتُ بَصِيرًا ﷻ قَالَ كَذَلِكَ أَتَتْكَ آيَاتُنَا فَنَسِيتَهَا وَكَذَلِكَ الْيَوْمَ تُنسَى»

“Kesê bîr anîna min (an kitêba min) pişt xwe ve avêt. wê jiyanek bi zehmet hebê. Û roja qiyametê emê ewî kor mehşûr bikin. Dibêjê: çima te ez kor mehşûr kirim; halhale ez bîna bûm? (Xudê) dibêjê: wiha ye, ayetên Xuda yê te bi alîyê te da hatin, vêca te ew jibîr kirin; eha bi wî awayî îro tu jî hatî jibîr kirin”.

Nixwe sebebê korî ya di wê cihanê da jibîr kirina ayetên Xuda ye di vê cihanê da, ne korî ya zahirî û eşkere.

Vê gorekê girêdan û peywenda dinya û axiretê ne ji qismê peywenda di navbeyna esbab û musebbebatên dinyayî ye.

Xweşîyên dinyayî ne sebebê bextreşî ya axiretê ne

Hineka jî guman kiriye navbeyna xweşîyên dinya û axiretê da girêdan û peywendek bervajî heye û ew kes bexteweriya axiretê dest ve tênin ku ji xweşîyên dinyayê bêbehr bin. Û berhemendên ji xweşîyên dinyayê jî ji bexteweriya axiretê bê behr in. Lê evênhe bêxeber in ji vê yêkê ku dinyaxazî beraber nîne digel behremendiya ji xweşîyên dinyayê (binêrin ayetên: Beqere / 200, Alê ‘Imran / 77, Isra / 18, Şûra / 20, Ehqaf / 20) belkî dinyaxaz ew e yê lezzetên dinyayê bikê armanc û hedefa xebat û kiryarên xwe û hemî quweta xwe ji gehana wan ra bikar bibê, herçend negehê xwesta xwe. Û axiretxaz jî ew e ku dilê xwe bi lezzetên dinyayê ve girê nedê û hedefa wî axiret bê; herçend gelek ji xweşîyên

dinyayê behremend bê, wek hezretê Suleyman û gelek ji pêxemberên dî yên Xuda (selewat û selamên Xuda li ser wan bin), ku ji gelek xweşîyên dinyayê behremend bûne û ji bona gehana bexteweriya axiretê û razî bûna Xuda jê istifade kirine.

Nixwe navbeyna behremendiya ji xweşîyên dinyayî û xweşî yên axiretê ne tenasuba rasterast û ne tenasuba bervajî tunehin. Belkî hem xweşî û hem belayên dinyayê hekîmane di nav xelkê de belav bûne (Zuxruf / 32) û hemî ji bo imtihana wa ye [1] û behremendî an mehrûmiyeta ji xweşîyên dinyayê bi xwe bi xwe ne nîşanê nêzîkî û ne dûrî ya ji Xudê ye û ne jî sebebê bextewerî û bextreşî ya axiretê (Alê 'Imran / 179, Mu'minûn / 56, Fecr / 15, 16).

Netîce û desthat

Desthata vê behsê ev e ku inkara peywenda navbeyna dinya û axiretê de di hukmê inkara me'adê da ye, lê ne peywenda di nav xweşîyên dinyayê û axiretê û nexweşîyên wa de. Ewa ku dibê sebebê xweşî an 'ezabê axiretê, kar û kiryarên ixtiyarîyên mirovan di dinyayê de ye. Û evahe ye destata bi sedan ayetên Qur'anê ku behremendiya bexteweriya axiretê di girewa îmana bi Xudê û roja qiyametê û pêxembera da daniye û her wiha kirina karên xudayî wek nimêj û rojî û cihad û dana di rêka Xudê [infaq] da û qencî ya digel 'evdên Xudê û emrê bi qencîyê û nehya ji kirêtê û muqabila gel kafir û zaliman û rabûna 'edalet û cî kirina wî. Û 'ezabê ebedî jî di nav kufr û şirk û nifaq û inkara qiyametê û derewîn kirina pêxemberan û gunehkarî û zulmê û ... daniye.

[1] - Enfal / 28, Enbiya / 35, Texabun / 15, E'raf / 168, Kehf / 7, Maide / 48, En'am / 165, Neml / 40, Alê 'Imran / 186.

Di ayetekî da bi awayê giştî sebebê bextewerîya ebedî «îman û kar û 'emelê salih û qenc» zaniye [1] û sebebê bextreşîyê jî kufr û gunehkarî daye nasandin[2].

PIRSYARÊN DERSA 52

Inkara peywenda navbeyna dinya û axiretê da çi işkal heye?

Me'na dinya zeviya axiretê ye şîrove bikin.

Çi nisbetek heye di navbeyna xweşîyên dinya û axiretê da?

Çi nisbetek heye navbeyna xweşîyên dinyayê û 'ezabê axiretê da?

Çi tişt di dinyayê da bi awayek heqîqî dibê sebebê bextewerî û bextreşî ya axiretê?

---

[1] - Beqere / 25, 38, 62, 82, 103, 112, 277, Alê ‘Imran / 15, 57, 114, 115, 133, 179, 195, 195, 198, Nisa / Maide / 9, 65, 69, En’am / 48, Tewbe / 72, Yûnus / 4, 9, 63, 64, Re'd / 29, Ibrahîm / 23, Nehl / 97, Kehf / 2, 29, 30, 107, Taha / 75, Hec / 14, 23, 50, 56, Furqan / 15, 'Enkebût / 7, 9, 58, Rûm / 15, Luqman / 8, Secde / 19, Sebe / 4 , 37, Fatir / 7, S 49 /, Zumer / 20, 33, 35, Xafir / 40, Fussilet / 8, Şûra / 22, 26, Casiye / 30, Feth / 17, Hedîd / 12, 21, Texabun / 9, Telaq / 11, Inşiqaq / 25, Burûc / 11, Tîn / 6, Beyîne / 7, 8.

[2]- Beqere / 24, 39, 81, 104, 161, 162, Alê ‘Imran / 21, 56, 86, 88, 91, 116, 131, 176, 177, 196, 197, Nisa / 173 ,169 ,168 ,161 ,151 ,145 ,121 ,56 , Maide / 10, 36, 72, 86, En’am / 49, Tewbe / 3, 68, Yûnus / 4, 8, Re'd / 5, Kehf / 32, Xafir / 6, Şûra / 26, Casiye / 11, Feth / 13, 17, Hedîd / 19, Mucadile / 5, Texabun / 10, Mulk / 6, Inşiqaq / 22, 24, Xaşiye / 23, 24, Beyyîne / 6.

DERSA 53

ŞIKLÊ PEYWENDA NAVBEYNA DINYA Û AXIRETÊ

Dagirê: Pêşgotin

Peywenda heqîqî an danerî

Şahidên Qur'anî

Pêşekî

Me zanî ku navbeyna bawerî û karê qenc ji aliyekî ve, û nêzîkiya Xudê û xweşîyên axiretê ji alîyê dî ve, girêdan û peywend heye. Her wiha kufr û guneh ji aliyekî ve û dûriya ji Xuda û xweşîyên axiretê ji alîyê dî ve nisbetek rasterast heye. Her wiha di navbeyna îman û karê qenc gel 'ezabê axiretê û navbeyna kufr û guneh gel xweşîyên ebedî nisbetek bervajî û me'kûs heye. Derheq eslê va tenasuban de ji nezer Qur'anê ve çi şik û şubhe tunehin û inkara wan şûna inkara Qur'anê da tê hesabê.

Lê vê derheqê da ronahî kirina hinek mesela lazim e; wek: gelo ev rabite û peywendên ku hat gotin heqîqî û tekwînî ne, an ji ber qirardanê ye? Û çi girêdan navbeyna îman û karê qenc û kufr û guneh da heye? Û gelo navbeyna karê qenc û xirab bi xwe da jî tesîr û eser kirin heye?

Emê li vê dersê da ji vê yêkê baxivîn ku ev girêdan û peywendên hatîn gotin ne qirardadî û danerî ne.

Peywenda heqîqî an danerî

Çewa ku me gelek caran işare pê kirî, peywenda kiryarên dinyayî û xweşî û 'ezabên uxrewî, ne ji qismê peywendên maddî û me'mûlî ye; û mirov nikarê gorekî qanûnên fîzîkî an şîmiyayî û ... ewê şîrove û tefsîr bikê. Û heta fikra vê çendê ku enerjiya mesref bûyî di kiryarên mirov da li ser esasê bîr û hizra tebdîla maddê û enerjîyê bi hevdu tê berçav kirin û bi awayê xweşî an 'ezabê axiretî eşkere dibê û derdikevê meydanê, bîr û hizrek nedurust e. Çimko:

Yêk: enerjiya mesref bûyî di gotin û kiryarên mirovekî da belkî ne ew qas bê ku tebdîl bibê bi sêvekî, vê gorekê ew li kû û xweşîyên bê êjmarên bihiştê li kû!

Du: tebdîla maddê û enerjîyê bi hevdu ser esasê hinek sebebên taybet pêk tê û çi girêdanek digel başî û xirabî ya kiryaran û niyeta karker (fa'il) nîne û li ser esasê çi qanûnek tebî'î mirov nikarê ferqê bêxê navbeyna kiryarên xalisane û riyakarane da, heta vêca enerjî ya yêkî tebdîl bibê bi ni'met û enerjiya ya dî tebdîlê bi 'ezab û nexweşîyê bibê.

Sê: enerjiyek ku carekî di rêka 'ibadet da mesref bûyî, çêdibê carek dî di rêka ne guhdarîyê da bikar bê birin.

Lê nefya peywendek wiha, ne bi me'na inkara hemî peywendên heqîqî ye. Çimko daire ya peywendên heqîqî şamilê peywendên nenas û neyên tecrube kirin jî dibê û 'ulûmên tecrubî; çewa ku nikarin peywenda 'illiyeta navbeyna tiştên dinyayî û uxrewî da sabit bikin, nikarin hemî peywendên 'illî û me'lûlî jî pûç bikin û jinav bibin. Û ferza vê yêkê ku kiryarên baş û xirab eserek waqi'î di rûhê mirov da hebê û ew eserên rûhî bibin sebebê peyda bûna xweşî an 'ezabên uxrewî. Wek eser danîna hinek nufûsan di tiştên ji 'edetê der yên dinyayî da, ferzek wiha nabê neber 'eqil, belkî ser esasê hinek eslên taybetên felsefî ew bê sabit kirin. Û beyana wê ne munasibê halê vê kitêbê ye.

Şahidên Qur'anî

Beyanên Qur'anî herçend xalib bi awakî ne ku mirov peywenda qirardadî jê fêhm dikê, wek ayetên ku te'bîra ecr û ceza têda hatî, [1] lê mirov dikarê ji ayetên dî istifade bikê ku peywenda ku navbeyna kiryarên insan û xêr û cezayê axiretî da heyî, zêdetir e ji peywendek qirardadî û danerî.

Nixwe mirov dikarê bêjê: te'bîrên deste ya ewil ji rihet kirina fêhm kirinê û hay jê mana halê xalibê xelkê ra ye ku digel te'bîrên bi vî awayî nastir in. Her wiha ji gelek hedîs û riwayetan tê zanîn ku 'emelên ixtiyarî yên mirovan, şiklên melekûtî yên muxtelif jêra hene ku wê di 'alema berzex û qiyametê da derkevin meydanê û eşkere bibin.

Li vêderê emê berê xwe bidin hinek ayetan ku nîşan didin girêdan û peywendek heqîqî navbeyna kiryarên mirov û desthata wan ya axiretê da heye:

« وَ مَا تُقَدِّمُوا لأنفُسِكُم مِّنْ خَيْرٍ تَجِدُوهُ عِندَ اللّهِ - her başiya ku hûn pêş xwe da rêkin, hûnê ewê li bal Xuda bibînin» (Beqere/ 110; û binêrin: Muzzemmil / 20).

«يَوْمَ تَجِدُ كُلُّ نَفْسٍ مَّا عَمِلَتْ مِنْ خَيْرٍ مُّحْضَرًا وَ مَا عَمِلَتْ مِن سُوَءٍ تَوَدُّ لَوْ أَنَّ بَيْنَهَا وَبَيْنَهُ أَمَدًا بَعِيدًا وَيُحَذِّرُكُمُ اللّهُ نَفْسَهُ وَاللّهُ رَؤُوفُ بِالْعِبَادِ »

"Roja ku herkes kar û 'emelê baş û xirabê kirî hazir dibînê..." (Alê 'Imran / 30).

يَوْمَ يَنظُرُ الْمَرْءُ مَا قَدَّمَتْ يَدَاهُ – roja ku herkes berê xwe didê wê ya destên wî pêş xwe da rêkirî ... » (Nebe' / 40).

"Kesê qas zerreyekî karê baş bikê wê ewê bibînê û yê

[1] - Te'bîra «ecr» bi xwe 90 car û kelîme yên ji wê hatîn çêkirin jî ji sed car zêdetir di Qur'ana Pîroz da hatiye bikar anîn.

qas zerrekî karê xirab bikê wê ewê bibînê” (Zilzal / 7-8).

“Gelo cezayê ku ji hewe re tê dayîn xêncî ji wan kiryara ye ku hewe (di dinyayê de) kirîn” [1] (Neml/ 90 û binêre: Qeses /84)

«إِنَّ الَّذِينَ يَأْكُلُونَ أَمْوَالَ الْيَتَامَى ظُلْمًا إِنَّمَا يَأْكُلُونَ فِي بُطُونِهِمْ نَارًا وَسَيَصْلَوْنَ سَعِيرًا»

“Ewên bi zulm malê yetîman dixwin, xêncî ji agir nakin zikê xwe de» (Nisa / 10).

Eşkere ye ku dema mirov roja qiyametê dibînê kanê di dinyayê de çi kiriye, mexsed ne xêr û ceza ye; belkî sûret û şiklê melekûtî ya kiryar û 'emela ye ku bi şiklê xweşî an 'ezab xwe nîşan didê û şexs pê wan dikevê xweşîyê an 'ezab. Wek çewa ji ayeta paşî tê fêhmê, şiklê xwarina malê yetîm agir e. Û çewa ku dema li qiyametê da heqîqet eşkere dibin wê bibînê ku xwarina filan xwarina heram, agir bûye û wê şewata navdeyî ya wî bibînê û wê jêra bê gotin: gelo ev agir ji wî malê heramê te xarî pêve tiştek dî ye?!

PIRSYARÊN DERSA 53

Ferza vê yêkê ku tecessuma 'emelan tebdîla enerjî ya di kara de mesref bûyî ye bi madde, çi işkalek heye?

Mirov çewa dikarê peywenda heqîqî navbeyna 'emelê insan û desthatên axiretîyên wan bi awayek ber 'eql melheze bikê?

Ayet delalet dikin li ser tecessuma 'emelan? Û bikar birina te'bîrên wek «ecr» û «ceza» çewa tên me'ne kirin?

Gelo mirov dikarê tecessuma 'emelan bi me'na hazir bûna 'emelan bi şiklê wê yê dinyayî şîrove û tefsîr bikê?

[1] - و مَن جَاء بالسَّيِّئَةِ فَكُبَّتْ وُجُوهُهُمْ فِي النَّارِ هَلْ تُجْزَوْنَ إِلَّا مَا كُنتُمْ تَعْمَلُونَ -

DERSA 54

ESERA ÎMAN Û KUFRÊ DI SE'ADET Û ŞEQAWETA EBEDÎ DA

Dagirê: Pêşekî

Heqîqeta îman û kufrê

Nisaba îman û kufrê

Esera îman û kufrê di bextewerî û bextreşî ya ebedî da

Şahidê Qur'anî

Pêşekî

Meseleyek dî ji meselên vê behsê ev e ku gelo îman û 'emelê salih her yêk serbixwe 'amileke ji se'adeta ebedî ra, an herdu li ser hev dibin sebebê se'adeta ebedî? Her wiha kufr û neguhdarî ku gelo her yêk an pêkve sebebê 'ezabê ebedî ne? Eger şiklê duwê bê, ew kesê ku tenê îman heyî an tenê karê qenc kirî, an tenê kufr û an guneh tenê hebê wê sernivîs û 'aqibet û dûmahîka karê wî çi bê? Û eger bawerdar gelek guneh kiribin an kafirekî karê qenc kiribin, gelo ehlê bextewerîyê ne an bextreşîyê? Eger yêkî hinek ji 'emrê xwe bi îman û 'emelê salih û hinek digel kufr û guneh borandî bê, dûmahîka karê wî wê çi bê?

Ev mesele hema ji ewilê Islametîyê ve jê hatiye xeberdan û yên wek "Xewarican" gotine guneh 'amil û sebebek serbixwe ye ji şeqaweta ebedî ra û belkî dibê sebebê kufr û irtidadê jî û komên wek «Murci'e»ya jî gotine hebûna îmanê ji se'adeta ebedî ra bes

e û guneh kirin zererê nagehênê se'adeta bawerdar. Lê gotina heq ev e ku: her gunehek nabê sebebê kufr û şeqaweta ebedî, herçend çêdibê ser hevda kom bûna gunehan îmanê jinav bibê. Her wiha ne wereng e ku digel hebûna îmanê hemî guneh bên bexşîn û 'efû kirin û guneh qet esera xirab jêre tunebê.

Di vê dersê de emê hinkî ve behsa heqîqeta îman û kufrê û esera wan di bextewerî û bextreşî ya ebedî de bikîn û meselên dî emê di dersên hêjbên da jê baxivîn.

Heqîqeta îman û kufrê

Îman haletek yê dil û rûhî ye ku ji ber zanîna mefhûmekî û qebûl û meyla bi wê çêdibê. Û pê zehfî û kêmiya her yêk ji van du 'amilan kamil dibê an li kêmê didê. Û eger mirov bi hebûna tiştekî [herçend bi awayê guman] agahî nebê, nikarê îmanê pê bênê, lê tenê xeberdar bûn û agahî ne bes e; çimko çêdibê ew tiştên agahî pê heyî an lewazimên wê xilaf û bervajîyê meyl û viyana wî bê û meyla wî li ser dijê wê bê û ji ber vê yêkê ji 'emel kirina bi lewazimê wê re biryarê nedê û heta belkî biryarê bi 'emelê bervajîyê wê bidê. Qur'an derheq Fir'ewniyan da dibêjê: «Ayetên Xudê bi zulm û xwe bilindkirinê inkar kirin, halhale yeqîn pê hebûn»[1] (Neml / 14).

Hezretê Mûsa (s) got Fir'ewn: «Muheqeq te zaniye ku ev ayet û mu'cize hema ew in ku Xuda yê 'esmana û 'erdê rêkirîn»[2] (Isra / 102). Halhale ewî îman neanî bû û digota xelkê: «Xêncî ji xwe ez çi xudayan ji hewe re nizanim»[3](Qeses /38).

Lê dema ket ber nûqî bûna di behrê da got: «Min îman anî ku

---

[1] - وَجَحَدُوا بِهَا وَاسْتَيْقَنَتْهَا أَنفُسُهُمْ ظُلْمًا وَعُلُوًّا فَانظُرْ كَيْفَ كَانَ عَاقِبَةُ الْمُفْسِدِينَ -

[2] - قَالَ لَقَدْ عَلِمْتَ مَا أَنزَلَ هَؤُلاء إِلاَّ رَبُّ السَّمَاوَاتِ وَالأَرْضِ بَصَآئِرَ وَإِنِّي لأَظُنُّكَ يَا فِرْعَونُ مَثْبُورًا -

[3] - وَقَالَ فِرْعَوْنُ يَا أَيُّهَا الْمَلَأُ مَا عَلِمْتُ لَكُم مِّنْ إِلهٍ غَيْرِي ... -

hema birastî xêncî Wî yê benî israîl bawerî pê anîn çi Xuda nînin»[1] (Yûnus / 90). Û me pêşda got îmana bi vî awayê neçarî, nayê qebûl kirin (dersa 9); eger îman jêra bê gotin.

Nixwe îman bi qebûl û meyla dil û ixtiyarê ve girêdayî ye, bervajîyê zanîn û xeber hebûnê ku bê ixtiyar jî tê dest û çêdibê. Ji ber vê yêkê mirov dikarê îmanê «karê ixtiyarîyê dil» hesab bikê, yanî pê berfireh kirina mefhûmê «'emel - kar» îman ji qismê 'emel hesab dibê. Wêje ya «kufr»ê jî carna ji nebûna meleke ya îmanê ra bikar tê birin û nebûna îmanê çi ji ber şik û nezanîyê an ji ber meyla bi bervajîyê wê û inkara bi qest û ... jêra kufr tê gotin, carna jî ji qismê paşî ra yanî inkar û 'inadê tenê ra tê gotin, ku emrek dijê îmanê ye.

Nisaba îman û kufrê

Gorekî wê ya ji ayet û hedîsan tê fêhmê kêmtirîn heddê îmanê ku ji bexteweriya ebedî ra lazim e ev e ku: bawerî bi Xuda yê tek û xêr û cezaya axiretê û durust bûna wê ya pêxemberan (selam li wa bin) anîn hebê û lazima wê jî ew e ku bi awayek gişti bi destûr û fermanên Xuda 'emel bikê. Û bilindtirîn merteba wê jî taybetê pêxemberan û ewliya yên Xuda ye (selam ser wan bin).

Û kêmtirîn kufr jî ew e ku: mirov di tewhîd an pêxemberî an qiyametê da şik hebê an inkar bikê. An jî inkara wê ya zanê ji alîyê Xuda ve ji pêxembera ra hatiye xarê. Û pîstirîn merteba kufrê jî inkara bi 'inad ya va heqîqeta ye û biryara berberekaniya digel wa ye di hallekî da ku zanê rast û durust in.

Vê gorekê şirk (inkara yêk bûna Xudê) jî ji kufrê tê hesab kirin û nifaq hema kufra navdeyî û xef e û tevlî hîlebazîyê ye ku xwe musilman nîşan didê, kafirê nixûmandî ye. Û cihê wî li biniya binê

[1] - حَتَّى إِذَا أَدْرَكَهُ الْغَرَقُ قَالَ آمَنتُ أَنَّهُ لا إِلـهَ إِلاَّ الَّذِي آمَنَتْ بِهِ بَنُوا إِسْرَائِيلَ وَأَنَا مِنَ الْمُسْلِمِينَ -

agirê cehnemê da ye[1] (Nisa / 145). Lazimê gotinê ye ku Islam û kufra ku di fiqhê da jê tê xeberdan û derheq hukmên bi wa ve girêdayî, wek: pakî û helaliya ser jê kirî ya wan û caiz bûna zewicînê digel wan û mîrat birin an bervajîyê wan çi mulazime digel îman û kufra ku di behsa binyatên dînî de jê tê xeberdan tunehin. Çimko çêdibê kesek "şehadeteyn"ê bêjê û hukmên musilmanên li ser carî bibin lê di dil da îman û bawerî tunebê.

Nukteyek dî ya gotinê ev e ku eger kesekî karîn tunebê ku binyatên dînî nas bikê, mesela yê dîn, an bê 'eql, an ji ber şert û mercên heyîn nekarî dînê heq nas bikê, ew kes qas nekarîn û qusûra xwe me'zûr e û lê nayê girtin. Lêbelê kesê karîn ji nas kirinê ra hebê û texsîratîyê bikê û di halê şikê de bimînê an bê delîl binyatên dîn û lazimî yên di dîn da heyîn inkar bikê, ew ne me'zûr e û wê ber 'ezabê ebedî bikevê.

Esera îman û kufrê di bextewerî û bextreşî ya her û her da

Ji ber vê yêkê ku kemala heqîqî ya mirov pê nêzîkiya bal Xudê ve tê dest û ketina wî jî pê dûriya ji Xudê ye, mirov dikarê îmana bi Xuda yê Te'ala û rubûbiyeta Wî ya tekwînî û teşrî'î ku mustelzimê baweriya bi qiyamet û pêxemberîyê ye darka kemala heqîqî ya insan hesab bikê ku karên xudayî wek çiq û belgan pêve tên û fêkîyê wê jî bextewerî û se'adea ebedî ye ku li axiretê eşkere dibê. Vêca kesê tovê îmanê di dilê xwe da neçand û şûna wê da tovê jehrî kirîyê kufr û neguhdarîyê çand, ewî isti'dad û qabiliyetên Xuda dayî jinav birine û dara ku ziqqûm pêve tê li biniya cehnemê da ji xwe re çandiye. Mirovê wiha berê wî ne li bexteweriya ebedî ye û esera karên wî yên qenc ji vê dinyayê derbaz nabê.

[1] - إِنَّ الْمُنَافِقِينَ فِي الدَّرْكِ الأَسْفَلِ مِنَ النَّارِ وَلَن تَجِدَ لَهُمْ نَصِيرًا -

Sirra wê jî ev e ku her karê ixtiyarî bizaveke ji rûhê mirov ra bo alîyê wê hedefê ku di fikra karker da ye, vêca kesê bawerî bi 'alema ebedî û qurba ilahî tunebê wê çewa bikarê xweyê vê hedefê bê û berê karê xwe bidê wî alî ve? Nixwe ewê wiha qet nikarê berhêvîyê xêra ebedî bê ji Xuda yê Te'ala. Zêdetirîn tişta em dikarin derheq karê qencê kafiran da qebûl bikin ev e ku: eserek ji kêm kirina 'ezabê wan ra hebê, çimko karên qenc dikarê rûhê xwexazî û 'inadê lawaz bikê.

Şahidê Qur'anî

Qur'ana pîroz behsa esera îmanê di bexteweriya ebedî da dikê û bi dehan ayet hene ku di pey îmanê ra behsa hebûna karê qenc dikê. Çend ayet jî hene ku hebûna îmanê şertê eser danîna 'emelê salih zanê. Yêk ji wan ayeta 124 ji sûretê Nisa ye, kerem dikê: **«her mêr û jina ku karê qenc bikê di halekî da ku mu'min bê wê ew biçê bihiştê»**[1].

Ji alîyê dî ve vêca dibêjê 'ezabê ebedîyê cehnemê ji kafira ra ye û kar û 'emelê wan pûç hesab dikê. Di ayeta 18 ya sûretê Ibrahîm da 'emelê wan şebihandiye xwelîyê ku bayek dijwar lê bidê û çi eserê jê nehêlê[2].

Di ciyek dî da (Furqan / 23) kerem dikê: **"emê kar û 'emelê kafiran wek tozekî li hewa ra belav bikîn"**

«وَقَدِمْنَا إِلَى مَا عَمِلُوا مِنْ عَمَلٍ فَجَعَلْنَاهُ هَبَاءً مَّنثُورًا »

Di sûretê Nûr, ayeta 39 da 'emelê wan bi leylanê teşbîh dikê ku mirovê têhnî dilê xwe dibîyê û hêvîdar dibê û qestê dikê, lê dema digehê wêderê avê nabînê:

---

[1] - وَمَن يَعْمَلْ مِنَ الصَّالِحَاتَ مِن ذكَرٍ أَوْ أُنثَى وَهُوَ مُؤْمِنٌ فَأُوْلَـئِكَ يَدْخُلُونَ الجَنَّةَ وَلاَ يُظْلَمُونَ نَقِيرًا

[2] - مَّثَلُ الَّذِينَ كَفَرُوا بِرَبِّهِمْ أَعْمَالُهُمْ كَرَمَادٍ اشْتَدَّتْ بِهِ الرِّيحُ فِي يَوْمٍ عَاصِفٍ لاَّ يَقْدِرُونَ مِمَّا كَسَبُوا عَلَى شَيْءٍ - ذَلِكَ هُوَ الضَّلاَلُ الْبَعِيدُ

«وَالَّذِينَ كَفَرُوا أَعْمَالُهُمْ كَسَرَابٍ بِقِيعَةٍ يَحْسَبُهُ الظَّمْآنُ مَاء حَتَّى إِذَا جَاءهُ لَمْ يَجِدْهُ شَيْئًا وَوَجَدَ اللَّهَ عِندَهُ فَوَفَّاهُ حِسَابَهُ وَاللَّهُ سَرِيعُ الْحِسَابِ»

Nûr / 40 jî wiha dibêjê: «an wek tarîtiya bi behra kûr da ku pêlek serda hatiye û pêlek dî li ser wê pêlê, ser wê jî vêca 'ewrek hebê, tarîtîyên li ser hev, dema destê xwe derênê ewê nabînê û kesê Xudê ronahiyek nedayîyê, bê ronahî ye[1] (kınaye ye ji hereket û bizava kafiran ku nagehin çi deran).

Di ayetên dî da kerem dikê: desthata karê dinyaxazan di vê dinyayê da ji wan ra tê dayîn û ewan li axiretê da çi behr tunehin:

«مَن كَانَ يُرِيدُ الْحَيَاةَ الدُّنْيَا وَ زِينَتَهَا نُوَفِّ إِلَيْهِمْ أَعْمَالَهُمْ فِيهَا وَهُمْ فِيهَا لاَ يُبْخَسُونَ ۝ أُولَـئِكَ الَّذِينَ لَيْسَ لَهُمْ فِي الآخِرَةِ إِلاَّ النَّارُ وَ حَبِطَ مَا صَنَعُوا فِيهَا وَ بَاطِلٌ مَّا كَانُوا يَعْمَلُونَ»

(Hûd / 15 – 16. Û binêrin: Isra / 18, Şûra / 20, Ehqaf / 20)

PIRSYARÊN DERSA 54

Gotina xewaric û murci'e û gotina durust derheq îman û kufrê da bêjin.

Heqîqeta îman û kufrê û peywenda wan digel zanîn û cehlê beyan bikin.

Nisaba lazim ya îman û kufrê ronahî bikin.

Nisbeta şirk û nifaqê gel kufrê beyan bikin.

Islam û kufra fiqhî çi nisbetek heye gel îman û kufra kelamî.

Esera îman û kufrê di bextewerî û bextreşî ya axiretê da û sirra wê beyan bikin.

Şahidên Qur'anê li ser vê tesîrê beyan bikin.

---

[1] - أَوْ كَظُلُمَاتٍ فِي بَحْرٍ لُّجِّيٍّ يَغْشَاهُ مَوْجٌ مِّن فَوْقِهِ مَوْجٌ مِّن فَوْقِهِ سَحَابٌ ظُلُمَاتٌ بَعْضُهَا فَوْقَ بَعْضٍ إِذَا أَخْرَجَ يَدَهُ لَمْ يَكَدْ يَرَاهَا وَمَن لَّمْ يَجْعَلِ اللَّهُ لَهُ نُورًا فَمَا لَهُ مِن نُّورٍ

DERSA 55

GIRÊDANA DUBEREKIYA ÎMAN Û 'EMEL

Dagirê: Pêşgotin

Peywenda îmanê digel 'emel

Peywenda 'emel digel îmanê

Desthat

Pêşekî

Heta niha me zanî ku ‘amil û wesîla eslî di bextewerî û bextreşî ya ebedî û her û her da îman û kufr e; û bexteweriya her û her bi îmana cîgirtî ve tê; herçend guneh kirin dibê sebebê 'ezabê mehdûd. Û ji alîyê dî ve vêca bextreşî ya her û her jî bi kufra cgirtî ve tê û digel hebûna kufrê qet çi karê qenc nabin sebebê bexteweriya axiretê. Her wiha me işare kir bal vê çendê ve ku îman û kufr qewî bûn û ze'êfî jêre heye û çêdibê kirina gunehên zehfî yên mezin îmanê jinav bibê. Her wiha kirina karên qenc reh û rîşên kufrê ze'êf dikê û çêdibê ku rêkê ji îmanê ra vekê.

Ji vê derê muhimmî ya pirsyara derheq peywenda îman û 'emel da ronahî dibê û di vê dersê da emê vê derheqê da baxivîn.

Peywend û girêdana îmanê digel 'emel û kiryarê

Ji gotina pêşda ronahî bû ku îman haletek rûhî ye ku maya wê ji zanîn û pey ketinê hatiye girtin û lazima wê ew e ku mirovê xwey îman biryarek gişti hebê ku bi wê ya lazimê îmana xwe 'emel bikê.

Vê gorekê eger kesek ji heqîqetekî xeberdar e, lêbelê biryar daye ku qet çi wextî bi çi yêk ji lewazim û pêve girêdayî yê wê 'emel nekê, ewî îman bi wê tiştê nîne. Heta eger di şikê da bê ku bi wan 'emel bikê an nekê dîsa ewî îman neaniye. Qur'an dibêjê: «(Komekî) ji çoliyan gotin: me îman aniye. (ey pêxember) Bêje: hewe îman nîne, lê bêjin me Islam aniye. Û hêca îman neketiye dilê hewe» (Hucurat / 14).

Lê îmana rastî jî mertebe û derecên wê hene. Û ne wereng e ku hemî mertebên wê bikê lazimê xwe ku bi hemî lewazimê wê 'emel bê kirin. Çêdibê halatên şehewanî û xezebî mirovê îman ze'êf bi alîyê guneh û neguhdarîyê ve pal bidê, lê ne bi awayekî ku biryarê bidê daim gunehan û muxalefeta lewazimên îmana xwe bikê. Elbet çiqas îman qewîtir û kamiltir bê eserek pitir heye ji kirina karên rêk ketî û munasib digel îmanê.

Welhasil: îman di eslê xwe da li ber xwe girê vê çendê ye ku lazimîyên wê bi cî bên û qas û miqdarê evê tesîrê jî girêdayî ye bi zehfî û ze'êfiya wê ve û paşî ra irade û biryara mirov e ku dibê sebebê kirin an nekirina karekî.

Peywenda 'emel digel îmanê

'Emelê ixtiyarî, an baş û rêkketî ye digel îmanê, an jî nebaş û muxalifê berûkê îmanê ye. Şiklê ewil îmanê qewî û dil ronahî dikê û şiklê duwê dibê sebebê ze'êfiya îman û tarî bûna dil. Vê gorekê karê qenc ku ji mirovê mu'min çêdibin herçend ji îmanê serkanî girtine; lê dibin sebebê quwet û cîgiriya îmanê û rêkê ji kirina karên qencî yên dî re jî vedikin. Û mirov dikarê esera 'emelê qenc ser kamil kirina îmanê ji vê ayetê fêhm bikê (Fatir / 10): « إِلَيْهِ يَصْعَدُ الْكَلِمُ الطَّيِّبُ وَالْعَمَلُ الصَّالِحُ يَرْفَعُهُ - gotina (baweriya) baş bi alîyê Xudê ve bilind dibê û kar û 'emelê qenc ewê bilind dikê» (gorekî vê me'nê: zemîra fa'ilî bo «el-emel es-

salih» û ya mef'ûlî bo «el-kelim et- teyyîb» dizivirê). Her wiha di gelek ayeta da behsa zêde bûna îmanê û ronahî ya hidayetê ji qenckara re hatiye kirin: (binêrin: Alê ʻImran / 173, Enfal / 2, Tewbe / 124, Kehf / 13, Meryem / 76, Ehzab / 22, Muhemmed / 17, Muddessir / 31).

Ji alîyê dî ve vêca eger xwestên mirov bûn sebeb ku karên bervajîyê berûkê îmanê bên kirin, yanî karên nebaş ji mirov çêbin û îmana wî ne ewqas bihêz bê ku nehêlê ew kar bên kirin hingê kêm kêm îman ze'êftir dibê û rêk ji kirina gunehên dî ra vebê û eger hema bi vî awayî dewam bikê wê rêk ji gunehên mezintir re vebê û tekrar û dubare bibê û paşî ra çêdibê el'eyazu billah esl û esasê îmanê bavêjê ber zewal û jinavçûnê û ewê bi kufr û nifaq biguhêzê.

Qur'ana pîroz derheq wa yên dûmahîkê ra gehayîn nifaqê wiha kerem dikê: «Pey wê bê soziya wan digel Xudê û derewgotinên wa re nifaqek di dilê wa de cî kir, heta roja ku raberê Wî bibin»[1] (Tewbe / 77).

Û kerem dikê: «Vêca dûmahîka karê wa yên pîstirîn guneh dikiran bû ev ku ayetên Xudê inkar dikiran û tevzê xwe pê dikiran» (Rûm / 10).

Her wiha di gelek ayeta de behsa zêde kirina kufr û tarîtî û dilreqiya gunehkaran kiriye. (binêrin: Beqere / 10, Alê ʻImran / 90, Nisa / 137, Maide / 68, Tewbe / 37, Isra / 60, 82; Sef / 5, Nûh / 24).

Netîce û desthat

Pê berçav girtina girêdana duberekî ya îman û 'emelê baş û qenc û esera wan di bexteweriya mirov da, mirov dikarê jiyana bextewerane û bi se'adet teşbîh bikê bi darekî (Ibrahîm / 24 - 27)

[1] - فَأَعْقَبَهُمْ نِفَاقًا فِي قُلُوبِهِمْ إِلَى يَوْمِ يَلْقَوْنَهُ بِمَا أَخْلَفُوا اللَّهَ مَا وَعَدُوهُ وَبِمَا كَانُوا يَكْذِبُونَ -

ku îmana bi Xuda yê tek û tenê û îmana bi hinartî û peyamên Wî û îmana bi roja xêr û cezadanê, roja qiyametê; reh û rîşe yên wê darê ne, û qurmê wê hema biryara giştî ye bi 'emelê bi lewazimên wî û çiq û bergê wê, ew kar û 'emelê qenc in ku quweta xwe ji reh û rîşên darê digirin û fêkîyê wê jî bexteweriya her û her û daimî ye. Û eger reh û rîşe tunebê qurm û çiq û berg çênabin û fêkiyek jî pêve nayê.

Lê ne wereng e ku hebûna reh û rîşê, daim bikê lazimê xwe ku çiq û belgên munasib hebin û fêkiyek baş bidê. Belkî carna ji ber şert û mercên nebaş û peyda bûna afetan çiq û belgên lazim pêve neyin û ne hema fêkiyek baş nedê belkî carna dibê sebeb ku dar bi xwe jî hişk bibê. Her wiha çêdibê ji ber peywenda ku bi qurm an çiq û heta carna jî bi reh û rîşê darê ve datînin hinek tiştên dî jê çêbin û carna jî tebdîl bibê bi darek dî û evahe hema tebdîla îmanê bi kufrê (irtidad) ye.

Welhasil: baweriya bi tiştên hatî gotin sebebê eslî yê bexteweriya mirov e, lê esera kamila vî ‘amil û sebebî bi kêşana mewaddên lazim yên xezayî ve girêdayî ye ku ji rêka karên qenc ve çêdibê û jinav birina afeta jî bi rêka xwe vedana ji guneha ve ye.

Û terka waciba û kirina heraman reh û rîşa îmanê ze'êf û lawaz dikê û carna jî dibê sebebê hişk bûna wê, çewa ku peywenda bawerîyên nedurust dibê sebebê guherîna mahiyeta wê .

PIRSYARÊN DERSA 55

Esera îmanê di kiryarên qenc da jê baxivin.

Esera karên baş û xirab di qewî kirin û ze'êf kirina îmanê da bêjin.

Peywenda duberekî ya îman û 'emel û girêdana wan bi bexteweriya mirov ve beyan bikin.

DERSA 56

ÇEND NUKTÊN GIRÎNG Û MUHIM

Dagirê:

Pêşekî

Kemala heqîqî ya mirov

Tebyîna 'eqlî

Esera hedef û niyetê

Pêşekî

Hinek ji wa yên digel ferhenga Islamî nas an nasîbûnek baş neyîn û pê pîvekên nedurust biha û qîmetê karê mirova dipîvin û niyet û hedefa karker jî muhim nizanin û wek dibêjin: «husna fa'ilî» (di beraberê husna fi'lî de) tunehin û an kêşeka bihayê kar û 'emelan tenê di esera rihetiya ji ya dinyayî da guman dikin, mirovên wiha di vejenîna gelek ji bawerî û zanînên Islamî da ji rê derdikevin û an fêhm û beyana wa da nekar dibin. Yêk ji wa tişta esera îmanê û girêdana wê bi 'emelê salih ve ye û her wiha di esera wîrankera kufr û şirkê da dikevin xeletê, mesela wiha fikr dikin ku kaşifên mezin ku wesîla rihetîyê ji xelkê ra anîne, an azadî xazên ku di rêka azadî ya milletê xwe da xebat û fidakarî kirine gereke meqam û merteba wan ya axiretî jî gelek bilind û xweş bê, herçend îman bi Xudê û roja qiyametê nebin...

Herçend nuqta ze'êfî û xeletiya vê fikrê ji dersên borîyê kifş bûn, lê çimko ev fikrên he hinekî di vî zemanî da belav bûne û ji nesla

hêjbê ra xeter têda heye gereke li vêderê em pitir li ser baxivîn û ronahî bikîn.

Kemala heqîqî ya mirov

Eger em darek ya sêvê gel darek bêber û bêfêkî qiyas bikîn emê dara sêvê ji ya bêber pitir qîmet bidinê. Û ev hukm dan ne tenê ji ber wê ye ku mirov ji dara xwey fêkî behrek pitir dibê, belkî dara xwey fêkî ji wî cihetî ve ku kamiltir û eserên pitir di wê da hene di zatê xwe da bi qîmettir e. Lê hema ev dara sêvê eger afet lê bikevê û ji rêka kemala xwe derkevê wê qîmet û bihayê xwe ji dest bidê û heta belkî bibê sebebê zerer gehandinê jî.

Mirov jî ku werê qiyas kirin gel candarên dî, ev hukm jêre heye, eger bigehê kemala layiqê xwe û eserên munasibê fitreta xwe jê bixweyhin wê ji yên dî bi qîmettir bê, lê eger xwehrî û afet serda bên, çêdibê ji heywanên dî hemiya jî bê qîmettir û bi zerertir bibê; çewa ku Qur'anê hinek mirov pîstir ji hemî civokan (Enfal / 22) û li rê wundatir ji dewaran (E'raf / 179) zaniye.

Ji alîyê dî ve vêca eger hinek dara sêvê tenê hingê dîtibin nikarin bi heqîqet û kemala wî ya paşîn bihesin û tenê ew kes dikarin kemala wî ya nihayî û paşîn pê bihesin û bizanin ku nas bin digel kemala wî ya nihayî.

Lê kemala heqîqî ya mirov ne ji pêka kemalatên maddî û tebî'î ye. Çimko çewa pêşda jî me got insaniyeta insan bi rûhê melekûtî ve girêdayî ye û tekamula insan jî di heqîqet da hema kamil bûna rûh e ku pê xebatên xwe yên ixtiyarî tê dest, çi xebata navdeyî û dilî û çi jî xebata ji derveyî û pê navcîtiya endamên bedenê. Vêca kemala bi vî awayî mirov nikarê pê tecrube yên hissî û pê kêşek û pîvekên qas û miqdara nas bikê û miqdarê wê kifş bikê û her wiha rêka gehana wê jî mirov nikarê pê wesîle yên ceribandinê nas bikê. Nixwe ew kesê ku bi xwe negehayî vê kemalê û ew pê 'ilmê huzûrî û şuhûda qelbî peyda nekiriye gereke ewê bi rêka

delîla 'eqlî an bi rêka wehya ilahî û kitêbên 'esmanî ve nas bikê.

Gorekî wehyê û beyanên Qur'an û gotinên Pêxember (s) û ehlê mala wî ya pak, bê şik kemala nihayî ya mirov mertebeyeke ji wucûda Wî ku pê gotina «qurba ilahî» jê tê xeberdan û eserên wê jî razî bûna Xuda ye ku wê di 'alema axiretê da eşkere bibê. Û rêka wê jî Xuda perêsî û teqwatî ye ku hemî jiyana ferdî û komî li ber xwe digirê.

Lêbelê ji nêrîna 'eqlî ve mirov dikarê delîlên hinkî ve aloz ji vê ra bênê ku muhtacê pêşekî yên felsefî yên zehfî ne. Li vêderê emê xwe reht bikîn da em bikarîn meselê rihettir ronahî bikîn.

Tebyîna 'eqlî

Mirov di fitreta xwe da li pey kemala bê hedd û bê sînor e, ku zanîn û qudret ji wê tên hesab kirin. Û gehana evê kemalê ye ku dibê sebebê lezzeta bê sînor û bexteweriya cîgirtî. Û hingê çêdibê ev kemal ji mirov ra hebê ku digel serçavka ʻilm û qudret û kemala temam yanî Xuda yê Te'ala peywend û girêdanê peyda bikê û hema ev irtibat û girêdan e ku bi navê «qurb» hatiye nav kirin. (binêrin kitêba: Xudşinasî berayê xudsazî - ji nivîser).

Nixwe kemala heqîqî ya mirov ku hedefa xilqeta wî ye di bin sîbera girêdan û qurba Xuda yê Te'ala ve tê dest û mirovê ku kêmtirîn merteba vê kemalê, yanî ze'êftirîn merteba îmanê jî tunebê, wek wê darê ku hêj negehaye berê xwe û nûberê wê jî nehatiye dest. Eger ev dar ji ber afeta ku serda hatî qabiliyeta fêkî danê ji dest bidê wê ji darên bêber jî kêmtir bê hesab kirin.

Vê gorekê muhimmî ya îmanê di kemal û bexteweriya mirov da ji vî cihetî ve ye ku taybetî ya eslî ya rûhê mirov irtbat û girêdana agahane û ixtiyarî ye bi Xuda yê Te'ala ve; û bêy wê ji kemala layiq û eserên wê mehrûm û bê behr dimînê û bi gotinek dî: insaniyeta wî nagehê fi'liyetê. Û eger pê bijartina xirab vêca

evê qabiliyet û isti'dada hêjayî jinav bibê, mezintirîn zulm li xwe kiriye û bûye musteheqê cezadana ebedî. Qur'ana pîroz derheq va kesa de dibêjê: «bê şik pîstirîn civok li bal Xudê ew in yên kafir bûyîn vêca bawerîyê naynin»[1] (Enfal / 55).

Hasilê gotinê: îman û kufr bergehê mirov e ji bona gehana kemal û bextewerîyê an ketin û bextreşîyê. Û tebî'î ye ku kîjan li paştir bê wê gorekê esera nihayî û paşîn wê hebê.

Esera hedef û niyetê

Eger eslê hatî gotin berçav bê girtin ronahî dibê bihayê heqîqî yê karên ixtiyarî yên mirov bi vê ve girêdayî ye kanê ji gehana kemala heqîqî ra ku qurba ilahî ye çiqas eser hebûye. Û herçend hinek kar bi awayekî [heta eger bi çend wasitan rêka tekamula xelkê vedikê] wesfê başîyê bi xwe digirin, lê esera wan di bexteweriya ebedî ya fa'il de, girêdayî ye bi wê eserê ve ku ketiye rêka tekamula rûhê wî da.

Ji alîyê dî ve girêdana ef'alê xaricî digel rûhê fa'il ji rêka iradê ve tê dest ku karê wî yê bê wasite ye, û irade ya kar, ji meyl û şewq û viyana bi xayet û netîceyan der tê û hema ev e ku bizavê di nav rûh da çêdikê ku bi alîyê hedef û mexsedê ve dikevê rê, û di şiklê irade ya kar da xwe nîşan didê. Nixwe bihayê karê iradî tabi'ê niyet û bizavçêkerê fa'il e û husna fi'lî bêy husna fa'ilî di tekamula rûh û bexteweriya ebedî da bê eser. Hema ji ber vê ye ku karên bi niyeta maddî û dinyayî pêk tên di bexteweriya ebedî da bê eser in. Û mezintirîn xizmetên komî jî ji xelkê ra eger bi qest û niyeta xwe nîşan dan û pêşde danê (riya) bê, kêmtirîn feydê nagehênê fa'il. [2] Belkî wê bibê sebebê zerer û paşketina

[1] - إِنَّ شَرَّ الدَّوَابِّ عِندَ اللّهِ الَّذِينَ كَفَرُوا فَهُمْ لاَ يُؤْمِنُونَ -

[2] - Binêrin: Sûretê Beqere / 246, Nisa / 38, 142, Enfal / 47, Ma'ûn / 6.

rûhê wî jî. Û li ser vê binyatê ye ku Qur'ana pîroz esera 'emelê qenc di bexteweriya axiretê da girê daye bi îman û qesta qurbeta Xudê ve[1].

Welhasil: karê qenc ne ew tenê ye ku mirov ji xelkê ra xizmetê bikê. Her wiha xizmeta ji xelkê ra wek 'ibadetê erdî hingê eser di kemal û bexteweriya ebedî da heye ku niyet xudayî bê û hedef ji serçavka xudayî hatibê girtin.

[1] - Binêrin Sûretê: Nisa / 124, Nehl / 97, Isra / 19, Taha / 112, Enbiya / 94, Xafir / 40, En'am / 52, Kehf / 28, Rûm / 38, Beqere / 207, 265, Nisa / 114, Leyl / 20.

PIRSYARÊN DERSA 56

Bihayê heqîqî yê her tiştî bi çi ye?

Mirov çewa dikarê kemala nihayî ya insan nas bikê?

Sabit bikin ku kemala nihayî ya insan tenê li bin sîbera girêdan û qurba ilahî ve çêdibê.

Sabit bikin ku esera qenciyan di se'adeta ebedî da girêdayî ye bi vê çendê ve ku niyet xudayî bê.

DERSA 57

HEBT Û TEKFÎR

(Hebt û Tekfîr du istilahên Qurʾanê ne. Hebt- bi me'na bê eser bûna karên qenc û Tekfîr- bi me'na cubrana guneha ye).

Dagirê:

Pêşekî

Peywenda îman û kufrê

Peywenda karên baş û xirab

Pêşekî

Yêk ji mesele yên derheq peywenda îman û 'emelê salih digel seʾadeta uxrewî û her wiha peywenda kufr û 'isyan digel bextreşî ya ebedî ku jê tê xeberdan ev e:

Gelo girêdana her bêhnekî ya îman û kufrê her wiha karê qenc û xirab digel desthata wan ya axiretî bê şik û sabit e? an çêdibê guherîn bikevitê? Mesela, gelo mirov dikarê esera gunehekî pê karekî qenc jinav bibê? an esera başiyekî pê gunehekî pûç bikê?

Gelo kesekî ku di du dewrana da 'emrê xwe hem di nav îman û qencîyê da derbaz kiriye hem jî di nav kufr û neguhdarî û 'isiyanê de, wê sernivîsa wî çewa bê? Gelo zemanekî wê xêr jêra bên dayîn û bikevê xweşîyê û zemanekî jî wê ceza û 'ezab bidinê? an mesele bi awayek dî ye?

Ev mesela he mesela «hebt» û «tekfîr»ê ye ku ji kevn da navbeyna mutekellimên Eş'erî û Mu'tezilî da xirecir hebûye li ser vê meselê. Emê di vê dersê de bîr û bawera Şî'an bi kurtî vê derheqê da bêjîn.

Peywenda îman û kufrê

Di dersên borî da me zanî qet çi karên qenc bêy baweriya eslên dînî nabê sebebê bexteweriya ebedî. Bi gotinek dî: kufr sebebê pûç kirin û bê eser kirina karê qenc û baş e.

Li vêderê em ser gotina pêşda zêde bikîn ku: îmana mirov di axirîka 'emr de eserên xirabên kufra pêşda jinav dibê û mehw dikê û wek tîrojên ronahîyê tarîtîyê pêşda radikê. Bervajîyê wê jî vêca heye ku kufra dûmahîka 'emr, eserên îmana pêşda jinav dibê û mehw dikê û perwende û dosya mirov reş û sernivîsa wî xirab dikê. Heçweku agir li bêderekî bikevê hemî başiyan dişewitênê.

Misalek dî eger em bînin ev e ku îman çirayeke ku di mala dil da hatiye berdan û mala dil pê ronahî bûye û kufr tefîn û temrîna wê çirayê ye ku mala dil di nav reşî û tarîtîyê da ye. Heta ku mirov di vê cihanê da ye daim ev guherîn û cih guhaztin jêra mumkin e, car çêdibê çira geş di dilê wî da hilbê û car heye kêm ronahî bê û car heye êkcar bitemirê, evahe heta hingê ye ku di vê cihanê da bijî, lê dema mirov ji vê dinyayê bar kir êdî çira wî di halê mirina wî di çi halî da bê êdî kêm û zêde nabê û heqê bijartinê jê tê girtin (binêrin dersa 49).

Ev esera ku di navbeyna kufr û îmanê da heyî gorekî nêrîna Qur'anê şik û şubhe têda nîne û gelek ayet vê derheqê da hene ku yêk ji wan: Texabun / 9, kerem dikê: «kesê îmanê bi Xudê bênê û karên layiq û qenc bikê wê (Xuda) karên wî yên xirab pûç û mehw bikê». Di sûretê Beqere, ayeta 217 da jî dibêjê: «kesê ji hewe ji dînê xwe bizivirê û di halê kufrê

da bimirê karên wî di dinya û axiretê da pûç dibê û evênhe ew cehnemî ne ku wê li wir bimînin»[1].

Peywenda karê qenc û xirab

Wek peywend û girêdana ku di navbeyna îman û kufrê da heyî mirov dikarê li vêderê jî bêjê. Lê ne bi awayê gişti û awayek wereng ku ji her û her ra karê baş di name ya 'emelê wî da sabit bê û 'emelê nebaşê pêşde jinav çûbê (çewa ku hinek ji mutekellimên Mu'tezilî gotîn) ...

Vê derheqê de gereke mesele ji hev werê qetandin, bi vî awayî: hinek karên qenc eger bi durustî û baş û meqbûl pêk bên eserên xirab yên pêşde jinav dibin; wek tewbê ku eger bi awayek meqbûl pêk bê, gunehên mirov 'efû dibin û tên bexşîn (Nisa / 110, Alê ‘Imran / 135, En’am / 54, Şûra / 25, Zumer / 53 û ...).

Tewbe wek tîrojê ye ku tam dikevê ser nuqta tarî û ewê ronahî dikê. Lê her karek qenc esera her gunehekî jinav nabê. Ji ber vê ye ku mirovê bawerdar heta bi demekî giriftarê kêşana cezayê gunehê xwe bibê û paşî ra biçê di bihişta her daim heyî da. Heçweku rûhê mirov çend alî ye; her birek ji karên baş û xirab bi alîyek yê wê ve girêdayî ne. Mesela, karê baş ku alîyê «A»yê ve girêdayî ye nikarê esera guhhê alîyê «B» jinav bibê, illa ku 'emel û karê qenc û baş ewqas ronahî bê ku ronahiya wê bigehê alîyên dî yên rûh, an guneh gelek esera xwe hebê û genî bê ku tarîtîyê ser karê baş da bidê.

Di hedîsa şerîf de hatiye ku nimêja meqbûl gunehan dişo û dibê sebebê 'efû bûna wan. Qur’ana pîroz kerem dikê: «di du alîyê rojê û qismekî ji şevê nimêj bike! Birastî başî, nebaşîyê

[1]- وَمَن يَرْتَدِدْ مِنكُمْ عَن دِينِهِ فَيَمُتْ وَهُوَ كَافِرٌ فَأُوْلَـئِكَ حَبِطَتْ أَعْمَالُهُمْ فِي الدُّنْيَا وَالآخِرَةِ وَأُوْلَـئِكَ أَصْحَابُ النَّارِ هُمْ فِيهَا خَالِدُونَ

jinav dibin»[1]. (Hûd / 114)

Hinek ji gunehan wek: pêk neanîna heqê dê û baba û eziyeta wan; 'ereq vexwarin û ... heta bi demekî dibin sebebê qebûl nebûna ‘ibadet. An minnet kirina piştî arîkarîyê, xêra wê jinav dibê. «يَا أَيُّهَا الَّذِينَ آمَنُوا لاَ تُبْطِلُوا صَدَقَاتِكُم بِالْمَنِّ وَالأذَى - qencî yên xwe pê minet û eziyetê pûç nekin» Beqere / 264.

Lê mirov nikarê qanûn û qa'ideyek giştî ji vê meselê ra bidê û ji qasê tesîr kirin û awayê eser danînê gereke em ji rêka wehyê û xeberdanên Pêxember (selat û selam li ser wî û alê wî bin) û binemala wî ya pak ve dest ve bênîn. Gotina vê çendê jî baş e ku carna karên baş û xirab esera xwe ji xweşî û nexweşî û tewfîq û selba tewfîqê û ... di vê dinyayê bi xwe da jî heye, mesela qencî ya digel xelkê û nexasma dê û bab û famîl dibê sebebê dirêjiya 'emr û def'a afetan û belayan, an bê qîmet kirina mezina û nexasma seydayê mirov dibê sebebê bê tewfîqîyê. Lê di her hal û karî da cihê girtina xêr û cezayê 'alema axiretê ye, û ewa di dinyayê da nabê pêşîgirê wê .

PIRSYARÊN DERSA 57

Me'na hebt û tekfîrê binivîsin.

Çend awayên peywenda navbeyna kufr û îmanê da hene û ya durust kîjan e?

Girêdana navbeyna karê qenc û xirab çewan e û durusta wê çi ye?

Gelo eserên dinyayî yê karên qenc û xirab cihê xêr û cezayê axiretê wan digirê an ne?

---

[1] - وَأَقِمِ الصَّلاَةَ طَرَفَيِ النَّهَارِ وَزُلَفًا مِّنَ اللَّيْلِ إِنَّ الْحَسَنَاتِ يُذْهِبْنَ السَّيِّئَاتِ ذَلِكَ ذِكْرَى لِلذَّاكِرِينَ

DERSA 58

SERAYTÎ YÊN BAWERDARAN

Dagirê:

Pêşekî

Zêdebûna xêrê

Bexşîna gunehên biçok

Behre girtina ji karê yên dî

Pêşekî

Di pişka Xudê nasîyê da (dersa 11) me zanî ku irade ya ilahî di esil de bi xêrat û kemalata ve girhaye û şurûr û kêmasî bi-t tebe' dikevin ber irade ya ilahî da. Irade ya ilahî ji vê çendê ne der e derheq mirov da ku irade ya eslî ya ilahî li ser tekamul û gehana mirov e bo bexteweriya ebedî û daimî, û 'ezab û bextreşî ya xirabkaran ji ber bijartina wan ya xirab e ku ewan bi xwe bi serê xwe da aniye û bit tebe' bûye dagirê irade ya hekîmaneya Xudê Te'ala. Û eger 'ezab û bextreşî ya uxrewî ne pêvehata bijartina xirab ya mirov bi xwe bûya, rehmeta berfireha Xuda wereng bû ku qet çi kes giriftarê 'ezab nabûya.

Lê hema ew rehmeta berfireha Xuda ku bo sebebê xuliqandina mirovê xweyê taybetiya bijartin û ixtiyarê û lazime ya bijartina her yêk ji du rêkên îman û kufrê û gehana xilasekek qenc an xirab e; pê vê ferqê ku gehana dûmahîka baş mute'elliqê irade

